# DI DÎROKA PKK'Ê DE
# DEMA KOMA BÎRDOZÎ

# XISLETÊN BINGEHÎN ÊN
# PÊVAJOYA PARTÎBÛNÊ

**Heval Abbas**

**Werger: Yekta Şoreş**

**WEŞANÊN OCAXA PKK'Ê YA SAKÎNE**
**CANSIZ-44**

# Di Dîroka PKK'ê de Dema Koma Bîrdozî

# Xisletên Bingehîn ên Pêvajoya Partîbûnê

**Heval Abbas**

***Navê Orîjînal ê Berhemê***

***PKK TARİHİNDE İDEOLOJİK GRUP DÖNEMİ***

***PARTİLEŞME SÜRECİNİN TEMEL ÖZELLİKLERİ***

**Werger: Yekta Şoreş**

# WEŞANÊN OCAXA PKK'Ê YA SAKÎNE CANSIZ

# NAVEROK

**Pêşek........................................................................5**

**Destpêk.....................................................................7**

**Zanista Dîrokê.......................................9**

**Serwextbûna li Dîrokê.........................13**

**Rastiya Partiyê......................................21**

**Terîfa Bîrdozî ya PKK'ê.......................27**

**Şertên Derketina Holê ya PKK'ê..........51**

**Ji Aliyê Dîrokî ve Şekilgirtina Rastiya Rêbertî.......................................................69**

**Li Enqereyê Pêkhatina Koma Bîrdozî..87**

**Pêvajoya Beriya Damezirandina Fermî ya PKK'ê (1976-1978)........................................119**

**-Vegera Koma Bîrdozî ya li Kurdistanê**

**-Civînên Kurdistanê yên Rêbertî "Sefera Kurdistanê"**

**-Kongreya Damezirandina Fermî ya PKK'ê 26-27'ê Mijdara 1978**

**Pêşek**

**Hevrêyên Hêja;**

**Pirtûka “Di Dîroka PKK’ê de Dema Koma Bîrdozî û Xisletên Bingehîn ên Pêvajoya Partîbûnê” ya ji vegotinên dersa “Rastiya Rêbertî û Dîroka PKK’ê” ya Heval Abbas a li Ocaxa PKK’ê ya Sakîne Cansiz me hilbijart û kom kir, ji gotina Rêbertî ya *“Dîroka fermî ya PKK’ê girîng e, lê pêvajoya beriya wê girîngtir e”* em derketin rê, me amade kir û armanc kir ku bigihînin we.**

**Weke tê zanîn PKK, partiyeke li ser maseyê hatiye avakirin nîne û nebûye partiyeke ku pêşbînî kiriye hinek armancên siyasî bi ser bixe. Heta hatiye ber bi bibe partî hinek rastî, rêgez û xislet derxistiye holê.**

**Bihara 73'yan demeke ku darbeya 12'ê Adarê hukmê xwe dimeşîne. Dema zexta giran e. Demeke wiha ye Rêber tên qetilkirin, rêxistin tên belavkirin, kadroyan dixin girtîgehê, eger mirov bêje li Tirkiyeyê nedihiştin çivîk bifire di cih de ye. Ya rastî kesên rêxistina wan hene, jê direvin, rêxistina xwe belav dikin. Ji ber kesên xwedî rêxistin tên girtin û hê wêdetir weke di mînaka Denîzan de tên îdamkirin.**

**Rêbertî di atmosfereke ku her kes ji rêxistinê, rêxistinbûnê direviya, biryar da rêxistinê ava bike. Ev bi rewşa giştî re nakok e. Li gor sekna mirovekî normal divê di wê demê de rêxistin neyê avakirin. Pêwîst e mirov bêje, em bipên, taloq bikin, bila şert û merc guncaw bibin, em 'rêxistinê ava bikin'. Lê Rêbertî wer nabêje. Serwextbûna Rêbertî digihîje asta veguhere rêxistin û çalakiyê. Atmosfer çi dibe bila bibe, serwextbûna Rêbertî gihiştiyê bêyî li şert û mercan binihêre û lêpirsîna dê ev çi zextan bi xwe re bînin bike gavên pêwîst diavêje. Di destpêka vê gavê de çi hene? Yekemîn, cesaret ve fedakartî. Duyemîn, zereyeke oportunîzmê nîne û di asta herî pêş de xwedî sekneke şoreşgerî ye. Sêyemîn, dilsoziya têkildarî nirxên dixwaze bide jiyîn heye. Ha ev pirtûka ji bo mirov van hemûyan kûrtir fêm bike, li ser biponije me amade kir, em wer difikirin ku di asteke girîng de wê tevkariyê bike. Li ser vê bingehê em ji hemû hevrêyan re serketinê dixwazin.**

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**Komîteya Çapemeniyê ya PKK'ê**
**2018**

## Destpêk

**Dema ‘Koma Bîrdozî’ ji pêvajoya sê salan a di navbera salên 1973-75’an pêk tê. Bi esasî demeke ku hemû xebatên li Enqereyê di nav ciwanên zanîngehê de hatine meşandin îfade dike. Gavavêtin û fikra Rêbertî li Enqereyê di nav ciwanên Tirk ên zanîngehê dixwînin ku komek qezenc kir, di şexsê vê komê de avahiyeke rêxistinî bi dest xist jî digire nav xwe. Xebata esasî ya demê lêkolîn û lêgerîna teorîk e. Ji bo xeta bîrdozî-polîtîk û serwextbûna teorîk bê pêşxistin lêkolîn û lêgerînên zêde tên kirin. Li pirtûkxaneyan, malan, li ku derê derfeta xwendin-lêkolînê bê dîtin hewl tê dayîn li wan deveran xwe bigihînin hemû çavkaniyan, da ku daneheva agahiyan a rastiya Kurd û Kurdistanê rohnî**

bike û ji şoreşa Kurdistanê re bibe ronahî bê peydakirin.

Ev ji aliyê komê ve tê kirin û di Rêbertî de kom dibe. Vê xebatê herî zêde Rêber Apo bi xwe dike. Bêsekn dixwîne. Bi taybet pirtûkên têkildarî sedsala di navbera nîvê duyemîn ê sala 1800'î û nîvê duyemîn ê 1900'î, û di çarçoveyeke tengtir de jî yên pêvajoya 50 salên di navbera çaryeka dawî ya sala 1800'î û çaryeka pêşî ya sala 1900'î dixwîne û lêkolîn dike. Ji ber Kurdistan di wê pêvajoyê de bibû çar parçe û statuya heyî ya li ser Kurdistanê di wê pêvajoyê de hatibû pêşxistin. Wê demê ew pergala parçekirin û qirkirinê çawa ava bû? Kurdistan çawa kirin bin pergala înkar û tinekirinê? Li vir kê çi kir, polîtîka û helwesta kê çawa bû? Kîjan dewlet, kes û rêxistinan çi rol lîstin? Kurd çawa tevgeriyan? Kîjan civaka Kurd helwesteke çawa wergirt? Ji lewra pergaleke çawa derket holê? Kê ev pergal derxist holê? Kurdan çima û ji ber çi pergaleke wiha qebûl kir? Ji bo bersiva ji van pirsan re, rastiya Kurdistan, pirsgirêka Kurd

kê çawa derxist holê û çawa bi Kurdan dan qebûlkirin? Li ser çi esasî tê meşandin? Naverok û bingeha pirsgirêka Kurd çi ye? Agahiyên hatin komkirin hatin nîqaşkirin, nîqaşên zêde hatin kirin. Bi vî awayî serwextbûna teorîk, bû xeta bîrdozî-teorîk. Ji bo xeta teorîk a koma Apocî bê avakirin, hewldan hatin kirin.

Tevî vê yekê aliyekî din ê xebatê propaganda ye. Ev agahiyên derketin holê, di nav ciwanên Kurd de hatin propagandakirin. Rastiya Kurdistan û civakê, rastiya mêtinkarî û qirkirina li ser Kurdistan tê ferzkirin ev e. Bi awayê di vê rewşê de weke ciwan û rewşenbîrên Kurd divê em wisa tevbigerin, li Enqereyê di nav ciwanên Kurd ên xwendekarên zanîngehê de xebateke propagandayê ya pir zêde hat meşandin. Ciwanên tesîr bûn û tevlî vê fikrê bûn, anîn cem hev û kom-kom xebata perwerdeyê hat destpêkirin. Têkildarî van fikran û bi esasî jî têkildarî teoriya giştî, teoriya Marksîst, teoriya rizgariya neteweyî û teoriya

**mêtinkariyê ya rê li ber fêmkirina van fikran vedike perwerde hat dayîn. Ji ber xebata bingehîn, xebata teorîk û propaganda bû. Ji bo mirov di komê de cih girtiba, diviyabû mirov lêkolîn-lêgerîn û propaganda kiriba. Diviyabû mirov di asta karibe wê bike de xwe perwerde kiriba. Ji lewra kesên xwestin tevlî PKK'ê bibin, dest ji xebatên xwe yên din berdan, tevlî vê xebata lêkolîn-lêgerîn û propagandayê bûn. Ji bo wê jî xwe perwerde kirin. Bi vî awayî fikreke nû, komeke mirovan a li derdora wê fikrê û ew fikir pejirandine xwe kom kirine derket holê. Di nav pêvajoya sê salan de ev bi serketî pêk hat.**

**Fêmkirina vê pêvajoyê bi baş fêmkirina xisletên bingehîn ên gav-avêtina Rêbertiyê ve eleqedar e. Ji ber heta ev neyê zanîn mirov nikare koma bîrdozî jî, pêvajoya piştre jî baş fêm bike û zanibe.**

**Zanista Dîrokê**

**Bêguman dîrok ji bûyer û diyardeyan pêk tê, lê belê zanista dîrokê, bi jiberkirina van bûyer û diyardeyan ve bûyîna xwedî agahiya kronolojîk nîne, helbet ev jî hewce ne. Lê ev ast tenê wergirtina agahiyekê îfade dike. Bîrewerî, veguhertina van agahiyan ber bi bîreweriyê, ji lewra derketina holê ya zanistekê jî bi şîrovekirina van bûyeran ve têkildar e. Lewma beşeke kêm a dîrokê agahî ye, beşa zêde şîrove û bîrewerî ye. Zanista dîrokê ji vê pêk tê.**

**Di vê nuqteyê de pêwîst e mirov ne di nav nêzîkatiya şaş de be. Hewce ye mirov tenê bi agahiyên kronolojîk xwedî têgihiştineke dîrokê nebe. Nêzîkatiyeke wiha nêzîkatiyeke zanistî nîne. Divê mirov karibe dîrokê şîrove**

**bike. Dîrok hêza şîroveyê ye. Di vê çarçoveyê de dîrok lod û gidîşa agahiyên hişk û pûç, avahiyeke dogmatîk nîne. Bûyereke bîrewerbûnê ye ya zindî, nûjenîxwaz, timî guhêrbar e. Divê mirov dîrokê wer bibîne, bi vî awayî bigire dest, wiha nêzî rastiya dîrokî jî zanista dîrokê jî bibe. Ji ber vê ji zanista dîrokê re, "dayika zanistan" tê gotin. Mirov zanibe hemû zanistên din ên beşerî, fizîkî û sosyal ji zanista dîrokê çêbûne girîng e. Ji ber bîreweriya mirov li ser vê bingehê ava bûye.**

**Li gorî hemû zanistên din berhema bîreweriya mirov e, naxwe ji zanista dîrokê derketine. Çavkaniya hemû jê çêbûne dibe zanista dîrokê. Heke rastî ev be, wê demê mirov dîrokê weke hinek lod û gidîşa agahiyan, dubarebûna kronolojîk a bûyer û diyardeyên rû dane, bibîne rolekî wer dernaxe holê. Avabûna bîreweriyeke wiha îfade nake, eger mirov wer nêzîk bibe wê bibe nêzîkatiyeke şaş û kêm. Wê rastiya dîrokî bi awayekî zanistî nehatibe destgirtin.**

**Rêber Apo ji bo vê got, “Dîrok di roja me de veşartiye, em di destpêka dîrokê de veşartîne.” Ji bo rohnîkirina rewşa rojaneyî, weke tevger, civak û mirovatiyê, çareseriyê ji pirsgirêkên rojane em bi wan re rûbirû tên bibînin, dîrok serwextker e, fêrker e, pêşî li mirov vedike. Em zanista dîrokê li ser vê bingehê digirin dest û bi kar tînin. Yan na ne ji bo hinek bûyer çawa çêbûne, mirov fêrî çîrokên wan bibe û nostaljî bike, berevajî ji bo em pêşiya xwe rohnî bikin, pêşbîniya pêşerojê bikin, ji pirsgirêkên em bi wan re rûbirû tên çareseriyên rast û serketî bibînin, em rabihuriya dîrokî lêkolîn dikin, hûrdikolin. Ji bo mirov rohnîbûneke wiha bike jî bêguman şîrovekirin esas e.**

**Rêber Apo rastiya dîrokî wiha girt dest. Hêza bi tenê ya di dest de rastiya şîroveya dîrokê bû. Wekî din ti çavkaniyeke wî ya hêzê nebû. Bi qasî karîbû zanista dîrokê bi kar bîne, roja îro rohnî kir pêşbîniya pêşerojê kir, vê jî ji bo hemû civakê rohnîbûnek derxist holê. Bîrewerî û armanceke nû ava kir. Vê**

**serwextkeriyê ji civakê re îstiqameteke nû xêz kir. Rastiya Rêbertî bi awayekî vê îfade dike. Çavkaniya hêza herî bingehîn a Rêber Apo dibe ev. Em bala xwe bidinê çavkaniyeke din a hêzê nîne. Di aliyê maddî, manewî de hêzên wer xwe bispêre wan nîne. Hêza Rêbertî ya şîrovekirina dîrokê, ji dîrokê dersên rast bigire heye. Vê hêz û melekeya xwe timî pêş dixe.**

**Dizane ku çavkaniya hêzê ya herî mezin a mirov, têgihiştineke dîrokê ya rast, bi awayekî rast bikaranîna zanista dîrokê ye û vê dinirxîne. Ji vî alî ve jî bi zanista dîrokê li bersiva hemû pirgirêkên bi wan re rûbirû tê digere. Her dema bi pirsgirêkekê re rûbirû tê serî li rastiya dîrokî dide. Dîrokê lêkolîn dike, hûrdikole, hewl dide encaman ji wir derxe. Ev weke rêbaz pêş xistiye. Hemû nirxandinên wî wiha ne. Carinan dema mirov di nav nêrîna seresere û teng de be, zen tê kirin ku ev dubare ye. Dema carekê tê xwendin, dikare bê gotin, 'em fêr bûn, ên din wekî wê ne'. Ev fikrên şaş in. Heman bûyeran dinirxîne, lê ji**

heman pirsgirêkan re li çareseriyan nagere. Ji lewra ji heman cihî bi heman armancê nêzî bûyeran nabe. Ji aliyên cuda bi armancên cuda, ji bo ji pirsgirêkên cuda re li çareseriyan bigere nêzî heman bûyeran dibe û şîrove, nirxandin timî cuda ne. Yek ji wan jî ne dubareya ya beriya wê ye, heta dewama wê jî nîne. Hemû ji nû ve, ji nû ve nirxandinê îfade dikin.

Naxwe dîrok, karê ji nû ve nirxandinê ye. Dibe karê şîrove û nirxandineke bêdawî. Pêwîst e em dîrokê wiha bigirin dest. Şîroveyeke dîrokê nîne. Zanista dîrokê, tevî çîrok û agahiya kronolojîk a bûyer û diyardeyan nîne, bi tenê şîroveya dîrokê jî nîne. Bi tenê şîroveya dîrokê jî dibe dogmatîzma hişk. Weke esasgirtina bûyer û diyardeyan dike yek û tek, teng dike, dibe awayê ku fikir dikeve rewşa herî dogmatîk û li gor qaliban tê destgirtin. Şoreşgeriya Rûs ket rewşeke wer a dogmatîk û li gor qaliban digirt dest. Di destpêkê de ku hêzeke şîroveyê ya mezin bû, piştî bû desthilatdar şêwazê wê yê

**dîrok li gor qaliban û dogmatîk girt dest fikir, pêşveçûn anî nuqteyeke cemidand. Mirovatî pêş ket, tiştên nû çêbûn, lê wan qîma xwe pê anî tenê bûyer û diyardeyên di nav beşeke dîrokî de rû dane, şêwazê çêbûna wan ji ber kirin û dubare kirin. Encama vê ku hilweşîneke xerab bû, bi awayê dîrokî bi şêwazekî bi êş rû da. Li pêşiya me ders û tecrûbeyeke ciddî heye. Naxwe nêzîkatiya dibêje wê bi tenê şîroveya dîrokê hebe rast nîne, dogmatîk e, li gor qaliban tê destgirtin. Û bi esasî li dijî cewhera zanista dîrokê ye. Mijara destgirtina dîrokê ya Rêber Apo jî em nikarin wer binirxînin. Dema em dibêjin, 'Em destgirtina dîrokê ya Rêber Apo esas bigirin', ne yek bêdawî şîrove derdikevin pêşiya me. Rêbertî dîrokê timî ji nû ve şîrove dike. Wer nêzî dîrokê dibe, zanista dîrokê wer digire dest.**

**Di nêzîkatiya ji rastiyên dîrokî re hinek tezên bingehîn hene. Li ser esasê wan tezan, lê belê bi qasî şîroveya ku ji pirsgirêkên em timî bi wan re rûbirû tên li çareseriyan digere pêş**

**bixin, em ê bibin xwedî fikra avaker, veguhertin û pêşketinên civakî em ê karibin fêm bikin, safî bikin, ji pirsgirêkên roja îro re çareseriyan bibînin. Xisûsa ku dîrok di roja me de veşartiye tê vê maneyê. Rohnîkeriya roja me îfade dike. Ji bo roja me rohnî bike jî ji sedî sed li ser esasê hinek tezên bingehîn şîrove û analîza avaker a rabihuriyê hewce ye.**

**Agahiyên kronolojîk jî berbiçavtir û yekparetir bin girîng e. Li ser bingeha îfadekirina xislet û şêwazê çêbûna bûyerên esasî weke agahiyeke kronolojîk hinek xebat dikare bê kirin. Ne bi awayê dîrok, eger wisa be, dikare materyaleke bûyerên rû dane, her kes têra xwe dizane derxe holê. Ev dikarin bên kirin, lê belê ji derveyî wê bêyî mirov serî pê biêşîne, bêyî bifikire û nîqaş bike, tenê bi jiberkirinê were xwestin ku belgeyeke em ê li dîrokê serwext bibin bê derxistin, mirov dê bikeve nav dogmatîzmê. Pêwîst e mirov li benda tiştekî wer nebe. Divê tiştekî wiha rast jî neyê dîtin. Hewce ye mirov nekeve nav**

têgihiştineke wiha. Bi qasî em nekevin nav wê em ê di nav nêzîkatiyeke rast de bin.

Dewlemendî, afirînerî hewce dike. Em nekevin nav dogmatîzmê yan jî ezberê, lê belê divê mirov seresere û teng jî nebe. Zanista dîrokê fikirandin, serî li serê êşandin, bikaranîna aqil digire nav xwe. Di vê çarçoveyê de jî kûrahî, berfirehî û xurtbûnê hewce dike. Eger wisa nebe, bi gotina, ‘ez dîrokê şîrove dikim’ ji vir û wir mirov hinek tiştan deyne holê tiştekî nade qezenckirin.

Vê tevî em di Rastiya Rêbertî û Dîroka Partiyê de digirin dest, ji bo dîroka welat û gel, dîroka cîhan û mirovatiyê jî divê em wer bigirin dest. Ji bo hemûyan jî bi vî rengî ye. Pêwîst e mirov tenê ji bo dîroka partiyê raber neke. Dîroka Kurdistanê jî weke şîrove û nirxandineke rabihuriyê, bi şîrovekirina bûyeran mirov karibe ders bigire girîng e. Em ji vê re dibêjin, serwextbûna li dîrokê.

Yekemîn xisleta bingehîn a rastiya Rêbertî ew e, bi awayekî kûr xwedî serwextbûna li

**dîrokê ye. Yekemîn, zanista dîrokê weke rastiyeke zindî rast digire dest, baş bi kar tîne. Duyemîn, ji vê bi awayê ku hest û bîreweriya berpirsiyartiya zêde pêş dixe encamên rast derdixe holê. Serwextbûneke li dîrokê ya kûr û rastî ava dike. Mebesta me ya ji vê çi ye? Mebesta me ew e, mirov di nav hewldaneke li bersiva van pirsan bigere de be: Dîrokê çi fêrî me kir, çi fêrî me nekir? Em ê çawa nêzî dîrokê bibin? Kîjan wezîfe û berpirsiyartî danî ser milên me? Em ê wan çawa bînin cih? Rastiyeke ku tevahî zanîn-agahiyan bi awayê xwe dispêre zanista dîrokê derdixe holê, rastiya Rêber Apo ye. Vê jî bi hesta berpirsiyartiyeke kûr pêk tîne. Ji bo mirovatiyê, gelan, gelê Kurd, Kurdistanê dike. Bi tenê agahiyên hişk û pûç dernaxe holê, wan bi jiyana zindî, heyîn û pêşerojê re dike yek. Ji vir hest û bîreweriya berpirsiyartiyeke zêde derdikeve holê. Divê mirov zanibe ev jî tê maneya serwextbûna li dîrokê yan jî bi wê ve girêdayî ye.**

## Serwextbûna li Dîrokê

**Dema em li ser dîrokê disekinin, divê em li ser serwextbûna li dîrokê jî bisekinin. Mînak, 'em bijîn wê çi bibe, em nejîn wê çi bibe!' Di vir de mirov cihêbûnê bike girîng e. 'Wê çi bibe, Kurd hebin wê çi bibe, nebin wê çi bibe!' Em li ku dera wê disekinin. Heke em dibêjin, 'Ma wê çi bibe, hebin jî dibe, nebin jî dibe!' 'Em bijîn jî dibe, nejîn jî dibe, pir jî maneya wê nîne!' Ji bo nêzîkatiyeke wiha di zanîn, zanista dîrokê de ti maneyek wê nabe. Lê eger em jiyanê bi gotina Kemal Pîr, 'Bi qasî di oxira wê de bimirin' jê hez dikin, jiyanê weke diyardeyeke pîroz heqîqeteke esas dibînin, wê demê bersiva van pirsan diguhere. Bîrewerî û hesta berpirsiyartiyê diguhere, ji vir serwextbûna li dîrokê diguhere. Eger em hebûnê û jiyanê weke heqîqeta bingehîn digirin dest, wê demê dê ev çawa be? Mirov dikare çawa hebe? Mirov dikare çawa bijî? Ev pirs û dîtina bersiva wan tê rojevê. Ev lêgerîn, têkoşîna di asta xwesteka mezin de, wiha derdikeve holê. Enerjiya naqede di encama serwextbûneke li dîrokê û hesta berpirsiyartiyê ya wiha de, weke pêdiviyeke**

**wan derdikeve holê. Ji sedî sed ev serwextbûn-bîreweri û hest Rêber Apo tîne asta ku rastiyan ew qasî dizane, pêşbîniya pêşerojê dike, ev qasî têkoşîn dike û hewl dide. Xisleta bingehîn a rastiya Rêbertî ev e. Bi me re jî cudatiya herî bingehîn a di navbera me û Rêbertî de divê em di vir de bibînin. Cudahiya bingehîn a di navbera hemû seknên em nikarin bigihîjin Rêbertî, nikarin rast tevlî Rêbertî bibin, nikarin Rêbertî rast pêk bînin, ev e. Em dikarin vê weke nêzîkatiya felsefîk jî binirxînin. Rêbertî jî wisa bi nav kir.**

**Qederperestî, guhnedêrî, bêmanetiya vê meseleyê heye. Îddîaya me ya jiyanê çi qasî heye? Hevrê Zîlan got, "Îddîaya min a jiyanê pir mezin e" û bi biryar, bi wê îddîayê çû wê çalakiya mezin. Dibe felsefe û cewhera berxwedêriya 14'ê Tîrmehê. Naxwe cewhera rastiya Rêbertî îfade dike. Mirov di nav sekn, helwest, nêzîkatiyeke bi zanebûn û mirovî de be girîng e. Divê em rastiya Rêbertî jî di vê nuqteyê de bibînin. Sekn û helwestên bi wê**

**rastiyê re nakok jî hewce ye em di vê çarçoveyê de bigirin dest û binirxînin.**

**Rêbertî ji bo Pêngava 15'ê Tebaxê got, "Berxwedana îddîayekê înadekê." Weke têkoşîna israra di mirovmayînê de bi nav kir. Mirov weke mirov bimîne, weke mirov hebe çi îfade dike? Ji bo me çi qasî xwedî qîmet e? Em jiyanê çawa digirin dest? Têgihiştineke felsefe û jiyanê ya pergalê daye heye. Têgihiştineke felsefe û jiyanê ya Rêbertî temsîl dike heye. Ev ji hev cuda ne. Em di navbera her duyan de ne. Em timî ji her duyan jî bandor dibin. Ya rastî cudatî ew e ku dijberî hev in. Yek ya din tine dike û bi vî awayî pêk tê. Pergal jî dixwaze xwe bide jiyîn. Pergala desthilatdarparêz-dewletparêz xwe weke sîstemeke ku heta cîhan hebe ava bûye û heta cîhan hebe divê hebe bi nav dike. Ji bo hebe divê dijberê xwe tine bike. Dijbertiya wê ya bi Rêbertî re ji vir tê. Rêbertî li dijî mijara ku pergala desthilatdarparêz-dewletparêz hinekên din tine dike derdikeve. Divê her kes li cihê xwe karibin bi hev re hebin, lê hewce ye**

**li ser esasekî wiha be ku hevdu tine nekin, ji lewra zext û mêtinkariyê pêk neynin.**

**Şaxê maddî yê teng ê jiyanê jî heye. Tê maneya xwarin-vexwarin, merivbûn, mayîndebûnê. Carinan tu dibêjî qey em mirovan pir dinepixînin û heyînên din pir xerab nîşan didin. Lê belê şêwazê hebûna nebatekê, heywanekî, xisletên wan ên bi pîvanên maddî hatine diyarkirin hene. Çêdibe, mezin dibe, dimeşe, dimire, dibe tov; ji nû ve-ji nû ve dubare dibe. Jiyana hemû candaran, heyînan wiha ye.**

**Mirov, weke heyîneke hêza mejî û fikir bêhtir pêş xistiye naxwaze wiha be, naxwaze bimire. Yek jî naxwaze bi tenê weke diyardeyeke maddî hebe, dixwaze wêdetirî wê biçe. Dixwaze ji heyîna maddî wêdetir heyîna manewî pêk bîne, heyîna maddî ne weke domandina dubareya ya berî xwe, dixwaze danehevê bide pêkanîn, mezin bike, bilind bike, pêş bixe û bigihîje ya baştir, xweşiktir. Hêza fikir û aqil vê dide mirov. Jixwe cudatiya mirov a ji heywan ev e. Nuqteya ji heywan qut**

**bû, bû cureyekî cihê ji vir dest pê dike. Em dikarin vê bi awayekî berbiçav bibînin. Ya jêre mirovatî tê gotin jî ya rastî ev e. Naxwe dema em dibêjin, 'mirovatî, jiyana mirovane, hebûna mirovane', em bihurîna ji dubareya heyîna maddî terîf dikin. Heke em jiyanê, hebûnê, weke dubareyeke di asta maddî de fêm bikin, ha di wir de tişta weke mirov tê terîfkirin diqede. Ji ber em ê wê red bikin.**

**Rêbertî dibêje di vê nuqteyê de, cureyê mirov ji hebûnên din ên heyîna maddî dubare dikin cihê bû. Heta wê demê hê bi heywan re tê terîfkirin. Nuqteya ji heywan cihê bû ev e. Heke mirov ji dubarekirina heyîna maddî nebihure, nikare bibe mirovî, wê di asta heywanî de bimîne. Dê ji wê astê nebihurîbe. Belê wê domdariyek hebe, lê belê dê weke domdariya dubareyekê be. Weke pêşketin, mezinbûn, gihiştina başî, xweşikiyê û weke danehev dê nebe. Mirov bi qasî wê biafirîne heye. Mirovatî jî karê avakirina wê ye. Em li ku dera vê heyînê ne? Em vê çi qasî fêm dikin, çi qasî girîngiyê didinê, em çi qasî pêwîst**

**dibînin? Ev pirs girîng in. Nuqteyên me li hemberî serwextbûna li dîrokê û berpirsiyartiya zêde dide lêpirsînkirin ev e. Di vê çarçoveyê de asta me ya cihêbûnê ya di navbera hebûn-nebûna jiyan û mirinê de çi qas e? Bersiva em didin vê bi çi awayî çêdibe? Ya rastî pirs di vir de asê dibe.**

**Rastiya Rêbertî yek jî divê mirov di vê nuqteyê de fêm bike, bigire dest, bibîne, binirxîne, serwextbûna li dîrokê û hesta berpirsiyartiyê ya zêde ya li wir, weke îddîa û israreke mezin a hebûn û jiyana mîna mirov bibîne. Rast fêmkirina Rêbertî û xisûsa bi awayekî rast mirov tevlî Rêbertî bibe bi gihiştina vê astê pêkan e. Rêbertî hemû kêmasî, serneketin, bêtedbîrî timî di vê nuqteyê de rexne kir. Got, "Ne di şer, cesaret û fedakariyê, di jiyanê de hûn winda dikin." Diyar kir, di felsefeya jiyanê, têgihiştina jiyanê, nêzîkatiya li jiyanê, di tarz û rêbaza ku jiyan tê destgirtin de tê windakirin, zeîf dimînin.**

**Li ser vê serwextbûna li dîrokê, hest û têgihiştina berpirsiyartiyê ya zêde ya Rêbertî divê mirov bisekine. Hewce ye mirov têkiliya wê ya bi îddîa û israra jiyana azad ve bibîne. Mirov weke mirov hebe, lê bi azadî hebe, bi azadî bi başî û xweşî bijî, yeqîn bike ku ev mimkun e, mirov xwe layiqî wê bibîne, zanibe ev karê têkoşîneke mezin e, bîr bibe di meşandina têkoşîneke wiha de em erkdar û berpirsiyar in pir girîng e. Eger wiha ne be em ê çi bikin? Em ê di asta jiyaneke teng, maddî ya xwe dubare dike de bimînin. Em ê di nuqteya 'bibe jî dibe, nebe jî dibe' de bimînin.**

**Naxwe divê mirov rastiya Rêbertî weke têgihiştineke dîrokê ya rast bigire dest. Hewce ye mirov têkiliya Rêbertî ya bi zanista dîrokê re baş deyne holê. Eger em dixwazin rast fêm bikin û tevlî bibin, divê em ji sedî sed vê bikin. Yan na em ê nikaribin Rêbertî rast fêm bikin û em ê nikaribin li cihê rast li rastiya Rêbertî bigerin. Em ê nikaribin bi awayekî rast û têra xwe bigihîjin heqîqeta wî. Eger wiha be jî em ê nikaribin rast tevlî bibin û pêk bînin. Wê bi**

**parçe, teng û sereser e be. Em wer yeqîn dikin ku me fêm kiriye, em ê rabin li ser navê Rêbertî bikin, lê belê ev ji bîlî em a xwe pêk bînin wêdetir naçe. Em ê navê Rêbertî lê bikin, lê em ê ya xwe pêk bînin. Rêbertî ev red kir. Bi gotina, *"Eger hûn ê ya min pêk bînin, hûn ê xwe biguherînin. Na eger hûn ê ya xwe pêk bînin, wê demê hûn ê li tişta dikin xwedî derkevin. Divê mirov ji vê rewşa berevajî bibihure û were tehlîlkirin. Wisa her sekn bi navê min nikare bê kirin, kirina wê dê ne rast be û neyê qebûlkirin. Her sekn bi awayê bikaranîna navê min be jî, wê aîdî min nebe. Wê ev rewş zelal bibe"* cihêbûna xwe nîşan da. Divê em vê pir baş binirxînin. Rêbertî digot, *"Wezîfeya min weke berpirsiyarê partiyê ew e, ez jî di nav de, hemû kadroyan û partiyê di xizmeta şoreşê de rast bidim xebitandin."* Li ser vê bingehê Rêbertî got, *"Ez xwe nadim bikaranîn."* Wê demê em nikarin rastiya Rêbertî li gorî xwe fêm bikin. Em nikarin weke em fêm dikin şîrove bikin, bijîn. Em nikarin navê Rêbertî bînin ziman û her tiştî bikin. Ev revîzyonîzma herî bi tehlûke ye.**

**Jirêderketin ji vir li ser hemû fikrên mezin tê ferzkirin. Berê di zanista civakê de ji vê re "revîzyonîzm" dihat gotin. Em çawa pênase bikin jî têgîna revîzyonîzmê baş bû. Jirêderketin dikare ji bo xisûsên cuda jî bê gotin, ji ber giştîtir dimîne. Revîzyonîzm tê maneya guhertina cewherê. Tu şêweyê wê dibêjî, navê wê lê dikî, lê tu naverok û cewhera wê diguherî. Di bin wî navî de tu diçî cihekî cuda. Niha bi navê Îsa cîhan ev qasî tê şewitandin, hilweşandin, talankirin û mêtin. Îsa jî bi awayê "şemaqekê li rûyê wî bide pariyê ji devê wî bigire" kesayetek dilnizm e. Kesayeteke bi felsefeya "pariyek xirqeyek" hebû. Lê li ser navê vî kesî 500 sal e cîhan ev qasî hat talankirin. Xisletên bingehîn ên cîhanê hema hema xera bûn.**

**Niha nîqaşa wê qiyamet rabe, ranebe tê kirin. Mijara, wê cîhan hebe nebe! Tê nîqaşkirin. Ji ber hem rastiyeke mirov û civakê hem jî rastiya xwezayê ew qasî xera bû ku, ev hemû li ser navê Îsa tên kirin. 300 salî red kirin, dema fêm kirin bi redkirinê nikarin**

**bi bin bixin jî lê xwedî derketin û xwestin bi vî awayî cewhera wî vala bikin. Hemû di carekê de bûn Îsewî. Cîhan anîn vê rewşê. Ev jî rêbazek e. Ji vê re 'di hundir de fetihkirina kelehê' tê gotin. Padîşahê Osmanî Sultan Abdulhamît ji vê polîtîkayê re dibêje, "Zûrîna bi guran re." Eger dijminên te hebin ji bo bêhêzkirina wan mirov timî di eniyê de li dijî wan dernakeve. Heke tu ji wan zêdetir li tiştên ew dibêjin xwedî derkevî û derkevî pêş, tê her tiştî ji destê wan derxî û paşê tişta dixwazî tê pêk bînî.**

**Em bala xwe bidinê, Tayyîp Erdogan jî wiha kir. Yê herî çepgir, herî sosyalîst bû ew. Weke partî demekê hema hema wê bibana endamê enternasyonalîzma sosyalîst a Ewropa. Ji her kesî her tişt wergirt, li gor dilê wan tevgeriya. Piştre dema bû xwedî hêz, a xwe pêk anî. Xeta Erbakan, xeta Ewropa, xeta Komara Tirkiyeyê (TC) jî revîze kir. Niha jî hatine rewşa ku aşkera bêjin, 'em dewletê ji nû ve ava dikin.' Karê revîzekirinê karekî cîddî ye. Her sekna ji cewhera meseleyê qut**

**dibe revîze dike û bi tehlûke ye. Heke tu ji derve de, ji eniyê li hember derkevî ew aşkera ye, wê her kes bibîne û zanibe, lê dema tu li ser navê tiştekî tevbigerî, tu cewhera wê xera bikî, dîtin û fêmkirina wê zehmet e. Her kes nikare bibîne û fêm bike. Ji lewra ji bo bêbandorkirina wê têkoşîn zehmettir e.**

**Ev ji bo rast fêmkirina rastiya Rêbertî me îfade kirin. Ev jî bi esasî bi hesta berpirsiyartiyê, serwextbûna li dîrokê û nêzîkatiya ji jiyanê re çêdibe. Naxwe pêwîst e em rastiya dîrokî sivik negirin dest. Divê em jî karibin rêbaza Rêbertî esas bigirin, pêk bînin. Hewce ye em karibin bi awayekî felsefîk tevlî Rêbertî bibin. Bi nêrîn, jiyan, rêbaz û her tiştî divê em tevlî bibin. Em nikarin bêjin, 'Em ê hinekî tevlî bibin, hinekî tevlî nebin, ev jî wê şêwazekî tevlîbûnê be.' Rêbertî ev tevlîbûn *"weke yekîtiya ruhî"* bi nav kir. Ji bo hevrê Hakî Karer got, *"Weke ruhê min ê veşartî bû."* Çima ev got? Got, *"Em kakilek in a yekîtiya ruhî pêk aniye."* Tevlîbûna rast a nav Partiyê û Rêbertî ev e. Ti kes nikare bêje, 'Hevrê Hakî**

**Karer wisa tevlî dibe, ez ê jî wiha tevlî bibim.' Ev weke tu dixwazî nabe. Rastiya tu dixwazî tevlî bibî wê wekî xwe be. Hevrê Kemal Pîr got, "Ruhê Rêber Apo ruhê me hemûyan e". Dema Fatma rexne dikir got, "Ruhê kê hildigire, weke sîxura çi di nav me de ye? Bila ev derkeve holê." Tenê Rêbertî jî wisa pênase nake, kesên tevlî Rêbertî dibin jî şêwazê tevlîbûna xwe wer pênase dikin. Di zanebûna wê de ne. Wisa ne paşê jî, hê di destpêka meseleyê de di zanebûna wê de ne.**

**Naxwe rastiya Rêbertî rastiyeke wiha ye. Rastiyeke dixwaze, ji sedî rast bê fêmkirin, bê kirin û vê ferz dike. Eger wê rastiyek xwe ferz bike, dê ev ferzkeriya Rêbertî be. Nabe mirov li ser Rêbertî ferz bike, mirov tevlî Rêbertî dibe. Wezîfeya mîlîtan ne ew e, pîvan û xisletên ji deverên din wergirtiye li ser Rêbertî ferz bike, divê Rêbertî fêm bike û ya Rêbertî pêk bîne. Li ser vî esasî mirov tevlî rastiya Rêbertî dibe. Mirov nikare bi sekna cuda tevlî rastiya Rêbertî bibe. Heke em ê Rêbertî rast fêm bikin û pêk bînin, beriya her tiştî divê**

**mirov rastiya dîrokî ya Rêbertî baş bibîne û fêm bike.**

**Rêbertî çawa nêzî dîrokê dibe, têgihiştina wî ya dîrokê çawa ye? Tezên wî yên dîrokê çi ne, rewşa wî ya tehlîlkirina dîrokê çi ye? Serwextbûna wî ya li dîrokê çawa ye? Dostan çawa dibîne, li ser vê bingehê dijmin çawa dibîne? Çawa li pergala global û mêtingeriyê dinihêre? Çi qasî girêdayî jiyana azad e? Tehlûkeyên li pêşiya wê çi qasî dibîne? Li hemberî van tehlûkeyan çi qasî hişyar e? Çi qasî bi rêxistin e û çi qasî têkoşer e? Îddîaya wî ya jiyanê çi qas e? Divê mirov li van binihêre.**

**Rêbertî îddîayeke jiyanê ya mezin e. 45 sal in didomîne. 20 salên dawî ne, hemû cîhan di nav êrîşekê de ye, kirin qefesekê, lê nikarîbûn îddîaya wî ya jiyanê bişkînin. Armanca tevahî zext û êrîşan, pergala Îmraliyê bi tenê ew e, vê îddîaya jiyanê ya di Rêbertî de bişkînin. Li ser vê bingehê rehîn girtine û tevî hemû zext, îşkence û tecrîdê nikarîne bişkînin. Rêbertî hişyar kir û paşê jî helwest girt. Di dest de ti**

**çekek wî nîne, di qefesa dijmin de ye. Tenê bîrewerî, biryardarî û îradeya wî heye. Bi wan li ser piyan dimîne û li ber xwe dide. Naxwe mirov wer jî dikare li ser piyan bimîne û li ber xwe bide. Apocîtî, rastiya Rêbertî wer tiştekî bi hêz û derfetan pêk tê, nîne. Têkoşîna PKK'ê xwe nasipêre wan. Karekî bîrewerî, karekî baweriyê, karekî îradeyê ye. Dikare li her cihî pêk bê, li her cihî têkoşîn tê kirin. Bi tenê ne li Îmraliyê, Rêbertî got,** ***"Di gorê de jî ez ê têbikoşim, bila ti kes nebêje em ê rojekê bimirin, rizgar bibin. Min rastiyeke Rêbertiyê ya wê li sedsalan belav bibe derxist holê, ez hebim jî wê bibe, nebim jî wê bidome. Bi awayê fizîkî mayîn û nemayîn ti tiştekî naguhere. Ji wê wêdetir min rastiyeke ku wê li her cihî û timî hebe derxist holê."*** **Mebesta Rêbertî ya ji vê gotinê çi ye? Temsîla çi dike?**

**Di encama van hemûyan de mirov dikare vê bêje: Hewce ye em girîngiyê bidin vê sekn û nêzîkatiya Rêbertî, bala xwe bidin ser û ciddî bigirin. Pêwîst e em pîvan, rêgez, sekn û uslûba Rêbertî fêm bikin. Hêza xwe ji ku**

**digire? Xisleta wî ya bingehîn çi ye? Divê em baş li vir binihêrin, fêm bikin û bibînin. Ji lewra divê em ji vir Rêbertî bigirin dest û tevlî wir bibin. Wisa helwesta ez ê tevlî hinek tiştan bibim, tevlî hinek tiştan nebim, nikare bê qebûlkirin. Gotina, 'me fêm nekir', 'me di pratîkê de şaşî kir' bi awayekî ji lêpirsîna hundirîn tê. Ji bo kesekî hewl dide Rêbertî fêm bike û ya Rêbertî pêk bîne fêmnekirin û pêkneanîn nabe. Lê belê nêzîkatiya tiştên xwe yên ne diyar e bê ji ku derê fêr bûye bi Rêbertî re muqayese dike, dide ber hev, li ser van esasan bi awayekî Rêbertî lêpirsîn dike timî pirsgirêka fêmkirinê û pêkanînê derdixe holê.**

**Pirsgirêk û zehmetiyên karê pêkve derdixe holê, timî ferdperestî, ligorxwebûnê teşwîq dike, derdixe pêş û egoîstiyê ava dike. Lewma timî perwerdeyek hewce dike. Di xeta Rêbertî û şehîdan de timî rexne-xwerexnekirinek pêwîst e. Ev mecbûrî ye. Rewşa rastî ev e. Li gorî xwe şîrovekirin bi tehlûke ye. Ji ber wê têgihiştina dîrokê, tezên dîrokê yên Rêbertî ku rastiyeke dîrokî ye, têgihiştina li dîrokê ya**

**Rêbertî, berpirsiyartiya zêde ya Rêbertî ya ji vir derdikeve holê, xwesteka Rêbertî ya jiyanê û ji sedî sed hewce ye mirov bi awayekî azad hebe divê bibîne. Ev rewşa kesekî nîne, Rêbertî dema weke îddîa û îradeyeke wiha derket holê ev bi civaka Kurd û hebûna Kurd ve kir yek. Got, *"Eger min hebûna xwe bi hebûna dîrokî ya gelê Kurd ve û Kurdîtî jî bi xwe ve nekiriba yek min nikarî ez yekê ji van ava bikim."* Di vê îddîa û îradeyê de divê mirov bi tenê hewldana hebûnê ya weke ferd, weke mirov nebîne. Hebûna weke gelekî ye.**

## Rastiya Partiyê

**Divê mirov li ser rastiya partiyê raweste. Di vê mijarê de helwesta Rêbertî zelal e. Got, *"Rojekê PKK bi cewhera xwe re li hev neke û bê nuqteya zerarê dide civakê û feydeyê nade, beriya her kesî ez ê wê tine bikim. Weke min ava kiriye, ez dizanim ji holê jî rakim."* Dibe ku wiha jî bibe. Di encam de partî ne armancek, amûrek e. Lê belê ne amûreke wer ji rêzê ye. Rêber Apo yê ev hemû tiştên me gotin anî ziman got, *"Hûn dikarin her tiştî bikin, lê ez qet destûr nadim heqaret li partiyê bê kirin. Ya zerarê dide bîbika çavên min jî be ez ê derxim û biavêjim."* Belê partî amûreke, lê Rêbertî amûra partiyê jî wiha girt dest, wer nêzîk bû, wer mane dayê. Got, *"Bê partî li Kurdistanê pel jî nalive."* Partî li Kurdistanê weke amûreke avakerê her tiştî girt dest, pênase kir, rêxistin kir, xebitand, bi kar anî, nirxand. Xwe û gel jî bi amûra partiyê, bi navê PKK'ê anî heta roja îro. Ev jî aliyekî din ê meseleyê ye. Ev bêguman rastiyeke Rêbertî ye. Naxwe hewce ye mirov maneya wê jî baş fêm bike. Pêwîst e mirov rol û mîsyona partiyê baş bibîne. Em ê tehlûkeya wê ya zerardayînê jî**

**baş bibînin. Wê demê encamên em ê ji van derxin divê çawa bin? Partîbûyîna rast, weke partiyeke rol û mîsyona xwe rast dilîze, wezîfeyên xwe bi serketî tîne cih derxistina holê, mirov partîbûneke wiha pêk bîne û bibe partiyiyekî wiha. Yan na di tarzekî wisa gavek ber bi pêş gavek ber bi paş nîne. Bi şêweyî hinekî kar bike, hinekî xera bike nîne. Divê ji sedî sed em pêşengtiya partiyê, partîgiriyeke timî bi serketî kar dike, danehevan ava dike derxin holê. Serketin jî, zerarnedayîn jî girêdayî vê ye.**

**Di vê çarçoveyê de em ê PKK'ê çawa pênase bikin? Di oxira wê de bêyî çavên bimiçîne ev qas şehadet rû didin. Rêbertî got,** ***"Ya zerarê dide bîbika çavên min jî be ez ê derxim û biavêjim."*** **Gel dibêje, 'PKK gel e, gel li vê derê ye' û weke nasnameya xwe dibîne. Dijmin wê ev qasî ciddî digirin. Di Kurdistana 40 salên dawî de rastiya herî zêde tê nîqaşkirin PKK ye. Têgîna herî zêde hatiye gotin "PKK" ye û ev rastî ne ya guftûgokirinê ye. Bi tenê ne ji bo Kurdistanê, ji bo Tirkiyeyê**

**heta hema hema ji bo Rojhilata Navîn, mirovatiyê jî hat vê rewşê. Bû diyardeyeke ku her kesî di vê astê de bandor dike. Tevî pêş ket, li deşt û çiyayên Kurdistanê belav bû, li Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê belav bû. Bi awayekî erênî yan jî neyînî her kes bandor kir. Veguherî diyardeyeke ku hema hema ji aliyê her kesî ve jî tê zanîn.**

**Di vê çarçoveyê de teng û lawaz nîne. Dostên wê hewl didin dostaniyê bikin, dijminên wê hewl didin dijmintiyê bikin. Bûye hêzeke di asta global de têkoşînê dimeşîne. Erênî-neyînî di cîhana me ya îro de ya herî zêde rol dilîze PKK ye. Yên dost pir bi rûmet û serbilind in, lê xwedî derdikevin. Dijminên wê jî wê ciddî digirin. Ji kapîtalîzma global heta pergalên faşîst ên qirker-mêtinkar wiha ye. Yên dixwazin dijmintiyê bikin, hewl didin li gor vê dijmintiyê bikin. Lê di nav van hemûyan de mirov rewşa xwe bibîne, PKK'ya di realîteyê de dimeşe bibîne, mirov li asta fêmkirin û pêkanîna pratîka PKK'ê ya**

**endamên PKK'ê binihêre, li seknên li hemberî PKK'ê binihêre balkêş e.**

**Aliyekî wê ku wiha ye, bi hezkirineke mezin ciwan, mirov dibezin li ser esasê armancên xwe 30-40 hezar mirovî hezar can dane, li aliyekî jî dibe hêzeke wer herî zêde rastî êrîşê tê, ji paş ve tê xencerkirin, tê şewitandin-hilweşandin, rastî xerabî, hêrs, bertekan tê. Ev aşkera û veşartî tê kirin. Tevî mîlîtan û dostên wê yên wer hene, di vê çarçoveyê de di nav de yên dijberî wê jî hene. Rastiyeke wiha jî heye. Em ê vê çawa fêm bikin û çareser bikin? PKK seradeke wiha ye. Civakê li ber çavan derbas dike, başî û xerabiyan ji hev cuda dike. Hendazeyek e, mirovan û civakê dixe hendazeyê. Darazek e, têgihiştin, rewşa ruhî, hest û fikrên wan didarizîne. Ev bûyera darizandinê hukmê xwe pêk tîne.**

**Diyardeya li pêşberî me diyardeyeke besît nîne, lê belê nakokiya wê pir e. Niha em ê diyardeyeke wiha çawa pênase bikin, çawa fêm bikin? Em ê li ku dera vê diyardeyê bin?**

**Em nikarin bêjin, her tişt pir xweş e, hemû mîlîtan-fedaî ne, li vir her tişt temam e, ti pirsgirêk nîne. Berevajî tevî ev hemû hene, yên dijberî wan jî herî kêm ev qas hene. Weke yên erênî yên neyînî jî di heman astê de rû didin.**

**Rêbertî di vê çarçoveyê de têkildarî partiyê gelek pênase kirin. Got, *"PKK'ya rast, partiya navîn, partiya kontra."* Wer lê hatiye ku hema hema her kes xwedî PKK'yekê ye. Hemû dewletên cîhanê xwedî PKK'yekê ne. PKK'yeke PDK-YNK'ê heye. PKK'yeke rêxistinên Kurd ên hevkar heye. Rêxistinên ji PKK'ê direvin, li hemberî PKK'ê têkoşîn dikin timî diyardeke PKK'ê dimeşînin.**

**Yek jî PKK'ya Rêber Apo bi rê ve dibe heye. Em wê esas digirin, lê yên din jî ji vê qut nînin. Rastî pir bi rîsk û tehlûke ye. Aliyên wê yên mirov dikare bi tundî rexne bike jî hene. Di nav saetekê de tu dibînî PKK'yî ye, piştî saetekê tu dibînî bûye dijminê sondxwarî yê PKK'ê û bûye kontra, çûye eniya dijmin. Hema hema rojek jî nabihure. Semîr got,**

**“Min êvarekê biryar da ez bûm PKK’yî, êvarekê jî min biryar da ez qut bûm. Ma çi di vê de heye.” Rêber Apo jî got, *“Te çawa di êvarekê de PKK fêm kir û tu bû PKK’yî, êvarekê jî tu PKK’yiyekî çawa bû ku te dest ji ev qas nirxan berda.”* Carinan li êvarekê jî belav nabe. Di saetekê de çêdibe. PKK, li aliyekî jî bûyereke têkoşînê ya ev qasî bêtirs, bi lez û bi tundî rû dide ye. Rastiyeke wer bêbandor, homojen nîne. Nakokî û pevçûnên wê yên hundirîn diyardeyeke ev qasî bi lez û tund e. Diyardeyeke dijbertiyên wê ev qasî li seriyekî ne. Aliyek mîlîtanên fedaî yên çavên xwe namiçînin, aliyê din êrîşkarên kontra yên çavsor in. Niha rastî wiha ne.**

**Divê mirov rastiyan wekî heyî deyne holê. Hewce ye mirov aşkera nîqaş bike, fêm bike û bi awayê fêm bike tevlî bibe. Di vê partiyê de tiştekî wer bê veşartin nîne. Lê belê di nav partiyê de her tişt nayê gotin, her tişt nayê axaftin. Rêber Apo got, *“PKK ne kolan e. Hûn nikarin her têgînê bi kar bînin, pîvan û rêgeza wê heye.”* Atmosfera partiyê her gotinê**

**ranake. Armancek, rêgezek û pîvaneke wê jî heye. Tiştên qebûl dike û red dike hene. Cih nade tiştên red dike. Diyardeya PKK'ê hebûneke ku pîvanên wê yên red-qebûl, prensîbên wê yên bîrdozî, rêgez û pîvanên wê yên jiyanê hene, ji bo mirovatiyê pêşbîniya rêgez û pîvaneke jiyana nû dike.**

**Divê em çawa nêzî vê hebûnê bibin û çawa fêm bikin? Têgihiştin û serwextbûna li partiyê divê çawa be? Careke din hat rojevê û tê lêpirsînkirin. Hebûnên wiha bi hêz in, PKK hêzeke mezin e. Wer belavbûn û çûna wê hêsan nîne. Di wê astê de lawaz nîne. Yek jî nirxên mezin ên PKK'ê li ser piyan digirin hene. Rêbertî, şehîd û gel hene.**

**Bi awayekî sewdaserî bi partiyê ve girêdan, girêdana bêzanebûn, heta mirov lê serwext nebe bi tehlûke ye. Bi awayekî serwextî tevlîbûn, hêza biryar û çalakiya mezin pêş dixe. Rêber Apo têkildarî tevlîbûna heta mirov lê serwext nebe got,** ***"Di nav partiyê de weke mayîneke bêarmanc û eletexmîn hatiye danîn îfade dike."*** **Dadgeha darbeyê ya 12'ê**

**Îlonê bername-rêziknameyekê datîne pêşiya heval Mazlum. Heval Mazlum dibêje, "Ev ne bernameya me ye." Dema dadger dibêje, "Bernameya PKK'ê ev e" heval Mazlum bi awayî bersiv dide: "Ma ez tevlî partiyeke ku bernameya wê nizanim û min nexwendiye bûme. Ma hûn min ev qasî paşvemayî dibînin." Ha ew çalakiya mezin ji vê bîreweriyê çêbû. Wer ji ber xwe ve çênebû. Bîreweriya rast, hêza biryardarî û çalakiya mezin ava dike. Ev hemû bi girêdanên nebîrewer, bêmane û bi sewdaserî nabin.**

**Beriya her tiştî divê mirov partiyê weke bûyereke têkoşînê bibîne. Bersiva ji pirsa PKK çi ye? re eger mirov bêje, 'Karekî têkoşînê yê mezin e', bi îhtîmaleke mezin wê yek ji pênaseyên herî nêzî rastiyê be. Lewma divê mirov PKK'ê weke diyardeyeke bêtêkoşîn, homojen, pirsgirêkên xwe çareser kirine, di nav de her tişt temam e, ti pirsgirêk nîne, bi xweşikî dimeşe nebîne. Aliyekî wê ev e. Ev meyla Rêbertî ye. Lê li aliyê din deriyên wê heta dawiyê vekirîne. Her kes tê. Bi tenê ne**

**ji Kurdan re, ji hemû gelan re vekiriye. Bi tenê ne ji kedkaran re, ji axayan re jî, ji began re jî vekiriye, ne ji cinsekî re, ji hemû cinsan re vekiriye, ne ji kesên di nav civakê de, ji kesên di her qademeya dewletê de cih digirin re jî vekiriye. Ti kes nikare bêje, tu nikarî tevlî PKK'ê bibî. Ev qasî aşkera ye.**

**Ji çar aliyên cîhanê mirov ji bo tevlî PKK'ê bibin tên. Berê zêdetir Kurdistanî bû, ji Kurdistanê dihatin û ji lewra yên dihatin pirsgirêkên li Kurdistanê rû didan dianîn nav partiyê. Niha ji çar aliyên cîhanê, ji her rengî, her neteweyî, her cinsî, her beşê mirov tên. Hemû pirsgirêkên cîhanê tên nav PKK'ê. Di PKK'ê de kom dibe. Bêguman PKK pev diçe. Cihekî nakokiyên wê ew qas pir, pevçûna wê ev qas zêde ye. Mirov van rastiyan wer bibîne girîng e. Ji ber wê nêzîkatiyên teng û seresere pir zêde derdikevin holê. Seknên ferdperest, seknên kurtebir, xwe dana axaftin derdikeve pêş. Mirov di mijara fêmkirina li ku derê ye, di nav atmosfereke çawa de ye dikare rastî zehmetiyan bê.**

**Ji vî alî ve jî divê mirov zanibe PKK diyardeyeke têkoşînê ye. Rêber Apo ji bo PKK'ê digot, *"Laboratuvarek e."* Pirsgirêkên civakî em pêşî tînin vir, bi rêgez û pîvanên partiyê em rêyên çareseriyê dibînin. Paşê ji bo pirsgirêkên di nav civakê de çareser bibin, em wê çareseriyê neqlî civakê dikin. Pêşengtiya partiyê wer pêk tê. Partî dibe laboratuvarek. Dibe qadeke pirsgirêkên civakî di zemîneke teng de ber bi têkoşînê ve tê veguherandin û rêyên çareseriyê tên dîtin. Qadeke wisa bê têkoşîn nîne. Qadeke bênakokî, bêpirsgirêk, bêpevçûn nîne. Yek ji aliyê lawaz ê herî zêde di me de tê dîtin jî ew e, em partiyê qadeke wer homojen, bênakokî, bêpevçûn, em ê bi rehetî bijîn û li gor kêfa xwe tevbigerin dibînin. Ev nêrîn û pênaseyeke şaş e. PKK'yeke wiha nîne. Bi sedema di nav de têkoşîn heye jî PKK zeîf û xerab nîne.**

**Di salên 80'î de polîsên Elman lêkolîn kirine, bi awayê "PKK çawa li ser piyan dimîne, me fêm nekir. Hêzeke ev qasî bi hev dikeve, pev diçe diviyabû heta niha ji zû ve**

**tine bûba" rapor dabûn dozgeriyê. Heta hinekan bi awayê, "Em zêde têkil nebin, jixwe wê xwe bi xwe tine bike" qewîtî kiribûn. Lê rastî wisa nebû. Ne tinebûn, pêşketineke xurt derket holê. Ma ketin şaşiyê? Bi awayekî ji ber rastiya Rêbertî nedîtin, ketin şaşiyê. Bi awayekî jî ne şaş bûn. Ji ber heke bi rastiyan têkoşîn nehatiba meşandin, têkoşîna xetê û Rêbertî nebûya, dibe ku belav û parçe bûba. Eger ji ew qas têkoşînê bi xurtî derdikeve, li ser piyan dimîne ev ji ber xwe ve nabe. Bi saya hinek tiştan çêdibe. Hêzên vê dikin, pêk tînin hene. Rastiya Rêbertî, şehîdan û gel heye. Ji lewra em wer zen nekin ku yên vê partiyê li ser piyan digire 'em in'. Şaşiyeke wer a mîlîtanan jî heye. Yên xwe dinepixînin, xwe pir diecibînin, wer zen dikin ku ew dikin derdikevin. Belê, rol û mîsyoneke mezin a mîlîtan jî heye, divê mirov wê jî biçûk nebîne, ciddî bigire. Fedaîtî besît nîne, lê belê her tişt ne bi mîlîtan an jî kadroyên partiyê ve jî, hinek nirxên dema tengav dibe, dikeve zehmetiyan rastiya partiyê, li ser piyan digirin hene. Pêwîst e mirov van nirxan bibîne. Mirov**

**zanibe bi saya wan em hene girîng e. Ji vî alî ve jî hewce ye em bi awayê xwerexnekirinê nêzîk bibin, xwe baştir zanibin.**

**Bolşevîk dema ji bo şoreşê şer dikirin, kes bi qasî wan wêrek û fedakar nebûn. Dema me pirtûkên hatibûn nivîsandin dixwendin, mîlîtantiya Bolşevîk em hemû dilerizandin. Lê belê em dizanin bê piştî bûn desthilatdar ketin çi rewşê. Bêyî ti kes fîskeyekê li wan bide xwe bi xwe hilweşiyan. Me di ezmûna Sovyetê de dît ku dema hêzêk bi rêgez û armancên xwe re bikeve nav nakokiyê wê bikeve çi rewşê. Ji bo PKK'ê derseke hatiye jiyîn e. Hêzên Sovyetê dikarin bêjin, 'Li pêşiya me tecrûbeyek û dersek nebû, me wer rast fêm kir, şaş derket.' Lê em niha nikarin wisa bêjin. Ezmûna Sovyetê li pêşiya me mînakek û dersek e. Dema bi armancan re dikeve nav nakokiyan ber bi hilweşînê ve dibe.**

**Terîfa Bîrdozî ya PKK'ê**

**Mirov hebûneke difikire. Eger mirov bifikire û bikeve nav ponijandineke diyar, bi xêzkirina îstiqametekê re dikare bikeve ser rêya rast. Hem ketina ser rêya rast hem jî ketina ser rêya şaş ji fikir derdikeve. Fikra şaş ber bi şaşiyê ve dibe. Naxwe tu dikarî rast jî bifikirî, şaş jî bifikirî. Her tişt dikare ji fikir derkeve. Yan na em nikarin bêjin, ez difikirim wê demê di rêya rast de me, ez çi bikim rast e. Heke em wisa bêjin, em ê xwe ji rastiyan re bigirin û xwe bixin nav şaşiyeke mezin.**

**Naxwe partî çi ye? PKK partiyeke çawa ye? Di kîjan merheleyan re bihuriye? Di roja me de divê PKK hebe, yan na nebe? Eger wê hebe divê çawa hebe? Pêwîst e rêgez û pîvanên wê, wezîfe û berpirsiyartiyên wê çi bin? Ev pirs, pirsên girîng in.**

**Di 45 salan de gelek tişt rû dan û hat dîtin, hê hemû nehatine fêmkirin. Rêbertî maneyeke mezin dayê, têkoşîn kir, hê têkoşîna xwe didomîne. Cîhan bûye yek, ew kirine qefesekê û hewl tê dayîn her tiştên wî ji dest bê derxistin. Lê belê Rêbertî bi mejî, hest û dilê xwe li hemberî van hemûyan şer dike, îddîa û îradeya xwe ya jiyanê ji her demê xurttir digire û diparêze. Li hemberî her êrîşê têkoşîn dike. Sekna Rêbertî îddîayeke hebûnê ye, îddîaya jiyanê ye. Xwedî îrade û îddîaya di jiyana azad de hebe û pêk bîne de ye. Jê qut nebûye. Rastiyên vê seknê û têkoşînê derxistine holê hene. Kesên bi awayê maneyê didin van pêvajoyan dijîn jî hene, em dikarin ji jiyana wan jî ders bigirin. Rastiya Rêbertî û şehîdan, berxwedana gel vê îfade dike.**

**Di mijara partiyê de divê em zêdetir bigihîjin zelalbûnê. Encameke wer pir mutleq nîne. Nikare bê gotin, 'PKK temam çêbûye.' Di rabihuriyê de me zen kir ku wê wisa be. Me fêm kir ku ev jî nêzîkatiyeke şaş e. Wê ti carî partiyek wisa nebe, dê timî têkoşînê bimeşîne,**

**wê timî serketin, windahî, rastiyên wê hebin, li ser navê partiyê tiştên şaş bên kirin wê hebin. Di vir de ya girîng ew e, serketin mezin, serneketin kêm bin, di têkoşîna nav partiyê de mirov timî li xeta rast, xeta Rêbertî xwedî derkeve, biparêze û bimeşîne. Heke wisa bibe dê PKK kar û xebatan bimeşîne, wê êrîş bi hêsanî nikaribin PKK'ê bixînin. Di têkoşînê de eger kesên xwedî li xeta Rêbertî derdikevin û diparêzin lawaz bimînin an jî helwest û afirîneriya rast a pêwîst nikaribin nîşan bidin wê demê dê neyînî û lawaz be. Tehlûke di vir de ye. Yan na PKK'yeke wisa hatiye dawiyê nîne. Mirov li benda wê be rast nîne. Mirov li PKK'ya hatiye dawiyê bigere çi ye? Ya rastî tê maneya qedandina PKK'ê. Em serketinê wisa dibînin. Serketineke wisa nîne. Ya em weke 'serketin' difikirin, ya rastî dibe qedandinek. Di vir de mirov dikare mînaka Yekîtiya Sovyetê bîne bîra xwe. Tê maneya mirov PKK'ê dixe radeya jêr a Sovyetê. Pêwîst e em PKK'ê wer fêm nekin.**

**Partî çi ye? Ne çi ye? PKK çi qasî heye, çi qasî nîne? Çi qasî serketî ye, çi qasî neserketî ye? Kar û xebatan çi qasî bi rê ve dibe, çi qasî bi rê ve nabe? Ev pirsên girîng in. Em çi qasî dikarin partîgiriyê bikin? Rêber Apo got, *"Yekîtiya Ruhî."* Em li ku dera xeta yekîtiya ruhî ne? Li pêşiya me hemûyan ev pirs heye? Divê em rast û têra xwe bersivê bidin vê. Ev pirs timî li pêşberî me ye. Heta em hebin pirs ji holê ranabe, timî li pêşiya me ye û timî wê ji me bersivê dixwaze. Mirov nikare bi bersivekê qîma xwe bîne. PKK diyardeyeke wiha ya zindî û guhêrbar e. Partîbûn wiha ye. Divê mirov nebêje, 'Bila wiha nebe, bila bi gotinekê çêbibe, di carekê de çêbibe.' Bi îhtîmaleke mezin cewhera felsefeya pozîtîvîst dibe ev. Nêzîkatiya li gor qaliban tê destgirtin, dogmatîk û pozîtîvîst ev e. Dibe redkirina cewhera zindî, afirînerî, têkoşerî, pêşketin, diyalektîka veguhertinê ya meseleyê. Ya pêk tê li şûna diyalektîkê bicihkirina metafizîkê ye. Ev şaş e. Cewhera meseleyê felsefîk e. Rêber Apo got, *"Min fêm kir ku nakokiya di navbera hevalan û me de felsefîk e, lewma divê ez pir***

***zêdetir li ser felsefeyê bisekinim.”*** **Paşê got, *“Destûr nadin tiştên min têkildarî felsefeyê nivîsandine jî derkevin derve, ma wiha dibe!”* Naxwe hinek tişt nivîsandibû û nirxandibû, lê nikarî derxe derve. Yên derdikevin derve hemû di çarçoveya dadgeh û hiqûqê de ne. Mecala didinê di çarçoveya hiqûqî de ye. Ji derveyî wê nikarî tiştekî bike. Destûr nedan wê. Dema hinek nivîs derdikevin holê wer tê zenkirin ku dê timî wiha be, wisa nîne. Ev hemû prosedura hiqûqî ya herî teng bû. Ew nirxand, dema pêşî lê tê girtin, prosedura hiqûqî ya di çarçoveya teng de qediya, pêşiya xebatên wiha jî tê girtin. Tecrîd jî ji vir tê.**

**Beriya têgîna partiyê divê mirov pirsa, rêxistin çi ye? bike. Rêxistin, ji bo karekî hevpar li ser bingeha rêzikên diyar pêkve ketina nav liv û tevgerê ye. Diyardeyeke karbeşiyê ye. Divê em rêxistinê rast terîf bikin. Naxwe her rêxistinek xwedî armancekê ye, yek jî rêgezên wê hene. Rêxistineke bêarmanc nabe. Komeleyek jî ji bo armancekê tê avakirin. Bernameya wê tê çêkirin an jî rêgez**

**tên diyarkirin. bêyî diyarkirina armancê rêxistin nabe. Diyarkirina armancê têr nake, yek jî mirovên ji bo pêkanîna wê armancê hatine cem hev, wê li gorî kîjan rêzikan bixebitin. Ji ya yekemîn re bername, ji ya duyemîn re rêzikname tê gotin. Di komeleyan de 'platform û rêvebername' tê gotin. Diyarkirina armancan û yek jî diyarkirina rêgez û rêzikan e. Weke rêxistinekê partî jî amûreke wiha ye. Armancên wê hene, bi bernameyê tê diyarkirin. Rêgezên wê hene, ev bi rêziknameyê tê diyarkirin. Rêgezên xebat û jiyanê yên rêxistinê ne. Ji vê re rêzikname tê gotin. Hemû partî wiha ne. Bi awayekî wiha dikare bê terîfkirin.**

**Li aliyê din divê mirov li ser du aliyên partiyê bisekine. Yek, têkiliya wê ya bi desthilatdarî û rêveberiyê, yek jî têkiliya wê ya bi zîhniyetê re girîng e, têkiliya wê ya bi têgihiştin, zîhniyetê re. Hêmana zîhniyet û têgihiştinê ya partiyê heye. Bi tenê amûreke bi zîhniyet û têgihiştinê re mijûl dibe nîne. Amûrên wer jî hene. Zanîngeh, akademî,**

**dergeh, medrese bi zîhniyet û têgihiştinê re mijûl dibin. Fîlozof, entelektuel cemaet, akademîsyen derdikevin holê. Ew tenê bi zîhniyetê re sînordar dimînin. Partî wisa nîne. Bi zîhniyetê re têkildar e, lê belê di nav sînorê akademîk de nehatiye girtin. Amûr û organeke ku zîhniyet bi rêxistin û çalakiyê ve kiriye yek. Lê belê zîhniyeteke wê, rêgez û pîvanên wê yên bîrdozî hene. Xeta wê ya bîrdozî-polîtîk heye. Tevgereke xetê, bi bername û analîzên stratejîk tê diyarkirin. Ji lewra têkiliya partiyan bi têgihiştinê re heye, lê belê pewîst e mirov bi zanîngeh û akademiyan re tevlîhev neke. Bi wê ve ne bi sînor e, ji wê dibihure. Lê belê ji ber bi wê qadê ve eleqedar e, car caran dibe ku navê 'partî'yê li xebatên bi vî awayî bê kirin.**

**Li aliyê din têkiliya wê ya bi rêveberî û desthilatdariyê re jî girîng e. Partî, hêzeke çalaktiyê ya rêxistinî ye. Hêzeke rêxistin dike û bi rê ve dibe. Bi awayekî wisa derdikeve holê. Ji ber rêveber e, heke rêveberî bigihîjin desthilatdarî û dewletê, dibin amûra**

**desthilatdarî û dewletê. Di nav pergala desthilatdarparêz û dewletparêz de timî blokên desthilatdariyê yên cuda hene. Partiyê dema tînin ser têkoşîna desthilatdariyê, her bloka desthilatdariyê dibe partiyek. Ew nav lê nayê kirin, lê belê demên berê di împaratoriyan, qraltiyan de di hemû amûrên dewlet û desthilatdariyê de blokên desthilatdariyê yên cuda hene. Di pergala împaratoriyên serdema navîn de her padîşah û şehzade weke partiyekê ye, weke lîderekî partiyê ye. Ji bo bibe padîşah namzet e, ji bo desthilatdariyê namzet e. Ji lewra li derdora wê komeke berjewendîperest a dixwaze wê bike desthilatdar ji sedî sed xwe rêxistin dike, dibe weke partiyekê. Pevçûneke desthilatdariyê ya tund dimeşînin. Ev di dîroka Kurdan de jî hene. Di begtiyên Kurdan de bi şêwazê desthilatdarîbûna Kurd ku di nav pergalên qesrê yên xanedantiyê pêş dikevin jî hene.**

**Mirov ji Osmaniyan, pergala Îranî dikare gelek tiştan fêr bibe. Dîsa di vê mijarê de**

mirov dikare ji pergala Ereban, Misrê tiştan fêr bibe. Lê ji van hemûyan re partî nayê gotin. Têkiliya partiyê bi hemû qadan re heye. Ev kengî navê ‘partî’ digirin? Tişta em ji zanista civakî, ji lîteratura çepgir fêr bûne ew e, ya rastî di nav tevgera sosyalîst de cara pêşî têgîna ‘partî’ hatiye bikaranîn. Lîga Komunîstan komeleyek e. Paşê vediguhere partiyê. Bi awayê “Partiyên Karkeran ên Sosyal Demokrat” partî tên avakirin. Ev partî rêxistinbûnên jor jî ava dikin. Paşê, di nav Şerê Cîhanê yê Yekemîn de dibin du beş. Aliyek li Rûsyayê dibe desthilatdar. Paşê navê “Partiya Komunîst” werdigire. Aliyek lîberaltir e, li Ewropayê li deverên cuda partiyên lîberal bi gewde dibin. Weke hêzên ku berjewendiyên çînên cuda îfade dikin, xwe terîf dikin. Faşîzm pêş dikeve. Faşîzm jî partiyeke sosyalîst e. Em weke sosyalîstan, bi awayê ‘faşîzm’ pir tînin pêşberî xwe, lê belê esasê “Partiya Nasyonal Sosyalîst” “Nazîzm e”, partiya ji aliyê Hîtler ve hatiye pêşxistin. Ew jî xwe weke partî terîf dike.

**Bi awayekî rojane nuqteya em dizanin ew e, di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de hesabpirsîneke navdewletî heye. Di nav desthilatdarî û partiyan de jî hesabpirsîn çêdibe. Di encam de Nazîzm-faşîzm têk diçe. Partiyên faşîst tên qedexekirin. Bloka demokrasiyê ya Yekîtiya Sovyetê, Amerîka û Ewropayê ava kirine bi ser dikeve. Têkildarî van hemû qadan partîgirî zêdetir pêş dikeve. Partiyên Sosyal Demokrat ava dibin. Partiyên Demokrat ên Xirîstiyan tên avakirin. Partiyên lîberal ên rastgir di bin navên curbicur de ava dibin. Lê belê têgîna herî zêde tê bikaranîn dibe "Demokrasî". Bi îhtîmaleke mezin têgîna navê wê herî zêde di partiyan de heye têgîna 'demokrasî' ye. Ev jî bi mijara ku di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de eniya demokrasiyê li hemberî faşîzmê serketin bi dest xist ve eleqedar e. Piştî wê partîgiriya di roja me de tê. Di cîhana roja me de hemû karên rêveberiyê, karên desthilatdariyê bi navê partiyê dimeşe. Ev bi tenê ne li Ewropayê, êdî li Asya, Afrîka û Amerîkayê jî wiha ye. Li hemû parzemînan, hemû pergalên**

**dewletparêz hema hema wiha ye. Di hinekan de dibe ku yek partîtî heye, di hinekan de partî nayê bikaranîn, lê belê civak an jî welatên bê partî pir kêm in. Li her cihî hêzên dibin desthildar, rêveber jî xwe weke 'partî' bi nav dikin. Hêzên muxalefetê yên têkoşîna desthilatdariyê dimeşînin jî xwe weke partî bi nav dikin. Ji lewra rêxistina herî berfireh a roja me, partî ye. Ji ber li her cihî heye. Bi her cureyî, her navî partî hene. Dema 'partî' tê gotin, divê mirov van hemûyan bibîne. Dema bi awayekî dîrokçe em binihêrin ev hemû hene.**

**Aliyên wan ên hevpar hene? Ev qas partî, muxalefet hene. Partiyên rastgir-çepgir hene. Aliyên hevpar ên ev qas organên bi hev dikevin hene. Hinekî bi fikir ve eleqedar in, hinekî bûyîna rêveberî û desthilatdarî dibe aliyekî hevpar. Yek jî rêxistin in. Li gor esasê bername û rêziknameyê dixebitin, ev alî hevpar e. Lê di naverokê de ji aliyê armanc û rêgez de ji hevdu pir cuda dibin, diguherin. Bi rêgez û armancan ve girêdayî ye. Zêdetir**

**partiyên pergala kapîtalîst, pergala zext û mêtinkariyê, mulkiyeta taybet û kedxwariyê rast dibînin, esas digirin hene. Ji van re 'partiyên rastgir' tê gotin. Partiyên desthilatdariyê ne. Dewletparêz in, desthilatdarparêz in. Tevî vê partiyên têgînên weke 'azadî, wekhevî, lihevparkirin, demokrasî' bi kar tînin, li ser van rêgezan tevdigerin hene. Ji van re jî 'partiyên çepgir-sosyalîst' tê gotin. Ev jî rêgezên azadî, wekheviyê esas digirin, lê belê ji aliyê amûr ve ji navendê ve bi ser dewletê ve ne û li desthilatdariyê endeks dibin. Bi paradîgmaya dewletparêz tevdigerin. Dibin partiyên dewletparêz. Cudatiya di navbera wan de hinekî bi awayekî dibe cudatiya nuansê. Dikare bê gotin, 'Dewleta te baş e, dewleta min baş e.' Bolşevîkan ev veneşartin. Gotin, 'Dewleta wan li gor wan demokrasî ye, ji bo me weke dîktatoriyê ye. Dewleta me ji bo me weke demokrasiyê ye, ji bo wan dibe dîktatorî. Bila be em jî dikarin bibin dewletek e wiha' û ev mijar parastin.**

**PKK bi guhertina paradîgmayê re partîgiriyeke nû terîf dike. Baş e ma PKK çawa weke partiyekê çêbû? PKK, di nav tevgera çepgir-sosyalîst, sosyalîzma pêkhatî, ji nav pergala partiyên weke 'Partiyên Komunîst' an jî 'Partiyên Karkeran' dihatin terîfkirin, di aliyê teorîk de ku ji wan bandor bû, bi awayê pratîk dişibiya wan, ew weke model esas digirt, çêbû.**

**Partiyeke paradîgmaya dewletparêz esas digirt. Ji navendê ve bi ser dewletê ve û li desthilatdariyê endeks bû. Xwe hem weke rêxistineke rizgariyê ya bindestan, çînan û beşan, hem jî weke rêxistina rizgariyê ya netewe û gelê bindest terîf kir. Weke partiyeke rizgariya neteweyî û rizgariya sosyal pêkve kir bername, kir zikhev, bi hev re girt dest hebû. Teoriya xwe li gor wê ava kir. Xwest li Kurdistanê jî têkoşîneke wiha bimeşîne. Di nav vê civatê de çêbû. Lê bi pîvanên dihat pêşbînîkirin derfet nebûn li Kurdistanê mirov li dijî pergala mêtinkar-qirker a heyî derketiba, jê qut bûba û li hemberî wê têkoşîn**

**kiriba. Dema di çarçoveya rizgarixwaziya neteweyî û sosyal a sosyalîzma pêkhatî terîf dikir, ket Kurdistanê jî hinek pîvanên pratîk ferz kir.**

**Eger tu hebûn û azadiya gelê Kurd esas digirî, tu di vê rewşê de hevgirtî bî, wê demê tê ji vê pergalê qut bibî û bibî pergaleke cuda. Ji ber pergala faşîst-qirker bi ti awayî mafê hebûnê nade. Ne weke partiyên din ên çepgir e. Tevgerên çepgir, seriyê çepê yê pergalê ne. Di rewşa ku herî faşîst e jî dikarin hebin. Lê belê, eger tu hebûn û azadiya Kurdistanê esas digirî, wê demê zereya wê jî nîne. Hebûnê nas nake. Pergaleke li ser esasê tinebûna Kurdîtiyê hatiye avakirin. Tu nikarî navê wê jî bêjî, tu nikarî nasnameya wê jî îfade bikî, tu nikarî propagandaya wê jî bikî. Eger tê wisa bikî, wê demê tê ji wir qut bibî. Paradîgma çi dibe bila bibe, tê ji wê cuda xwe rêxistin bikî. Rastiya pergala qirker-mêtinkar a li Kurdistanê ev e.**

**Ji ber vê xisleta herî bingehîn a Rêber Apo ew e, terîfa ‘rizgariya neteweyî û sosyal’**

**nekiriye. Rêxistin û partiyên din jî ew tişt dinivîsandin. Rêbertî weke tê xwestin têkiliya wan bi hebûn û azadiya Kurdistanê ve çêkir. Xwe anî nuqteyeke ku hebûn û azadiya Kurdistanê bêtawîz diparêze, bi wê derê ve dibe yek. Rêbertî got, *"Heke min hebûna xwe bi hebûna Kurdistanê re, hebûna Kurdan jî bi hebûna xwe re negihandiba hev, min nikarî ez van pêşketinan ava bikim."* Rêbertî bi wê derê ve gihand hev. Dema wisa bû, pratîk timî ji fikir cuda bû. Bi wê teoriyê ne pêkan bû mirov li Kurdistanê pratîkeke azadîxwaz a rast kiriba. Di rewşeke wiha de PKK timî bi nakok bû. Weke teorî û gotin qebûl kir. Tiştekî din a ava kiriba nebû, lê dema ket qada pratîk jî şertên azadiyê çi bûn, li gor wan tevgeriya. Gotin û gavên Rêbertî ku hevdu digirin û dahîtiya Rêbertî ji vir tê. Pratîkê çi xwest ew kir. Azadî, di pratîkê de çi dixwaze wer tevgeriya. Ji lewra pêşketina pratîk, şekilgirina navxweyî ya partiyê û kadro cihê pêk hat. Di gotinê de terîf û pîvanên partiyê cuda, di fiîliyatê de cuda bû. PKK, Rêbertî fiîliyat esas girtin.**

Dema partî hat damezirandin ev nakokiyeke bingehîn bû. Rêzikname: "Kesê bername û rêziknameyê qebûl dike, bi rêkûpêk di rêxistinekê de dixebite û aîdata xwe dide kadro yan jî endamê partiyê ye." Di PKK'ê de kadroyek wiha nebû. Di PKK'ê de jî ne qebûlkirina bername û rêziknameyê, bi armancên wê re yekparebûn, ne di rêxistinekê de kar-xebat û dayîna aîdatan ew e, mirov hemû hebûn û jiyana xwe bide vê dozê. Ji ber bi awayekî fiîlî partîgiriya 24 saetan e, pratîk û teorî nakok bû. Rêbertî ev nakokî di kongreyê de bi bîr xist. Li rewşa di rêziknameyê de nihêrî, biryar derket û dît ti kes fêm nake. Dema kongre bi dawî bû got, "Wê demê hûn ê ji bavê xwe pere bigirin û her meh aîdatên xwe bidin." Dema Rêbertî ev got, her kes şaş mabû. Pereyê ti kesî nebûn, her kes bi bavê xwe re pev çûbû, ji pergalê qut bibû û hatibû. Di navenda qutbûna ji pergalê qutbûna ji malbatê hebû. Ji ber yek ji çavikên girîng ê pergalê malbat bû, pergala mulkiyetparêz, desthilatdarparêz û ferdperest li ser malbatê ava bibû. Nakokî ev qasî

**berbiçav bû û Rêbertî bi zanebûn ev nakokî dijiya. Hêza wî ya çareseriyê hê jî nebû, lê belê hinek rêgez esas girtibûn û dimeşand. Di nav lêgerîna wê li ku derê bê çareserkirin de bû. Bi sedema 'Nakokiyeke wiha heye' nedireviya. Çareseriya bêdem ferz nedikir.**

**Ev çareserî di pêvajoya piştî Pêngava 15'ê Tebaxê de pêş ket. Pêngava 15'ê Tebaxê, bi tenê ne ji bo propagandayê qutbûna ji pergalê, yek jî dema li dijî pergalê jiyana xwe danî holê û xeta şer derxist holê êdî berbiçavbûn hewce dikir. Ji bo ev domandiba diviyabû fikir û pratîk biba yek. Xisleta Kongreya 3. ev e. Ev yekparebûn pêk anî. Teorî li gor ên di pratîkê de bi gewde kir. Pratîk li gor teoriyê veneguherand, hinek ferzkirin ji bo rewşa pratîk li gor teoriyê hatiba rêkûpêkkirin bû û PKK jî biba weke partiyên sosyalîzma pêkhatî. Lê Rêbertî tersê wê ferz kir, ji ber ku ya azadî pêş dixist tersê wê bû. Bi vî awayî bi azadiyê, gerîla, azadiya jinê re di zikhev de pêk hat û yekparebûn wer derket holê. Gerîlabûn, azadî û ev di xeta**

**azadiya jinê de pêkanîn, weke yekparetiyeke ketiye zikhev derket holê. Di vê rewşê de paradîgma neguhert, lê belê li gor şert û mercên Kurdistanê partîgiriyeke nû derxist holê. Ji partîgiriya berê hat bihurîn.**

**Ji bo pêşxistina şer bi awayekî bû çareserî, lê belê bi temamî çareseriyeke bîrdozî jî nebû. Nakokiya armanc û amûr hebû. Kongreya Sêyemîn armanc zelal kir. Li aliyekî azadî, guhertina bi cudatiyan, azadiya jinê, lihevparkirin, piştevanî, sîstema ekolojîk pêş ketin. Li aliyê din ji paradîgmaya dewletparêz nehat bihurîn. Qutbûna ji pergalê, li şûna partîgiriya saetên diyar ên rojê, partîgiriya 24 saetan û ji bo armancên partiyê fedaîtî anî. Lê belê ev fedaîtî nebû xeteke bîrdozî. Nakokiya amûra ew pêk aniye ya bi bîrdoziyê, rêgezên bîrdoziyê re heta guhertina paradîgmayê hat. Rêbertî piştî komployê got, "Em pêxîrtengiya bîrdozî dijîn." Amûr û armanc li hev nake. Vê carê ji nû ve amûr û bi armanc re li hev anî, kir nav ahengekê. Rêgez esas girtin, amûr li gor rêgezê terîf kir.**

**Diyar kir ku bi dewleta amûreke zext û mêtinkariyê ye, azadî-wekhevî pêk nayê û li amûrekî nû geriya. Demokrasî, civaka demokratîk, konfederalîzma demokratîk wiha terîf kir. PKK'ê guhertineke bi kok li ser vê bingehê jiya. Pêşî ji pergalê qut bû, destpêk wisa ye. Ev qutbûn bi Kongreya 3. re li hemberî pergalê bû şer. Paşê jî bû guhertina paradîgmayê. Bi guhertina paradîgmayê re êdî ji partiya dewletparêz-desthilatdarparêz derket, bû partiyeke civakparêz. Bû "Partiya Civakparêz a Demokratîk, Partiya Sosyalîst a Demokratîk". Civakparêzî, sosyalîzm e. Weke têgîn wisa tê terîfkirin. Bû partiyeke civakparêz a demokratîk. Yanî ji xisûsa ku ji aliyê amûr ve ji navendê ve bi ser dewletê ve ye û li desthilatdariyê endeks dibe derket. Bû partiyeke ku ji aliyê amûr ve ji navendê ve bi ser civaka demokratîk ve ye. Bû partiyeke civakparêz a demokratîk a xwe disipêre azadiya jinê û ekolojiya civakî. Ev rewş dibe partiyeke nû.**

**Partîbûna dema sêyemîn vê îfade dike. Partîbûna dema yekemîn bi sosyalîzma pêkhatî re qutbûna ji pergalê bi xwe re anî. Partîbûna dema duyemîn ji Kongreya 3. ve li hemberî pergalê şerekî daîmî dibe anî rojevê. Partîbûna dema sêyemîn qutbûna bi awayê paradîgmayî bi xwe re anî. Hemû partiyên xwe dispêrin paradîgmaya dewletparêz di encam de desthilatdarî û dewlet çêkirin, zext û mêtinkarî anîn. Rêgezên azadî-wekheviyê di gotinê de man, pêk nehatin. Armancê amûr têk bir. Di vê rewşê de guhertina paradîgmayeke armanc û amûr li hev anî û kir nav ahengekê pêk hat.**

**PKK di vê çarçoveyê de dibe partîgiriyeke nû. Ji navendê ve bi ser dewlet û desthilatdariyê ve nîne, bi ser civaka demokratîk ve ye. Ji navendê ve bi ser civaka demokratîk ve ye ya xwe disipêre azadiya jinê û ekolojiyê. Partiyeke cureyekî nû ye. Nû pêş dikeve, li gor xwe xisletên wê hene. Guhertina paradîgmayeke wiha di PKK'ê de nakokiyê ava nake, çareseriya nakokiyên ji berê de hene**

bi xwe re tîne. Çareseriya nakokiya armanc û amûr îfade dike. Bi vî awayî pêşî li partîbûneke xurttir vebûye, zemîna wê hatiye avakirin. Ev guhertin ya rastî PKK'ê nake rewşeke nayê fêmkirin û jiyan lê nabe. Berevajî yekparebûna armanc û amûr tê pêkanîn, dihêle PKK zêdetir bê fêmkirin, mirov hêsantir tevlî bibe, baştir jiyan lê dibe.

Terîfkirina stûnên navmalê yên bingehîn ên dîrokê û xisletên wê jî girîng e. Rêbertî got, "Dîroka fermî ya PKK'ê girîng e, lê pêvajoya beriya wê girîngtir e." PKK partiyeke ku li dora maseyê hatiye avakirin, pêşbînî dike hinek armancên siyasî bi ser bixe nîne. Heta hatiye ber bi partîbûnê hinek rastî, rêgez û xislet derxistiye holê. Me terîfa partiyê kir, têkiliya wê ya bi desthilatdariyê, fikir û diyardeya rêxistinê re îfade kir. Me bal kişand ser xisletên bingehîn ên gelek partiyan jî. PKK jî yek ji wan e, lê belê ma mirov dikare bi wan re wisa qiyas bike? Ma em dikarin bêjin, 'Madem PKK jî partiyek e, em li partiyên din binihêrin û bêjin PKK jî wiha ye?' Eger wer

**bêjin wê rast be? Madem partî rêxistin in, komele jî rêxistin in, wê demê ma em dikarin weke her rêxistinekê nêzîk bibin? Pirsgirêk hinekî jî ji vir derdikeve.**

**Me pêvajoya guhertinê ya di PKK'ê de bi kurtasî terîf kir, lê hewce ye mirov naverok, cewhera PKK'ê jî fêm bike û terîf bike. Partî ye, lê partiyek e çawa ye? Rêxistin e, lê rêxistinek e çawa ye? Tevgera Azadiyê ye, lê tevgereke azadiyê ya çawa ye? Niha PKK'ya şaxberdayî li ku dera wê ye?**

**Di aliyê karmeşandina rêxistinî de disîplîna her rêxistinekê, tarzê wê yê xebatê, sûc-ceza û rêzika wê heye. Heta wiha nebe nikare bibe rêxistin. Ev di PKK'ê de jî hene. Divê mirov esasê karmeşandina rêxistinî ya di PKK'ê de zanibe. Wê rêxistin bê avakirin, lê belê rêgeza wê çi ye? Berê digotin, "Rêgeza partiyê." Di vê mijarê de şaşî hene. Bi rêxistin û partiyên din re tê tevlîhevkirin. Rêbertî bi awayê "yekparebûna îradeyê" terîf kir. Herî dawî dema di rêziknameya Kongreya 5. amade kir, terîfa kadro û endam hat bicihkirin de got,**

**“Kesê îradeya xwe di asta herî jor de bi îradeya partiyê re kiribe yek.” Ev tê maneya mirov li gor îradeya rêxistinê tevbigere. Di vir de êdî ‘ez’ nîne, ‘rêxistin’ û ‘em’ hene. Nêrîna min wiha ye, ez ê nêrîna xwe pêk bînim, nîne. Helbet avakirina nêrînê, tevlîbûna nîqaşan, azadiya fikir, berpirsiyartiya fikir a her kesî heye. Lê belê nîqaş di çarçoveya rêzikên partiyê de ne. Dîsa dema nêrîn vediguherin biryarekê, mirov neçar e li gor wê biryarê tevbigere. Rewşeke bi awayê ‘Ez tevlî wê biryarê nebûm, ez pêk nayînim’ nîne. Di vir de parastina fikra xwe, parastina mafê xwe yê rexneyê heye, lê biryar wekî heyî bicihanîn heye. Ji kesê ku tişta rast nabîne, dema partî dike biryar pêk tîne re bi esasî kadroyê partiyê tê gotin. Yekparebûna îradeyê vê îfade dike. Nayê pêkanîn, carinan aşkera tê guhertin.**

**Di demên dawî de tavilê dikarin kom bibin û biryarên me li ser navê PKK’ê girtine biguherînin. Wer bê kirin jî dîsa PKK’yî ne. Wisa nîne. Bi tenê eger tam di nav yekîtiya**

nêrînê de bin em dikarin pêk bînin. Eger nêrîna wî be kadroyek ji bo pêkanîna wê tevlî dibe. Nakeve nav helwesta ‘Ez rast nabînim, madem partiyê biryar girtiye, ez ê vê heta dawiyê bi serketî bînim cih.’ Ji rêgeza rêxistinê qutbûn heye. Îrade û bi îradeya partiyê re kirina yek nîne. Vesazkirina xwe ew bi xwe çêdike. Dibêje, ‘Ez pêşniyar dikim.’ Pêşniyar jî ji bo bandorkirina aliyê pêşber e. Ji ber dema li dû wê neyînî derdikevin holê, rexne tên, dikare bêje, ‘Min devereke din pêşniyar kiribû, we ez şandim.” Bi awayekî çêkirina muqaweleyê ye. Di partiyê de pêşniyarkirin nîne. Ji partiyê re pêşniyarkirin heye, lê bi partiyê re rewşa xwe muqawelekirin nîne. Tê gotin, ‘Ez dixwazim biçim wê derê’, lê belê rêxistina partiyê heye, ji bo ku derê plansaziyê çêbike, hewce ye mirov li ku derê têkoşînê bike mirov diçe wir. Bi awayê, ‘bila partî wiha bê rêxistinkirin, wisa têkoşînê bimeşîne’ mirov dikarin pêşniyaran bikin. Divê ev timî hebe, lê bi awayê ‘Ez wisa bim’ divê pêşniyar neyê kirin. Ji ‘bila partî wê bike zêdetir’ pêşniyara, ‘ez

**wisa bim' heye. PKK partiyeke wisa nîne. Rêbertî got, "Yekîtiya me ya ruhî heye. Berê em bi hevrêyan re nediaxivîn, dema çavên me diketin hev me fêm dikir bê em çi dibêjin û her kesî wezîfa xwe dikir." Mirov wer tevlî Rêbertî dibe. Niha hinek tiştên di nav partiyê de tên kirin, ew qasî sûcekî giran ê disîplînê ye, heke partiyek zeîf bûya dibe ku hilweşiyaba. Partiyeke normal jî divê ceza bike. Ya rastî her kes li ser partiyê ye. Berê dihat gotin, "Partiya te heye, partiya xwe belav bike." Niha partiya wan nîne, ew bi xwe partî ne. Her kes li gor xwe divê di ser partiyê re be! Bûne şef. Li derdorê şefokên wer dikarin derkevin pêş. Mirov nikare wiha bibe partî. Ji vî alî ve dema mirov li ya heyî dinihêre, mirov dikare çi qasî bibe partî bi nîqaş e.**

**Terîfkirina PKK'ê hem zehmet hem jî hêsan e. PKK muxlaq û bêxwedî nîne. Rêbertî got, "Şehîd PKK'yî ne. PKK, rêxistinbûna bîranîna Hakî Karer e. Ji zincîra şehîdan pêk tê." Em dibêjin, "Rêbertî partî ye. Em tevgera**

**Rêbertî ne.” Gel dibêje, “PKK gel e, gel li vir e. PKK nasnameya me ye.” Ev hemû rast in. Naxwe xwediyên wê hene. Weke Rêbertî, şehîdan û gel tê terîfkirin. Ji ber bi hêza gel li ser piyan dimîne. Her tişta xwe bi awayê dispêre hêz, tevkarî, hêza cewherî ya gel dike. Ji ber wê gel partiyê weke nasname dibîne. Naxwe xwediyê wê heye, bêxwedî nîne. PKK, bêxwedî û bêrêgez nîne. Hêzeke her kesê dixwaze li gor dixwaze xwe şîrove bike, li gor dixwaze tevlî bibe, li gor dixwaze tevbigere nîne. Tam berevajî xwediyên wê, rêgez û armancên wê hene. Bi bernameyê armancên xwe, bi rêziknameyê rêgezên xwe diyar dike. Xwe weke partiya Rêbertî, şehîdan û gel terîf dike. Ev xwediyên wê ne. Naxwe eger wê tevlîbûn çêbibin, divê bi zanebûna van rastiyan tevlîbûn çêbibe. Heke tê di nav partiyê de tevbigerî, bi zanebûna van rastiyan tê tevbigerî. Wer mirov serobero tevbigere nabe. Bi ti awayî ji kêfiyetê re cih û destûr nabe. Aliyekî rastiya partiyê jî wiha ye.**

**Naxwe em tevgereke Rêbertiyê ne. Mirov bibe tevgereke Rêbertî çi ye? Yekbûna Rûhî ye. Di nav vê tevgerê de, 'Nêrîna min a cuda, liv û tevgera min a cuda, têgihiştinên min, ez jî wer difikirim, ez wiha heme, ez jî pariyek im, stûneke navmalê me, ez çawa dixwazim ez ê bibim' nabin. Mîlîtan ew kes e di nav xeta Rêbertî de dihele. Kesayetek e ku şertên xeta Rêbertî dikare bi rê ve bibe. Rêbertî got, "Heqîqeta xwe rêxistin kiriye û hatiye çalakkirin." Diyar kir, tarzê jiyana vê heqîqetê mirov "bi felsefeya pariyekê xirqeyekê bijî". Fedaîtî ji dayîna canê xwe nayê. Ji tarzê xwe yê jiyanê tê. Divê mirov fedaîtiyê şaş fêm neke. Yekparebûna wê heye. Yekparebûna "Fikir-zikir-çalakiyê" heye.**

**Rêbertî girîngî da partiyê. Got, "Bê partî li Kurdistanê pel jî nalive." Ya girîng derketin û gavavêtina Rêbertiyê bû. Rêbertî girîngî da bîrewerî û rêxistinbûnê. Şêwazên wê pir curbicur dît. Xwest bi tevgera çepgir a Tirkiyeyê re jî di bin sîwaneke hevpar de têkoşînê bimeşîne. Heke ne sosyal şoven bûna**

**û tevlî bibûna, wê pêvajoya jêre ADYOD dihat gotin, dewam kiriba. Wê weke modele rêxistinî ya bi tifaqa stratejîk a şoreşên Tirkiye û Kurdistanê pêş ketiba. Wan red kir. Paşê xwest rêxistineke eniyê ava bike. Li Kurdistanê her kes heye, komên curbicur, rêxistin û rêbertî hene. Lê wan dikarî di nav eniyekê de tevbigerin. Heke Kemal Burkay û yên din qebûl kiribana, dê weke tevgereke eniyê ketiba Kurdistanê. Lê wan tevlîbûna nav eniyeke wisa red kirin. Ji ber nedixwestin tiştekî bikin, red kirin. Wan dema rêxistin ava kirin, pêşbîniya jiyana xwe dikirin. Dema Rêbertî çû rêxistinê ava bike pêşbîniya welat û gel azad bike dikir. Armanc cuda bûn. Ji lewra jî têgihiştin, pîvan, jiyan û tarzê xebatê cuda bû. Di encama van de rêxistinbûneke wer a bi şêwazê PKK'ê pêşbînî kir û pêş xist. Timî jî ji tifaqên bi vî awayî re amade bû. Vekirî ma, lê dema bi van re nemeşiya, rêya xwe dît, rêxistina xwe pêş xist. Eniya gel, rêxistina gerîla, hêza parastinê ava kir. Her tişt bi hêza gel û hewldana xwe afirand. Xwe nesipart ti derê.**

**Me PKK terîf kir, hêzeke têkoşînê ya wiha ye. Di nav de her meyl heye. Di civakê de çi hebe di nav PKK'ê de jî ew hene. Em nikarin vê tine bihesibînin. Ev her roj neqlî PKK'ê tên kirin. Ji ber her roj mirov tevlî dibin, em dixwazin zêdetir tevlî bibin. Ji eniya dijber qut dibe û tê, leşker e çeka xwe datîne û tê nav me. PKK ev qasî vekiriye. Ji lewra her meyl têde heye. Partî qadeke têkoşînê ye, me terîf kir. Divê mirov vê rastiyê zanibe û bibîne.**

**Bi sedema wiha ye, mirov nikare weke tevgereke her kes kêfa xwe dide axaftin, bê armanc, bê rê û rêzan binirxîne. Na, wisa nîne. Xeteke wê, felsefeya wê, teoriya wê, bîrdoziya wê, bernameya wê, analîza wê ya stratejîk, şêwazê wê rêxistin û çalakiyê heye. Ev hemû hene û Rêbertî van diyar dike. Di vê çarçoveyê de tevgereke Rêbertiyê ye. Rêbertî ya rast diyar dike. Ti kesekî din diyar nake. Ji lewra Rêbertî îstîqameta wê xêz dike. Her meyl tê, lê di nav PKK'ê de têkoşîneke bîrdozî-rêxistinî ya zêde heye. Vê têkoşînê meyl û xeta Rêbertî dimeşîne. Ya kontrol dike,**

**hakim e, digire meyl û xeta Rêbertî ye. Hewl dide wan çareser bike, bihelîne, rêyên çareseriya pirsgirêk û nakokiyên ji civakê tên bibîne, rê û rêbazên çareseriya pirsgirêkên bi heman awayî yên di nav civakê de peyda bike. Bi qasî ku wan çareser dike pirsgirêkên di nav partiyê de çareser dike, nakokiyan ji holê radike, bi qasî rêyên çareseriyê dibîne dibe hêza çareseriyê, bandor li ser civakê dike. Bi vî awayî bi xurtî bandorê li civakê dike. Asta perwerdekirin û rêxistinkirina civakê, her wiha civak kişandina nav çalakiyê zêde dibe. Heke nakokî û pevçûna di nav xwe de çareser neke, hêza çareseriyê peyda neke, bandora wê ya li ser civakê, bûyîna hêza perwerde, rêxistinkirin û çalakiyê lawaz dimîne. Kesekî bi xwe bêperwerde be nikare kesekî din perwerde bike. Naxwe divê pêşî partî perwerdekirî, rêxistinkirî û çareserker be. PKK yek jî partiyeke wiha ye.**

**"Felsefeya pariyekê xirqeyekê" girîng e. Felsefe têgihiştina jiyanê ye. Bi heman awayî rêgezên bîrdozî jî girîng in. Îdeolojî, tê**

maneya pîvan û rêgezên jiyanê. Divê mirov vê bi teoriyê re tevlîhev neke. Lenîn, dibêje “teorî gewr e.” Di nav de her tişt heye. Em niha dikarin nirxandinekê bikin, êvarî jî em dikarin nirxandineke din bikin. Dibe ku bûyerên cuda rû bidin, em ji aliyekî din karibin binihêrin. Girîng e bê em ê bal bikişînin ser ku derê. Lê bîrdozî mutleq, teqez û di heman demê de dijwar e. Ji yekparetiya rêgez û pîvanan pêk tê. Bîrdozî naguhere, rêgez wer bi hêsanî ji holê ranabin. Ev dikarin bên nûkirin, xurtkirin, ev cuda ye, lê belê rêgezên bîrdozî girîng in. Carek rastiyeke bîrdozî ya wiha ya PKK’ê heye. Rêbertî herî dawî got, “Jiyana pariyekê xirqeyekê.” Weke tarzeke jiyanê diyar kir.

Rêbertî berê digot, “Divê mirov weke kesekî ji gel bijî.” Di manîfestoya pêşî de heye. Wisa ji bo xwe xwesertî, cihêxwazî nîne. Wisa mirov xwe bide jiyîn, bibe xwedî mal-mulk, mulkiyeta ferdî nîne. PKK tevgereke ku ji jiyana maddî bihuriye. Di aliyê bîrdozî de tevgereke xizmetê ya wiha ye. Civata mirovên

ku jiyana xwe, hebûna xwe fedaî azadiya civakê kirine. PKK xwe wiha terîf dike. Yên tevlî dibin, tevlî vir dibin. Ya balkêş jî ev e. Rêbertî di parêznameyê de got, “Gel ne li axaftinên PKK’yiyan, li jiyana wan nihêrî, yeqîn kir û tevlî bû.” Sekna wan a bîrdozî, tarzê wan ê jiyanê bandor kir. Tarzê jiyanê jî tarzê jiyana fedaî ya heyî ye. Cihê ku mirov ji ferdperestiyê, maddiyatperestiyê, bûyîna xwedî malê taybet, di xwe de hinek tiştan kom bike dibihure ye. Cihê hemû îmtiyaziya jiyanê tê rakirin e. PKK’yîtî, rastiya Rêbertî ev e. Pîvan û rêgeza wê ev e. Ji vî alî ve tarzê jiyanê girîng e. Me tesfiyekariya 2002-2004 dît. Tesfiyekariyê êrîşî ku kir û xwe bi çi îfade kir. Xwest bi tarzê xwe yê jiyan û têkiliyê vê bike. PKK’yîtî axaftina beredayî, galegal nîne.

Nuqteyeke din jî, wê têkiliyên Rêbertî-PKK’ê çawa bên îfadekirin: Di vê nuqteyê de jî mirov PKK’ê û Rêbertî ji hevdu qut bike, PKK’ya rasteqîn û Rêbertî yekpare bike, tam bike weke hev çi qasî şaş e, mirov ji hevdu qut bike jî ew qasî şaş e. PKK’ya di fiîliyatê de

**heye, nayê maneya Rêbertî. Rêbertî di hundirê wê de ye, lê hêza têkoşînê ye ya kontrol dike, rê dide ber. Xetek, meyleke. Li hemberî têgihiştinên ji derve tên nav partiyê hêzeke ku têkoşîna xeta bîrdozî-rêxistinî dimeşîne. PKK homojen nîne. Di PKK'ê de her cure meyl û têgihiştin heye, lê ya serwer e, hildigire, rê dide ber meyla Rêbertî û xeta Rêbertî ye. Dema ji vir derdikeve ber bi jirêderketinê ve diçe.**

**Di vê nuqteyê de gelek nêzîkatiyên encamgir hene. Di nav PKK'ê de qet nedîtina têkoşîna çîn û cins, têkoşîna xeta bîrdozî-rêxistinî, tênegihiştin, xwedîlêderneketin, tevlînebûna vir, bi gotina, 'Bila hinekên din vê bikin, bila Rêbertî bike', her tişt avêtina ser derve û ser Rêbertî heye yan jî gotina, 'PKK cuda, Rêbertî cuda ye' heye. Ev her du jî şaş in. Ev her du jî pir zêde rû didin. Têkoşîna xeta bîrdozî-rêxistinî têra xwe nayê meşandin. Halbûkî Rêbertî got, "Meşandina xeta bîrdozî-rêxistinî xisleta min a bingehîn e." Eger dê mirov bi ser bikeve, divê tarzê Rêbertî**

esas bê girtin. Eger ev neyê kirin, wê demê mirov bi ser jî nakeve.

Li aliyê din tê gotin, ‘Rêbertî cuda, partî cuda ye.’ Têgîna ‘Apocîtiyê’ ber bi wir ve tê kişandin. Têgîna ‘Apocîtiyê’, têgîneke ku heval Mazlum pir jê hez dikir. Hêzên dijber jî wisa gotin, Rêbertî girt ser xwe. Navekî komê nebû, em dikarin bêjin ku hinekî jî weke tedbîr hat kirin. Rêxistinê nîşan dide. Tevgereke ku bi tifaq û lihevkirina hinekan ava bûye, nîne. Tevgereke li derdora Rêbertî ava bûye. Naxwe pîvanên felsefîk-bîrdozî yên PKK’ê û tarzê jiyana wê, encama ku tarzê jiyana Rêber Apo veguheriye rewşa rêxistinî ye. Ya rast ev e. Wer ji hinekan nehat wergirtin. Di vê çarçoveyê de ‘Apocîtî’ xwedî girîngî bû.

Komeke, tevgereke ku di Rêbertî de berbiçav bibû. Kesên ji derve jî lê dinihêrin wisa digotin, hundirê wê jî wisa bû. Beriya bi fermî ava bibe, dema koma bîrdozî bû, tevgera ciwanan bû wiha bû û rêxistinek bû. Rêxistineke ji rêxistina fermî ciddîtir bû. Aliyê

**wê yê bîrdozî pir bilindtir bû. Hemû rêgezên bîrdozî, tarzê jiyanê di wê demê de ava bûn. Rêbertî ne belasebeb ji bo Hakî Karer got, "Weke ruhê min ê veşartî bû." Di asteke mezin de têkiliyên di navbera Rêbertî û Hakî Karer de tarzê jiyana PKK'ê, rêgezên wê yên bîrdozî çêkirin. Têkiliyên kadro, têkiliyên bi mirovan re, pîvanên bûyîna pêşeng û mîlîtan li wir berbiçav bûn. Rêbertî ev pêş xist, Hakî Karer bû mîlîtanê wê. Rêbertî weke rêber dît û tevlî bû. Li gor wê pîvanên mîlîtan derxist holê. Ji lewra rêgez û pîvanên bîrdozî yên partiyê di wir de veşartîne. Divê mirov nebêje, 'Dema Koma Bîrdozî' û jê nebihure. Hemû tesfiyekar êrîşî wir dikin. Tavilê navek jî lê dikirin. Dibêjin, "Koma Enqere." Koma Enqereyê kî bûn? Koma esasî Rêbertî, heval Hakî û Kemal bûn, têkiliya di navbera wan de bû. Kakil ev bûn. Yên êrîşî koma Enqereyê bikin, êrîşî vir dikin. Xeta li Enqereyê berbiçav bibû ev bû. Paşê mezin bû û koma ber bi welat ve hat neqilkirin wer ava bû. Wan pîvanan rê da ber, kesekî nehat rê neda ber.**

**Tevî ev hemû tên zanîn jî tesfiyekariyê êrîş kir. Di 2002-2004'an de zêdetir êrîş kirin. Ji Enqereyê kî derket, kesî ev pir lêpirsîn nekir. Bû ya bi guman lê tê nihêrîn. Heta di şexsê hinek kesan de li hemberî bingeh û rêgezên bîrdozî yên partiyê êrîş çêbû, lê xwedîderketin lawaz bû. Manedayîn lawaz ma, bi guman hat nihêrîn.**

**Girêdana bi sewdaserî bi PKK'ê ve, guman û înkarkerî di zikhev de ye. Lenîn dibêje, "Bingeha vê ya civakî heye." Înkarkerî meyla çîna navîn e. Îsa bi hewariyên xwe tê naskirin. Îsa ji hewariyan re dibêje, "Ez xwe naxapînim, pêşî hûn ê min înkar bikin." Yê yekemîn hewariyê wî Petrûs e, dema Îsa digirin, sê caran dibêje, 'Ez nas nakim.' Derewan dike. Lê xwedî dernakeve, înkar dike. Naxwe Îsa nexapiya. Mirovên dikevin formasyoneke wiha naxapin. Dema dibin partî jî dijbertiyek heye. Sekneke nabe mîlîtan jî heye. Du cure mîlîtanbûn heye. Yek jê, bi ruhê xwe bi her tiştê xwe bi Rêbertî re dibe yek û dimeşe. Yek jî sekneke ku dixwaze ew bi xwe**

**partiyê şîrove bike û ji lewra timî xwedî nêrîneke bi guman e. Rêbertî ji vê re got, “Şekîlgirtina tîpê duyemîn.” Ev hene û li aliyekî dibin evîndarê partiyê, li aliyê din jî dikarin bibin dijminê herî mezin. Ev jî rastiyeke PKK’ê ye. Rastiyeke divê timî têkoşînê bimeşîne û çareser bike.**

**Terîfa ‘Apocîtiyê’, terîfa redkirina PKK’ê nîne. Apocîtî ew e mirov tevlî Rêbertiyê bûba, tevlîbûneke li ser esasê yekîtiya ruhî ya Rêbertiyê re bû. Apocîtî mezin bû. Bû kom, bû tevgera ciwanan. Paşê bû partî. Ruh, hest, fikir û keda Rêbertî bi partiyê veguherî rêxistin û çalakiyê. Li cihekî din veneguherî. Ji lewra qutkirina Rêbertî ji partiyê, tê maneya mirov Rêbertî ji pratîkê qut bike derxe asîman û pratîkê bi dest bixe.**

**Dijmin, 19 sal in Rêbertî kiriye Îmraliyê û hewl dide ji PKK’ê qut bike. Lê Rêbertî qet qut nebû. Di nav PKK’ê de hebûna gelek meylan û têkoşîna bîrdozî-rêxistinî rewşeke cuda, cihê destgirtina PKK’ê û Rêbertî rewşeke cudatir e, pir bi tehlûke ye. Partî ji**

**Rêbertî qutkirin û kirina bin kontrola xwe îfade dike. Ya duyemîn, xeta Rêbertî ji pratîkê qut dike taloqî pêşerojê dike, dike mucered û ji berbiçavbûnê tê qutkirin. Piştî tê gotin, 'nayê fêmkirin, nayê pêkanîn' êdî li ser navê Rêbertî her kes a xwe pêk tîne. Karê ew dike dibe karê Rêbertî. Wiha nîne. Ev rewşa jirêderketin û jirêderxistinê ye. Heke partî nebe, wê ti qîmetê fikrên Rêbertî nebe. Wê li ku derê bikeve pratîkê? Wê çi tesîra wê hebe? Ji ber her tiştî bi partiyê re dike, bi partiyê re kir. Rêbertî partî wer dît û got, "*Ya zerarê dide partiyê bîbika çavên min jî be ez ê derxim û biavêjim.*" Di vê çarçoveyê de di Rêbertî de lihevkirin nîne.**

**Yek jî têgîneke wisa ye: Di dema 2. de ERNK, ARGK hat avakirin. Wezîfeya demê gerîlabûn û berxwedana gel bû. Pêşengiya partiyê rêxistinên taybet ên wan bi rê ve dibe ava kir. Di dema 3. de KCK heye, HPG heye. Tevgera Jin bi rêxistiniya xwe heye. Komalên Ciwan-Tevgera Ciwanan heye. Siyaseta demokratîk heye. Li her parçeyî partî hene.**

**Sîstemên parçeyan hene. Rêbertî got, "Konfederalîzma Demokratîk rêxistinbûneke tevnê ye." Têkildarî bûyîna rêxistinbûna tevnê divê em pergaleke ku ji hezaran rêxistinên ketine zikhev ên yekparetiyekê ava dikin pêş bixin. Rêxistiniyeke ev qasî berfireh e.**

**Di terîfkirina avahiyeke rêxistinî ya wiha de pirsgirêk hene. Çavkaniyeke girîng a nîqaşên di demên dawî de ev e. Rêxistinên ava bûne şibandina hev û kirina wekhev heye. Ji lewra lêgerîna di bin sîwanekê de gihandina hev heye. Wê sîwan kî be? Nîqaş di vê nuqteyê de ye. Wiha tê gotin, 'Wê PKK bibe sîwan? Wê KCK bibe sîwan? Ev nabin, em qebûl nakin, wê demê bila Apocîtî bibe sîwan, di nav tevgera Apocî de rêxistin hene, gelek rêxistin hene, hemû dişibin hev.' Ne wiha ye. Tevgereke wiha nîne. Mirov nikare Apocîtiyê wiha bi nav bike. Bi vî awayî tevgerê tînin asteke ji yekûna arîtmek a rêxistinên bi heman rengî. Halbûkî yekûna arîtmetîk nîne. Yekûna wê ya organîk e. Mebesta ji yekûna organîk çi ye? Yekîtiya rêxistinên di heman**

**fonksiyonê de nîne. Rêxistinên fonksiyonên wan cuda tên cem hevdu yekîtiyeke nû, organîzmayeke nû ava dikin. Weke mirovekî serî, mil, tilî, ling û organên wî yên hundirderve hene. Rol û mîsyona hemûyan cuda ye, lê dema digihîjin hev organîzmayek yanî bedena mirovekî çêdibe. Em bala xwe bidinê, lê ne yek e, bedena mirov ne sîwanê wan e. Dema ew digihîjin hev yekparebûneke nû ava dibe. Niha tevgera azad tevgereke wiha ye. Tevgera PKK'ê xwe wer rêxistin dike. Dema KCK'ê rêxistin dike li ser vê bingehê dixwaze bike pergalek.**

**Li şûna wiha bin, tê xwestin ku wisa bin: Wiha tê gotin, 'Rêxistin hene, bila hemû di bin sîwanekê de bibin yek. Bila KCK bibe sîwan.' KCK û PKK sîwanek nînin. Ji van jî dibihurin û dibêjin, 'Bila Apocîtî bibe sîwanê me.' Carek têgihiştina 'sîwan' şaş e. Têgihiştina 'sîwan' rêxistinan dişibîne hev. Tê gotin, "PKK, KCK, HPG, PAJK, KJK, Komalên Ciwan hemû rêxistin in, wekî hev in. Bila bên cem hev, tevgereke hevpar bê avakirin,**

**komîteyên tevgerê ji van pêk bê û tevger ji yekûna van pêk were!" Ev nêrîn şaş e. Eger wisa bibe, wê demê rol û mîsyon wê bibin weke hev. Wê cihêrengî ji holê rabe, hemanbûn derkeve holê û veguhere yekûna heman rêxistinan. Mînak HBDH, tifaqeke partiyan e, rêxistina sîwan e. "Tevgera Şoreşger a Yekbûyî ya Gelan" e, lê ne PKK HBDH'yek e, ne jî KCK-HPG HBDH'yek e. Wisa nîne. Weke HBDH tifaqeke partiyan nîne. Yekûna organîk e. Di nav de gelek rêxistin hene, lê rol û mîsyona hemûyan cuda ye. Hemû weke bedenekê digihîjin hev, organîzmayeke nû derdixin holê. Naşibe hev, heman rolî nalîze. Yekûna hemanbûnan, yekûna yên dişibin hev nîne. Ev jî têgihiştineke rêxistinî ya şaş e. Ev bi tenê ji bo sîstem wiha ye nîne, eger tenê PKK jî hebe mînak, Komîteya Navendî ya PKK'ê, kongreya wê, komîteya wê ya parçeyan, komîteya wê ya herêman heye. Lenîn dibêje, "Partî ji yekûna arîtmetîk a van komîteyan pêk nayê." Sed komîteyên wê hene, nabêje rêxistineke ji sed komîteyan pêk tê. Sed**

**komîte hene, lê her komîte cuda cuda ye, cudatiyên wan hene. Navê wan 'komîte' ye, lê rol, mîsyon û wezîfeyên wan cuda ne. Dema tevlî partiyê dibin, cihê tevlî dibin cuda ne. Her kes, her komîteyek organeke organîzmaya nû pêk tîne. Li ser vê bingehê tevlîbûn çêdibe. Ji komîteyan avabûneke wer heye. Partî bi xwe jî wiha ye. Her komîte di nav partiyê de xwedî wezîfe, berpirsiyartî, rol û mîsyoneke cuda ye. Her kes heman tişt nîne û heman tiştî nake. Partî wiha nîne, komeleyek jî wiha naxebite. Heke komîteyeke jêr a wê hewl bide wê bike, dê wê rake ber bi rexekî ve dahf bide.**

**Ji vî alî ve dema mirov bêje, 'Ev rêxistin hemû heman tişt in, xwedî heman mîsyonê ne, partî yek in, gelek partî hene û PKK jî partiyeke wekî wan e. Gelek partî hene, PKK jî partiyeke wekî wan e. Hemû dişibin hev, ji lewra di navbera PKK û KCK'ê de ti ferq û cudatî nîne, di heman astê de ne', ti xebatek nikare bê meşandin. Ev nêrînên şaş in. Bilêvkirineke 'sîstem'ê heye. Di nav sîstemê de**

rêxistin hene. Her rêxistin biryara dixwaze dikare bigire. Di vê sîstemê de rol û mîsyona her rêxistinê çi ye? Wezîfe û berpirsiyartiya kê di çi çarçoveyê de ye? Kîjan wezîfeyê kîjan rêxistin pêk tîne û pîvana wê çi qas e? Ev nayê dîtin, şibandin, kirina wekhev heye. Wisa nîne. Hê jî di fêmkirina vê de, di fêmkirina konfederalîzma demokratîk de lawaziyeke ciddî heye. Bi giştî di fêmkirina rêxistinê, bi taybet di fêmkirina konfederalîzma demokratîk û partiyê de lawazî heye. Şibandin, kirina wekhev zerarê dide partiyê. Ji ber avahiya hêza bîrdozî ye, partî ye. PKK û PAJK e. Di PKK û PAJK'ê de ev anîna rojevê, nîqaşkirina wan, derketina holê ya pirsgirêkan tê fêmkirin. Di rêxistinên din de çima pirsgirêkeke wiha nîne, heta di fêmkirinê de hinek tişt dibin pirsgirêk, ji ber rêxistinên xwedî hêmanên bîrdozî nînin. Li gorî wan bi vî awayî xweş e. Karan hinekî baştir jî bi rê ve dibin, lê çima ji partiyê ji vê re îtîraz çêdibe, PKK-PAJK di vê mijarê de rexne dike, têkoşînê dimeşîne, dixwaze biguhere. Di fêmkirina vê de zehmetiyan dikişînin, lê belê

**ev sekn PKK'ê diqedînin. Bîrdozî diqede. Heke bîrdozî biqede wê PKK biqede. PKK di vê çarçoveyê de bi tenê tevgereke siyasî nîne, bi tena serê xwe tevgereke leşkerî nîne, tevgereke ku hemûyan digire nav xwe ye. Rêbertî got, "Partiya kok." Hewce ye mirov têgîna 'Partiya Kok' fêm bike û nas bike. Divê mirov li ser lêhûrbûnan bike. Rêbertî got, "Her tişt li ser koka xwe hêşîn dibe." Ya jor diyar dike kok e. Ya avahiyekê diyar dike hîm e. Nebatekê koka wê diyar dike. Heke em dibin neteweyeke demokratîk koka wê jî dibe partî. Rêbertî ji vê re got, "Prototîp."**

**Pêwîst e mirov weke 'Partiya Kok' bibîne û terîf bike. Divê mirov PKK û PAJK'ê bi rêxistinên din re tevlîhev neke. Partiya kok e. Hêzek e li tevahî qadên bîrdozî, polîtîk, rêxistinî, leşkerî, civakî xwe rêxistin kiriye, bi rê ve dibe, hemûyan temsîl dike. Hêzeke ku li her qadê heye, têgihiştinê pêş dixe û bi rê ve dibe. Hêzeke felsefeyê, xeteke bîrdozî-polîtîk, bernameyek, sîstemeke rêxistinbûnê, hêzeke tarz-uslûb-tempo ye. Van hemû xisletên xwe ji**

**rastî û taybetmendiyên Rêbertî werdigire. Ya PKK'ê rast diyar dike, ya diyarker rastiya Rêbertî ye. Ji ber tevgereke Rêbertiyê ye.**

**Hewce ye em hemû rêxistinan jî xebatên xwe yên rêxistinî jî di vê çarçoveyê de rast fêm bikin. Pêwîst e em partiyê jî rast fêm bikin. Heke em rast fêm nekin û tevlîhev bikin, dema em dibêjin em kar dikin, dibe ku em xera bikin. Di vê rewşê de em çi qasî bixebitin em ê ew qasî pir xera bikin. Mirov qet nexebite, baştir e. Ya herî baş mirov rast fêm bike û rast bixebite. Naxwe em ê hemûyan rast fêm bikin. Em ê PKK'ê jî rast fêm bikin. Divê em bi partiyên li parçeyan, bi KCK, HPG û Komalên Ciwan re tevlîhev nekin. Bi van re qiyaskirin û şibandin nabe. Dubarebûna rêxistinên bi heman cureyî nîne. PKK nayê maneya KCK'ê. Eger wisa be jixwe yek ji wan bê mane dibe. Wê demê bila yek hebe, didu îsraf e. Eger wisa nebe, divê mirov cudatiyên wan baş fêm bike. Dema mirov cudatiyan datîne jî divê ne weke dijbertiyan, weke yekparebûnê deyne holê. Ne hemtayên hev, ne**

**jî dijberên hev in. Alternatîfên hev jî nînin. Temamkerên hev in. Dema tên cem hev yekparetiyeke organîk a nû ava dikin. Yekîtiyeke li rex hev nînin, yekîtiyeke wan a di zikhev de heye.**

**Ji vî alî ve mirov di nav PKK-PAJK'ê de be û di nav yên din de be heman tişt nîne. Tiştekî bi awayê dema mirov di nav wan de be nikare di nav PKK'ê de be nîne. Carek nasnameya bingehîn a hemû mîlîtanên profesyonel-şoreşger, nasnameya partiyê ye. Partiya kok e. Hêza bîrdozî-felsefîk e. Ya diyarker ew e. Divê piştî wê nasnameyên duyemîn, nasnameyên sêyemîn hebin. Wiha tê gotin, "Ya tê di nav PKK'ê de bî yan jî di nav KCK'ê de. Yan tê di nav PKK'ê de bî yan jî di nav HPG'ê de, bila her kes cuda cuda be." Heke wisa be, wê demê maneya ew heman tişt in jî dikare derkeve holê. Ev nêzîkatî şaş e. Çima em nikarin bi nasnameyên dumend, sêmend re bixebitin. Wê demê Rêbertî got, "Eger hewce bike, kesek dikare di nav deh rêxistinan de cih bigire." Niha Rêbertî Serokê Giştî yê KCK'ê ye,**

**Rêberê PKK û PAJK'ê ye, Serfermandarê HPG û YJA-Star'ê ye, Rêberê Gelê Kurd ê gel e. Gelek nasnameyên Rêbertî hene. Ev di heman demê de nasnameyên fermî ne. Herî dawî bû Serokê Giştî yê KCK'ê. Wiha tê gotin, "KCK heye, Rêbertî KCK ava kiriye, Serokê Giştî yê KCK'ê ye." Wê demê kê PKK ava kir? Kê HPG ava kir? Ji KCK'ê çil qat zêdetir Rêbertî ev ava kirin. Tê gotin ku xwe weke Serokê Giştî yê KCK'ê terîf kiriye. Rêbertî weke "Rêbertiya Partiyê" terîf kir. Sala 1984'an li Ewropayê weke "Rêberê Neteweyî" hat nivîsandin. Di Kongreya Sêyemîn de got, "Ev rast nînin. Ji niha û şûn ve têgîna fermî, em ê bêjin Rêbertiya Partiyê ye." Ev terîfeke ku Rêbertî hem jî di kongreyekê de gotiye û fermî kiriye. Li Akademiya Mahsum Korkmaz, weke Serfermandar pêşî ferman da ARGK'ê paşê da HPG'ê. Di rêvebernameya HPG'ê de jî wiha ye. Weke Serfermandar tê terîfkirin.**

**Ez dixwazim çi diyar bikim, hemû nasname hene. Divê mirov nebêje, 'Em ê bibin**

**nasnameya tekane.' Hewce ye mirov nasnameyan tevlîhev neke. Nêzîkatiya tek û dûz me nake hêzeke ku tevna rêxistinbûnê ya weke konfederalîzma demokratîk pêş dixe. Wê demê em ê pir alî bin. Em ê gelek nasnameyên rêxistinî di zikhev de bi kar bînin, em ê hewl bidin. Em ê van tevlîhev nekin. Dema wiha dibe, wê li vir nasnameya partiyê, pêşengiya partiyê tevlîhev nebe. Ji ber sekna felsefîk-bîrdozî ya diyarker e. Tê partiyê bi yên din re qiyas nekî. Tu nikarî bêjî, ez wiha tevlî HPG'ê bûm, ez wiha jî tevlî PKK'ê dibim. Tu nikarî bêjî, ez wiha di Komalên Ciwan de cih digirim, di PKK'ê de jî wiha cih digirim. Ji ber pîvan û rêgezên wê cuda ne. Eger tu tevlî PKK'ê bûyî, wê demê tê tevlî rêgez û pîvanên PKK'ê bibe. Tê li gor pîvanên mîlîtanê şoreşger ê profesyonel tevlî bibî. Mîlîtaniya şoreşger a profesyonel pîvan û sekna kadro ya bingehîn a PKK'ê ye. Ma sempatîzanên PKK'ê hene? Belê hene. Sempatîzantî pîvanek e. Alîgirtî jî pîvanek e. Ev di rêziknameya PKK'ê de jî hene. PKK tevahiya gel jî digire nav xwe, lê weke kadro**

**cih nagirin. Civaka kadro ya mîlîtan a PKK'ê cuda, civaka sempatîzan, alîgir a PKK'ê cuda ye. Ev bi dîwaran ji hev qut nînin, lê bi pîvanan ji hev qut bûne. Mirov ji yekê derbasî ya din dibe. Pêvajoyên kadrobûnê ji alîgirtiyê, sempatîzantiyê pêş dikeve. Lê carekê eger tu wekî mîlîtanê şoreşger ê profesyonel tevlî bibî, wê demê tê rastiya PKK'ê, bîrdoziya wê, tarzê wê yê jiyanê, rêgezên wê, felsefeya wê, bîrdoziya wê zanibî. Çawa li jiyanê dinihêre, tarzê wê yê jiyanê, rêgez û pîvanên wê çi ne? Di PKK'ê de rêgezên rêxistinî, yekîtiya rêxistinî çawa ye? Disîplîna rêxistinê çi ye û çawa dixebite? Ji çi re sûcê disîplînê tê gotin? Divê ev hemû bên zanîn û di rêziknameyê de hatine diyarkirin. Di bername û rêziknameyan de bi fermî heye û hatiye fermîkirin. Tê li gorî van tevlî bibî, tê di vê astê de bimînî. Heke tu van îhlal bikî dibe ku partî biavêje, divê biavêje. Ji ber divê partî xwe zelal bike. Têgîneke bi awayê "pakkirin-şûştina partiyê" heye. Rêbertî kesên pîvanên partiyê rast nekirin, nemeşandin avêt. Ji sala 1986'an û şûn ve got, "Em pîvanên eniyê yên**

**ERNK'ê daxin. Nikarin bibin mîlîtanên şoreşger-profesyonel, nikarin bibin mîlîtanên fedaî, wê demê bila weke welatparêzan ên hevgirtî bixebitin. Eger wê hevgirtî bin, em firsendê bidin ku weke dixwazin bila bixebitin. Lê belê bila pîvanên xwe li ser partiyê ferz nekin. Bila sekna xwe ya bîrdozî û bi awayê bila partî wekî ez dixwazim be ferz nekin. Ti kes nikare wer pîvanên xwe li ser partiyê ferz bike."**

**Şertên Derketina Holê ya PKK'ê**

**PKK, dixwaze bibe tevgera sedsala 21'emîn, têkoşîna xwe ya girîng di sedsala 21. de bi rê ve dibe, lê em dizanin ku di sedsala 20'emîn de derket holê. Dema derketina holê û şekilgirtin xisletên şertên sedsala 20. dihewîne û hildigire. Ev rastiyeke tê zanîn e.**

**Rêbertî şertên derketina holê ya PKK'ê bi şêwazê sernavên curbicur lêkolîn dike. Bi taybet jî di çarçoveya bîrdoziya dewleta netewe de digire dest û dinirxîne. Partiyeke ku girêdayî paradîgmaya dewletparêz bû û ji navendê ve bi ser dewletê ve bû dihat çi maneyê? Di vê çarçoveyê de Rêbertî dinirxîne.**

Di avabûna xeta teorîk, felsefîk, bîrdozî-polîtîk, avahiya rêxistinî û çalakiyê de helbet tesîreke zêde ya dema derketiye holê heye. Ne li derveyî wê ye. Di vê çarçoveyê de bi qasî ku jinûve avabûn jiyaye sedsala nû temsîl dike. Ev jî bi esasî bi guhertina paradîgmayê ya di serê sedsalê de jiyaye tê îfadekirin. Nûbûn, guhertin, jinûve avabûn li ser vê bingehê pêk tê.

Ya bi esasî mohra li cîhana sedsala 20. xist, nakokî û şerê di navbera DYA û Sovyetê de bû. Xisleta wê ya bingehîn ew e, cîhan du qutb bû. Dema nîv sedsala ji nîveka çaryeka pêşî ya sedsalê û çaryeka dawî pêk tê, bi temamî nakokî û pevçûna dijwar a cîhana du qutb îfade dike. Wer lê hatiye ku ji derveyî vê nakokî û pevçûnê li cîhanê bûyereke din nikare pêk were. Tevahî tevgerên bîrdozî, siyasî, leşkerî di nav cîhaneke wiha de pêk tê û mohra wê hildigire. Nikare derkeve derveyî wê. Li hemberî meylên derdikevin derveyî wê her du qutb di carekê de helwest digirin û tevgerên bi wî awayî zêdetir hildiweşin,

**darbeya girantir dixwin. Hewldanên bi vî awayî jî hene.**

**Di derketina holê ya PKK'ê de jî qutibbûyîneke wiha, têkoşîna di navbera du qutban de, sekna her du qutban û têkoşîna di navberê de jî xwedî bandor e. Wer lê hatiye ku ev qutibbûyîn jixwe bi şerên mezin çêdibe. Sedsala 20. weke "Sedsala Şerên Cîhanê" jî tê binavkirin. Du şerên mezin hene. Yek jê, di çaryeka pêşî ya sedsalê de, ya duyemîn; di nîvê sedsalê de çêdibe. Dîsa weke "Sedsala Şoreşan" jî tê binavkirin. Şoreşa Cotmehê ya di nav Şerê Cîhanê yê Yekemîn de rû daye heye. Tevgerên Rizgariya Neteweyî yên li dû Şerê Cîhanê yê gihiştine serketinê hene. Ji lewra ji bo vê sedsalê gelek binavkirinan dikin. Sedsaleke wer bêbandor, zenûn û bêhereket nîne. Mirov dikare weke sedsaleke ku dîroka mirovatiyê texrîbatên herî giran jiyane binirxîne.**

**Bi tena xwe texrîbata Şerê Cîhanê yê Duyemîn çêkir, texrîbateke ku li cîhanê mînakeke wê nîne. Hema hema behsa mirina**

**50 mîlyon mirovî tê kirin. Bajar û welatên hatine hilweşandin, şewitandin û bi erdê re bûne yek hene. Civakên bi komkujî û qirkirinên mezin rûbirû hatine hene. Her yek ji wan rastiya sedsala 20'emîn in. Ji bo bê fêmkirin ez îfade dikim. Mirov di çarçoveyeke ku meyla globalbûnê ya kapîtalîzmê derdikeve pêş û ketiye nav pêşbaziya bibe hegemon de dikevin nav sedsalê. Ji vê re "Dema Mîlîtarîstbûn"ê jî hat gotin. Ya rastî pergala moderniteya kapîtalîst dixwaze hemû cîhanê bi dest bixe. Di vê nuqteyê de ji qadên divê fetih bike ya sereke Rojhilata Navîn e. Ya duyemîn jî têkildarî wê kî bibe lîderê hegemonyaya kapîtalîst a global nakokî û şer hene. Di vê nuqteyê de jî şerê Îngîltere û Elmanyayê heye. Ev dibe her du derdorên sermayeyê bi awayekî careke din cîhanê parve bikin. Şerê Cîhanê yê Yekemîn di nav nakokî û şerekî wiha de pêk tê. Her du hêz hevalbendên xwe çêdikin. Ya rastî şer şerekî Ewropayê ye. Şerê kapîtalîzma Ewropayê dixwaze cîhanê bi dest bixe. Şerê ku Îngîltere û Elmanya dixwazin bibin hakimê kapîtalîzmê**

**ye. Lê belê şer li Rojhilata Navîn rû dide. Giranî li ser Rojhilata Navîn e. Şerê bidestxistina Rojhilata Navîn e. Kî Rojhilata Navîn bi dest bixe, di hegemonyaya global de jî derdikeve pêş. Ji ber Rojhilata Navîn navenda pergala desthildarparêz-dewletparêz e. Li vir tifaqa Elmanya bi pergala Osmanî ya li Rojhilata Navîn serwer e heye. Tifaqa Îngîltere, Fransa, Rûsya jî parçekirina pergala Osmanî didin ber çavan.**

**Encama şer ji destpêka wê cudatir e. Sala 1917'an li Rûsyayê şoreş çêdibe. Rûsya ji şer vedikişe. Îngîltere û Fransa bi tenê dimînin, tevî vê tifaqa Elmanya-Avûstûrya-Osmanî têk diçe. Hêzên serketinê bi dest dixin, Rojhilata Navîn parve dikin. Statuya îro wê demê pêk hatiye. Parvekirin, parçekirin, şer û qirkirina heyî ya rastî berhemên Şerê Cîhanê yên Yekemîn in. Dibin encamên ku milliyetgiriya Îttîhad û Teraqî ava kirine.**

**Rûsya di vê çarçoveyê de dikeve nav îddîaya avakirina cîhaneke nû. Hewl dide wê weke cîhaneke alternatîf, sosyalîst bike. Hêzên**

**di encama şer de têk çûne, di demeke kurt de îtîraz dikin. Hê şer diqede naqede weke bermayiya Osmanî îtîraza 'Tevgera Kemalîst' heye. Sala 1922'yan bi hêzên serketî yên Şerê Cîhanê Îngîltere û Fransayê re digihîjin Peymana Lozanê û bi awayekî peymanên berê bi qismî diguherin û têkçûna jiyane hinekî dabîn dikin. Elmanya vê mînak digire. Jixwe Hîtler ji bo Mustafa Kemal dibêje, "mamosteyê min". Îtîraz û encama tevgera Kemalîst wergirtiye mînak digire, û dikeve nav hewldana Elmanyayê ji nû ve ava bike. Li ser van esasên faşîst, Nazîzmê pêş dixe. Piştî xurtbûneke diyar bi dest dixe, careke din şerekî parvekirinê, di hegemonyaya kapîtalîst a global de pevçûna lîdertiyê derdixe pêş. Ya rastî di vê de jî armanc Yekîtiya Sovyetê ye.**

**Wiha çêdibe: Li hemberî Yekîtiya Sovyetê şer dike da ku nîşan bide hêza herî dînamîk a kapîtalîzmê ye û weke hêza dikare hemû pergalê biparêze derkeve holê. Pevçûna Elmanya-Yekîtiya Sovyetê demdirêj didome. Dibe şerê herî mezin û demdirêj ê cîhanê yê**

**heta niha rû dane. Îngîltere û Amerîka tifaqa demokrasiyê pêk tînin. Di nav şer de ku Îngîltere û Fransa rastî texrîbatê tên, hêza Amerîkayê hê zêdetir derdikeve pêş. Di encam de dibe duyemîn têkçûna Elmanyayê. Faşîzm têk diçe, demokrasî û sosyalîzm bi ser dikeve. Encama Şerê Cîhanê yê Duyemîn wiha ye. Lê belê şerê di nav pergala kapîtalîst de, li ser lîdertiya kapîtalîzmê ye. Li ser vî esasî li hemberî Yekîtiya Sovyetê şer pêş dixe. Lîdertî vê carê ji Îngîltereyê ber bi Amerîkayê ve dişemite. Weke hêza dînamîk, hêza xurt a siyasî û leşkerî dibe Amerîka. Di şer de jî mezinbûn û pêşketineke girîng çêdibe. Vê carê nakokiya DYA-Sovyet li ser vî esasî pêş dikeve. Li hemberî xeta Yekîtiya Sovyetê ya dixwaze hemû cîhanê bike şoreşeke bi xwe ve girêdayî, Amerîka jî xeteke pêşbînî dike Yekîtiya Sovyetê bisekinîne û hilweşîne ava dike. Ji destpêkê ve jixwe xwesteke wer a kapîtalîzmê hebû. Pêvajoya bi şer a jêre, "Şerê Sar, Cîhana Du Qutb" tê gotin, li ser vî esasî pêş dikeve. Beramberî hev tifaqên leşkerî û siyasî hene. Tifaqên ekonomîk û îstixbaratî**

**hene. Cîhan di navbera du hêzan de dibe du parçe. Beramberî hev li her qadê şerek çêdibe. Li hemberî NATO'yê Pakta Varşova, heta bajarên ji hev tên cudakirin, rewşeke şer rû dide.**

**PKK tevgereke di nav pêvajoyeke şer a wiha de bi gewde bûye. Di nav vê pêvajoya bi şer de, xisûs û pêşketinên li ser avabûna PKK'ê bandor kirine çi ne? Ya yekemîn; tesîreke objektîf a pêşketinên di bloka kapîtalîst de hene. Em dikarin van weke tesîrên mêtingeriya nû ya DYA'yê li şûna mêtingerî û nîv mêtingeriya hildiweşiya pêş dixist jî bi nav bikin. Mêtinkariyê weke hinek merhele bi nav dikin. Berê li ser vê mijarê nirxandinên sosyalîstan hebûn. Dema daneheva sermayeyê ye. Dema pêşketina endustriyalîzmê, dema mêtinkariya nû ye. Dema mêtingeriya nû, pergaleke ya ji aliyê DYA'yê ve hatiye pêşxistin. Weke welatên pîlot li hinek deveran pêk tîne. Yek ji wan jî Tirkiye ye. Tirkiye li nuqteyeke stratejîk cih digire. Di blokbûn û şerê DYA-Sovyetê de,**

**sînorê wê bi Yekîtiya Sovyetê re heye, dibe welat û qadeke girîng û stratejîk e ya nahêle Sovyet ber bi deryayên germ ve biçe. DYA bi Îran û Afganistanê re di vê çarçoveyê de heta ber bi pêşxistina 'Projeya Kembera Kesk' ve jî diçe. Di heman demê de Tirkiyeyê dikin NATO'yê jî. Dibe baskê başûrêrojhilat ê NATO'yê. Li vî baskî sînorê wê bi Yekîtiya Sovyetê re heye. Qada ku NATO û Pakta Varşova li ser sînor tên beramberî hev e. Ji bo vê girîngiyê didin Tirkiyeyê û wê xurt dikin. Jixwe tevahiya sedsala 19. ji bo roleke wiha amade dikirin. Di encama van amadekariyan de dixwazin bixin pratîkê.**

**Mêtingeriya nû, weke îxraca sermayeyê hat terîfkirin. Mînak; di mêtingeriya klasîk de, şêwazên mêtinkariyê biha tên dîtin. Ji welatên mêtingeh ji bo dayika niştiman veguhastina maddeya xam di aliyê maliyetê de biha ye. Malê wê bê firotin, neqilkirina bazarê, yek jî ji ber li welatên kapîtalîst têkoşînên civakî pêş ketine, hêza kedê biha ye. Li welatên paşvemayî, li mêtingehan pir erzantir e.**

**Mêtingeriya nû, hinek rêbazên mêtinkariyê ne yên li cîhana kapîtalîst a pêşketinên di pêşengiya Yekîtiya Sovyetê de ev teng kiriye, di çarçoveya qanûna kara herî zêde ya kapîtalîzmê de ji bo kar zêde bike hatiye dîtin. Ev jî zêdetir ji bo kêmkirina mesrefan e. Mesrefa veguhastina maddeya xam kêm bike, mesrefa maddeya wê neqlî bazarê bike kêm bike, mesrefa hêza kar kêm bike, dema van hemûyan vediguherîne kar dibe yekûneke girîng. Bi vî awayî xwe disipêre mijara li şûna hilberînê li welatên kapîtalîst bike, li cihê maddeya xam û bazar lê ye dike, sermayeyê yanî şaxa hilberînê neqlî wir dike -bi giranî pîşesaziya montajê- li cihê xwe hilberînê dike û avantajên kar ên bazargeriyê bi kar tîne. Ev zêdetir bi awayê pêşxistina pîşesaziya montajê, kapîtalîzma hevkar pêk tê. Dema mesrefên rê û hêza kar kêm dibin, karê sermayeyê zêde dibe. Ya esasî ev e.**

**Di vê çarçoveyê de ji salên 1950'î ve di heman demê de li ser esasê ji plansaziyên taybet ên xwe disipêrin NATO'yê yên weke**

**"Plana Marshall, Doktrîna Truman" ji bo pêşxistina mêtingeriya nû, yek jî ji bo hinek welatan bi taybet jî welatên Yekîtiya Sovyetê dorpêç dikin jê sûd werbigirin û werin pêşxistin, Tirkiye jî para xwe digire. Her diçe Tirkiyeya ji cîhanê re girtî, êdî vedibe. Sermayeyeke bi lez dikeviyê û ev rê li ber du rewşan vedike. Yek; li Tirkiyeyê rê li ber guhertineke sosyo-ekonomîk a pir bi lez vedike. Du; mêtinkariya li Tirkiyeyê têr nake, di çarçoveya qanûna kara herî zêde de kapîtalîzm dixwaze Kurdistan jî ji mêtinkariyê re bê vekirin. Rêveberiya Tirkiyeyê ya heta wê demê wer difikirî ku bi tevgerên leşkerî, komkujî û qirkirinan Kurdistan pelçiqandiye, civaka Kurd kiriye bin kontrolê, êdî wê ji her alî ve pergaleke asîmîlasyonê ava bike û tinekirina neteweyî pêk bîne, daxwaza ji kapîtalîzmê hatibû jî bi xwesteka zêdetir kar bike re kir yek, û êdî neditirsiya ku Kurdistanê ji cîhanê re veke. Kurdistan heta wê demê ji cîhanê re girtiye. Ti têkiliya wê bi cîhanê re nîne. Lê belê dibêjin, "Kurdistana Xeyalî li vê Derê Veşartiye." Piştî**

**îqna bûn xeyal, fikir û çalakiya Kurdistanê bi temamî tine kirine, êdî difikirin ku dikare ji bo mêtinkariyê ji bazara cîhanê re bê vekirin.**

**Bi vî awayî ji salên 1950'î ve ku zêdetir sermayeya pêşdatir derbasî Tirkiyeyê dibe, ji salên 1960'î ve jî li ser esasê mêtingeriyeke nû ya wiha sermaye diherike Kurdistanê. Dest bi talana çavkaniyên maddeya xam ên li Kurdistanê dikin. Malên erzan û bêqîmet neqlî bazara Kurdistanê dikin. Ji bo çavkaniyên wê yên dewlemend bi dest bixin, tam tevgereke talanê ya xwe disipêre montajê tê pêşxistin. Hilberîna feodal a gundî ya heta wê demê di hundirê xwe de, girtî û teng e, wexta bi êrîşeke sermayeyê ya wiha re rûbirû tê bi lez parçe dibe. Guhertineke sosyo-ekonomîk a pir xurt li Kurdistanê jî pêk tê. Li Tirkiyeyê jî wiha ye, ji ber paralelî hev in. Ya li Kurdistanê hê texrîbkar û bi leztir e.**

**Bi vî awayî gundîtî û cotkarî ji hev dikeve. Di nav xwe de gundîtî li ser esasê hinek çînîbûnan cuda dibe. Bajar bi lez mezin dibin. Li bajaran kompradortî, ajandatî pêş dikeve.**

**Feodal dibin kompradorên nîv axa. Li bajaran dibin komprador, li çolterê dibin axa. Bi vî awayî çîna navîn pêş dikeve. Ji esnafan wêdetir tebeqeyên bûrjûvaya biçûk ên nû yên curbicur û xwe disipêrin dewletê çêdibin. Li ser esasê hêza mejî bimijin ciwanan bixin bin kontrola xwe û asîmîlasyonê pêk bînin pergala dibistanê tê pêşxistin. Mêtinkariyeke wiha ji bo li ser esasê qirkirinê were pêşxistin hinek amûrên bingehîn hene. Pergala dibistanê, leşkeriya mecbûrî, bazar û rê ne. Kurdistan bi rêyên nû yên tên çêkirin ji her alî ve bi bazara Tirkiyeyê ve tê girêdan. Bi vî awayî dewlemendiyên Kurdistanê tam di nav talanekê de tên hiştin. Li her cihî dibistan, bazar saziyên asîmîlasyonê tên avakirin. Bi vî awayî qirkirina çandî tê pêşxistin û dixwazin temam bikin. Ya esasî ev e.**

**Li ser vê bingehê avahiya sosyo-ekonomîk a berê bi lez parçe dibe. Civak bi vî awayî guhertineke talanker a pir texrîbkar dijî. Hemû li ser esasê qirkirin û asîmîlasyonê tên kirin. Lê di encama van pêşketinan de hinek**

beşên nû derdikevin holê. Gundîtiya xizan zêde dibe, yek jî çîna karkerên di karên li erdê mayî de dixebitin xuya dike. Ya esasî beşa nû pêş dikeve dibe beşa ciwanên rewşenbîr. Ev di saziyên xwe disipêrin asîmîlasyonê de weke beşeke nû derdikevin holê. Her wiha civak jî dikeve nav tevgerê. Avahiya hişk a feodal an jî bêtevgerî hildiweşe. Pêvajoyeke civakî ya nû dest pê dike. Rastiya civakî ya sekan, bêtevger, li derve girtî, li cihê xwe dimîne tê bihurîn. Ji bo mirov bikevin nav rêxistin û têkoşîneke wiha tevgera civakî pir girîng e. Aliyê wê yê texrîbê heye, lê dema hinekî baş bê bikaranîn jî aliyê wê yê erênî jî dikare çêbibe.

Li Kurdistan û Tirkiyeyê kevir li ser kevir nehat hiştin. Ev guhertineke, lê ev ne guhertineke erênî û bi îstîkrar e. Dibe guhertineke talan, derew, parçebûn û tinebûnê. Dema nirxdarazî bi lez guherîn, tevgera derket holê, di nav rêxistin û çalakiya şoreşgerî de zemînek ava kir. Rêxistinbûneke modern, serwextbûn, bingeha tevlîbûna nav

**tevgereke weke ya gerîla ava kir. Yan na bi civaka kevin re ev mimkun nebû. Di nîzama eşîretê de, weke eşîret karîbûn bikevin şer, lê wê tevgereke weke ya PKK'ê derneketiba holê. Bandoreke wiha ya vê zemînê hebû.**

**Li metropolan, dibistanên bilind komeke ciwanên rewşenbîr a qismî ava bû. Pêşî di nav zarokên axa û begên giregirên Kurd de çêbû. DDKO (Ocaxên Şoreşger ên Çanda Rojhilat) rêxistina van beşan bû. Rêxistineke di sala 1970'î de ava bibû. Zêdetir xwe disipart zarokên hêzên serwer ên feodal, nîv komprador, ji ber li pêş dihatin girtin. Rewşeke wan a perwerdeyê ya ji çanda 'Aşîret-Mekteb' dewam dikir ku dikarîn bixwînin û biçin dibistanê hebû. Paşê bi lez bi asîmîlasyon û mêtinkariyê ji bo hêza mejî ya pêşketî bimijin her beş kirin nav vê. Ji ber vê dibistan birin her devera Kurdistanê. Xwendin kirin mecbûrî, her kes kirin xwendekar. Tevî armanceke vê asîmîlasyon bû, armanceke vê jî ev bû ku hêza mejî ya pêşketî hilbijêrin, kom bikin û di karê xwe de**

bi kar bînin. Rêbertî di manîfestoya pêşî de ji vê re got, “Mêtingeriya mejî.” Niha jî yanî di manîfestoya dawî de jî weke “qirkirina zîhniyetê” bi nav kir. Rohnîbûna cureyekî nû yê cîhanê nas dike, ji lewra li ser Kurdistanê serê xwe diêşîne derket holê. Beşa ciwanên rewşenbîr a ji derveyî mekteb, medrese, hîndekariya Îslamî, bi zanista civakî dikare bifikire, nîqaş bike, serwext bibe ava bû. Beriya wê rewşenbîrên Kurd Şêx û Seyîd bûn. Xwediyên terîqet û medreseyan bûn. Wan jî di dawiya sedsala 19. û destpêka sedsala 20. de xwestin hinek tiştan bikin û pelçiqîn. Pir zêde negihiştin hêza bi bandor bin, encam bigirin, civakê rêxistin bikin û bixin nav tevgerê. Mirov dikare rewşa maddî ya eniya mêtingeriya nû ava kiriye wiha terîf bike.

Eniya din eniya sosyalîst e. Bandora eniya sosyalîst jî heye, ew jî di eniya xwe de bi bandor bûye. Mêtingeriya nû di heman demê de ew e deriyên Tirkiyeyê li derve vebûn. Karker ber bi Ewropa, Elmanyayê ve çûn. Ket NATO’yê û çû Kore. Di ser Tirkiyeyê re

vebûna Kurdan jî pêk hat. Heman tişt paralelî naskirina cîhanê, fêrbûn û têgihiştina pêşketinên li cîhanê meşiya. Bi awayekî rohnîbûnekê rû da. Di nîvê sedsala 20. de bi lez li Tirkiyeyê sîstema wergerê pêş ket. Bi taybet pirtûkên tecrûbeyên tevgerên çepgir-sosyalîst, rizgarîxwazên neteweyî vedibêjin bi lez wergerî Tirkî hatin kirin û belav bûn. Vê rohnîbûnek, naskirina cîhanê, fêrbûna zanistên civakî bi xwe anî. Li Tirkiyeyê di serê salên 1970'î de çêbû. Weke şaxekî jî xwe di nav Kurdan de da der. Ev pir girîng bû. Bandorek jî ev bû. PKK di nav pêşketineke wiha de serwext bû. Rêbertî jî xwe di atmosfereke wiha de perwerde kir. Kadroyên tevlî PKK'ê bûn jî xwe li vir perwerde kirin. Bandora teorî û fikra sosyalîst, Şoreşa Cotmehê jiyan. Wê pêşketinek çêkir. Aliyekî girîng ev bû.

Aliyekî din jî Tevgerên Rizgariya Neteweyî bû. Di navbera du şerên cîhanê de jî li hemberî mêtingeriyê şer hat rêxistinkirin, pêş ket. Lê belê hê zêdetir di nav Şerê Cîhanê yê

**Duyemîn û piştî wê de hemû gelên mêtingeh, biçûk-mezin, spî-reş, li Asya, Amerîka li her cihî xwe rêxistin kirin, li hemberî emperyalîzm û mêtinkariyê ketin Şerên Rizgariya Neteweyî. Gerîla weke tarzekî rizgariyê esas girtin û bi lez serketin bi dest xistin.**

**Di nav 25 salên ji 1950'î heta 1975'an li Asya, Afrîka, Amerîkayê gelek şoreşên rizgariya neteweyî yên serketî çêbûn. Di nîvê sala 1970'î de serketina Şoreşa Vîetnamê jixwe weke nîşaneya têkçûna emperyalîzmê ji aliyê hemû civakan, ramanweran ve hat terîfkirin. Serketinên li Afrîkayê, Gîneyê, Mozambîkê û welatên wekî wan bûn pîvanekî girîng. Nîjadê reşik tevî pir biçûk û lawaz bû, 'jêre nedihat gotin mirov e jî', serwext bû, xwe rêxistin kir. Ket şer û hêzên xwe weke stûna cîhanê didîtin têk birin. Fransa, Îngîltere, Spanya, Portekîz têk birin. Vîetnamê Amerîka têk bir. Di bin navê Şoreşa Kubayê de li Latîn Amerîkayê tevgereke gerîla ya mezin pêş ket. Pêşengiya Castro û Che Guevara bandorker**

**bû. Che Guevara ev veguherand şoreşa domdar. Tevgera wî li pêşiya mirov rohniyeke nû bû.**

**Hem bandora moral a serketinên Tevgerên Rizgariya Neteweyî hem jî pratîka wan a mirov hîn dike di perwerdeya ciwanên rewşenbîr ên Kurd û dîsa di perwerdeya koma PKK'ê ava dike de bi rastî jî pir rol lîst. Bû hêzeke moral a mezin. Ev di PKK'ê de di asta herî pêş de bû. Mîna Vîetnam, Kurdistan bû. Te digot qey Mozambîk Kurdistan e, Kuba Kurdistan e hat hiskirin. Ew qasî bi hûrgilî hat xwendin û lêkolînkirin. Vê jî moral û hêz da. Eger gelê lawaz, biçûk û nebîrewer li ser bingeha gerîla xwe rêxistin bike û şer bike dikare dewletên emperyalîst ên herî mezin têk bibe. Rêxistinbûneke wiha Vîetnam, Fransa û Amerîka têk bir. Ev pir girîng bû. Hela welatên serketî yên Afrîkayê yên di nav rewşa herî zeîf de jî dikarîbûn bikin. Ciwanên rewşenbîr ên Kurd bi ser xwe ve anîn, bawerî da wan. Têkildarî serketin dikare bê bidestxistin, baweriyeke mezin da. Divê mirov**

**vê ji bîr neke. Heke ev bandorkirin nebûya, di rewşeke psîkolojîk a ew qas komkujî, qirkirin, pelçiqandina tevgerên berxwedanê ava kiribûn de careke din ketin nav berxwedanekê bi rastî zehmet bû.**

**Pelçiqandinên di sedsala 19. de, li dû wê bandora psîkolojîk a giran a komkujiyên di navbera salên 1925-40'î de ji aliyê têkoşînên serketî yên van gelan ve hatin şikandin. Li şûna wê moral, bawerî û serwextbûna xurt da. Ev rewşeke pir girîng e. Mînak berxwedana li zindanê şopên berxwedana li zindanên Vîetnamê hildigire. Hevalê Xeyrî belasebeb negot, "Kurdistan, dibe Vîetnam." Tiştekî din nabêje, em bala xwe bidinê. Fêrbûna dersên berxwedana Vîetnam, dawerivandina wan ji bo wê berxwedana mezin zîhniyet, helwest, liv û tevger, îrade ava kir. Ev pir girîng bûn. Ji vî alî ve di mijara avakirina baweriya bi xwe, serwextbûn û moral de bandoreke mezin a Tevgerên Rizgariya Neteweyî çêbû. Ya rastî bandora psîkolojîk a neyînî ya komkujiyên qirkirin û komkujiyan şikand. Ev aliyekî**

**girîng bû. Ya neyînî parçebûna di nav van tevgeran de bû. Mînak parçebûna Sovyet-Çîn, dîsa ya di nav tevgerên sosyalîst de bi awayekî neyînî xwe li her cihî da der. Li Tirkiye û Kurdistanê jî tevî diviyabû mirov hêzeke moral a wer ava kiriba, serwext kiriba, hewce bû mirov bêmoraltiya vê parçebûnê ava kiribû jî şikandiba. Rêbertî di vê mijarê de pir hesas û bi tedbîr tevgeriya. Hewl da tiştên wiha pir zêde derbasî Kurdistanê neke. Bi rexneyî lê nihêrî, lê ne parçebûn şoreşên rû dane derxist pêş. Ya li pişt parçebûnê jî nêzîkatiyên dewletparêz-hegemonîk bûn. Ji ber siyaset ketibû pêşiya bîrdoziyê. Sovyetê û Çînê jî heman xet şopandin. Yên dişibiyan bi hev xistin. Rêgezên azadî-wekheviyê yên sosyalîzmê çûn aliyekî. Berjewendiyên dewletê ket pêşiya her tiştî. Tiştekî bi awayê li ser bingeha berjewendiyên dewletê parastina Yekîtiya Sovyetê hat derxistin. Hat xwestin ku hemû şoreşên cîhanê bi vir ve bê girêdan. Rêbertî ev der rexne kir û ji vê re got, “Revîzyonîzm.” Lê ji pevçûneke navxweyî ya wiha re terîfa ji yekê re bêje xerab ji yekê re**

**bêje baş nekir. Heta jê hat neyînî nîşan neda, lê ji bo serwextbûna teorîk a rast çêbibe jî şaşî rexne kir.**

**Yek jî "Tevgera Ciwanên Şoreşger a Cîhanê" ya li hember vê parçebûnê derdiket hebû. Jêre "Şoreşa Ciwanan a 68'an" jî hat gotin. Pêvajoyeke ku ji armanc û rêgezên sosyalîzmê hatiye berdan, berjewendiyên siyasî kirine asta yekemîn e. Ciwanên Ewropa yên hêviyên wan şikestin, li dijî vê rewşê derketin. Di vê mijarê de bi taybet helwesta Che Guevara heye. Dema Kuba terk kir û xwest li Amerîka Latîn şoreşê, gerîla bidomîne ciwanên cîhanê pir ji kûr ve bandor kir. Jixwe hêviyên ciwanên Rojhilatê Ewropayê ji sosyalîzma li Sovyetê nemabûn. Berteka wan a li hember nêzîkatiya ku berjewendiyên dewletparêziyê li pêşiya rêgez û îdealên sosyalîzmê hatibûn danîn ew ber bi lêgerîneke nû ve birin. Gihiştin asteke ku rêgez û têkoşîn derxistin pêş û li her qadê rêxistinbûn û çalakiyên ciwanan pêş ketin.**

**Jêre "Tevgera Ciwanên Xwendekar a 68'an" tê gotin. Rêbertî ev weke "Şoreşa Ciwanan" jî terîf kir. Ji Elmanyayê heta Fransa, ji Îtalyayê heta Îngîltere li hemû welatên Ewropa, bi qadên din ên cîhanê re rêxistinên ciwanan ava bûn. Dest bi berxwedana çekdarî kirin. Çalakiyên zêde hatin rojevê, ketin çalakiyên leşkerî jî. Ev jî bi meşa di şopa Che Guevara de pêk anîn. Bandoreke vê ya girîng çêbû. Ev lêgerîneke nû bû. Li hemberî nêzîkatiya ku rêgezên bîrdozî dikirin qurbana berjewendiyên siyasî, şoreşeke ciwanan a bîrdozî bû. Vê tevgera şoreşê hemû cîhan kir nav xwe. Lêgerîneke nû bû, bi qasî mêtingeriya nû rexne dikir, nêzîkatiyên ku sosyalîzmê berjewendiyên dewletê datîna pêşiya rêgezên bîrdozî jî rexne dikir. Di vê çarçoveyê de tevgereke zêde ya nîqaş û rexneyê bû. Bûyera serwextbûnê bû. Rêbertî PKK weke baskê li Kurdistanê yê gavavêtineke ciwanan a wiha terîf kir.**

**Tevgera Ciwanên Xwendekar a 68'an, li ser tevgera ciwanan a li Tirkiyeyê jî di asteke**

girîng de bandor kir. Paşê di dawiya salên 70'î de li ser esasê berxwedana Filistînê "Radîkalîzma Ereb" jî tevlî xwe kir. Lê derketina holê ya esasî di nav Tevgera Ciwanên Şoreşger a Tirkiyeyê de çêbû. Tevgera Ciwanên Şoreşger a Tirkiyeyê, bandora Şoreşa Ciwanan a 68'an a li Ewropayê pêş ket ji nêz ve jiya. Bi derengiya salek-du salan di destpêka salên 70'î de mîna çend salên li Ewropayê rû da, gavavêtineke demokratîk a şoreşger li Tirkiyeyê jî pêk hat. Di vê mijarê de bi qasî pêşketinên ekonomîk-sosyal pêşketinên bîrdozî-siyasî jî rol lîstin. Di salên 1950'î de kapîtalîzma hevkar pir bi lez pêş ket. Partiya Demokrat derî heta dawiyê ji sermayeya derve re vekir. Rêveberiya Menderes, Bayar hinekî xwe spartin olê. Hinekî jî dema pere dîtin, bûn hezkiriyên dewlemendan û civakê. Tevahiya 10 salan Tirkiye hema hema bû cenneta sermayeyê.

Li hemberî vê darbeya 27'ê Gulana 1960'î tevî tevgereke ku esas digirt vê sermayeyê hinekî din bike yekdestdar, hinekî bi rêzik û

**pîvanan ve girê da. Di destûra bingehîn a 1961 de ew jî hene. Hinekî din xwest pergala hiqûqê, avahiya dewletê pêş bixe. Ji bo vê neçar man hinek avahiyên ji wan re 'mafê demokratîk' dihat gotin nas bikin. Dibe Ewropayî û vê jî firsend da rêxistinbûnên nû. Zemîna hiqûqî ya pêşketinên bîrdozî-rêxistinî ava kir, pêşî lê vekir. Astengiya hiqûqî hinek be jî ji holê rabû. Di vê çarçoveyê de gelek beş û çînên cuda li gor berjewendiyên xwe berê xwe dan serwextbûn, rêxistinbûn û çalakiyê. Bi vî awayî bîrdoziya fermî ya serdest "Bîrdoziya Kemalîst" şikest. Ekolên bîrdozî yên nû ji nîvê sala 1960'î ve bi awayekî diyartir derketin holê û pêş ketin.**

**Ekola milliyetgiriyê yek ji wan e. Turkeş ê darbeya 1960'î pêk anî, di nav cûntayê de yek ji kesê bi bandor bû. Ekola olperest pêş ket. Erbakan di dawiya salên 1960'î de "Partiya Nîzam a Millî" ava kir. Bi awayê xwe disipart Ewropayê dibû gavavêtineke bîrdozî ya nû. Tevgera çepgir û sosyalîst pêş ket. Di nîvê salên 1960'î de "Partiya Karkeran a**

**Tirkiyeyê" ava bû. Di hilbijartina 1965'an de 15 parlamenter derxist, di meclîsê de kom ava kir. Sendîka bi awayekî aktîf pêş ketin. DÎSK ava bû, di nav "Tevgera Karkeran" de pêş ket. Tevgera ciwanan a ji zanîngehan dest pê kir pêş ket. Qulûbên fikir hebûn. Rêxistinbûn û komeleyên ciwanan di federasyonekê de kirin yek. Paşê navê wê weke DEV-GENÇ (Federasyona Tevgera Ciwanên Şoreşger a Tirkiye) guhertin û bi vî awayî tevgera ciwanan a nû ya xwe disipêre ciwanên zanîngehê ava bû.**

**Di nav tevgera ciwanan de komên şoreşger derketin holê. Lîder û rêxistinên şoreşger ava bûn. TKP-C, THKO, TÎKKO bi Berxwedana Filistînê re jî têkilî çêkirin. Çûn wê qadê perwerde dîtin û rastiya herêmê jî nas kirin. Di serê sala 1970'î de bîrdoziya Kemalîst parçe bû. Li şûna wê gelek ekolên bîrdozî yên nû, li ser vê bingehê tevgerên siyasî-leşkerî, atmosfereke têkoşînê ya zêde ya vê rê li ber vekir pêş ket. Ekolên bîrdozî-polîtîk ên nû, tê maneya nakokî û pevçûnên nû. Bi vî awayî di**

**serê sala 1970'î de Tirkiye hat ber serê durêyeke nû. Pirsa "Wê Tirkiyeyeke çawa be?" êdî bû rojeveke bingehîn. Komara di sala 1923'yan de ava bû, "Wê demokratîk be, wê dîktatoriya faşîst olîgarşîk be?" Ev pirs aşkera bû, olîgark ava bibûn. Bingehên wê yên leşkerî yên faşîst hebûn. Bi hêza sermayeya global bi NATO ve girêdayî bûn. Dixwestin Tirkiyeyê veguherînin dîktatoriyeke faşîst. Li hemberî wê tevgera çepgir-sosyalîst, tevgera ciwanên şoreşger, tevgera rewşenbîran, tevgera mamosteyan, tevgera karkerên sendîkayê, tevgera siyasî TÎP Tirkiyeyeke demokratîk dixwestin û bi ferzkirina şoreşa demokratîk dixwestin komar demokratîk bibe. Ev her çû di serê sala 70'î de ket rewşeke pir dijwar. Êdî pergal diket rewşeke nikaribe bixebite. Grev û boykot berfireh dibûn. Dibistan û fabrîka ku nedixebitîn kolan vediguherîn qada çalakiyê. Bi vî awayî rêveqetîneke berbiçav derket holê. Wê Tirkiye çawa bibe? Wê biçe ku derê? Hêzên demokratîk ên şoreşger, hêzên gel bi taybet jî Tevgera Ciwanên Şoreşger DEV-GENÇ, şoreşa demokratîk pêşbînî dikirin û ev**

pir bi bandor bû. Tirkiye weke civak di nav şoreşeke demokratîk de bû. Hemû rêxistin û tevgerên ciwanan bandortir bûn. Dînamîk û bi bandor bûn, fikrên xwe bi xurtî diparastin. Li Egeyê, Derya Reş mîtîng hatin lidarxistin. Deverên niha kelehên faşîzmê ne, wê demê kelehên şoreşê bûn. Qada herî şoreşger a wê demê Derya Reş bû. Li Ordû mîtînga findiqan hatibû lidarxistin. Mahîr Çayan bi xwe jî ji Derya Reş bû. Mîtîngê Tirkiye hejandibû.

Li hemberî pêşketinên şoreşgerî, êrîşa dij şoreşê ya faşîst a hat ferzkirin darbeya leşkerî ya 12'ê Adara 1971'ê bû. Darbe ya rastî muxtira bû. Demîrel û hikûmeta wî hat xistin, li şûna wî yek ji parlamenterên CHP Nîhat Erîm anîn. Zilamekî baş ê Îsmet Paşa bû û kontgerîlayek bû. Nîhat Erîm kirin serokwezîr û hikûmeteke taybet hat avakirin. Rêveberiya awarte hat îlankirin. Artêşê dest danî ser tevahî rêveberiyan. Hikûmet ji bo tevgera çepgir-sosyalîst bipelçiqîne ket nav êrîşeke zêde. Li hemberî wê tevgerên di nav tevgera ciwanên şoreşger de xwe rêxistin kiribûn jî

**dest bi berxwedanê kirin. THKP-C, THKO, paşê Artêşa Rizgariya Karker Gundiyan a Tirkiye, koma TÎKKO ya ji partiya Dogu Perînçek veqetiya hinekî dereng be jî ket nav berxwedanê. Pêşbîniya gerîla kirin û zêdetir Kurdistan weke bingeh girtin dest. Vê şer û pevçûneke dijwar derxist holê. Li Tirkiyeyê tevgera girseyê veguherî berxwedana çekdarî. Di nav tevgerên berxwedan bi rê ve dibirin, di asteke girîng de ciwanên Kurd cih girtin. Di nav tevgerên rewşenbîr ên kedkar de jî Kurdan di asteke mezin de cih girtin. Ev tevgereke hevpar a berxwedan û şoreşê bû. Tevgereke wer tenê ji Tirkiyeyê mirov tevlî bûne nebû.**

**Bi vî awayî di nav vê de PKK derket holê. Ciwanên Kurd ên dixwestin bi awayekî dînamîk, şoreşgerî, aktîf an jî radîkal têkoşînê bikin, tevlî vê tevgerê bûn. Kesên hinekî din di xeta reformîst, milliyetgir de man jî weke tevgereke cuda DDKO ava kirin. Ew jî di wê demê de ava bibûn. Bi çalakiyeke bi sînor, reformîst û pasîfîst qîma xwe anîn. Xisleta**

**wan a berxwedana radîkal nebû. Tirkiyeyê şoreşek jiya. Ya rastî pêvajoya îro jî didome ev e. Gihişt 45-46 salan, pêvajoyeke ku hê jî bi temamî bi encam nebûye.**

**Hêzên faşîst hewl dan bi darbeyan bi bandor bibin. Li Tirkiyeyê bi pelçiqandina tevgera şoreşgerî di asteke mezin de serweriya xwe çêkirin. Baskekî berxwedana di vê demê de dest pê kir, ber bi Kurdistanê ve şemitî û xwe weke PKK'ê rêxistin kirin. Li hemberî darbeya 12'ê Îlonê Pêngava Gerîla ya 15'ê Tebaxê pêş xist. Heta îro weke baskekî berxwedanê yê têkoşîna "Komara Demokratîk, Tirkiyeya Demokratîk" a di serê sala 1970'î de hat destnîşankirin, temsîl dike, didomîne û bi rê ve dibe ma. Ji lewra li Tirkiyeyê bi temamî têkçûna Tevgera Şoreşger a Demokratîk asteng kir. Têkiliyeke wê ya wiha heye. PKK di nav tevgereke wiha de derket. Rêber Apo di atmosfereke wiha de xwe perwerde û serwext kir. Bû xeteke bîrdozî-polîtîk. Gavavêtina Rêbertiyê di nav atmosfera têkoşîneke wiha de pêk hat. Ji**

**lewra xwe weke domdariyeke vê tevgerê temam kir. Ji vê qet paşde nema, bi vê timî serbilind e. Ji ber bi rastî jî tevgera berxwedanê ya di serê sala 70'î de bexwedana hevpar a her kesên li Tirkiyeyê bû. Yên herî zêde cih girtin Kurd bûn. Di tevgera ciwanan de ciwanên Kurd hebûn. Di tevgera karker kedkaran de dîsa yên herî radîkal karker û kedkarên Kurd bûn. Yên herî zêde şoreşger û herî zêde cih digirtin ew bûn. Ji ber yên herî zêde zerar dîtin ew bûn. Yên herî zêde di bin zextê de bûn, pêwîstiya wan bi cîhaneke nû hebû û ji bo wê têkoşîn dikirin ew bûn. Bi vî awayî wê zemînê bandora erênî çêkir. Paşê di dawiya salên 1970'î de zemîna berxwedaniya radîkal a Ereb nirxand. PKK'ê ew jî girt nav xwe. Dîsa radîkalîzma Îranê jî girt. Bi vî awayî bû sentezeke Rojhilata Navîn. Lê belê ya ji Tirkiyeyê girt zêde ye. Bi esasî ji wir gav avêt. Têkildarî gerîla ji berxwedaniya Ereb, gerîlatiya Filistînê gelek tişt wergirt. Vê zemînê jî tevkariyeke wiha kir.**

**Weke şertên ku PKK derxistine holê mirov dikare van diyar bike. Eger em bala xwe bidinê wiha nayê gotin. Berê timî ev nirxandin ber bi wir ve dibirin. 'Ew der wisa kêrhatî ye, li wê derê wiha pêşketin çêbû. Ew pir bûn bandoreke erênî çêkirin, ji lewra wê erênîtiyê tevgereke wiha derxist holê, tevger jî yekser bû berhema wan...' Ji bo Kurdistanê hukmê vê nîne. Bandora tiştên rû dane hene, li ser gavavêtina Rêbertiyê, derketina holê ya PKK'ê bandorên wê yên ciddî hene. Lê ev hemû ji bo PKK'ê derxin holê çênebûn. Beriya her tiştî nuqteya divê mirov bi baldarî binirxîne ev der e. Van xisûsên bandor kirine, ji bo vir bandor bikin, pêşketineke wiha derxin holê nebûn. Tam berevajî pêşiya pêşketineke weke ya PKK'ê bi temamî hatibû girtin. Mêtinkariya gihiştibû nirxandina "Kurdistan hat tinekirin" û ev hesab dikir, ya rastî ji bo li ti devereke din careke din derketineke holê ya weke PKK'ê qet çênebe û bi temamî pêşiya wê bigire, pêşî li van hemû bandorkirinan vekir.**

Vebûna wê ya ber bi cîhanê ve jî wisa bû. Çi di ser DYA'yê re be, çi bi awayê ku destûr hat dayîn bandorên tevgerên çepgir-sosyalîst neqlî Tirkiyeyê bên kirin, armanc ev bû. Hesabên wan ew bû êdî bi temamî pêşî li derketineke holê ya weke PKK'ê hatiye girtin û wê çênebe. Derketina wê hişt ku matmayî bimînin, hêrs bibin û bertek nîşan bidin. Li pişt wê li gelek lîstikan geriyan. Ji ber li gor xwe pêşî li gavavêtineke wiha girtibûn, wê pêk nehatiba. Tevî vê dema gavavêtina Rêbertiyê çêbû, rêxistiniya PKK'ê pêş ket, di vê de timî li tiştekî geriyan. Gotin, "Li pişt wê hîleyek heye, lîstikek heye, hinek wê dikin. Ya rastî me tedbîra xwe girtibû, ev tevgereke ku diviyabû nebûya." Neheq jî nebûn. Divê mirov nebêje wisa pir xapiyan jî. Tedbîra wê girtibûn, pratîka wê kiribûn, tedbîra girtibûn teqrîben di wê astê de bû ku pêşî li pêşketineke wer bigire. Ya ew hilweşand dahîtiya Rêber Apo bû. Bi awayê wisa tedbîrên baş negirtibûn bê nirxandin, dê mirov ber bi encamên rast ve nebe. Li gor teqrîbî sekna mirov, ji bo gavavêtineke wiha

**çênebûba hemû tedbîrên pêwîst girtibûn. Sekna Rêbertî ev berevajî kir. Gavavêtina Rêbertî gavavêtina ku ji ya normal dibihure. Pêwîst e em wê bibînin û binirxînin.**

**Di vê nuqteyê de pirseke wiha derdikeve holê: PKK çi qasî berhemên şertên objektîf e? Çi qasî tevgereke Rêbertî ye? PKK tevgereke ji aliyê rastiya Rêbertî ve derketiye holê. Her kes vê nîqaş dike û wer tê dîtin ku wê timî jî bê nîqaşkirin. Di vê nuqteyê de divê mirov bigihîje vê encamê. Helbet bandora pêşketinên maddî yên objektîf, pêşketinên sosyo-ekonomîk ên curbicur hene. Lê ev di asta bandorê de ne. Ya diyarker rastiya Rêbertî ye. Kesayet û xisletên Rêber Apo ya rastî di pêkanîna gavavêtineke wiha de bû diyarker. Ji destpêkê ve asta bîreweriyê, serwextbûna li dîrokê, asta berpirsiyartiyê, hêza ji tecrûbeyên dîrokî dersan bigire, Rêbertî anî nuqteyeke karibe ji hemû tehlûkeyan bibihure, neyîniyan têk bibe, pergala rêxistî berevajî bike, bi pêşketineke tersê wê bihêle berepaş bizîvire. Hêzeke wiha da Rêbertî.**

**Ji lewra divê mirov faktorên objektîf jî hesab bike, lê nirxandineke wiha şaş e: ‘Guhertina sosyo-ekonomîk a ji aliyê mêtinkariya nû ve hat pêşxistin, dîsa serketinên tevgerên rizgariya neteweyî û sosyalîst ên li cîhanê ku bandor li Kurdistan û Tirkiyeyê kir û vê bandorê atmosfereke objektîf ava kir, PKK weke encameke vê rewşê derket holê. Ji ber encameke wiha rû da karîbû derkeve holê. Çi dibe bila bibe wê encameke wiha derketiba holê, wê derketineke holê ya Apocî çêbûba. Pêvajoyê ev hewce dikir!” Ne wisa bû. Berevajî hemû pêvajo hemû objektîvîte li ser tinekirina Kurdan û temamkirina qirkirina Kurdan bû. Fermana ji bo Qirkirina Dêrsimê hatibû dayîn, xwedî hukim bû. “Di demên pêş de, her kesên îhtîmala wan a îddîaya Kurdîtiye hilgirin hebin, divê bên kuştin û tinekirin.” Fermana komkujiya Dêrsimê wiha bû. Wer dihat fikirîn ku li ser xeta vê fermanê encam hatiye wergirtin.**

**Şert û mercên objektîf ên pêş ketin, ya rastî xwe disipart hesabê ku ev pêk hatiye. Bi temamî ew bû vê temam bike. Objektîvîteyeke armanc û pêşbînî dikir qirkirina Kurdan temam bike, hebûna Kurdan bi temamî tine bike, êdî veguhertineke neteweyî pêk bîne, Tirkkirinê li Kurdistanê serwer bike. Ji lewra şert û mercên objektîf, şert û mercên ji derketina holê ya Rêbertî re zemîn pêşkeş dikirin nebûn, ji bo dernekeve holê pêk hatibûn. Rêbertî di nav şert û mercên diviyabû mirov dernekeve holê de ji hinek derfetan sûd girt û tersê wê çêbûnek pêk anî. Naxwe PKK berhemeke objektîvîteyê, şert û mercên objektîf nîne, weke berhemeke dahîtî, pêşbîniyên siyasî û keda Rêber Apo derket holê. Bi temamî li ser vî esasî xwe rêxistin kir. Ev dibe ku weke nirxandineke subjektîvîst a zêde were dîtin. Pêkan e zanistî jî neyê dîtin, lê berê wiha dihat nirxandin, her tişt bi objektîvîteyê ve dihat girêdan. Pozîtîvîzma zêde hebû. Niha Rêbertî bi nirxandinên xwe helbet, ew nêrîn guhert, mehkûm kir. Şaşiya wê danî holê. Ji vê jî wêdetir ji bo gavavêtina**

**Rêbertiyê baştir bê fêmkirin nêrîneke nû pêş xist. Em dikarin vê fêm bikin. Vê nêrînê bi qasî em li kesên din belav bikin wê her kes karibe vê rastiyê fêm bike. Wê îhtîmal bide ku tiştekî wiha dikare pêk were, dê vê çêbûnê qebûl bike û bi vî awayî jî wê derketina holê ya PKK'ê, gavavêtina Rêbertiyê rasttir fêm bike, xurttir fêm bike.**

## Ji Aliyê Dîrokî ve Şekilgirtina Rastiya Rêbertî

**Avabûna partiyê, partîbûn, berhema keda fikrî û pratîk a Rêbertî ye. Naxwe hûrkolandina rastiya Rêbertî, fêmkirina wê û mirov têde serwext bibe dibe şêwazê yekane yê**

**rast û tam fêmkirina partiyê û pêvajoya partîbûnê. Ji derveyî wê rê nîne. Rêbertî ji Rêbertî fêmkirin esas e. Divê wisa be. Ji ber kesek ji derve de jî bi awayê çavdêrîkirinê dikare bê vegotin. Lê herî baş kesek dikare xwe vebêje, behsa xwe bike. Bi taybetî dema di asta Rêbertiyê de be ev ji sedî sed wiha ye. Ji wî alî ve jî ya em bikin bingeh ew e, divê em Rêbertiyê ji Rêbertî fêr bibin. Ji bo rast fêmkirin û dawerivandinê ji Rêbertî fêrbûn divê esas be. Rêyeke vê ya din nîne. Lewma divê mirov nîqaşên bi vî awayî çi qasî bike? Divê em bikin yan em nekin? Eger em pareke îhtiyadê ya wisa deynin holê em ê karibin. Ev tiştên me vegotin aîdî me ne, aîdî Rêbertî nînin. Mimkun e rast jî bin, mimkun e şaş jî bin. Em bi qasî fêm dikin, nîşan didin. Divê her kes wiha lê binihêre. Eger her kes dixwaze rastiyê bibîne û fêr bibe, divê Rêbertî ji Rêbertî fêr bibe û lêkolîn bike. Eger em bêjin fêrbûna rast ew e, dibe ku nîqaşên wiha zerarê nedin. Em ê karibin pêşî li zerarê bigirin û dikare encamên bi feyde jî bide. Lê eger em wiha nekin, tehlûke heye. Eger bê gotin,**

‘Rêbertî weke ez dibêjim e’ divê mirov guman bike. Ew dibe rewşeke pir bi tehlûke. Dibê şêwazê herî zêde yê mirov xwe dike şûna Rêbertî û Rêbertî li gor xwe şîrove dike. Divê mirov nekeve rewşeke wiha. Ji vî alî ve tiştên em ê bêjin, ên ji aliyê me ve hatine fêmkirin in. Ya rastî me nîşan didin. Divê ev bê zanîn. Rastiya Rêbertî ya rastî çi qasî em dikarin pêk bînin, me ew qasî fêm kiriye. Ji lewra tiştên em dibêjin rastiyê îfade dikin. Weke têgîn, bi şeklî dibe ku em mîna hinek tiştan îfade dikin werin xuyakirin. Lê ya esas cewher e, naverok e, ya bîrdozî ye. Hinek tiştên di şekil de bên gotin, pêkan e nikaribe cewherê nîşan bide. Dikare berepaş bizîvirîne, berevajî jî bike. Hewce ye mirov nekeve wê rewşê jî. Ji ber vê divê mirov Rêbertî fêr bibe, fêm bike û dawerivîne.

Pêwîst e em vê li ser bingeha hûrkolandin û lêkolînkirinê ji Rêbertî bi xwe bikin. Têkildarî nirxandinên xwe bi xwe kirine hewce ye mirov bi lêkolîn-lêgerîn, fikirandin û nîqaşan vê bike. Bi hûrkolandina pratîka Rêbertî divê em

**bikin. Ji bo em karibin Rêbertî rast û têra xwe fêr bibin û fêm bikin, pêwîst e em Rêbertî hûrbikolin, lêkolîn bikin û nîqaş bikin. Rêbertî yên wer nedikirin rexne dikir. Digot,** ***"Çima hûn min hûrnakolin, lêkolîn nakin, an jî ev kêm çêdibe? Ji lewra bi qasî ku hûn ji hevdu bandor dibin, çima hûn ji min bandor nabin? Ez jî hêzeke bandorkirinê me, lê tersê wê çêdibe. Hûn zêdetir ji hev bandor dibin, ji ber ev tê hesabê we. Hûn ji min kêm bandor dibin, ji ber tiştên ez dibêjim û dikim nayê hesabê we. Ji bo we ters tê. Li gor şertê wê tersbûnê hûn ji min dûr disekinin, nîqaş nakin, hûrnakolin."*** **Divê em wiha nekin. Hewce ye em hûrbikolin, lêkolîn bikin.**

**Divê em Rêbertî ji Rêbertî fêr bibin û vê esas bigirin. Vegotina rast, terîfên rast ji sedî sed di wê derê de ye. Ji bo vê divê em yeqîn bikin ku Rêbertî dikare bê fêmkirin û dawerivandin. Gotinên 'Wisa nabe, zehmet e nabe, em Rêbertî fêm nakin' rastiyê nîşan nadin. Ya rastî dibe qilifê ku naxwaze bê kirin, serî pê nayê êşandin. Mirov Rêbertî bîne**

**rewşa nayê fêmkirin neheqiya herî mezin a li hemberî Rêbertî ye. Lewma eger wê bê gotin, 'Pirtûkên Rêbertî, analîz û parêzname pir giran in, em dixwînin lê em fêm nakin', dê ev jî weke rastî neyê qebûlkirin. Yê herî bi hêsanî bê fêmkirin, Rêbertî ye. Rêbertî zêdetir berbiçav e, zelal e û tê fêmkirin. Got, *"Bi qasî hingivê nisilandî pêşkeş dikim."* Fikrên xwe wer îfade kir. Heke hingivê nisilandî neyê fêmkirin, ma wê wekî din çi bê fêmkirin! Ji wî alî ve nêzîkatiya 'em fêm nakin', nêrînên Rêbertî giran in, nikarin bên fêmkirin, ji lewra nikarin bên pêkanîn, dê mirov ber bi, wê demê ya bê pêkanîn bila yekî din be ku ev jî dibe revîzyonîzmê.**

**Bi vê ve girêdayî mirov Rêbertî wisa bi hêsanî fêm bike jî rast nîne. ev nêzîkatiya, 'Min carekê xwend, min fêm kir. Êdî tiştên ez difikirim, fikrên Rêbertî ne. Gotina ez dibêjim gotina Rêbertî ye' jî rast nîne. Ew qasî jî hêsan nîne. Divê mirov wiha jî nêzîk nebe. Divê mirov wisa tavilê nebêje, em dizanin me fêm kir. Berevajî divê timî lêkolîn-lêgerînek**

**hebe. Jixwe gelek caran dema tê xwendin, ji mirov re wer tê ku mîna berê qet nehatiye xwendin. Dibe mîna ku mirov cara pêşî ye pêre rûbirû tê. Gelek beş, hevok, bend ji mirov re wer tê. Bê çi qasî xwedî naverok e, her hevok û her peyv bi rêkûpêk çi qasî bi awayekî tijî mane hatiye bicihkirin îfade dike. Lewma mirov bêje nayê fêmkirin çi qasî şaş e, mirov bêje min tavilê çavek lê gerand ev besî min e, ez êdî Rêbertî rast pêk tînim jî ew qasî şaş e. Mesele wer hêsan jî nîne, hewldan û xebatê hewce dike. Divê mirov serê xwe li ser biêşîne, bi kûrahî bifikire. Ji wî alî ve jî mirov yeqîn bike ku wê bê fêmkirin, li ser vê bingehê nêzîk bibe, lê belê hewce ye em zanibin tenê bi hewldaneke mezin em ê karibin vê pêk bînin.**

**Eger em wiha bikin, em ê hem Rêbertî fêm bikin, hem jî dawerivînin. Di vê mijarê de bi qasî xwendina pirtûkan, temaşekirina CD'yan jî girîng e. Girîngiya nêrîna dîtbarî jî heye. Di mijara fêmkirina rasttir û kûrtir de ev girîng in. Nivîs nîvê wê îfade dike, bi taybet di çarçoveya axaftinan de wisa ye. Eger nîvê**

**axaftinekê gotin be, nîvê din jî zimanê beden e. Mirov rasterast temaşe bike, wergirtina her duyan jî di carekê de bi xwe re tîne. Mirov bi tenê yên bûne nivîskî bixwîne, bi tenê tiştên hatine gotin bixwîne, bi fêmkirinê re rûbirû dihêle. Ji ber wê mirov dikare zêdetir cih bide temaşekirina CD'yan. CD'yan tenê ne bi guhdarkirina gotinan dikarin temaşe bikin, liv û tevgera Rêbertî jî girîng e. Tenê ne vegotinên Rêbertî yên di dersan de, liv û tevgera wî ya li derveyî dersan jî, sohbet û nîqaşên wî girîng in. Civînên biçûk ên bi koman re jî pêk dianî pir pir girîng in. Ji bo mirov tarzê tevgera Rêbertî, nêzîkatiya wî ya ji bûyer û şexsan re, ciddiyet, disîplîn û hesasiyeta wî ya mezin bibîne û fêm bike pir girîng e.**

**Hebûna van jî ji bo me xezîneyeke mezin e. Hemû pêşbîniyeke xurt îfade dikin. Nîşan dide bê çi qasî demdirêj ji bo dema pêş hatiye fikirîn. Dide xuyakirin bê jiyanê çi qasî realîst fêm dike. Lewma di destê me de xezîneyeke mezin heye. Divê em vê xurttir û rasttir**

**binirxînin. Di xisûsa em analîz û pirtûkên Rêbertî bi awayekî ku hêsantir û leztir bên xwendin bikin beş û pêşkeşî hinek beşên civakê bikin, wezîfe û berpirsiyartiyên me hene.**

**Di çarçoveya van de li gor ku îfadeya berbiçav a ruh, hest, fikir, liv û tevgerên Rêbertî şêwazê bûye rêxistin û çalakî ye, cîhana ruh, fikir, liv û tevgera Rêber Apo çi ye? Ne çi ye? Xwedî kîjan xisletan e? Ev xislet li ku derê û çawa şekil girtin? Rastî guhertin û pêşketineke çawa hatin? Li ku derê çawa pêk hat? Rast fêmkirin û bi serketî pêkanîna ya Rêbertî girêdayî liv û tevgera li gor wê û nêzîkatiyeke bi vî tarzî ye.**

**Rêbertî ji gundê Amara yê Xelfetî ye. Jidayikbûna wî sala 1949 e, lê ji ber çûna dibistanê ji bo ji aliyê dadgehê ve rastkirina wê hewldan çêbûn. Dibe 4'ê Nîsanê. Ev di demên dawiyê de hinekî din derketin pêş. Xwişk û birayên hatine dinyayê û di zarokatiyê de wefat kirine hene. Sê xwişk û sê bira ne. Zarokatiya wî li gund dibihure.**

Dibistana seretayî li gundê Cîbîn ê saeteke dûr e dixwîne. Cîbîn gundekî di nav nîqaşa 'Tirkmen e, Ermenî ye' de ye. Ermenî jî hene, lê yên xwe Tirkmen dihesibînin jî hene. Dibistana seretayî ya 5 salan didome li Cîbînê dixwîne. Sibehan diçe Cîbînê dibistanê û êvaran jî vedigere. Rêbertî got, "Ji bo min pirsgirêka Kurd roja min dest bi dibistana seretayî kir dest pê kir." Heta wê demê di nav çanda malbatê, ji lewra di nav çanda Kurd de wî zimanî û wê çandê dijî. Tişta ew qasî diyar nîşan dide 'ziman' e. Dema roja dest bi dibistana seretayî dike ku rastî zimanê Tirkî tê, xisûsên bi awayê, "Perwerde çima ne bi Kurdî ye? Eger bi Kurdî bûya em ê baştir fêr bibûna û me yê fêm kiriba" difikire.

Rêbertî ev hemû gotin û nivîsand. Rewşeke xwezayî ye. Ev çîrok bi tenê aîdî Rêbertî nîne. Ew dem jî di nav de heta îro jî tê. Çîrokeke aîdî bi sedhezaran zarokên Kurd e. Zarokên Kurd ên rastî heman rewşê nehatine kêm in. Ji lewra mirov rastiya çêbûna Rêbertî bi tenê ne weke avabûna kesekî, ya rastî mirov weke

**pêvajoyekê binirxîne, weke demeke guhertina civakî binirxîne realîsttir e. Rêbertî ev weke "Ji klan çûna ber bi gelbûnê" nirxand û weke "Klana Apo" terîf kir.**

**Dibistana Navîn li Nîzîbê dixwîne. Diyar dike ku li Nîzîbê kedê nas dike. Heta diçe dibistana navîn, bandorên dibistana seretayî û gund zêde ne. Jiyan û pevçûna xwe ya li gund û di nav malbatê de weke "serîrakirina pêşî" nirxand. Paşê li Enqereyê Lîseya Pîşeyî ya Tapû Kadastro dixwîne. Dibistan li Maltepeyê ye. Nêzîkî navenda Enqereyê ye. Dibistaneke 4 salan e. Dema hîndekariyê ya 1965-69'an e. Rastî pêvajoyeke ku li Tirkiyeyê bîrdoziya fermî şikestiye, meylên bîrdozî yên nû derketine holê, ekolên bîrdozî-polîtîk ava bûne, rêxistinbûn pêş ketine, li gor cihêbûna civakî ku meyl û fikrên ava bûne, pevçûn û nakokiyên navxweyî her diçe zêde bûne tê. Di pêvajoyeke wiha de li Enqereyê ye. Salên wî yên ciwantiyê yên pêşî ne. Li dibistana şevînî dixwîne. Bi tena serê xwe li paytexta mêtingeriyê ye. Cara pêşî ye diçe bajêr. Li**

**paytexta dewleta mêtinkar bajar nas dike. Mêtingeriyê nas dike. Piştî wê salekê li Amedê ye. Li Erxeniyê Memûrtiya Tapû Kadastro dike. Di navbera Amed-Erxeniyê de bi gel re di nav hev de ye.**

**Dema 1969-70'î demeke ku li Tirkiyeyê jî têkoşîn gur bûye, li Başûr liv û tevger pêş ketiye. Li navenda Kurdistanê ye. Li navenda ku têkildarî avahiya civakî ya Kurd a herî zêde agahiyan dide dimîne. Van hemû geşedanan hem dişopîne, hem fêr dibe hem jî li rastiya dîrokî ya civaka Kurd serwext dibe. Ev mijar pir girîng e. Di sala hîndekariyê ya 1970-71'ê de li Stenbolê ye. Xwendekarê Fakulteya Hiqûqê ye. Dikeve ezmûnê. Puana ku dikare qeyda xwe li Fakulteya Hiqûqê çêbike werdigire. Sala 1970-71'ê demeke ku li Tirkiyeyê şoreşa demokratîk, di aliyê fikrî û pratîk de herî zêde pêş ketiye. Dibe pêvajoya ku li hemberî darbeya 12'ê Adara 1971'ê ciwanan, tevgerên şoreşgerî dest bi berxwedana çekdarî kirine.**

**Di pêvajoyeke wiha de Rêbertî li bajarê mezin ê Tirkiyeyê ye. Qadeke ku avahiya civakî herî zêde lê heye û nakokî herî zêde lê rû didin. Li navenda desthilatdariyê ya 4 hezar salan e. Ev çalakî jî herî zêde li wir pêş dikevin. Di nav hemûyan de ye, dibîne. Hemû tevger û rêxistinan nas dike. Tevgerên çepgir-sosyalîst ên Tirkiyeyê, rêxistinbûnên li ser navê Kurdistanê pêş ketine jî nas dike. DDKO'yê nas dike, tevlî DDKO dibe û dibe endamê wê. Diçe semîneran. Tevlî konferansên Mahîr Çayan dibe, guhdar dike, bandor dibe û dibêje ku bûye sempatîzan. Diyar dike ku nêzîkatiya têkildarî pirsgirêka Kurd cara pêşî ji Mahîr Çayan bihîstiye û ew pir bandor kiriye.**

**Paşê di sala hîndekariyê ya 1971-72'yan de qeyda xwe li Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqereyê çêdike. Wê demê eger puan zêde bûna mirov dikarî ji fakulteyên hiqûqê derbasî Fakulteya Zanistên Siyasî bibûya. Fakulteya Zanistên Siyasî fakulteyeke girîngtir e, fakulteya hiqûqê hinekî din teng**

dimîne. Berê ji Fakulteya Zanistên Siyasî re "Mekteba Mulkiye" dihat gotin. Ji sedî 70 burokrasiya dewletê ji vê Fakulteya Zanistên Siyasî derdiket. Mahîr Çayan ew jî xwendekarên Fakulteya Zanistên Siyasî ne. Rêbertî got, "Dibistana herî baş a Tirkiyeyê." Destpêkê dixwaze biçe dibistana leşkerî, ew jî ku weke bûyîna xwedî hêz bi nav kir, bi awayê ji bêhêziya di nav de ye bi hêzeke wer jê bibihure îfade kir. Lê ji bo biçe dibistana leşkerî sicîleke li gorî wê hewce dike û yek jî divê kesekî ku berpirsiyartiya wî hilgire hebe. Dema ew nehatin peydakirin çênabe. Madem dibistana leşkerî pêk nehat, nebû xwedî hêz, wê demê ku derfeta çûna dibistana herî baş a Tirkiyeyê ya piraniya burokrasiya dewletê perwerde dike hat dîtin, helbet diviyabû mirov biçe wir. Çûyîna Fakulteya Zanistên Siyasî wiha ye. Dema puanên wî digire tavilê diçe.

Bi vî awayî di sala hîndekariyê ya 1971-72'yan de careke din vedigere paytexta mêtinkar. Demeke ku faşîzm êrîş dike, zexta giran pêş dikeve, rêberên şoreşger tên girtin

**an jî qetilkirin, rêxistinên şoreşgerî tên belavkirin, zext û komkujî pêk tên. Di pêvajoyeke wiha de li Fakulteya Zanistên Siyasî dixwîne. Biharê 30'ê Adara 1972'yan dema li Kizildereyê Mahîr Çayan û hevalên wî tên qetilkirin, li Fakulteya Zanistên Siyasî belavokeke protestoyê tê weşandin. Rêbertî di nav de ye hem jî yek ji kesên pêşeng e. Rewşa xwe ya wê demê weke sempatîzaniya şoreşgerî terîf dike. Di pozîsyoneke wiha de ye ku tavilê karibe aktîf bibe û bibe kadro. Di belavkirina belavokan de tê girtin. Havîna 1972'yan li Girtîgeha Mamak a Enqereyê ye. Li wir hem dixwîne hem jî difikire û çavdêriyê dike. Hemû lîder û rêxistinên şoreşgerî li wir in. Zext û îşkence li wir heye, li derve rêber tên qetilkirin, rêxistin tên belavkirin. Di hundir de têkoşîneke zêde heye. Şoreşger tên îdamkirin. Dadgeh û nîqaş hene. Van hemûyan dibîne û meha Mijdarê dema ji girtîgehê derdikeve hevalekî wî yê ciwan ê ji Derya Reş ku li girtîgehê bi hev re bûn, navnîşana maleke karibe lê bimîne dide Rêbertî. Beriya bikeve girtîgehê dikarîbû li yûrda zanîngehê bimîne,**

**lê ji ber hat girtin êdî nema dikarî li wir bimîne. Kesê navnîşanê dide Rêbertî dibêje, 'Ciwanên ji Derya Reş in, şoreşger in wê piştgiriyê bidin te.' Rêbertî dema ji girtîgehê derdikeve yekser diçe wê navnîşanê. Maleke di navbera Bahçelîevler û Emek de ye. Derî lê dide. Mala ku heval Hakî Karer û Kemal Pîr lê dimînin. Tenê her du nînin, mala komeke ji xwendekarên zanîngehê ye. Çawa hevdu nas kirine û ew mal girtine em nizanin. Lê Kemal Pîr ev got,** ***"Rojekê li deriyê me da, ji me re got ku hûn dikarin min bikin mêvan, ez dikarim bimînim? Me jî qebûl kir, roja duyemîn bû xwediyê malê û talîmat didan me."*** **Ketina malê ya Rêbertî, tevlîbûna Rêbertî ya nav jiyana malê bi vî awayî ye.**

**Avabûna xeta PKK'ê, danîna hîmên xeta bîrdozî-polîtîk û rêxistiniya wê li vê malê ye. Bi nîqaş, lêkolîn-lêgerîn û xebata li wê malê çêdibe. Jixwe zivistana 1972-73'yan li wir dimîne, bihara 73'yan li dû Newrozê li Bendava Çûbûk bi komeke ciwanên Kurd re civînê li dar dixe û diyar dike ku kakilê**

**rêxistinî yê PKK'ê li wir hatiye danîn. Piştî Newrozê ye, ew dem demeke wiha ye ku zexta giran heye û êrîşên faşîst pêk tên. Civînên bi vî awayî wer bi hêsanî nikarin bên kirin. Rêxistin belav dibin. Yên rêxistinan ava dikin tên îdamkirin. Yên rêxistina wan hene rêxistina xwe belav dikin. Lê Rêbertî li cihê lê dimîne biryara avakirina rêxistinê dide. Di rewşeke ew qasî bi tehlûke de dixwaze vê bike.**

**Ji lewra wan deman civînên bi vî awayî bi geştên wiha, di bin navê pîknîkê de dihatin kirin. Xwendekaran tenê dikarîbûn bi vî awayî hevdu nas bikin. Bi awayekî xebateke şoreşgerî bû. Mirov di 1'ê Gulanan, Newrozan de diçû. Rêbertî piştî Newrozê ber bi dawiya Adarê ve 5 ciwanên Kurdistanî dawet dike, dibe Bendava Çûbûk. Ya rastî rewşeke wer a biçin wir nîqaşekê bikin an jî civînekê li dar bixin nîne. Rêbertî bi xwe organîze dike, ew diaxive, nêrînên xwe aşkera dike. Mirovên di çarçoveya van nêrînan de bang li wan kiriye dawetî xebata pêkve dike. Ew jî qebûl dikin û bi vî awayî bingeha koma Apocî tê danîn.**

**Biryara bûyîna rêxistin, bûyîna komê tê dayîn. Rêbertî ji bo vê biryarê dibêje, "Biryara herî girîng a jiyana min bû, ji bo min biryareke wiha daye qet ne poşman im, ez timî xwediyê wê biryarê me." Ji wê komê heval Fuat heye. 4 kesên qebûl dikin ku di wê komê de cih bigirin piştî demeke kurt vediqetin. Lê ya girîng danîna hîm e, avakirina komê ye. Rêber Apo got, "Wê yek biçe deh kes wê bên." Ev rewşa hê ji wê demê de dest pê kiribû, heta roja me ya îro wiha ye. Tenê bila hîm karibe bê danîn û were domandin. Bila karibe ew îddîa, îrade û domdarî were nîşandan. Yê ew kiriye jî Rêber Apo ye û bêyî girêdayî kesên din be kom dimeşe.**

**Dîrokçeya bingehîn wiha ye. Weke xulaseyên pir kurt rawestgehên bingehîn ev in. Têkildarî hûrgiliyên van rawestgehan mirov dikare çi bêje. Dema zarokatiyê, jiyana wî ya li gund û xisletên li wir wergirtine, girîng in. Rêbertî ew der girîng dît û diyar kir ku gelek xisletên wî li wê derê çêbûne. Carinan digot,** ***"Mirov di 7 saliya xwe de çi be, di 70'ê saliya***

***xwe de jî ew e.”*** **Got,** ***“Hûn di zarokatiyê de şaş hatine mezinkirin, we xwe pir zêde kiriye hembêza dayik-bavê xwe. Min wekî we nekir. Ji dema karîbûm li ser piyan bimînim, min hewl da li çareya serê xwe binihêrim. Min pirsên weke, Ev cîhan çi ye? Mirov çawa dikare bijî? Ez çima hatim dinyayê? Ez ê çi bikim? pirsî û min hewl da bi hêza xwe li ser piyan bimînim.”*** **Ev hemû girîng in.**

**Têkildarî nîqaşên xwe û hinek nêrînên xwe yên wê demê agahî da. Pir nirxand. Ya rastî hewl da tarzê avaker û taktîkên ji bo şer, ji bo gerîla pêwîst in ji dersên ku di wê dema zarokatiyê de jiyane derxe tehlîl bike. Têkiliya bûyerên xwezayê, zindiyên di xwezayê de bi jiyanê re çêkir û girt dest. Divê mirov nebêje, ‘çîrokeke jiyanê ye’ û nebihure. Di nav van de maneyên kûr veşartîne. Riha jî nirxand. Got,** ***“Bajarê pîrozî û lanetê.”*** **Her du jî di zikhev de îfade kir. Got,** ***“Em tevgereke Brahîmî ya nû ne.”*** **Bi derketina holê ya Brahîmî re şiband hev, domkerên wê li hemberî Nemrûd û Firewnan têkoşînê bi rê ve dibin. Hîcreta**

Brahîm ber bi welatê Kenan ve bû, Rêbertî ber bi Lubnanê ve çû. Hema jêra wê welatê Kenan e. Başûrê Lubnanê ji wir tê hesibandin. Qada Filistîn û Başûrê Lubnanê. Di wê çarçoveyê de hîcreta Hz. Brahîm û tarzê tevgera Rêbertî dişibe hev. Divê mirov zanibe ku Riha navenda civakbûnê ye. Kolandinên nû çêbûn, kolandinên arkeolojîk, dane û agahî derketin holê. Civakbûn li kevana Toros-Zagros çêdibe. Riha navendeke pir girîng a kevana Toros-Zagros, Kevana Zêrîn e. Dibe qada ku mirovê pêşî derbasî jiyana bicihbûyî bûye. Dibe qada ku şoreşa cotkarî-gund çêbûye, neolîtîk pêş ketiye, şoreşa jinê pêk hatiye û bajarên neolîtîk ava bûne. Di kolandinên arkeolojîk ên li peravên Firatê de bajar û gundên xwe dispêrin 10 hezar-12 hezar sal B.Z. hene. Tejaneya Dîcle û Firat ew cih in ên pirtûkên pîroz gotine “cennet” e. Dema mirov ji çola Ereban lê dinihêre bi rastî jî dibe cennet. Ev hemû rastiyên xwezayî ne. Paşê wisa hatiye îdealîzekirin ku veguherandine têgînên razber û ezber. Ev ji ber dogmatîzma olî wiha bûye. Ya rastî wisa

**nînin. Qet wer ji jiyanê, rastiya xwezayî qut nînin. Tam berevajî jiyanê bi xwe îfade dikin. Di vê çarçoveyê de civakbûna Riha girîng e. Daneheveke çandî ya mezin heye. Riha ji ber Hz. Brahîm jî weke "Bajarê Pêxemberan" tê terîfkirin. Yê sulaleya pêxemberan ava kiriye dibe ku Brahîm be. Ya rastî yên beriya xwe jî terîf dike, weke dîroka pêxemberan didome. Daneheveke çandî ya wer dewlemend heye. Divê mirov van aliyên wê bibîne. Têkildarî xisûsa ku di Rêbertî de ev daneheva çandî û asta serwextbûnê ava bû divê mirov xisleta hîndeker a herêmê bibîne. Wê çandê ji dema ji dayik bûye, ji zarokatiyê ve werdigire. Kesayet jixwe ji aliyê derdorê ve tê gewdekirin û avakirin. Kesayeta Rêbertiyê di atmosfera çandeke wiha de şekil digire û ava dibe. Wê danehevê û nakokiyên wê hildigire.**

**Li aliyê din civakbûn, ziman di zikhev de ne. Çandeke yeknesak jî nîne. Qadeke ku gelek çand di zikhev de ne. Tirkmen, Ermenî, Kurd hene. Daneheveke ziman û çandê ya dewlemend pêkve jiyane. Ev rewş wê herêmê**

**pir zêdetir dewlemend dike. Ev jî rewşeke pir girîngtir e. Wê dewlemendiya çandê zêdetir e. Divê mirov vê jî girîng bibîne.**

**Li dû Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi tevlîbûna Tirkiyeyê ya NATO'yê re ew kirin nav têkiliyên mêtîngeriya nû. Kurdistan jî ku ji serê 1950'an û dawiya 1960'an ve deriyên wê li derve hatin vekirin, parçebûn û guhertineke bilez a sosyo-ekonomîk dest pê dike. Li aliyekî dewlemendiya civakbûna berê, daneheva çandê heye. Li aliyê din bandora xerakirina wê ya mêtinkariya nû heye. Demeke wer a bi nakok û guhertinê ye. Jêre qonaxeke ku guhertin rû dide tê gotin. Ev rewş nakokiyan pir zêdetir dike. Nakokiyên civakbûn digire nav xwe hene, nakokiyên çandên cuda digirin nav xwe hene, ez van hemû nakokiyan di maneya neyînî de bi kar nayînim. Erênî jî, neyînî jî yek jî nakokiyên ku demê ava kirine hene. Tiştên vê demê ava kirine jî civaka Kurd parçe dike, civakbûn parçe dibe. Malbata Kurd di rewşeke zehmet de ye, mirovê Kurd di rewşeke zehmet de ye. Bi her awayî**

**bîrewerî, rêxistinî, azadiya xwe winda kiriye, di bin koletiyê de tinebûn li ser tê ferzkirin, lê hêza li ber xwe bide nîne. Ev jî rewşeke bi nakok a pir giran e. Ha xisletên derûniyeke ruhî, têgihiştin, liv û tevgera rewşeke wiha xuya dike. Bi van xisletan kesayeta Rêbertî şekil digire.**

**Rewşeke ku nakokî zêde ne. Hêza fikir û lêpirsînê ya Rêbertî pêş dixe. Jixwe bi xwe got, *"Ji zarokatiyê ve gumanberî bi stûyê min ve zeliqî, bi ti awayî ez ji tesîra wê xelas nebûm û ev hemû lêgerîn ji vir hat."* Lêpirsînerî derdikeve, guman dike, lêpirsîn dike. Hêzeke muhakemeyê ya kûr a Rêbertî heye. Yek jî dikare hêza xwe ya fikir bi kar bîne. Hêza wî ya muhakemeyê pir xurt e, yek jî zekayeke wî ya bi heybet heye. Rêbertî tenê ne tiştên dixwîne, tiştên dibihîze jî ji bîr nake. Ew gelek tiştên weke agahî gotine nedîtine, ne xwendiye jî, heke ji kesekî tiştek bihîstibe wê jî ji bîr nake. Ha ev ji gumanberî û lêgerînê tê. Divê hinek tiştan bike, wê li gor çi bike, di destên wî de hêz nîne, xezîne nîne, çavkaniya herî mezin**

**daneheva zanîn-agahiyan e. Ji ber vê zekaya xwe bi awayekî bi heybet bi kar tîne. Dahîtiya wî ya xurt e. Hêza wî ya muhakemeyê pir zêde ye. Diyalektîka wî pir xurt e. Rêbertî ku van hemûyan di mejiyê xwe de pêk tîne, hêza wî ya bûyer û diyardeyan bi hev ve girê bide û ji wir deran derxe pir zêde ye. Ev ji lêpirsîna di dema zarokatiyê de tê. Ya lêpirsîneriya di zarokatiyê de ava kir ev e. Bi vî awayî gelek tiştan lêpirsîn dike. Wer pergala heyî qebûl nake. Li hember qismekî wê serî radike. Li hemberî hinekan bêdeng bimîne jî di hundir de qebûl nake. Nîqaş dike, hewl dide fêm bike. Meyla wî ya fikra bingehîn ol e. Di wê rewşê de ekoleke fikir a bi van pirsgirêkan re mijûl dibe nîne. Ji lewra dixwaze lêgerîna mewzûbehs bi olê bidomîne. Dixwaze nakokiyên bi wan re rûbirû tê bi ol çareser bike, çareseriya pirsgirêkan bi kûrbûna di ol de bibîne. Û bi awayekî kûr xwe dide perwerdeya ol. Got, *“Ez ji teolojiya xwe bawer im, ez amade me bi her kesî re nîqaş bikim”* Di wê mijarê de bi rastî jî zanîna wî zêde ye. Şîroveya wî ya Îslamî pir xurt e, ji zarokatiya**

**xwe ve vê dike. Rêbertî diyar dike ku meleyê gund jêre gotiye, *"Eger tu wer biçî tê bifirî."* Di wê astê de xwe dide olê. Destnîşan dike ku dema diçû dibistana seretayî ji zarokan re meletî dikir, nimêj dida kirin, timî li mizgeftê bû, komên wer ava dikir, ne pasîf bû û di jiyana rêxistinî de jî aktîf bû. Komên nêçîrê, komên geşta çolê, komên nimêjê, timî rêxistinker e, avakerê koman e. Ev jî dibe melekeya wî ya lîdertî û rêxistinkirinê. Melekaya wî ya lîdertiyê pêş dixe.**

**Terzê wî yê liv û tevgerê bi fikir ve eleqedar e. Rêbertî dibêje, *"Ji min re digotin, tu wekî cîwayê yî."* Yanî nayê girtin, ew qasî bi liv û tevger e. Lêgerîna fikrî liv û tevgera fizîkî derdixe holê. Lêgerîna fikrî jî tê maneya ciwantiyê, nûjenîxwaziyê. Mebesta me ya ji ciwantiyê ev e. Îxtiyarî zenûnbûn e. Divê mirov wê hilweşîne. Eger li cihekî îxtiyar çêdibin, naxwe li wir ciwan nînin, ciwan rola xwe nalîzin û derdorê bi dînanîzma ciwantiyê bandor nakin. Lawaz in. Eger ciwan lawaz bin, ên din îxtiyar dibin. Li ser vê bingehê divê**

**mirov têkiliya di navbera hêza fikir û liv-tevgerê de ji sedî sed çêbike. Ji lewra tarzên liv û tevgerê yên Rêbertî wiha ne.**

**Kesê li Enqereyê herî zêde meşiyaye Rêbertî ye. Gelek caran ji mala li Bahçelîevler derdiket û heta fakulteya li Cebecî meşiyaye. Wer bi meşê ne mimkun bû mirov gihiştibayê. Dema Rêbertî dimeşiya hûn tenê dikarîbûn bibezin. Rewşa wî ya zîhniyetê û ya jiyanê bi hev ve girêdayî ye. Helbet wê ji fizîkeke weke cîwayê re mejiyekî mîna dahîtiya Rêbertî hebe. Yan na ji mejiyekî tevizî liv û tevgereke weke cîwayê dernakeve holê. Fizîkeke weke cîwayê tevdigere mejiyekî cemidiye qebûl nake. Em realîst bin, divê em jiyanê li gor xwe şîrove nekin. Eger em li derveyî xwe şîrove bikin û hewl bidin li gor wî tevbigerin dibe ku em karibin xwe perwerde bikin û biguherin. Lê eger em xwe bikin navenda her tiştî, xwe weke rast nîşan bidin, em bêjin bila jiyan li gor me be, wê ji wir guhertinek, veguhertinek û pêşketinek dernekeve holê.**

**Rêbertî têkildarî dema zarokatiya xwe gelek tiştan dibêje. Nîqaşa wî ya bi dayikê re girîng e. Dibêje,** ***“Min mirîşk mînak da, min got tu bi qasî wê jî nînî, ew dide pêşiya zarokên xwe ji wan re xwarinê peyda dike. Tu nikarî wê jî bidî min.”*** **Di wê demê de hêza wî ya fikir wiha ye û bertek nîşan dide. Dibêje,** ***“Min tavilê fêm kir ku bi tarzê bavê min ti tiştek nikare bê bidestxistin. Dema hêrs dibû derdiket ser banê xênî, heta diwestiya çêr û dijûn dikir. Paşê diçû li ber ocaxê dihêniji. Min fêm kir û dît ku bi wê tarzê jî nabe.”*** **Kedê nas dike. Di nav bax û baxçeyan de dixebite. Sekn û helwestên derveyî kedê yên qîmet nadin baxan rexne dike.** ***“Dayika min berê min da pevçûna ciranan, lê ez li dijî wê derketim.”*** **Tiştên heyî red dike. Pirsgirêka zewacê, malbatê, jinê dibîne. Dema xwişka wî dizewice dibêje,** ***“Min ev rewş wê demê jî bêmane dîtibû.”*** **Em dikarin bêjin ku ev hemû lêpirsînerî ye, ev paşê hatin gotin. Niha ku van dibêje jî girîng e. Em nikarin vê jî bikin. Em weke gilokê ne. Em ji xwe re vedişêrin û girêkan li ser girêkan çêdikin. Rêbertî wisa nîne. Rêbertî her tişta**

**xwe analîz kir, di dawiyê de pirsa, *"Çi maye min nedaye we?"* kir. Got, *"Di jiyana xwe de min çi kiriye, çi bihistiye û fikirîme min hemû gotin. Her kesek xweserî wî tiştek ma, tiştekî min nema."* Pêkan e wê demê di vê astê de nefikirîbe, lê niha ku wê difikire dibêje û bîreweriyeke wisa ava dike jî pir girîng e. Divê mirov wê jî girîng bibîne, ev tê maneya mirov xwe analîz û tehlîl bike. Bûyera jêre ji jiyanê wergirtina dersan tê gotin ev e. Rêbertî ders jê digire. Ya me dibe reva ji wergirtina destan. Li şûna girtina dersan tê maneya mirov hewl bide tişta hinek didin ezber bike ku bîreweriya wer nabe. Bi ezberê em nikarin biçin cihekî. Divê em ji analîzkirina jiyanê netirsin. Pergala mulkiyetê mirov ditirsîne. Pergala mêtinkariyê, ferdperestî mirov ber bi xwe ecibandinê û avakirina tiştekî wer biçûk ve dibe. Têkiliyeke cuda ya mirovan derdixe holê, lê ji bo atmosfera mîlîtanên fedaî ti hukmê wan nîne. Atmosfera partiyê cihê herî xurt e yê mirov dikare xwe analîz bike, ti astengiye nîne. Atmosfera di pergalê de vê nade kirin, ew atmosfer cuda ye.**

**Got ku di mijara veqetîna ji gund de çi qasî zehmetî kişandiye. Kesî ji me ev îtîraf nekir. Diyar kir ku herî dawî ji gund veqetiyaye. Destnîşan kir ku bê çawa di temenê biçûk de bi zehmet ji gund veqetiya. Xisletên bi heman rengî hene. Mebesta me ya ji van ew e, Rêbertî lêpirsîn kir û li ser esasê van lêpirsînan xwe nû kir. Ev hemû rexne-xwerexnekirin bûn. Kesek di asta vê bike de dikare xwe pêş bixe. Ne bi awayekî din e. Dema wisa dibe kesayeteke azad, lêgerekî azadiyê yê di temenê xwe yê biçûk de fêm dike, bi berpirsiyarî nêz dibe, xwe rêxistin dike, hewl dide li çareya serê xwe binihêre derdikeve holê. Di vî temenê biçûk de şekilgirtina Rêbertî wiha ye. Naşibe şekilgirtina hinekên din. Dikare bê gotin, 'Çima xwişk û birayên din wiha nabin?" Dikevin hembêza dayik û bav, bi sedema dê ew her tiştî bidin me vê dikin. Rêbertî navika xwe bi xwe dibire. Ya girîng ev e. Haya wî jê çêdibe ku ji wir tiştek nayê. Ferqa di navberê de ev e. Wê dibîne, ferq dike. Wê atmosfera bi nakok, wê atmosfera biteqereq tavila his dike.**

Cihê piştî wê diçiyê Enqere ye. Ji cihekî wekî Rihayê, hê di salên pêşî yên ciwantiyê de bi tena xwe çûna Enqereyê cesaretê dixwaze, lê Rêbbertî vê cesaretê nîşan dide. 4 salan li Enqereyê dimîne. Salên 1965-69 e. Dibe demeke ku nakokî û têkoşîna bîrdozî-polîtîk a nû ya Tirkiyeyê pêş ketiye. Atmosfereke ku bi qasî nîqaşên zêde hene, komele û kovar derdikevin holê her diçe pevçûn jî rû didin. Paytexta mêtinkar cihê ku fermana qirkirinê daye, bajarekî mezin û modern e. Di carekê de bi van hemûyan re rûbirû tê. Li vir jî lêgerînerî wekî heyî didome. Dikeve nav her atmosferê. Konferansên yek ji şîrovekarên herî li pêş ê xeta Îslamî Necîp Fazil Kisakurek guhdar dike. Li aliyê din tevlî merasîma cenazeyê Îmran Oktem ê yek ji profesorên Destûra Bingehîn a 1961'ê ya darbeya 27'ê Gulanê amade kiribû jî dibe. Bi sedema Oktem ateîst e, nimêja cenazeyê wî nayê kirin û pevçûn çêdibe. Îslamgir naxwazin cenaze bixin mizgeftê. Bi awayê "Bê ol e, nimêja wî tê kirin, nayê kirin" pevçûn çêdibe. Tevlî merasîma cenazeyê kesekî wiha jî dibe. Yek li

**seriyekî ye yê din li seriyekî din e. Wer bêyî fêr bibe nakeve nav tiştekî, hemûyan lêkolîn dike. Rêbertî tenê li cihekî nîne, li her cihî ye. Hewl dide fêm bike û fêr bibe, ji ber lêger e. Dixwîne lêkolîn dike, derdorê nas dike. Bajêr, Kurdîtiyê, dewletê paytextê nas dike. Hewl dide komarê fêm bike û nas bike. Ev hemû pêk tên û diyar dike ku li wir guhertineke fikrî ya girîng pêre çêbûye jî.**

**"Alfabeya Sosyalîzmê" dixwîne. Dibêje, *"Dema min qedand, min xwe bi xwe re got, Muhammed winda kir, Marks bi ser ket û min pirtûk kir bin balgiya xwe."* Dibîne û binirxîne ku êdî di olê de wê tiştekî nebîne, ti pirsgirêkekê çareser neke, pirsgirêkên li çareseriya wan digere doktrîna çepgir-sosyalîst nêzîkatiyeke kûrtir û çareserkertir nîşan dide. Wisa fêm dike, têdigihije, wê encamê derdixe û êdî nêrînên xwe diguhere. Piştî wê çepgirek û sosyalîstek e. Di her tişta di aliyê fikir de jê yeqîn kiriye, lêgeriyaye, lêkolîn kiriye, xwendiye û nivîsandiye de guhertineke wiha dike. Kûrbûna di fikra**

Îslamî de nadomîne, di fikra çepgir-sosyalîst de kûrbûn û lêgerîn dest pê dike.

Mirov dikare ji gelek aliyên wê ve pêvajoya Enqereyê binirxîne. Bi aliyê psîkolojîk, bi aliyê baweriya bi xwe, bi aliyê xwe hiştina li ser piyan mirov dikare lêkolîn bike. Ji ber atmosfereke pir zehmet e. Mirov wisa ji Xelfetiyê biçe li navenda Enqereyê bimîne û bijî karekî ciddî ye, ne hêsan e. Bandorên wê yên li ser kesayetê, xislet, mirov cesaretî karekî wer bike jî bi tena xwe karek e.

Piştî wê memûrtiya li Amedê heye. Hinekî din di aliyê fikrî de pêş ketiye, çarçoveya çandî ya civakbûna Rihayê dawerivandiye, di salên ciwantiyê de paytexta mêtinkariyê dîtiye, mêtingerî nas kiriye, sosyalîzm nas kiriye, niha jî diçe paytexta Kurdistanê. Diçe navenda civakbûna Kurd. Dîrok li wir e, siyaset li wir e, fikir li wir e. Nakokî û pevçûnên rojaneyî li wir in. Li ser navê Kurdistanê her cure agahiyan ji wir digire. Dibe firsendeke mezin. Ev pêvajoya salekê ye, lê tiştên wê di 3 an jî 5 salan de werbigire di

**salekê werdigire. Ew der ji avabûna zîhniyeta Rêbertî re tevkariyeke girîng dike. Pêvajoya Amedê wiha ye. Bûye memûrekî ciwan, li Enqereyê xwendiye, astekî wî ya bîreweriyê heye, lêger e, dînamîk e, 24 saetan nasekine, dikeve her cure atmosferê nîqaş û lêkolînan dike. Di rewşeke wiha de li Amedê di salekê de tiştên têkildarî Kurdîtiyê hewce ne werdigire. Di aliyê dîrokî û rojaneyî de çi hebin, têkildarî tevgerên Kurd, şexsiyet û rêxistinên Kurd dihêle li cihê wê bê fêrkirin.**

**Di aliyê demê de jî demeke ku li Başûr liv û tevger ji nû ve pêş ketiye. Tevgera Barzanî jî careke din ava dibe. Li Tirkiyeyê jî jixwe di serî de ciwan, hemû beşên civakê yên bindest berê xwe dane rêxistin û çalakiyan. Nîqaş dike, hewl dide civakê nas bike. Mirov bi vê civakê re dikare çi bike? Dixwest wê texmîn bike. Lê belê Kurdîtî bûyereke bêhêvî ye. Kurdîtî bi vî awayî derdikeve pêşiya wî. Ji ber dibêjin, "Tu çima bi me re mijûl dibî, em mîna dareke hişkbûyî ne." Di atmosfereke nîqaşê ya li bersiva pirsa, gelo bi vî gelî re mirov dikare**

**çi bike? digere rastî vê tê û tevî vê jî bêzar nabe, hewl dide hê kûrtir fêm bike. Wer dinirxîne û dibîne ku mimkun e di kûrahiya wê de hinek tişt hebin. Ew pêhesîn pir girîng in. Heke seresere binihêre, bi ya hatiye gotin ve bimîne, piştî wê gotinê dê dest jê berde, lê Rêbertî berevajî dest jê bernade, kûr dike. Dibîne ku di kûrahiyê de hêrsek, bertekek heye, cesaret û fedakartiyek heye. Civakê baştir analîz dike. Pratîka Amedê demeke ku analîza civakî bi hemû aliyên wê û kûrahiya wê pêk aniye.**

**Ya piştî wê dibe pêvajoya Stenbolê. Li navenda dewleta 4 hezar salan her tişt heye. Weke civak, weke dewlet, weke faşîzm, weke şoreşgerî jî her tişt heye. Li wir pêşketina şoreşgerî jî dibîne. Êrîşa faşîst a dij şoreşgerî jî çavdêrî dike. Sempatîzanek e, di nav de ye. Rêxistinbûnên Kurd, rêxistinbûnên Tirkiyeyê nas dike. Diçe hemûyan. Hînkeriya Stenbolê pir e. Di wê demê de têkoşîn zêdetir ekonomîk-demokratîk bûn. Sendîka herî zêde li Stenbolê xurt in. Tevgera ciwanan jî wiha**

**ye. Lewma navendeke herî girîng a têkoşînê ye. Dibe ku wê demê paytext nebû, lê paytexta civakî bû. Bi awayê rêûresm paytexta deshilatdarî û dewletê ye. Enqere hê nû ye. Di wê demê de hê tam nebibû paytext, niha hinekî hatiye wê astê. Destpêkê hemû sazî, rêûresma nûnertiya dewletê dikin li Stenbolê ne. Rêbertî wan jî dibîne û nas dike.**

**Paşê derbasî Enqereyê dibe. Demeke wiha ye ku êrîşên faşîst û zexta giran heye. Rêxistin hatine belavkirin, lîder tên girtin, dixin zindanan, tên qetilkirin, îdamkirin. Kontrgerîla di nav tevgerê de ye. Terora faşîst û îşkence di asta herî jor de ye. Di atmosfereke wiha de diçe Fakulteya Zanistên Siyasî. Fakulteya Zanistên Siyasî weke navenda fikra çepgir-sosyalîst tê dîtin. Qada êrîşên faşîst herî zêde ne. Dewlet ji bo wir ji bûyîna biryargeha şoreşgeran derxe her roj êrîşan pêk tîne. Timî qadeke têkoşînê ye. Van hemû pêvajoyan dixwîne, lêkolîn dike.**

**Paşê pêvajoya girtîgehê heye. Girtîgeh dibin qadên ku mirov kûr û zêde karibe bifikire.**

**Ciwanekî lêgerînerê mezin ê li Rihayê hatiye dinyayê, li Enqereyê lîse xwendiye, li Amedê memûrtî kiriye, li Stenbol û Enqereyê tevlî fakulteyê bûye, di carekê de dixin hucreyê. Di carekê de ji wê atmosfera bi tevger qut dibe, ya li dû wê ew e ku hemû tiştên jiyaye muhakeme, şîrove û analîz dike. Rêbertî vê dike. Bîrdozîbûn-polîtîkbûna wî li zindanê pêk tê. Biryarên bingehîn li wir digire. Kesên weke rêber dibîne û ew qebûl kirine li Kizidereyê tên qetilkirin, li Enqereyê li ber serê wî ku tên îdamkirin, dibihîze û his dike. Şoreşger, kadroyên rêxistinî, lîder li wir in. Derfetên hevdîtin û nîqaşan çêdibin. Ev rewş ji bo mirov bibe hêzeke fikir a mezin, di fikir de sîstematîk bibe, hemû tiştên hatine jiyîn bi rêkûpêk bike, zemîneke girîng e. Dibe rewşeke mîna mirov dikeve înziwayê. Em bala xwe bidinê gelek pêxember, rêberên şoreşger dikevin înziwayê, dikevin şikeftê û 40 rojan, nizanim çend mehan dernakevin, cihê lêhûrbûnê ye. Eger zindan nebe jî pêwîst e bikevin nav lêhûrbûneke wiha. Ji bo Rêbertî jî di fikir de girtîgeh xwedî heman fonksiyonê**

**ye. Girtîgehê wer dinirxîne. Paşê dema ji girtîgehê derket, atmosfera ket nav tam atmosfera lê digeriya bû. Atmosfereke ciwanan a ciddî û ji şoreşgerbûnê re vekiriye. Rêbertî ji bo heval Hakî û Kemal got, *"Du zarokên Derya Reş ên xera nebûne."* Ev pênase tê maneya mirovê têkiliya xwe ya bi civakê re diparêze, dijberî dewletê û jê dûr e. Lêhûrbûnên xwe yên di girtîgehê de dabûn destpêkirin, li derve zêdetir bi xwendina pirtûkan, bi dîtina zêdetir atmosfera nîqaşê re didomîne. Zivistana 1972-73'yan lêhûrbûneke wiha ye.**

**Rastiyeke Rêbertî ya pir bi sîstem, bi rêkûpêk, bi disîplîn dixwîne û dixebite heye. Kesayeteke rêxistinî ye. Ji bo bersivan ji pirsên di serê xwe de çêbûne bibîne pirtûk dixwendin û di wê pêvajoyê de dewam kir. Hema hema hemû pirtûkên pêvajoya di navbera 1850 û 1950'î de lêkolîn dikin û di salên 1974-75-76'an de wergerî Tirkî kirine dibe ku çend caran xwendine. Pirsgirêka Kurd di vê demê de derket holê. Ev pirsgirêk**

**çawa derket holê? Kê derxist holê? Kê çi rol lîst, helwest çi bû? Ji bo van fêm bike pir hewl da. Bi tenê ne ji ber ket zindanê zêdetirî hezar pirtûk xwend. Ne ji ber di girtîgehê de bû, li Enqereyê jî ji 1972'yan ve di 1973-74-75-76'an de bi heman rengî dema xwendin-nivîsandinê ye. Piştre di 1980-81-82'yan de li Lubnan-Sûriyeyê jî heman tişt kir. Îmrali bû dema lêkolîn-lêgerîne sêyemîn. Ew li derve jî kir. Li Enqereyê di girtîgeha Mamakê de û li derve jî kir. Ji lewra di encama lêgerîn-lêkolîneke mezin de ew agahî derketin holê. Encama gihiştiyê encama "Kurdistan Mêtingeh e". Statuya Kurdistanê lêkolîn dike. Mêtingeriyê lêkolîn dike û ji wir digihîje encamê. Diyar dike ku dema dibêje, *"Kurdistan Mêtingeh e"* ji ser hişê xwe çûye. Çima? Ji ber statuyekê lê dike, welatekî bêstatu ye. 'Heye, nîne' tê nîqaşkirin. 'Mêtingeh e' wê demê welatek heye, gelek heye. Statu mêtingehbûn e. Bi gotina mêtingehek e statuyê terîf dike. Du, ya divê li hemberî wê bê kirin jî şerê rizgariya neteweyî ye. Di heman demê de rêya çareseriyê jî nîşan dide. Du peyv e, lê hem di**

**nîşandana pirsgirêkê hem jî nîşandana çareseriyê de du peyvên rohnîker in. Gihiştina tiştekî wiha pir girîng e. Hinek dibêjin, “Me jî got”, lê piştî ku Rêbertî ev anî rojevê û kir nîqaşê gelek derdoran tavilê nivîsandin û xêz kirin. Pirtûk serobero xwendin, Hema ji pirtûkan agahî werdigirtin û mîna wan dîtiye tevdigeriyan. Wisa nîne. PKK’ê wisa nekir, wer nexebitî. Rêbertî ew nirxandin û terîf kirin. Pêşî Rêbertî diyar kir. Ew hêza nirxandinê Rêbertî derxist holê.**

## Li Enqereyê Pêkhatina Koma Bîrdozî

**Ji bo vê dê bi feyde be mirov pêşî careke din xisletên bingehîn ên derketina holê ya Rêbertiyê destnîşan bike. Weke pêvajo me terîf kir, mirov dikare hinekî din rewşa biryara avakirina rêxistinê û komê destnîşan bike. Bi taybet di bihara 1973'yan de avêtina gaveke rêxistinî ya wiha girîng e. Ji ber dem demeke wiha ye êrîşên darbeya leşkerî ya faşîst a 12'ê Adara 1971'ê didomin. Zexta faşîst, teror li her cihî tê pêkanîn. Kadro hatine girtin, rêber tên qetilkirin, rêxistin belavkirin, eger gotin li cih be rêveberiya faşîst nahêle çivîk bifire. Navê belavkirina rêxistinên şoreşgerî û êrîşên qutifandina tevgerên şoreşgerî "Tevgera Balyoz e." Navê plana pelçiqandina tevgerên şoreşgerî ya**

**rêveberiya darbeya 12'ê Adarê "Tevgera Balyoz" bû. Yanî tê maneya mîna mezrebe bi serê şoreşgeran û rêxistinên şoreşgeran de werin xwarê. Asta pelçiqandinê mirov dikare bi nihêrîna li mezrebeyê hesab bike. Di atmosfereke wiha de biryara avakirina rêxistinê rewşeke ciddî, karekî girîng e. Rewşeke ku divê rast bê fêmkirin û mirov li ser lêhûrbûnê bike. Rewşeke wer mirov normal bibîne nîne.**

**Di aliyê pratîk û dîrokî de wiha dikare bê terîfkirin: Li Tirkiyeyê -Bakurê Kurdistanê jî di nav de-, di navbera 12'ê Adara 1971 û dawiya 1973'yan de du rêxistinên hatine avakirin hene. Yek PKK ye, ya din jî TKPML-TÎKKO ye. Wekî din rêxistin nînin. Tevahî rêxistinên ji derveyî wan, beriya darbeya 12'ê Adara 1971'ê ava bûne yan jî piştî Çileya 1974'an çêbûne. Piştî efûya giştî ava bûn. Navbera 12'ê Adara 1971-74'an dibe dema ku rêveberiya darbeya leşkerî ya faşîst di rêveberiyê de ye, êrîşên xwe didomîne, rêxistinên şoreşger belav dike, dipelçiqîne û**

**zexta faşîst a giran pêk tîne. Di vê demê de avakirina rêxistinan berde, rêxistinên avakirî jî belav dibûn. Yên rêxistinkirî rêxistinên xwe belav dikin. Di rewşeke wiha de Îbrahîm Kaypakkaya rêxistin ava kir. Ew jî ji Dogu Perînçek qut bû. Piştî darbeyê dema Dogu Perînçek nikarî li hemberî darbeyê li ber xwe bide û bû ajan, jê qut bû. TKPML-TÎKKO ava kir. Berê navê partiya wan TÎKKP bû. Sala 1972'yan ava bûye. Yek jî Rêbertî bihara 1973'yan hîmên PKK'ê danîn. Sedema me ev diyarkirin ew e, demeke rêxistin tên avakirin, xebatên avakirina rêxistinan tê kirin nîne. Demeke rêxistin ji aliyê faşîzmê ve tên pelçiqandin, rêxistinên avakirî tên belavkirin e. Di demeke wiha de avakirina rêxistinê tê maneya mirov di wê astê de pevçûna bi faşîzmê re dide ber çavan. Gaveke ku dema agahiyeke biçûk jî bigihîje dijmin dikare bi komkujî û îdamê were cezakirin. Tevî rîsk û tehlûkeyên wiha tên zanîn jî Rêbertî gaveke rêxistinî ya wiha avêt. Ha divê mirov sedemên vê fêm bike.**

**Rêbertî wiha terîf kir: *"Rêxistin belav bûn, rêber hatin qetilkirin, îdamkirin û valatî çêbû. Ji bo dagirtina valatiyê, atmosfer bê rêbertî neyê hiştin û dagirtina cihê şehîdan min berpirsiyarî û wezîfe hilgirt."* Ev bîreweriya Rêbertî ye. Bîreweriya bingehîn a Rêbertî ber bi avakirina rêxistinê ve biriye. Paşê got, *"PKK, rêxistinbûna bîranîna Hakî Karer e."* Em ji vir çi fêm dikin? Gavavêtina Rêbertiyê xwedîderketina li bîranîna Mahîran, Denîzan, Îbrahîman e, dagirtina cihê wan e. Gavavêtina Rêbertiyê ew e, ji ber şehadeta wan firsend neyê danîn ku atmosfera şoreşgerî û gel bê rêbertî bê lîder nemînin.**

**Ev jî tê maneya wergirtina wezîfe û berpirsiyartiyê. PKK bi tenê rêxistinbûna bîranîna şehîdan nîne, gavavêtina Rêbertiyê jî rêxistinbûna bîranîna şehîdan û veguhertina rêxistinê ye. Karaktera bingehîn di vir de ye û li vir em bala xwe bidinê şopeke herî biçûk a oportunîzmê nîne. Asta fikir hewce dike mirov bibe rêxistin û li dijî faşîzmê têkoşîn bike. Digihîje wê bîreweriyê. Wê demê weke şertê**

**wê bîreweriyê ber bi rêxistinbûnê gav diavêje biryar dide. Nabêje, 'Zext hene, şert û merc giran in, em li bendê bin di şert û mercên hê guncawtir de bikin. Eger niha çêbibe tehlûke heye, wê li mirov bidin, zextan bikin.' Eger karek divê bê kirin, zehmetiya wê çi dibe bila bibe, tehlûke çi dibe bila bibe, atmosfer çi qasî bêderfet be jî kirina wî karî dide ber çavan. Taloqkirin nîne, berê xwe dide kar. Helwest û gotina wî ya nabe, em paşê bikin nîne. Heke hewce ye bê kirin, tehlûke çi dibe bila bibe derfet çi qasî kêm bin bila kêm bin, ji sedî sed ya divê bê kirin heye. Gavavêtina Rêbertiyê wiha ye. Xisleta bingehîn a gavavêtina Rêbertiyê ev e.**

**Xisleta bingehîn a mohra xwe li tevahî pêvajoyên paşê xist jî ev e. Di vê çarçoveyê de pêwîst e xisletên bingehîn ên rastiya Rêbertî, pêşketina Rêbertiyê baş bê zanîn. Ha her tişt di vir de veşartiye. Di vê çarçoveyê de helwest, liv û tevger û gotinên îro weke gelek têgihiştin tên destnîşankirin mehkûm dike. Wisa qebûl nake, serê xwe ji xeteke wisa re xwar nake.**

**Şertên şoreşgertiyê çi hewce dike wê pêk tîne. Şert û mercên çi dibin bila bibin, tehlûke çi qasî mezin be bila mezin be, derfet çi qasî çi qasî kêm bin bila kêm bin, ya girîng ew e mirov tişta divê bê kirin rast tespît bike û li ser esasê were kirin gav biavêje. Ev bi qasî karekî cesaret û biryardariyeke mezin e, karekî bîrewerî û berpirsiyartiyeke mezin e. Karê mirov li wezîfe, mîsyon û berpirsiyartiya dîrokî xwedî derkeve ye. Pêwîst e mirov di rastiya Rêbertî de vê bibîne. Naxwe wer bi hêsanî nikare bê destgirtin. Bû helwesteke ku paşê mohra xwe li tevahî pêvajoyên paşê xist. Ji bo vê PKK'ê di her atmosferê, her demê de dizanî çi bike, gaveke çawa biavêje û avêt. Rastiya Rêbertî timî jêhatî ye û gav pêş xist.**

**Têkildarî şêwaz û xisletên xebata demê, mirov dikare van bêje: Tevahiya sala 1973'yan geşedan hinekî rûtîn in. Faşîzm êrîşên xwe didomîne. Lîder hatine qetilkirin, herî dawî meha Gulanê Îbrahîm Kaypakkaya hatiye qetilkirin, rêxistin hatine belavkirin, şoreşger kirine girtîgehan tên darizandin.**

**Pêvajoyeke zexta faşîst a giran heye. Li aliyê din ciwanên nû hatine zanîngehan; bandora mezin a berxwedanên Denîzan, Mahîran, Îbrahîman heye. Şoreşgerî helwesta herî bingehîn e. Ciwanên şoreşger pir bi bandor, berfireh û xurt in. Ji lewra atmosfereke nîqaşê û atmosfereke şoreşgerî ya zêde heye.**

**Li zanîngehan li ser vê mîrasa şoreşgerî ya mezin daneheveke şoreşgerî ya zêde derdikeve holê. Di nav atmosfereke wiha de Rêbertî hewl dide fikrên xwe pêş bixe û belav bike. Dixwîne, lêkolîn dike û bi hevalên xwe re nîqaş dike. Bi ciwanên di fakulte û zanîngehan de tên naskirin re nîqaş dike. Fikrên xwe aşkera dike. Ev hemû bi devkî çêdibin. Di PKK'ê de materyalên nivîskî nebûn, Rêbertî got, *"Tiştên me dixwest em bêjin mîna me pif dikir guhên mirovan."* Ev hemû bi dizî dihatin kirin. Ji ber karê tê kirin pir bi tehlûke ye, ev hemû di nav şert û mercên darbeya 12'ê Adarê de çêdibin. Eger nepenîtiya karê tê kirin neyê parastin, li gor pergalê tavilê dibe sûcekî bê şert û merc îdamê pêşbînî dike. Di**

**wê nuqteyê de ya esas di nav ciwanan de propagandayeke zêde ye. Rêbertî di atmosfereke wiha de yek ji kesên di mijara li zanîngehan, fakulteyan girseyeke şoreşger a zêde kom bibe, hinekî bikeve rewşa rêxistinkirî de tevkariyeke zêde kiriye. Kesê herî zêde tê naskirin e, pêşengiyê dike, di girtîgehê de maye û derketiye, daneheveke wî ya agahiyan a girîng heye. Tê naskirin, ew bi xwe gelek mirovan nas dike. Her diçe navê wî tê bihîstin, bi taybet nêrînên wî yên têkildarî pirsgirêka Kurd tên zanîn. Ber bi bûyîna kom û weke kom ku tê ziman ve diçe. Rêxistin û navekî wî yê din nîne. Li dawiyê nêrînên bi navê Rêbertî tên parastin hene. Navê Rêbertî tê bihîstin, bihîstin her diçe ber bi binavkirin û îfadekirina weke "Apociyan" ve dibe.**

**Di aliyê pêşveçûna pêvajoya siyasî de, bihara 1973'yan dema TÎKKO'yê jî derb xwar darbekariya leşkerî ya faşîst a 12'ê Adarê wer hesab kir ku encam girtiye. Rêberên kiribû armanc an qetil kiribû yan jî kiribû girtîgehan. Ji bo rêxistinan jî rewş bi**

heman awayî bû. Bi vî awayî wer hesab kir ku êdî şoreşger bêbandor kiriye yan jî kiriye rewşeke nikarin zerarê bidin, armanc kir avahiyeke siyasî deyne ser asta derxistiye holê. Bi vî awayî biryar girt careke din hilbijartinê çêbike, rêveberiyeke bi hilbijartinê hatiye ser kar ava bike. Lê ev biryara xwe bi hesabê bi ser ketiye da. Bi hesabê rêxistin û hêzên şoreşger-demokratîk pelçiqandiye, belav kiriye û bêbandor kiriye kir. Di vê çarçoveyê de payîzê hilbijartin çêbû. Di pêvajoya hilbijartinan de zextên leşkerî yên rêveberiya awarte hinekî kêm kir. Propagandayeke zêde çêbû. Di hilbijartinan de CHP'ya Bulent Ecevît serokatiya wê dikir herî zêde deng wergirt û bû partiya yekemîn. Partiyên din Partiya Adalet a Suleyman Demîrel serokatiya wê dikir bû duyemîn. Darbeya 12'ê Adarê partiya Erbakan (Partiya Nîzam a Millî) girtibû. Partiya Selametê ya Millî bû sêyemîn. Bi qasî karibe komekê ava bike parlamenter derxist, bû xwedî bandor. Yek jî Partiya Tevgera Milliyetgir (MHP) a Turkeş hebû. Tenê Turkeş bû parlamenter. Parlamenterek

derxistibû. Hejmara parlamenterên partiya Ecevît û Erbakan ji bo avakirina hikûmeta koalîsyonê têr dikir. Her du partiyan jî soz dabûn ku eger hilbijartinan qezenc bikin wê efûya siyasî ya giştî derxin. Partiyên din ev negotibûn, nuqteya wan a hevpar derxistina qanûna efûya siyasî bû. Gotibûn ku ji bo girtinên siyasî yên darbeya leşkerî ya faşîst a 12'ê Adarê pêk anîbû bi dawî bikin wê efûyê derxin. Ji lewra li ser esasê vê hevkariyê di navbera du partiyan de hevdîtinên koalîsyonê çêbûn û di dawiyê de hikûmeteke koalîsyonê ava bû.

Di pêvajoya darbeyê 1972'yan, di nav CHP'ê de pevçûna lîdertiyê çêbibû. Berê Îsmet Paşa serok bû, Ecevît sekreterê giştî bû. Ketin nav lihevnekirinan, kongre çêbû. Ecevît li hemberî Înonu ji seroktiyê re bû namzet û bi ser ket. Înonu ji serokatiya giştî xist. Weke lîderekî ku Înonu ji seroktiyê xist bandora wî pir mezin bû. Hinekî jî bi awayê "Karaoglan/Lawikê Reşik tê' ji aliyê hinek derdoran ve pesnê wî hatibû dayîn. Bi taybet

**derdorên çepgir-sosyalîst ên darbeya 12'ê Adarê ew pelçiqandin jî destek dan Ecevît. Têgîneke bi awayê 'Çepgiriya navendê' bi kar dianî. Di encama van hemûyan de Cotmeha 1973'yan di hilbijartinê de bû partiya yekemîn û di dawiyê de bi partiya Erbakan re hikûmeta koalîsyonê ava kir. Ecevît bû serokwezîr, Erbakan bû alîkarê serokwezîr. Mîna soz dabûn hikûmeta koalîsyonê weke îcraeta pêşî li ser qanûneke efûyê ya nû xebitî. Qanûn amade kirin û birin meclîsê. Çileya 1974'an qanûna efûyê li meclîsê hat erêkirin û bi vî awayî soza xwe anîn cih. Efûyek giştî derket, deriyên zindanan vebûn. Ji bilî kesên cezayê îdamê û muebetê li wan hatibû birîn, li pey hev her kes derket. Cezayên kesên îdam û muebet li ser wan hatin kêmkirin. Girtiyên din hemû hatin berdan. Di carekê de her aliyê Tirkiyeyê bi kadroyên şoreşger ên beriya darbeyê tevlî çalakiyên siyasî, çalakiyên ciwanan bibûn, di darbeyê de hatibûn girtin, demeke dirêj di girtîgehê de mabûn, rastî îşkenceyê hatibûn, ezmûneke diyar jiyabûn re tijî bû. Ev rewşeke girîng bû û di heman demê**

**de li zanîngehan û fakulteyan jî li ser mîrasa berxwedana şoreşgerî girseyeke ciwanên sempatîzan ên şoreşger ava bibû. Dema ev kadro û girse gihiştin hev li pey hev gelek kom ava bûn. Kenan Evren digot, "Mîna kiwarkan hêşîn dibin." Wisa nîne, lê bi rastî jî kesekî dikarî çend rûpel nivîs binivîsîne û bêje li gor min nêrîna min heye, tavilê li cem xwe derdoreke diyar çêkirin û komek ava kirin.**

**Pêvajoya 1974-75'an e. Bû pêvajoyeke ku li ser navê Tirkiye û Kurdistanê bi dehan kom, rêxistin û partî hatine avakirin. Rêxistin û partiyên beriya darbeyê ava bibûn, hatibûn girtin û pelçiqandin. Kadroyên ketibûn girtîgehê dema lîder hatin qetilkirin, di nav xwe de bibûn çend parçe. Her rêxistin ji girtîgehê herî kêm weke 3-4 parçe derket. Di nêrînan de parçebûn, kesên li gor xwe helwest nîşan dabûn derketibûn. Di hundir de nikarîbûn yekîtî û yekparetiyê biparêzin. Di bin zexta faşîst de bi helwest, liv û tevgeran cihêbûn derketibû holê, veqetîn çêbibûn. Bi vî awayî ji girtîgehê derketin. Bi helwesteke**

parçebûn û tesfiyebûnê derketin. Dema li derve girseyeke mezin dîtin jî, her kesî bi qasî dixwest dikarî kadro û sempatîzanan bibîne. Ji lewra her kes ber bi avakirina rêxistinê ve çû. Hemû rêxistinên niha li Tirkiye û Kurdistanê di bin navên curbicur de hene 1974 û 1975'an ava bûn. Li Kurdistan û Tirkiyeyê jî wiha ye. Hinek dibin dewama darbeya 12'ê Adara 1971'ê. Gotin ku ew li ser mîrasa wê ava dibin. Lê damezirandina esasî di wê demê de bû. Gelek kom û rêxistin ava bûn.

Hikûmet ava bibû, zext kêm bibûn. Rewş hinekî din serbest bibû. Atmosfera mirov kariba propaganda kiriba, kom ava kiriba çêbibû. Atmosfera mirov kariba xwepêşandan û meş li dar xistiba, nivîsandiba-xêz kiriba vebibû. Bi sûdgirtina ji vê xwe rêxistin kirin. THKP-C dabeşî gelek parçeyan bû. Pêşî weke "Devrîmcî Yol/Rêya Şoreşger" navê kovarê bû, dîsa bi awayê "Kurtuluş Sosyalîst Dergî/Kovara Rizgarî Sosyalîst" yek jî weke "Halkin Yolu/Rêya Gel" parçe bûn. Paşê ji

**aliyê sempatîzanên Mahîr Çayan ve ku "Yekîtiya Propagandaya Çekdarî ya Marksîst Lenînîst" ava bû, hinek komên biçûk ên wiha jî çêbûn. Kovara "Rêya Gel" ji Yekîtiya Sovyetê re digot, 'Sosyal Emperyalîst.' Yên din jî diyar dikirin ku pirtûkên bi navê "Şoreşa Bênavber" ên Mahîr Çayan esas digirin. 'Kurtuluş Sosyalîst Dergî' koma pêşî ye qebûl kir ku Kurdistan mêtingeh e. Li ser vê bingehê ji Rêya Şoreşger cihê bûn. Paşê Devrîmcî Sol/Çepgiriya Şoreşger ji Devrîmcî Yol/Rêya Şoreşger qut bû. DEV-YOL û DEV-SOL demekê ketin nav şerekî dijwar. Koma THKO-Rizgariya Gel bû. Kovara bi navê "Yoldaş/Hevrê" derdixistin. 'Yekîtiya Kedê' ya din paşê bû TKEP-Partiya Kedê ya Komunîst a Tirkiyeyê. Tevgera Teslîm Tore ye. Dîsa TÎKKO'yî bûn çend parçe. Di bin navên komên weke Yekîtiya Gel, Yekîtiya Gelê Şoreşger de parçe bûn. TÎP-Partiya Karkerên Tirkiye parçe bû. Komek hê beriya efû derkeve ji girtîgehê derket, TSÎP-Partiya Karkerên Sosyalîst a Tirkiyeyê ava kirin. Oya Baydar a niha jî weke rewşenbîrekê dixebite û**

yên pêre partî ava kirin. Behîce Boran û hevalên wê derketin û TÎP weke partiya legal avakirin. Mîhrî Bellî rêxistinbûna xwe ava kir. Partiya koma Mehmet Alî Aybar hebû. TKP, (Komeleya Ciwanên Pêşverû-ÎDG) ava kirin. Kesekî bi navê Aktan Înce hebû, komek li dora wan ava bibû. Ew paşê bûn Yekîtiya Komunîstên Tirkiye-TÎKB. Niha jî bûne sê parçe. Yên ji wan mane dewama ODP û DEV-YOL in. Jixwe DEV-SOL bi xwe heye. DP-Partiya Şoreşger a ji Kurtuluş/Rizgarî mabû heye. EMEP, dewama Rizgariya Gel e. Gelek komên paşê yekîtî çêkirine hene. ESP'yî, TKP bûn çend parçe. TKP û TÎP bûn yek. Di rewşa heyî de hinek nav guherîne, lê komên ji wê demê mane. Ertugrul Kurkçu ji girtîgehê derneket, têde ma. Komeke Yilmaz Guney hebû, ew jî ket girtîgehê, di girtîgehê de ma. Çepgiriyeke bibû 40 parçe hebû. Lê ya berbiçav û xurt TKP-C'ya Mahîr Çayan bû. Xurt û fikra hakim bû. Ji TKP'ê bihurîbû. Mahîr Çayan hem di aliyê fikrî hem jî çalakiyê de bi bandor bû. DEV-GENÇ di destê wan de bû. Di nav ciwanan de ekoleke mezin

**bûn. Di nav rewşenbîran de tevgereke mezin bûn. Di artêşê de rêxistinbûna wan hebû. Mahîr Çayan hat girtin, ji girtîgehê reviya, revandin. Ev bi rêxistinbûna di nav artêşê de pêk hat. Paşê çû Kizildereyê. Bi THKO'yiyan re çalakî li dar xistin. Ji bo astengkirina îdamê wê guftûgo kiribana. Lidarxistina wan a çalakiyê hesteke berpirsiyartiya mezin bû. Ji lewra bi çalakiya Kizildere, reva ji girtîgehê jî bandor kirin. Kadroyên wan jî xurt bûn. Piştî efûyê mîrasa herî mezin bû. Di nav ciwanan de jî bi giştî dîsa ew bûn tevgera herî mezin. Weke fikra hakim Devrîmcî-Yol xwedî lê derket, Kurtuluş cihê bû, DEV-Sol cihê bû. Dîsa jî Devrîmcî-Yol weke koma mezin ma. Ertugrul Kurkçu ji ber di girtîgehê de bû zêde bandora wî çênebû, nikarîbû rê bide ber derve. Tevgerên wer hebûn. Tevgerên îro jî hene hê ji wê demê mane. Di roja me de jî kadroyên wê demê hene. Kesên EMEP'ê bi rê ve dibin dîsa yên ji wê demê mane. Kesên li Nûrheqê ketin şer û hatin girtin hene. Teslîm Tore li wir hat girtin.**

Têkildarî Kurdistanê jî mirov dikare van tiştan bêje. DDKO li girtîgehan ezmûneke pir baş nîşan nedabû. Mijara bingehîn a nîqaş dikirin, mijara 'Kurd hene yan nînin' bû. Li dadgehê hewl dan hebûna Kurdan îspat bikin. Zêde berxwedêr û hevgirtî nebûn. Ew ji girtîgehê bi awayekî çend parçe derketin. Li aliyê din kesên neketibûn girtîgehê hebûn. Hinek kes, PDK'yî, PDK-T'yî derbasî Başûr bûn. Fazil Bucak, dibe bavê Yusuf Serhat Bucak. Sala 1972'yan di bin navê pevçûna eşîretê de ya rastî ji aliyê MÎT'ê ve hat qetilkirin. Li aliyê din komeke din ji bo amadekariya gerîla çû Başûr. Li Başûr perwerde dîtin û di asteke diyar de amadekariyên wan hebûn. Lê bi hewldana Barzanî pev ketin. Koma Doktor Şivan qaşo Saît Elçî darizandibû û ceza kiribû. Barzaniyan jî Doktor Şivan û hevalên wî darizandin. Ji vê berpirsiyar girtin. Sait Kirmizitoprak, ji Dêrsimê bû. Ew jî ji zanîngehê tevlî bibû. Hewl dida PDK'ê hinekî din bike tevgereke radîkal a çepgir. Li Bakur amadekariya gerîla dikir. Ji bo gerîla rêxistin

**bike û peşmergetiyê pêş bixe di nav amadekariyan de bû. Bi vî awayî yên derbasî Başûr bûn hatin qetilkirin. PDK'ya li Başûr hat pelçiqandin. Hinek derdorên ji aliyê Barzaniyan ve hatin wezîfedarkirin li deverên din PDK ava kirin û rêxistin kirin. Ew hinekî bi dizî dixebitîn. Hem ji ber bandora wan hem jî bandora Doktor Şivan, dîsa endamên DDKO ku ji girtîgehê derketin û parçebûna wê, bû sedema çend kom derkevin holê. Sala 1974-75'an ava bûn. Komele ava kirin, hinekan kovar derxistin. Bi komele û kovarê hatin binavkirin.**

**Komeke ji Doktor Şivan bandor bibû li Enqereyê, Amedê DDKD ava kirin. Ew weke komekê ava bûn. Paşê derket holê ku 1975 an jî 1978'an bi navê "PKK-Partî Karker Kurdistan" partiyek ava kirine. Lê belê nikarîbûn partiya xwe îlan bikin. Piştî darbeya 12'ê Îlonê polîsan îlan kir. Li cem polîsan derket holê partiyek wiha ava bûye. Li Amedê sekreterê wê yê giştî Omer Çetîn hat girtin. Omer Çetîn, ji Bismilê bû, wî da dest.**

**Partiya Hatîp Dîcle wan bû. Hatîp Dîcle, endamê Komîteya Navendî bû. Vedat Aydin, hêza çalakger a partiyê bû. Partî ava kiribûn lê veşartî mabû. Polîsan partî derxist holê. Li gor ku wê du PKK nebin 1981 yan jî di serê sala 1982'yan de li Lubnanê kongre li dar xistin. Navê wê bi awayê PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan) guhertin. 'Kürdistan İşçi Partisi' wekî heyî wergerî Kurdî kiribûn. Bi awayê "Partî Karker Kurdistan" îfade kiribûn. Dadgehên 12'ê Îlonê xwestin hevalan bi bername û rêziknameya wan dadgeh bikin. Heval Mazlum ew red kir got, "Ev ne bernameya me ye." Lê wan PKK nivîsandibûn. Hewl dan bi wê bernameyê dadgeh bikin, jixwe nîqaşeke bi rêkûpêk çênebû.**

**Komekê kovara bi navê "Ozgurluk Yolu/Rêya Azadiyê" derxist. Komeleya Gel a Demokratîk jî ava kiribûn. Ev Kemal Burkay û hevalên wî bûn. Kemal Burkay, ji Dêrsimê ye. Ji Partiya Karkeran a Tirkiyeyê ye. Parêzer e. Di darbeya 12'ê Adarê de derketibû**

**derveyî welat, dema efû çêbû hat. Sala 1974'an dest bi derxistina kovareke bi navê "Ozgurluk Yolu/Rêya Azadiyê" kirin. Paşê sala 1975 an jî 76'an 'Partiya Karkerên Sosyalîst a Tirkiyeyê' ava kiribûn. Ev jî dîsa 1981'ê ji aliyê polîsan ve hat aşkerakirin. Kesî nizanî ku ava bûye. Weke "Ozgurluk Yolu" dihatin zanîn, lê hê ji wê demê ve partî ava kiribûn, weke partî tevgeriyabûn.**

**Komeke ji rewşenbîrên weke Îhsan Akyol û hwd. ava bû. Timî kovar derxistin, li dora kovarê xwe rêxistin kirin. Komek ew bûn. Komek jî Orhan Kotan û Mumtaz Kotan ên birayê hev bûn. Ev ji Agiriyê ne. Îsmaîl Beşîkçî bi wan re bû. Li dora wan komeke ji DDKO'yê mabû jî hebû. Wan jî sala 1975'an kovareke bi navê "Rizgarî" derxistin. Herî zêde Îsmaîl Beşîkçî dinivîsand. Weke xebata kovargeriyê domandin. Rexne dikirin, ji serokkomar re name dinivîsandin. Nirxandanên Îsmaîl Beşîkçî diweşandin. Beşîkçî bû teorîsyenê wê komê. Bi Orhan Kotan û Mumtaz Kotan ên birayên hev re**

**dinivîsand. Paşê 12'ê Îlonê Mumtaz Kotan hat girtin. Orhan Kotan derket derveyî welat. Mumtaz Kotan li zindana Amedê bû. Kesên behsa zindanê dikirin, behsa wî jî dikirin. li girtîgehê nikarî li ber xwe bide, ket rewşeke zehmet. Recep Maraşli hebû. Ew derketin pêş, weşangerî pêş xistin. Zêdetir bi weşangeriyê re mijûl bûn. Paşê komek ji 'Rizgarî' cihê bû, bû 'Ala Rizgarî'. Hinek parêzerên ji Erxeniyê hebûn. Di nav komê de cih digirtin. Ew parçe bûn. Komek bû 'Kawacî'. Kesên ji DDKD'ê veqetiyabûn. Hinekî ji kesên ji nav me veqetiyabûn pêk dihat. Ahmet Zekî Okçuoglu hebû. Wî pêşengî ji 'Weşanxaneya Yontem' re dikir. Ji Yekîtiya Sovyetê re digotin, 'Sosyal Emperyalîst.' Bûn komeke wisa. Weke parêzer çû cem Rêbertî. Rêbertî red kir û got, "Biçe şerê xwe bi hinekên din re bike, bi min re mijûl nebe." Ji me jî Dêrsimî hebûn. Alîşer Gurgoze û Hasan Gurgoze yên birayên hev hebûn. Cemîl Gundogan ew jî hebûn. Hinekî bûn qurbanê ferdperestiya bûrjûvaya biçûk. Mirovên pir jîr bûn, lê nedihatin disîplîna rêxistinê, hinekî jî meyla lumpentiyê jî bi wan**

**re hebû, kesayetên ferdperest, pozbilind, gotina xwe weke her tiştî didîtin bûn. PKK'ê bi awayê 'Biçin li cihekî din bi rêxistin bibin' ew li derve hiştin. Wan jî bi înada li hember PKK'ê çûn bûn yek û koma 'Kawacî'yan ava kirin. Hinekî nêzî PDK'ê bûn. Paşê hat dîtin ku beriya sala 1980'î li aliyê Botanê xwe rêxistin kirine. Dema qada vala hebû hinekî jî bi awayê xwe spartin PDK'ê xwe rêxistin kiribûn. Paşê ew rêxistinbûn belav bûn. Ya din jî PDK-T bû. Sîraç Bîlgîn wan ava kiribû. PDK'ê careke din xwe wiha rêxistin kir.**

**PDK-T 1966'an ava bû. Bû du partî. Damezirînerê wê Faîk Bucak e, jixwe di dema 12'ê Adarê de hat qetilkirin. Doktor Şivan û Saît Elçî hatin qetilkirin. Paşê 1977'an komeke bi navê "KUK-Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistan" ji PDK'ê cuda bû. Zêdetir li derdora Mêrdîn û Amedê kesên PDK'yî tevlî KUK'ê bûn. Ji propagandaya Rizgariya Neteweyî ya PKK'ê bandor bû. Rêbertî weke rêxistinbûneke şerê taybet nirxand. Weke tevgereke ku Rizgariya**

**Neteweyî wergirtiye dixwaze berfirehbûna PKK'ê ya li Kurdistanê û belavbûna fikra Rizgarixwaziya Neteweyî li Kurdistanê asteng bike îfade kir. Jixwe weke siyaset bi roleke provokatîf rabû. Diyar dikirin ku girêdayî Samî Abdurahman in. Paşê ji PDK'ê veqetiya, li Başûr Partiya Gel a Demokratîk ava kir. Paralelî wê li Bakur jî KUK ji PDK'ê cuda bû. Partîbûnên xweserî Kurdistanê wiha ne. Komên wiha çêbûn. Niha jî ev bi şêwazên curbicur di bin navên cuda de dewam dikin.**

**Di PKK'ê de kombûnek çêbû. PKK beriya wan, wekî wan piştî efûyê ava nebû. Bihara 1973'yan hîmên wê hatibûn danîn. Ew bi efûyê derketibûn û bi lez ava bûn. Li dû efûyê ku dihat gotin, wê rêxistinbûn, rêxistinbûna ciwanan, rêxistinbûna şoreşgerî çawa bin û bi lez ev kombûn ava dibûn, ciwanên li derve yekpare bûn. Ji zanîngehan hevdu nas dikirin. Fakulteya Zanistên Siyasî û Fakulteya Hiqûqê weke biryargehekê navendek bûn. Şoreşger li wir kom dibûn. Hevdu nas dikirin. Bi şoreşgerên li ODTU û Hacettepe re jî têkilî**

**dihatin pêşxistin. Atmosfereke ku hevdu nas dikirin hebû. Dema mirov ji girtîgehê derketin, ji bo avakirina komên xwe liv û tevgerek çêbû. Lê belê rewşa ciwanên sempatîzan ên li derve avakirina rêxistineke hevpar bû. Lewma kesên ji derve derketin nikarîbûn wê rewşê bişkînin. Neçar man ji wê re razî bibin û bi vî awayî li derveyî koma Dogu Perînçek meyla avakirina rêxistineke hevpar pêş ket. Mahîr Çayan ji bo Dogu Perînçek gotibû, "Ev sîxur e, wî tevlî nekin." Gotin, "Heke Mahîr Çayan gotibe, ev a rast e." Dogu Perînçek bi wî awayî tevlî nebû. Bi rastî jî sîxur bû. Ji wê rojevê ve teslîmî kontrgerîla bibû. Ergenekoncîtiyê bi rê ve dibe. Weke baskekî MÎT'ê yan jî kontrgerîla rol pê dan lîstin. Di mijara tevgerên şoreşgerî di aliyê bîrdozî de ji rê derxe, bixe rewşeke nikaribin siyasetê bikin û naveroka wan vala bike de rol pê dan lîstin.**

**Di encama nîqaşên avakirina rêxistina hevpar de wiha hat gotin, 'Bila bi civînekê biryara vê bê dayîn.' Ev hemû weke navenda**

**Fakulteya Zanistên Siyasî tê diyarkirin. Rêbertî bi awayekî aktîf di van xebatan de cih digirt. Li gor ciwanên şoreşger têde ji her fakulte û zanîngehê re kota hat veqetandin. Weke kotaya hilbijartinan bû. Hat gotin, 'Delegeyên xwe hilbijêrin û bişînin.' Wê demê çepgirî demokratîk bû. Li hemû zanîngeh û fakulteyan civîn hatin kirin. Di asta hat diyarkirin de delege hatin hilbijartin. Li dû wê delege kom bûn û ji bo rêxistinê ava bikin nîqaş kirin. Mîna kongreyekê bû. Bi rojan têkildarî 'divê rêxistineke çawa bê avakirin, wê bername-rêziknameyeke çawa ava bibe û rêveberiyek çawa bê avakirin' ku nîqaşên têgihiştinê çêbûn ev hemû girîng bûn.**

**Nîqaş zêdetir di navbera Rêbertî û DEV-YOL'ciyan de bû. Bi vî awayî Rêbertî xwerexnekirin dixwest. Ev encama derket holê çima derket holê, çima rêber hatin qetilkirin? Rêbertî digot, *"Divê em sedemên van bibînin da ku rêxistina nû nekeve heman rewşê."* Li ser vê bingehê bi awayekî teorîk rexne dikir. Têgihiştina dewletê, şovenîzma sosyal,**

**têgihiştina şoreşê rexne dikir. DEV-YOL'î darbekar bûn. Tarzê têkoşînê rexne dikir. Dixwest rêxistineke nû ya li ser esasê dersan werbigire bi xwerexnekirinê derdikeve holê, dîsa dersan ji derbên xwarinê derxe û li ser wan dersan were avakirin. Nêzî xwerexnekirinê nedibûn û hewl didan paşguh bikin. Jixwe nêzî xwerexnekirina li ser esasê şoreşgertiyê nebûn. Nav û pirtûkên Mahîr Çayan bi kar anîn, lê nikarîbûn wê xetê jî bişopînin. Bi tarzekî zirav cewhera berxwedanê ber bi rastgiriyê ve birin. Vê nîqaşê demeke dirêj devam kir. Wan Rêbertî bi awayê zehmetiyan çêdike, astengiyan derdixe rexne dikirin. Qebûl nekiribin jî Rêbertî ew hinekî bandor kir. Di hinek mijaran de hişt ku berbiçavtir nêrînan diyar bikin û hinekî xwe rexne bikin. Li ser vê bernameyek hat amadekirin. Armanc û prensîbên bingehîn ên rêxistinê, rêgezên rêveberiyê hatin diyarkirin. Di civîna delegeyan de yek jî rêveberiyek hat hilbijartin. Rêbertî û heval Hakî di vê rêveberiyê de cih girtin. Heval Hakî jî dihat naskirin. Weke**

**delegeyê Fakulteya Fenê tevlî civînan dibû. Dema rewşeke wiha çêbû xwestin rêxistina xwe dewrî vê rêxistinbûna nû bikin.**

**ADYOD di vê civînê de ava nebû, weke komeleyeke xwendekaran jixwe beriya efû derkeve dawiya 1973'yan ava bibû. Berî efû derkeve hinek kesên ji TÎP'ê weke partî, Partiya Karkerên Sosyalîst a Tirkiyeyê (TSÎP) ava kirin. weke komele jî Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqereyê (ADYOD) ava kiribûn. Bernameya xwe amade kiribûn, di aliyê qanûnî de bi emniyet û Wezareta Karên Navxweyî dabûn qebûlkirin. Rêveberiyek wan jî hebû. Civînê ji ber nêzîkatiya wan a feydeperest ew sûcdar kir. Ji ber bêyî li benda komên din bimînin bi tena serê xwe rêxistin ava kirin û mîna yekane rêxistina ciwanan e dihatin xuyakirin hatin rexnekirin. Dema fêm kirin ku wê tecrîd bibin û li derve bên hiştin, wiha hat gotin, 'Me şaşî kir, jixwe komele heye, we rêveberiya xwe hilbijart. Hûn bi rê ve bibin, em bibin rêveberiya fermî, bila wer bê zanîn. Em jî wer**

**tevlî bibin. Bila bernameya fiîlî û rêveberî jî ya vê civînê be. Bi vî awayî bila bibe rêxistineke îllegal cuda, legal cuda.” Jixwe wê Wezareta Karên Navxweyî bernameya ji civînê derketibû, qebûl nekiriba. Ev rewş guncaw hat dîtin û ADYOD rêxistineke bi du rêveberî bû. Rêveberiya îlegal û rêgezên wê cuda, pozîsyona wê ya qanûnî-legal cuda bû. Bihara 74’an hat avakirin. Bêyî ti bandoreke zêde çêbike betlaneya havînê hat.**

**Weke ADYOD çalakiya xwe ya mezin a pêşî destpêka Cotmeha 1974’an di vekirina zanîngehan de pêk anî. Ji berê de belavok hatibûn amadekirin, li Enqereyê li hemû qadan, zanîngeh û fakulteyan bi awayekî hevpar belavok hatin belavkirin. Zêdetirî 10 hezar xwendekar tevlî bûn. Weke tevgera destdanîna li ser Enqereyê bû. Aktîvîteyeke girîng bû. Li Beşevler û Yildirim Beyazit a MHP’yî û faşîst lê bi bandor bûn pevçûnan rû da. Ev pevçûn heta ber bi pevçûnên çekdarî jî çûn. Hinek rêveberan nikarî rast bi rê ve bibin, nîqaş çêbûn. Yê wezîfeya xwe herî baş**

**pêk anî Rêbertî bû. Rêbertî hem li qada xwe wezîfeya xwe anîbû cih hem jî têkildarî hinek deveran biryar girtibû û piştgirî dabû meşandina kar. Paşê zanîngeh vebûn, lê bi pevçûn bûn. Pevçûna di vekirinê de dest pê kir, qet neqediya. Li gelek qadan di navbera şoreşger û faşîstan de pevçûn çêbûn. Heta gihişt pevçûnên çekdarî. Hinek fakulte qet nikarîbûn bên vekirin. Mînak Fakulteya Ziman Dîrok Cografya qet nikarî dest bi sala hîndekariya nû bike. Her roj pevçûn hebûn. Hevalê Kemal Pîr û Cuma, li Fakulteya Ziman Dîrok Cografya xwendekar bûn. Li hinek fakulteyan her çû xitimandinek çêbû. Hîndekarî nikarîbû bê kirin. Li ser vê yekê di meha Mijdarê de dikarîbû derbasî hîndekariyê bibe.**

**Polîsan girt ser ADYOD'ê, nêzî 150 kes birin emniyetê. Ji wir jî birin Girtîgeha Mamak. Komele hat girtin. Kesên hatin girtin 10 rojan man. Ji me jî çend heval hatibûn girtin. Rêbertî jî hatibû girtin. Kemal Pîr ji ber reviyabû nehatibû girtin. Polîsan korîdor**

**ava kiribûn, dema ji avahiyê tê xwarê tevlî nav gel dibe û direve. Hefteyekê li Girtîgeha Mamakê man. Em jî di nav wan de bûn. Em di qawîşekê de man. Heval Fuat, Rêbertî û hemû lîderên li pêş ên rêxistinên din hebûn. Ji bo wext baş bê nirxandin 3 rojan semîner hat lidarxistin. Qaşo me yê nîqaş kiriba, lê lîderên rêxistinên din jî di nav de ti kes neaxivî. Ji Rêbertî re gotin, "Tu biaxive." Rêbertî konferans pêk anî. Gotineke li pêşberî Rêbertî anîbana ziman nebû, lê li pişt rexne dikirin. Di kovarên xwe de dinivîsandin. Lê nikarîbûn rûbirû bi Rêbertî re nîqaş bikin. Weke fikir nikarîbûn bersivê bidin rexneyên Rêbertî. Bandora fikrî ya Rêbertî wê demê di asteke wiha de bû. Di aliyê pratîk de jî têkildarî çalakiya di dema vekirina zanîngehan de hat lidarxistin yek ji rêveberên nehatibû rexnekirin bû. Got, *"Min ji ADYOD'ê re serokatî kir."* Li ser vê bingehê pêşengiyeke wî hebû. Lê zêde dewam nekiribû.**

**Dema ji girtîgehê derketin, komele hat girtin. Ciwanan careke din bi heman rêbazî**

**dest bi avakirina komeleyekê kirin. Ji bo vê careke din kota hatin veqetandin. Ji bo delege bên hilbijartin civîn çêbûn. Di navberê de 5-6 meh derbas bibû, kom ava bibûn. Berxwedana THKP-C, Mahîr Çayan û hevalên wî pir bi bandor bû. Koma herî mezin bibûn ew. Di nav gelek fakulte û zanîngehan de yên piranî ew bûn. Ji lewra wan delege dan hilbijartin. Dema delege careke din kom bûn, piranî DEV-YOL'cî bûn. Rêbertî di vê rewşê de got,** ***"Temam hûn pir in, lê heke hûn bi tena serê xwe komeleyê ava bikin, wê yên din li derve bimînin. Wer nabe, divê mirov rêveberiyê parve bike."*** **Ji derveyî koma Dogu Perînçek ji her komên din nûnerek di rêveberiya ADYOD'ê de hebû. Li wir her kes dihat temsîlkirin. Rêbertî bi awayê** ***"Bila dîsa wisa be" pêşniyar kir.*** **DEV-YOL'iyan red kir. "Demokrasî heye, her kes bi hilbijartinê tê, her kes dikare bibe endam. Kî bê hilbijartin ew dibe rêveberî." Jixwe piranî ew bûn. Wan namzet nîşan dan. Hemû hatin hilbijartin. Rêveberiyeke ji DEV-YOL'ê pêk hat. Bi navê AYOD (Komeleya Hîndekariya Bilind a Enqereyê) komele ava**

**kirin. Peyva 'Demokrasiyê' derxistin. AYOD ava bû. AYOD, veguherî komeleya ciwanên DEV-YOL'ê. Rêveberiya wê ji DEV-YOL'ê bû. Dema ji komên din kes di rêveberiyê de nehat temsîlkirin jî yek bi yek çûn komeleyên xwe ava kirin, kovarên xwe derxistin. Bi vî awayî çepgir belav bûn û parçe bûn.**

**Apocî dem bi dem tevlî çalakiyên ciwanan bûn. Komele ziyaret kirin, lê ji bo wan jî rewş bi heman rengî bû. Dihat maneya pêşniyara Rêbertî ya xebata pêkve red dibû. Dema wisa bû, Rêbertî sala 1975'an zêdetir bi rêxistinkirina komê re mijûl bû. Di 1974'an de hem xebata komê dikir, hem jî xebata rêxistiniya hevpar a ciwanan bi rê ve dibir. Ev di zikhev de pêk dianî, li dijî hev nedidît. Lê dema 1975'an nikarî tevlî rêxistinbûna ciwanan a giştî bibe, vê carê hemû dem û hêza xwe da rêxistinbûna komê. Civîn li dar xist, zêdetir xwend û lêkolîn kir. Ev hem di avabûna nêrînan hem jî naskirina kadroyan de bû xebateke girîng. Kom kom civîn li dar**

**xist. Civînên naskirinê, zêdetir bigewdekirina komê li dar xist.**

**Di encama wê de ber bi dawiya sala 1975'an bi vî awayî komek bi gewde bibû. Komeke kakil a ji kesên xwedî hejmara diyar ku hevdu nas kiribûn, li dora Rêbertî hatibûn cem hev, tevlî nêrînên Rêbertî bibûn, perwerdeyeke teorîk a diyar dîtibûn, xwedî wê hêzê bûn ku propagandayê bikin ava bibû. Çileya 1976'an li Dîkmenê li mala hevalekî ji Siwêregê di civîna hat lidarxistin de encamên vê rewşê hatin nirxandin, têkildarî çi dikare bê kirin nîqaş çêbûn. Hat nirxandin ku heke kom saleke din jî li Enqereyê xebatê bike wê bibe dubare, wê zêde tevkariyekê neke û êdî daneheva li Enqereyê derketiye holê divê neqlî Kurdistanê bê kirin. Û biryar hat girtin ku li qadên guncaw ên Kurdistanê jî bi heman awayî xebat bê kirin, xebatên rêxistinbûnê bên meşandin. Li Enqereyê girseya dihat armanckirin ciwanên hîndekariya bilind bû. Dema çûna Kurdistanê pêk hat, girseya dihat armanckirin ciwanên hîndekariya navîn yanî**

**ciwanên lîseyê ne. Li ser vê girseyê biryara rêxistinkirina komê hat dayîn. Jixwe li ADYOD'ê bi koma DEV-YOL'ê re yekîtî çênebibû. Çepgiriya Tirk rêxistinbûna hevpar red kiribû. Di nîvê sala 1975'an de Rêbertî çû cem rêxistinên Kurd, bi lîderê hemûyan re axivî. Ev di pirtûka "Pirsgirêka Rizgariya Neteweyî û Rêya Çareseriyê" de heye. Ji Sîraç Bîlgîn heta Kemal Burkay bi hemûyan re hevdîtin çêkir. Têkildarî rêxistinkirina eniyeke hevpar pêşniyar kir. Rêbertî ev pêşniyar ji wan re bir,** ***"Bila her kes kom û rêxistina xwe biparêze. Lê yek jî em weke Eniya Neteweyî ya Kurdistanê rêxistin bibin. Xebatên li Kurdistanê em di nav yekîtiya eniyekê de bi rê ve bibin."*** **Wan jî red kir. Jixwe Kemal Burkay vê îtîraf dike. Sîraç Bîlgîn jî îtîraf kiribû. Sîraç Bîlgîn, PDK'yî dema fikrên Rêbertî guhdar dikin, pir bi tehlûke dibînin. Dibêjin, "Ev fikir dê zerarê bidin Kurdistanê, em ê li hember van fikran şer bikin." Dema ji wir jî eniyeke hevpar derneket holê, weke encam PKK'ê koma xwe rêxistin kir. Li gor biryara di civîna Dîkmenê de ji serê sala 1976'an ve kadroyên**

**xwestin şoreşgertiya profesyonel bikin, bi dilxwazî bi agahiya Rêbertî li qada guncaw hat dîtin sewqî nav xebatan hatin kirin. Vegera li welat, vegera li Kurdistanê û li Kurdistanê ji bo avakirina tevgera ciwanan xebatên rêxistinbûnê dest pê kirin.**

**Çarçoveya agahdarkirinê bi vî awayî dikare bê kirin. Li dû wê li Kurdistanê pêvajo û gavên bûyîna koma ciwanan û partîbûnê pêş ket. Xisletên koma bîrdozî ya li Enqereyê ava bû çi bûn? Nêrînên wê çi bûn? Xeta wê ya bîrdozî-polîtîk çawa ava bû, xwedî çi hêmanan bû? Cudatiya wê ya ji hêzên din çi bû? Çawa hevdu rexne dikirin? Ev jî girîng in.**

**Kesê di navbera germ-sar, havîn-zivistan, şev-rojê de cudatiyê nebîne, nikare di navbera jiyan-mirinê de jî ferqê bibîne. Rewşa têkildarî sîstematîka fikir e. Tarzekî fikrê ye. Ferqa di navbera fikra qederperest û fikra diyalektîk lêpirsîn dike de îfade dike. Rêber Apo got, "Min fêm kir ku nakokiya di navbera me de felsefîk e." Rewşeke bi fêmkirina jiyanê ve girêdayî ye. Bi îddîaya jiyanê re ji lewra**

**rewşeke bi, wê jiyan çawa bê avakirin neyê avakirin ve girêdayî ye. Divê mirov wer fêm bike. Dema mirov pirsa, 'Di hemû xebatan û şer de çima afirînerî nîne? Çima dewlemendiya tarz nîne" bike, em dikarin bêjin ku ji vir tê. Di me de bi bîreweriyê, rê dayîna ber jiyanê pir kêm e. Dubarekirina xisûsên hatine hînbûn û ezberkirin pir zêdetir e. Hînbûnên me ji ya em difikirin 40 qat zêdetir rê didin ber me. Qaşo wer tê zenkirin ku bi fikir em karê xwe dikin, lê wisa nîne. Dubarebûneke xwe dispêre hînbûnan heye. Hêza fikir, afirînerî pir lawaz e. Heta ji guhertin nûjeniyê tê tirsîn. Mirov her tim çi dibe bila bibe gumanan dikin, dema tiştek diguhere wê encama wê çi be diyar nîne. Ev ji aliyekî ve rewşeke normal e. Ji xisûsa nezanîna 'wê çi bibe' tê. Dubarekirina ya heyî, herî kêm dema mirov bi tiştên nû re rûbirû bê jî heta ew nebe têkildarî wê çi bibe agahiyek wî heye. Lêgerîna zanînê ya mirov ji vir tê, pêwîstiya wî bi zanînê heye. Lê belê ji me kesên ji zanînê ditirsin jî hene. Kesên ji zanînê ditirsin hene. Rastiyeke me ya ew qasî kêm tê**

**fikirîn, bi hînbûn û dubarebûnê tê jiyîn heye. Divê mirov ji vê bibihure. Pêwîst e em bifikirin. Hewce ye em hêza xwe ya zanînê zêde bikin. Divê em ji nûbûnê re vekirîbin û guhertinê bijîn. Pêwîst e em lêpirsîn bikin. Bi zanebûn û fêmkirinê re divê em jiyanê manedar bikin û bijîn. Wisa ezberkirin û dubarekirin ti feydeyê nade. Ji wir qet serketinek dernakeve.**

**Lêpirsînerî bingeha meseleyê ye. Ji lewra mirov hinekî bi zanebûn û fêmkirinê hewl bide bijî pir girîng û pêwîst e. Dema dijmin hinekî tedbîran pêş dixe em dixitimin, dikevin rewşeke nikarin tiştekî bikin û bêçare diminînin. Halbûkî ew qasî hêza dijmin nîne, çare jî neqediyane. Çare ji xwe ve dernakeve holê, divê mirov vê bibîne. Ji bo dîtinê jî hewce ye mirov bifikire û lêpirsîn bike. Pêwîst e mirov karibe di nav dem û cih de bifikire. Bi baweriya wê bibe çare divê mirov bifikire. Divê mirov di serî de nebêje, 'Nabe.' Têgîna dem û cih nîne. Bi îhtîmaleke mezin komkujî bi wê derê ve girêdayî ne. Komkujî, qirkirin**

**hene, lê bandora wan çi ye? Weke partî 45 sal in em têkoşîn dikin. Rêbertî ev lêpirsîn kir. Ev qasî xebatên çapemeniyê û çandê tên pêşxistin. Bi awayekî ciddî lêpirsîna me ya têkildarî ferd û civakê nîne. Ya rasttir tehlîl û lêgerînên me yên têkildarî analîzên vê têkoşînê derxistine holê, çareseriyên pratîk veguherînin serwextbûnê, mirov û civakê bixin rewşeke baştir bên naskirin nînin.**

**Rewşên wiha hene. Têkiliya van hemûyan bi komkujî, zext û terorê re heye. Divê mirov qet nefikire ku li ser bîrewerî, hêza fikir û psîkolojiyê ti têkiliyek wê nîne. Divê ji ber bi fizîkî dijî, mirov nebêje, 'binihêre tiştek nebûye.' Belê weke fizîkî heye, lê belê bi awayên din di çi rewşê de ye. Hewce ye mirov wê jî lêkolîn bike. Ji vî alî ve xisûsên em pir li ser wan disekinin û tehlîl dikin nînin. Heta em van tehlîl nekin, em nikarin xwe biguherin. Heta em tehlîleke wiha pêş nexin, rast nîne em xwe rexne bikin. Em xwerexnekirina çi dikin? Em ê şaşî û kêmasiyên xwe bibînin. Divê guhertin di zîhniyetê de çêbibe. Zîhniyetê wekî**

**heyî biparêze û paşê jî bêje, 'Ez xwe perwerde dikim, diguherim.' Ev ne mimkun e. Tu çi diguherî? Ji şaşiyeke ku rojane rû dide re mirov bêje, 'şaşî çêbûye ez xwe rexne dikim', nayê maneya mirov ji wê şaşiyê xelas bûye. Divê mirov sedema wê ji holê rake. Sedema wê jî zîhniyeta ku rê li ber vekiriye. Şoreşa zîhniyetê û guhertin ji vî alî ve girîng e. Di rewşa heyî de zîhniyet pir teng, pir seresere û pir mekanîk e. Cîhana fikir pir baş nîne. Rewşeke ezber a tenê ya dibîne dubare dike heye. "Çima?" Ji ber qet lêpirsîn nake. Di vê rewşê de kîjan afirînerî, kîjan kûrbûn çêdibe! Mirov dikare behsa kîjan têkoşînê, serketinê bike! Bi tenê cesaret û fedakarî çêdibe, ew jî di asta zêde de çêdibe, lê belê her cesaret û fedakariya bi serwextbûnê re nabe yek kor e. Rêbertî ji vê re got, *"Cesareta kor"* û mehkûm kir. Niha dibêje, *"fanatîzm, xeta întîharê."* Heke tavilê neyê sererastkirin dibe ku veguhere dijberê xwe jî.**

**Her cure cesaret û fedakartiya xwe naspêre fikir, bi bîreweriyê mirov rê nade ber û bê**

**armanc dibe ku her kêlî veguhere dijberê xwe. Rêbertî ji tarzên bi vî awayî re digot, *"Weke mayîneke bêarmanc û eletexmîn hatiye danin."* Bingeha meseleyê hinekî di vir de ye. Ev rewş qet nayê lêpirsînkirin. Ew qasî ji xwe bawer in ji rastiya tiştên dizanin û dikin ew qasî pir bawer in, wer bi awayekî çavsor dubare dikin. Heta dikarin xwe ferz jî bikin. Em ji tiştên ku em dikin û dibêjin hinekî guman bikin, dibe ku şaş bin. Ma hêza me ew qasî heye û em dikarin her tiştî bikin! Lê belê sekn û dîmenê di pratîkê de ev e. Piştî wiha be heta tu bixwazî perwerdeyê bike, têkoşînê bi rê ve bibe, pêşketin, dewlemendî, guhertin-veguhertin pêk nayê. Ji bo em xwe biguherin divê em hinekî lêpirsîn bikin. Hewce ye têkildarî pêkan e em hinekî şaş in û dixapin gumana me hebe. Lê ev nîne. Halbûkî Rêbertî got ku di destpêka her tiştî de gumanber e. Ji wir diyar kir ku xweza *"lêpirsînerî" ye*. 'Rêbertî wisa ye, em wisa ne û em mîlîtanên Apocî ne!' Ti eleqeya wê pê nîne. Xisûsa ku em mîlîtanên Apocî ne wê ji îddîayeke pûç û vala wêdetir neçe. Bûyîna mîlîtanên Apocî bi**

**awayê mirov xwe bi xisletên Rêbertî gurçûpêç bike pêk tê. Wekî din nabe. 'Ez ê jî li gor xwe bim, lê ez ê dîsa jî bibim mîlîtanê Apocî!' Ev tê maneya mirov xwe li ser Rêbertî ferz bike û revîze bike. Dibe valakirina cewhera wê. Divê wisa nebe. Mirov van lêpirsîn bike baş e.**

**Beriya her tiştî PKK bûyereke zîhniyetê ye. Em li ser serwextbûna li dîrokê û têgihiştina berpirsiyartiyê sekinîn. Me weke xisleta bingehîn a Rêbertî ya beriya dest bi partiyê bike bi nav kir. Eger partî jî qada ku Rêbertî veguheriye rêxistin û çalakiyê ye, wê demê zîhniyeta rê dide ber vê rêxistin û çalakiyê zîhniyeteke çawa ye. Zîhniyeteke vê partiyê heye. Tevgera Rêbertiyê ye û ji aliyê Rêbertî ve hatiye gewdekirin. Em bi bûyer, liv û tevgerên wer anormal, pir bûyerên hişê mirovan nagire re rûbirû tên ku zarok jî vê nakin. Em di rewşeke ku ji wêdetirî bîreweriya zarokan nabihure de dimînin. Bi zarokatiya wiha em nikarin biçin ti deverê, ma em ê kîjan serketinê bi dest bixin! Ev zaroktî ji ku tê, çima mezinbûn çênabe?**

**Têkiliya vê ya bi qirkirinê, komkujiyê re çi ye? Bi îhtîmaleke mezin ev rewş ji ber xwe ve derneket holê. Ji sedî sed hinek tiştan rê li ber vê vekirine. Em dibêjin, "Mêtingerî, qirkirin, faşîzm, zext, şîddet, girtîgeh, komkujî" û em dibihurin. Bandora van a li ser me çi ye? Mirovek di bin van de dibe mirovekî çawa? Bandora wan a li ser psîkolojî, sosyolojî, zîhniyet, hest û fikrên me çi ye? Ev hemû me weke kesayeteke çawa bi gewde dike? Divê mirov serê xwe bi van biêşîne û lêpirsîn bike. Eger wê xwerexnekirin çêbibe divê mirov li ser van lêhûrbûnan bike.**

**Li holê rastiyeke Rêbertî heye. Rêbertî li vir çareseriyek, sekn û pîvaneke cuda ye. Ji bo me hemûyan avantajek e. Eger wisa neba me yê nikarîba rastiyê bibînin û me yê gotiba, 'Jixwe em hemû wiha ne, em ferq nakin bê çi çi ye.' Lê cudatî di eniya Rêbertî de heye. Wê demê em rast li Rêbertî binihêrin, rast fêm bikin. Bi rastî jî em rastiya Rêbertî baş fêr bibin û li ser vê bingehê xwe lêpirsîn bikin. Destpêka gava mirov tevlî Rêbertî bibe û bibe**

mîlîtanê Apocî ev e. Divê mirov guhertin û veguherineke wiha bijî. Di vê mijarê de ji serneketinê wêdetir pêwîstî çênabe. Rewşeke wer heye ku jixwe xwe pir zane dihesibîne. Ev pêwîst nayê dîtin. Tê gotin, ‘Rêbertî cuda, em cuda ne’. Dîsa tê gotin, ‘Di navbera me de cudatî nîne.’ Her kes ji bo ji nav meseleyê derkeve li gor xwe hincetekê dibîne. Lê belê hincetên wiha şaş in. Mirov hinekî lêpirsîner be, bi fêmkirin û zanebûna jiyanê bijî girîng e. Belê em cesûr û fedakar bin, lê divê ev xwe bispêre bîreweriyê. Em hinekî bi dîtina pêşiya xwe cesûr û fedakar bin, yan na cesaret û fedakartiyeke kor a wiha, fedakartî û cesareteke ji bîreweriyê bêpar, ji lewra ji plan û rêxistinbûnê dûr dibe tiştekî weke mirov xwe diavêje nav agir. Dişibe mînmînîka xwe diavêje nav agir. Di şerê qaşo ji bo şewitandina dijmin em derdikevin rê em xwe dişewitînin. Em zêde li rê û rêbazên şewitandin-hilweşandina dijmin nagerin. Ne meseleye jî, hema hema xweşewitandin-xwehilweşandin dibe xisûsa destpêkê. Bi vî awayî tevlîbûna rast nabe. Dawerivandina

**xisletên Rêbertî nabe. Ji lewra mirov nabe mîlîtanê serketî.**

**Heke em ê perwerdeyê pêk bînin, em ji van deveran bigirin û xwe lêpirsîn bikin. Çima em wextê xwe ev qasî dikujin, xwe diwestînin. Madem em xwe ev qasî diwestînin, wê demê pêwîst e hinek tişt derkevin holê. Divê em hinek encaman werbigirin û vala neçin. Naxwe pêwîstiya me pê heye. Pêwîst e hinek guhertin derkevin holê ku ji ber vê em ev qas derfet û enerjiyê xerc dikin, xwe diwestînin û wext jêre vediqetînin. Wê demê divê encamên wê hebin. Em encam bigirin, bila di me de rê li ber hinek guhertinan veke, em xwe hinekî cuda bikin.**

**Eger em armanca wê nebînin, nizanîbin bê çima dikin em ê nizanîbin çawa bikin jî. Em ê nikarîbin tarz, uslûb û tempoyê pêş bixin. Mirov li şûna van rewşan di dema wê de lêpirsîn bike, li çareyan bigere û xwe bîne nuqteya ku kar û xebatan bi serketî pêk bîne, divê dema kar û xebat neyînî bibin jî mirov nebêje, ‘çima wisa bû’, nekeve nav reşbîniyê û**

**sekneke negatîf. Heke wisa nebe dibe ku mirov bireve biçe cem dijmin jî. Ev rewş di encama nebûyîna mirov de derdikeve holê. Hewce ye mirovatî bibe rastkirin û bihurîna van rewşan. Rêbertî got, "Di mirovbûnê de israr." Ji bo vê got. Ji vî alî ve em lêpirsîner bin. Em timî negatîf nebin û yên li derveyî xwe lêpirsîn nekin. Bi awayê em di çi rewşê de ne hinekî li xwe binihêrin û xwe lêpirsîn bikin. Ev qasî pozbilindî yan jî matbûn, hişkbûn û bûyîna weke hestî baş nîne. Rêbertî behsa nermbûna xwezaya civakî, nermbûna zîhnê mirov kir. Em çi qasî nerm in? Bi qasî lihevkirin hewce dike em nerm in, ew qas. Afirînerîbûn, lêpirsînerîbûn qet berê xwe nade semta me jî. Lê wer rast nîne, guhertin-veguherin wiha pêk nayê, em ê nikaribin xwe wer biguherin. Heta em pêşiya xwe nebînin, xwe serwext nekin, em ê nikaribin karê rêxistinkirî, serketî û rast bikin. Em ê nikaribin li hemberî derve bi bandor bin. Em ê nikaribin rê-rêbaza bê em ê çi bikin rast bibînin.**

**Ev hemû bi hêza fikir çêdibin. Eger ev nebin bi awayê, 'Ez ya herî rast dizanim' xweferzkirin derdikeve holê. Tiştên herî nabin li ser derdorê ferzkirin e. Ew bi xwe mat bûye, dixwaze derdorê jî mat bike. Ev hemû yek jî li ser navê niyeta baş û şoreşgeriyê çêdibin. Li ser navê cesaret û fedakartiyê çêdibin. Nakokiyên me yên wiha hene. Em hewl bidin nakokiyên xwe baştir, kûrtir bibînin, lêpirsin bikin û çareser bikin. Eger em nakokiya di xwe de nebînin, em ê wan çawa çareser bikin eger em ji xwe re nekin pirsgirêk em ê xwe çawa perwerde bikin? Em hinekî lêpirsîner û fikirdar bin. Em tarzê xwe yê fikir jî di ber çavan re derbas bikin, li ser sîstema fikir bisekinin. Parêznameyan hinekî bi awayê fêm bikin em bixwînin. Pêwîstî bi fêmkirinê heye. Em hewl bidin fêm bikin. Em hewl bidin têgîn û teoriyan bi naveroka wan fêm bikin. Divê bi ezberkirinê nebe. Hewce ye di vê nuqteyê de em sererastkirinê bikin.**

**Çi têkiliya van bi mijara me re heye? Partî hêzeke fikir e. Diyardeya zîhniyetê ye. Di fikir**

**de hêz, zîhniyet bi qasî hebe vediguhere rêxistin û çalakiyê. Beriya her tiştî sedema em behsa derketina holê ya Rêbertî dikin ji vir tê. Avabûna Rêbertiyê avabûna zîhniyetê ye. Em bala xwe bidinê li Kurdistanê pêşî çalakî û rêxistin çênebû. Rewşeke dê wisa bûna nemabû, yek jî bêyî zîhniyetê ev nabin. Pergala mêtinkar hêza fikir, hêza zîhnê civakê tine kiribû. Wê demê ji nû ve pêwîstî bi avabûna zîhniyetê, bûyîna hêza fikir heye. Tenê di asta ew hebûya wê rêxistin û çalakî karîba pêş bikevin. Sedema mesele bi gavavêtina Rêbertiyê dest pê kir, Rêbertî ev qasî girîngî da hêza fikir û perwerdeyê ji vir tê. Çi qasî tê pêkanîn? Rêbertî got, "Hûn a min ji sedî yek jî pêk nayînin." Wê demê em çi dikin? Naxwe em ya xwe pêk tînin. Naxwe em ew qasî xerîbê Rêbertî ne. Hevalan timî li navbera meqes nihêrîn. Wisa nîne, got, "Hûn ji sedî yek jî nikarin pêk bînin." 'Ji sedî yek' sifir e, ev jî dibe 'tineyî'. Wisa bi navbera meqes re eleqeyeke wê nîne. Dîsa jî tê maneya mirov ji xwe re par derxe. Tê navbera meqes çi qasî vekî diyar nîne, lê 'ji sedî yek' diyar e.**

**‘Ji sedî yek’ hebûnek nîne. Bi sifirê re wekhev e. Heke normal bihêlî jî derece ‘ji sedî pênc’ nîşan didin. Rêbertî ne niha beriya komployê jî digot, “Ez fikrên xwe tenê ji sedî pênc dikarim bidin pêkanîn.” Em ev qasî cesûr û fedakar in, lê divê em bala xwe bidin ser tiştên Rêbertî dibêje jî. Divê em çavdêriya wê jî bikin.**

**Baş e ma çima wiha dibe? Çima Rêbertî pratîka tê pêkanîn li derveyî xwe dibîne? Çima em ew qasî ji pratîka Rêbertî pêşbînî dike dûr in? Naxwe em li derveyî Rêbertî ne. Ev tersîtî ji cudatiya zîhniyetê tê. Bi zanebûn an jî ji niyeta baş nîne. Heke wisa bûya guhertina wê dê hêsantir bûya. Ya zehmet guhertina zîhniyetê, bidawîkirina cudatiya wê ye. Ji ber xwe cuda nabîne, di xwe de israr dike. Ji wî alî ve der barê derketina holê, gavavêtina Rêbertî ya li metropolê de, hinek derdoran got, “Çima ne li Kurdistanê li metropolê xwe rêxistin kir?” Heke hêza rastiya Rêbertî nebe, bi vî awayî jî têkildarî meylên redkirina Rêbertî hene.**

Halbûkî sedsala 19. derbas bû, sedsala 20. derbas bû. Em dîrokê dixwînin. Ji Silêmaniyê ku dest pê kir, heta Sine û Mahabadê, ji wir heta Dêrsim, Efrînê li her cihî tişt in çêbûn, lê encam neda. Rêbertî piştî wan derket holê. Eger dewameke wan û bi awayê dubarebûna wan bûya wê dawiya wî jî wekî wan bûya. Mêtingeriyê êdî zemîna gavavêtineke wisa ziwa kiribû, lewma ew qasî ji xwe bawer bû û di mijara deriyên Kurdistanê ji cîhanê re veke de neket fikaran.

Hewce ye mirov zanibe ku diyardeya PKK'ê guhertin û şoreşeke zîhniyetê ye. Gavavêtina Rêbertiyê şoreşeke zîhniyetê îfade dike. Rewşeke bîrewerbûnê ye. Rêbertî dibêje, "Min got jiyana wiha nabe." Ji ber li jiyaneke cuda digere. Ev guhertineke bîrdoziyê ye. Lêgerîna li tarzê jiyaneke nû, li xeteke bîrdozî ya nû ye û di nuqteya gihiştiyê de jî ber bi rêxistinbûnê gav diavêje. Biryara bûyîna rêxistinê bidestxistineke hêzê ye. Vê hêzê bi çareseriya di bîreweriyê de gihiştiyê bi dest dixe. Bi qasî xisletên jiyana nû fêm dike,

**dibîne wê hêzê bi dest dixe û biryara bibe rêxistin dide. Gavavêtina Rêbertiyê hatina asteke wiha îfade dike. Ya piştî wê veguhertina vê ya rêxistin û çalakiyê ye, yanî neqilkirina wê ya hêzên din e. Yek kes dibe, 3 kes dibe, 5 kes dibe, 50 kes dibe, 5 hezar kes dibe. Pêvajoya partîbûnê jî belavbûn û mezinbûna tarz û lêgerîneke jiyana nû ya li derdorê îfade dike. Neqilkirina wê ya li hêzên cuda û bi vî awayî mezinbûna wê îfade dike. Ev bi awayekî rast û têra xwe çi qasî tê neqilkirin? Çi qasî tê fêmkirin û pejirandin? Ev diyar nîne. Ew jî rewşeke bi nîqaş e. Zehmetî, pirsgirêk derdikevin holê. Ev qasî lawazî, cudatî û pirsgirêkên di nav partiyê de bi esasî ji vir derdikevin holê. Divê wer bê zanîn.**

**Em dibêjin, "Pirsgirêkên têkildarî partiyê, pirsgirêkên perwerdeyê, pirsgirêkên têkoşînê yên bîrdozî-rêxistinî." Hewce ye mirov gavavêtina bîrdozî wer fêm bike. Ev rewşeke qutbûnê ye. Gotina, "Ez ê wer bijîm" tê maneya mirov li jiyana nû bigere, ji pergala**

heyî qut bibe, ji bîrdoziya heyî qut bibe û li bîrdoziyeke nû bigere. PKK bû bûyereke wiha ya qutbûnê. Rêbertî qutbûnek e. Bi tena serê xwe sîstemeke cuda û sekneke bîrdozî ye, jiyaneke cuda ye. Rêxistinbûn jî tê maneya mirov vê neqlî hinekên din bike.

Navê wê li ser e, em dibêjin, "Koma Bîrdozî." Baş e ma bîrdozî çi ye? Tê maneya komeke xwe bi bîrdoziyê gurçûpêç kiriye, sekneke bîrdozî ya nû bi dest xistiye û gihiştiye tarzeke jiyanê ya nû. Divê em zanibin ev ji bîrdozî û pergala jiyana heyî qutbûn, bîrdozî û tarzekî jiyana alternatîf e. PKK bûyereke wiha ya qutbûnê ye. Rêbertî qutbûneke wiha ya ji pergalê diyardeyeke bûyîna bîrdoziyeke cuda ye. Cudatiya wê ya bingehîn a ji rêxistinên din ev der e.

Çepgiriya Kurd an jî Tirkiyeyê xisleta bingehîn a hemûyan, her çi qasî li ser bîrdoziyê bisekinin jî, bûyîna seriyekî pergalê, hebûna di nav wê de, dîsa her çi qasî ji hinek aliyan ve bixwazin bîrdozî û tarzê jiyana heyî rexne bikin û biguherin jî rewşa ku qutbûna

**jê û bûyîna tarzê jiyaneke alternatîf nadin ber çavan îfade dike. Du alî ye, hem pergalê bijî hem jî bi hinekî îtîrazê bixwaze biguhere, rewşeke wiha ne şoreşgerî reformîzm e. Kesên li hemberî faşîzma 12'ê Adarê li ber xwe dan şoreşgertî temsîl kirin. Wan jî çalakiya leşkerî dan pêşiya hêmana bîrdozî. Ji ber şer hat û ferz kir, di dema wê de nikarîbûn vê têra xwe bikin. Di dawiyê de helwesta xwe wer danîn holê. Yên paşê ne helwesteke çalakiyê ya wer danîn holê, ne jî maneya bîrdozî ya wê helwestê dîtin. Ji lewra sekneke bîrdozî ya li gor wê nikarîbûn nîşan bidin. Berevajî tesfiye çêbû. Ev tesfiye bi awayê ku ketin nav pergalê rû da.**

**Di pêvajoya darbeya leşkerî ya faşîst a 12'ê Adarê de tişta tevgera çepgir jiya ev bû. Bûn seriyê çepgir ê pergalê. Di nav pergalê de li dijî pergalê weke muxalefeteke sererastkirinê, hêzeke rexneyê hinek xisûsan naecibînin, dixwazin biguherin. Ev qas e. Qutbûna ji pergalê nîne. Tê hem bibî memûr hem jî bibî karker, di nav pergalê de weke heyî tê bijî, tê**

**bibî wezîfedarê dewletê û nîzama xwe ya malbatê ava bikî, tê hemû xisletên pergalê û dewletê bijî, lê belê hinekî jî tê biguherînî. Hinek aliyên nexweş hene, tu wan jî biguherînî mesele diqede. Nêzîkatiya çepgiriya Tirkiyeyê wiha bû. Rêxistinên din ên Kurd, rêxistinbûnên bi DDKD'ê re derketin holê jî wiha bûn. Jixwe PDK wiha ava bibû. Bi taybet PDK'ya li Başûr û bandora wê wer ne ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd e, ya rastî rêxistineke kontgerîla ye ya ji bo Kurdên di bin qirkirina çandî de tên tinekirin, ketine qilqalê û nizanin çi bikin bixe bin kontrola xwe hatiye avakirin.**

**Divê mirov wiha bêje: Rêxistina kontrolê ya nîzameke ku pergala mêtinkar-qirker ji bo berxwedêriya Kurd a muxtemel di bin kontrolê de bigire ava kiriye, dîsa rêxistina kontrolê ye ya li ser zîhniyet, hest, fikir, rêxistin û çalakiya civakê ye. Bila zêde li hember dernekeve, kar û xebatan berevajî neke. Ji ber vê dixwazin tevahî Kurdistanê bixin bin kontrolê. Ji bo Rêbertî jî bixin bin**

**kontrolê gelek soz dan, ketin nav hewldanan. Rêbertî ev hemû red kir. Ji ber dizanî û fêm dikir neket lîstikek wiha û neket bin kontrola wan. Hê jî gelek rexne dikin, wê demê jî rexne dikirin. Wiha hat gotin, "Li Başûrê Kurdistanê jî ew qas tişt hene, çima neçûne wir çûne Lubnanê." Ev tişt hatin gotin. Ev gotin ji PDK'ê bûn. Ji ber ji kontrola wê derketibû gotinên wiha jî hebûn. PDK ji bo bixe bin kontrola xwe xebitî, NATO ji bo bixe bin kontrola xwe hinek ji Ewropayê şandin. Ev rastiyek in.**

**PKK weke bîrdozî, qutbûna ji pergalê îfade dike. Ji lewra sekneke bîrdozî ya nû, tarzê jiyaneke nû dihewîne. Ji bo mirov bikeve vir, divê ji hemû xisletên jiyanê yên pergalê qut bibe. Ev jî têkoşînekê dixwaze. Ya rastî şoreşa kesayetê ji vir dest pê kir. Carek divê mirov têkiliyên bi pergalê re bişkîne. Di serî de malbat li dijî vê şikandinê derdikeve. Ji lewra divê mirov bandora malbatê bişkîne, ji malbatê qut bibe û li dijî vê têkoşînê bike. Ev qutbûn wiha pêş ket, ji ber xwe ve pêş neket.**

Yên nikarîbûn qut bibin di nav pergalê de man. Ji bo qutbûnê jî têkoşîneke mezin hewce dikir. Wer derketina çiyayan, çûna cihekî cuda nebû, tê hem di nav de be hem jî helwest bigirî. Ev hemû bi pevçûn û têkoşînê çêbûn. Heta li gelek deveran pevçûnên çekdarî rû dan. Pevçûnên pir cuda rû dan.

Yên nikarîbûn ji pergalê qut bibin, nikarîn tevlî PKK'ê bibin. Terîfeke pir xweş a Hz. Îsa heye. Dibêje, "Du tişt di nav hev de nayê jiyîn." Ji bo PKK'ê jî wiha bû. Tu nikarî du bîrdoziyan di nav hev de bijî. Hem di nav pergalê de bijî, hem jî weke Kurdê azad bijî! Hem ji pergala faşîst-qirker be hem jî bibe Kurdê azad! Ev ne mimkun e. Neçar bû yek an jî ya din qebûl kiriba. PKK'ê li vir jiyanek nû, hebûna azad, avakirin û berdewamkirina Kurdê azad temsîl kir. Kesên tevlî PKK'ê bûn bi vî awayî ji hemû têkiliyên pergalê qut bûn. Kesên karîbûn qut bibin bûn PKK'yî. Kesên hewl dan qut bibin, lê nikarîn qut bibin careke din vegeriyan nav pergalê. Di nav PKK'ê de bijartineke wer timî çêbû. Ji vî alî ve di

navenda avabûna koma bîrdozî ya PKK'ê de ev heye.

Ya duyemîn, eger tu qutbûneke wiha pêk tînî, bîrdoziyeke nû dipejirînî, tu dixwazî bikevî qadeke bîrdozî ya nû, wê demê tê wê fêr bibî. Tê rêgez û pîvanên tarzê jiyanê fêr bibî û bi bîrewerî bikevî nav. Ev jî bi perwerdeyê çêbû. Tevlîbûna nav PKK'ê bi gotina, 'ez tevlî bûm' çênabe. Tu dikevî qadeke jiyanê ya nû, wê demê tê xwe perwerde bikî. Tê xisletên qada jiyana tê bikeviyê fêr bibî. Tê xisletên xwe yên berê bişkînî, tê wan xisletên nû dawerivînî. Tê xwe biguherî û veguherînî, tê xwe perwerde bikî. Dema tu biçûk bû, derdora tu di nav de mezin bû te perwerde kir û kesayeta te ava bû. Lê niha tu xwe rêxistin dikî, bi zanebûn tu dikevî nav jiyan û rêyeke nû. Wê demê tê ji nû ve xwe bi xwe ava bikî. Şoreşa kesayetê xwe ji nû ve avakirin e. Tê maneya mirov xwe perwerde bike, xwe ji nû ve ava bike û biguhere. Divê mirov karibe vê kûr û radîkal bike. PKK di vê mijarê de pir kûr û radîkal bû, ji pergalê qut

bû. Bi kesekî, bi komeke biçûk re jî karîbû sekneke radîkal nîşan bide. Wê demê ev kar û xebat bi awayekî şoreşgerî û radîkal dimeşin. Lihevkirin nîne. Di qada bîrdozî de lihevkirin nîne. Jiyana dumendî yan jî bi hev re nîne.

Komê ev di navbera salên 1973-75'an di pêşengiya Rêbertî li Enqereyê bi awayekî pir bi bandor jiya. Rêbertî pêşî weke kakil malek ava kir. Paşê bûn du mal. Heval Hakî malek kirê kir, Rêbertî li du malan bi cih bû. Li dû wê zêdetir bû û jiyaneke nû ava bû. Mebesta min a ji 'malê' tarzê jiyana komunal e. Qada jiyanê, qada perwerdeyê, qada xebatê çêbû. Weke tarz jî neçar bû nîzama jiyana komunal û xebata kolektîf bi awayekî veşartî û îlegalîte pêş bixe, ji ber wekî din nebû.

Dem dema xebata terorîk û propagandayê bû. Hemû pirtûkxane lêkolîn kir, tevahî pirtûk xwendin. Ti agahî-zanînek nebû. Ji hemû pirtûkxaneyan her tişta aîdî Kurd jê biribûn, avêtin an jî ya girîngtir hatibû guhertin. Li şûna Kurd hinek tiştên din hatibûn danîn. Diviyabû mirov li van geriyaba

**û dîtiba. Hewldaneke pir mezin bû. Rewşeke wer bi hêsanî û rehet hatiba dîtin nebû. Teorî-fikir bi gotina Rêbertî, *"Bi xebateke mîna mirov bi serê derziyê bîr dikoland hatin derxistin."* Rêbertî tarzê xwe wiha îfade kir. Kar û xebat bi derfeteke wisa bi rê ve dibir, amûra di dest de tenê ew qas bû. Qutbûna ji pergalê, ketina nav nîzama jiyana komunal, xebata kolektîf û avakirina jiyaneke alternatîf, ev hê di destpêkê de di nav PKK'ê de hene. Her yek ji van hemûyan şoreşek e. Qutbûna ji pergalê di asta tu xwe biguherînî şoreş e. Di kesekî de şoreş, di sê kesan de şoreş, di komekê de şoreş, di ciwanan de şoreş, di jinê de şoreş, di civakê de şoreş. Bi vî awayî em gihiştin Şoreşa Vejînê ya Neteweyî. Her qutbûna ji pergalê, her ketina nav tarzê jiyana nû şoreşek bû. Jêre şoreşa kesayetê hat gotin. Cewhera şoreşa PKK'ê, cewhera guhertinê jî ev e.**

**Ji lewra divê mirov xisletên jiyanê yên heyî girîng bibîne. Mîna tiştekî wer rojane çêdibe tê dîtin. Halbûkî pir girîng e. Jixwe em ji wir**

**winda dikin. Em tarz û xisletên xwe yên jiyanê naxin bin kontrolê, kontrol nakin, lêpirsîn nakin û em dibêjin tiştên em dikin, pêk tînin rast in. Dema wer dibe jî di bîrdoziyê de hişkbûn çêdibe. Dema behsa kesê hişk û mat bûye tê kirin, ev derdikeve holê. Em ê kesayeta xwe li ser bingeha guhertin-veguhertinê bigirin dest.**

**Têkildarî koma bîrdozî mirov dikare van jî diyar bike: Avabûna xetê, cudatiyên wê yên siyasî-rêxistinî, tarzê wê yê xebatê çawa bi gewde bû? THKP-C û rêxistinên wekî wê gihiştibûn asta berxwedana çekdarî. Dema darbeya 12'ê Adarê lê da ew jî paşde ketin. Zêdetir veguherîn rêxistinên ciwanan, rêxistinên civakî. Ew xisletên xwe di nîvê duyemîn ê salên 1970'î de di têkoşîna çekdarî ya li hemberî baskê ciwanan ê MHP'ê û hêzên paramîlîter faşîst de bi kar anîn. Helwesta Mahîr, Denîz, Îbrahîman li hemberî dewletê nîşan dan, wan tenê dikarî li hemberî hêzên MHP'ê yên faşîst ên hêza paramîlîter a dewletê ne nîşan bidin. Di wir de jî qediyan.**

**Piştre dema darbeya 12'ê Îlonê çêbû û bi dewletê re rûbirû hatin rêya teslîmiyetê hilbijartin, berxwedan terk kirin. Ev rewşeke vekiriye. Tesfiye bûn. Çima? Ji ber gelek têgihiştinên wan hebûn. têgihiştina wan a dewlet, artêşê, têgihiştina wan a şoreşê, ya herî girîng jî nêrîna wan a li Kurdistan û pirsgirêka Kurd şaş bû. Rastiya Kurd-Kurdistanê înkar dikirin û nedidîtin.**

**Nêrîna şoreşgeran di serê salên 1970'î de nîşan dan kûr nekirin û esas negirtin. Şovenîzma sosyal serwer bû. Tevî PKK'ê, Rêber Apo anî rojeva siyasetê û bi awayekî ferz kir jî, xeteke wer teng, muhafezekar, înkarker, şovenîzma sosyal şopandin. Di nav de beşeke pir kêm guherî. Komên weke Kurtuluş Sosyalîst Dergî û hwd. çêbûn, lê ya esas temsîl nekirin. Her çû gotin, "Em Kurdan red nakin, lê pirsgirêka Kurd ne pirsgirêka şoreşgeran, pirsgirêka axayan e." Melîh Pekdemîr hebû. Li Skenderûnê konferansek li dar dixist. Digot, "Heke axa xwe rêxistin bikin, têkoşînê bi rê ve bibin û ev têkoşîn**

**bigihîje nuqteya avakirina dewletê, ha wê demê divê sosyalîst mudaxele bikin.” Zîhniyeta wan ew qas bû. Ne fikrek bû, wî jî ji tişta digot yeqîn nedikir. Tevgereke xapandinê bû. Bi esasî meyla azadîxwaz a li Kurdistanê pêş diket, nêzîkatiya ciwan û gelê Kurd a rêxistin kiriba û tevlî têkoşîna azadiyê bûba astengkirin bû. Dema wiha bû nikarîn Tirkiyeyê jî rast tehlîl bikin. Zîhniyeteke wiha nikarî bibe şoreşger. Eger ji berxwedanê çûbûn teslîmiyetê di encama vê de çûn. Xwestin li Kurdistanê dijberê berxwedanê pêş bixin. Ji bo jêre nebin destek ev kirin. Wisa ji ber xwe ve dest ji berxwedanê bernedan, bi sedema wê azadiya Kurd ji berxwedanê sûd bigire dest jê berdan. Ji bo sûd negire li ber xwe nedan. Ya esas ev e. Ev nebû zîhniyeteke şoreşger, bû zîhniyeteke darbekar. PKK’ê ev rexne kir û nikarîbû bi zîhniyeteke wiha re bibe yek. PKK ji van qut bû, têkoşîn meşand û bi rexneya şovenîzma sosyal hebû. Ji çepgiriya Tirkiyeyê qutbûneke wiha jiya. Xeta xwe li gor wê ava kir.**

**Rêxistinên Kurd, PDK û ekolên din, bingeha nakokiya di navbera wan de jî bîrdozî, stratejî û taktîk e. Di navenda ya bîrdoziyê de jî nîqaşa wesfê kapîtalîzma ketibû Kurdistanê hebû. Ev pir girîng bû. Hem bername û xeta bîrdozî hem jî felsefe diyar dikir. Wan formulasyonên teoriya sosyalîzma pêkhatî ezber dikirin û fikreke pir ezber a ji rewşeke berbiçav dûr diparastin. Sekna wan a pratîk û maddî derfet dida wê. Ev tê xwestin: "Kapîtalîzm dike netewe, li her cihî yekîtiya neteweyî pêş dixe, tevgerên neteweyî pêş xist, niha kapîtalîzm dikeve Kurdistanê jî, ji lewra wê kapîtalîzm netewebûnê pêş bixe, wê demê pêşverû ye. Ji ber li her cihî bi roleke pêşverû rabûye. Wê li Kurdistanê jî rol bilîze û divê em xwedî li kapîtalîzma li ser bingeha mêtingeriya nû pêş dikeve derkevin, li hember dernekevin. Ji bo zêdetir pêş bikeve divê em hewl bidin. Ji bo vê pirtir dibistan, pirtir rê, pirtir av-elektrîk." Ev jî dihat maneya ji zêdetir talankirina Kurdistana di bin mêtinkariyê de bila hinekî jî par bidin me, em baş bijîn. Li ser vê bingehê**

**dixwestin bi mêtinkaran re bazariyê bikin. Milliyetgiriya wan ew qas bû. Ti eleqeya wê bi azadiyê û Kurdîtiyê re nîne. Bernameyên xwe bi temamî di vê çarçoveyê de ava kiribûn. Têgihiştina DDKO û yên piştre wiha bû. Tarzê wan ê têkoşînê jî li gor wê ava dibû. Wê demê weke çepgiriya Tirk kiriye ji bo hinekî din par bidin Kurdan tê pergala heyî rexne bikî. Ji bo wê jî tê komeleya xwe ava bikî, rojnameyê derxî, kovarê derxî û nîqaşan bi rê ve bibî. Rêbertî ev red kir û di van nuqteyan de cuda bû.**

**Bandora ji sosyalîzma pêkhatî zêde bû. Jixwe ciwanên rewşenbîr ên Kurd li cihekî ku têkoşîna şoreşgerî lê nîne, rêxistin lê nîne nikarîbûn rastiyan bibînin. Tenê dikarîbûn tiştên li cîhanê hene hîn bibin, wan neqlî Kurdistanê bikin û li ser vî esasî têkoşîneke hevgirtî û bi bandor pêş bixin. Ew kirin, ya wê karîba pêk were ev bû û şaş nebû. Wê demê bi sedema, çima rastî nedîtin! Mirov nikare ciwanên rewşenbîr ên Kurd rexne bike. Ya diviyabû pêk were ev bû, ji bilî wê nedibû.**

**Eger paşê nikarîbû bike, wê demê diviyabû bê rexnekirin. Pratîka şoreşgerî çi qasî pêş ketiba heke li gor wê hilberîna fikir nekiriba dikarîbû bê rexnekirin. Rêber Apo ev kir.**

**Di vê demê de di cewhera nêzîkatiya afirîner a Rêbertî de ev hebû. Belê tiştên bi giştî hatine gotin rast in, got: "Teoriya Marksîst wiha ye", lê rewşa li Kurdistanê cuda ye. Xislet û karaktera têkiliyên kapîtalîst a derbasî Kurdistanê bû cuda ye. Ev kapîtalîzma mêtinkar e. Bi awayekî cuda nakeviyê. Ya rasttir kapîtalîzma qirker e. Netewebûnekê pêş dixe, lê li ser esasê qirkirinê dikeviyê. Netewebûn, ziman, çanda serwextbûna li dîrokê ya pê dixe aîdî Kurdan nîne. Dibe aîdî Tirkan. Armanc dike Kurdan tine bike. Ji lewra qirker e divê were redkirin û mirov li hember têbikoşe. Ev cudatiyeke fikir a girîng bû. Cudatiya her tiştî hinekî ji vir çêbû. Kesên xwedî li kapîtalîzmê derketin, xwestin zêdetir bikeve Kurdistanê. Kesên difikirîn kapîtalîzm qirker e jî qebûl kirin ku divê mirov ji eniyê li hemberî wê têkoşîneke**

dijwar bike. Bernameya PKK’ê li gor wê ava bû. Ya rêxistinên din jî li gor xwe çêbû. Di vir de cudatiyeke fikir û armancê ya bingehîn derket holê. PKK’ê ev rexne kir. Got, “Bûrjûvatiya biçûk a hatiye qebûlkirin, ji bo ji mêtinkariyê par werbigire milliyetgiriyê û civakê bi kar tîne.” Ev hemû rast bûn û hê jî wisa ye. Divê mirov vê zanibe û fêm bike. Hewce ye mirov ji hinek peyvên xweş hatine gotin yeqîn neke. Hewce ye mirov li naveroka tiştên hatine gotin binihêre.

Li aliyê din li gor sekn û armanca bîrdozî jî stratejî û taktîk pêş ket. Wan hêzan li gor armanca xwe xeta rêxistin û çalakiyê weke komele û kovargerî pênase kirin. PKK ji vir jî qut bû. Bi awayekî stratejîk û taktîk jî ji wan qut bû û got ku rêxistina wê bi komelgerî û kovargeriyê bê avakirin, dê nikaribe ji bo azadî û rizgariya Kurdistanê têkoşîn bike, wê nikaribe fîskeyekê jî li mêtingeriyê bide. Diyar kir ku wê demê hewce ye rêxistinbûn ciddîtir be, veşartî be, mirov li gor şer xwe amade bike û kovargerî û komelgerî red kir. Veşartî

xebitî, li malên komun xwe rêxistin kir, mal kirin qadeke perwerde, jiyan û xebatê. Ji malekê dest pê kir, li Enqereyê bûn 3-5 mal, neqlî Kurdistanê bûn gihiştin bi sedan malan. Ev li gor asta rêxistinbûnê weke navenda xebatê ya her komîte yan jî yekeyê rol lîstin.

Ne rojname û kovargeriya di tarzê propagandayê de, propagandageriya devkî bi kar anî. Her kadroyek weke rojnameyekê, kovarekê tevgeriya. Diviyabû di wê astê de teorî û xetê zanibe. Di rêxistinbûnê de rêxistinbûna veşartî esas girt, komelgerî red kir, îlegal xebitî. Di serî de malên xwendekaran her çû di nav sîstema malê de xwe rêxistin kir û pêş xist. Ev tarz tarzekî rast bû. PKK ber bi çalakiyan ve dibir û ew diparast. Yên din nikarîn vê bikin.

Dema di nav rêxistinbûneke wiha de jî deşîfre bû, dîsa li ser agahiyên ku Şahîn Donmez dan, girtin çêbûn. Yan na di PKK'ê de ev qas girtin çênedibûn. Têkildarî rêxistinên din dewletê dema xwest di rojekê de hemû endamên wan girtin. Tenê kesên berê

**çûbûn hinek deveran rizgar bûn. Di pêvajoya êrîşên 12’ê Îlonê de endamên hemû rêxistinên din ku hatin girtin, tevî hêza dewletê-îstixbaratê bi awayekî qat bi qat zêdetir êrîş kir jî PKK’ê xwe parast û têkoşîn domand çavkaniya xwe ji vê girt. Di tarzê rêxistinbûn û têkoşînê de jî cudatî çêbû. Xeta heyî weke reformîst, lihevkirin û teslîmiyet bi nav kir. Ev zîhniyet û tarzê xebatê weke milliyetgiriya bûrjûvaya biçûk îfade kir. Ji vê meylê re got, milliyetgiriya bûrjûvaya biçûk an jî teslîmiyetkar a reformîst. Weke meyla çîna navîn dît.**

**Milliyetgiriya PDK’ê jî weke milliyetgiriya pêşî bi nav kir. PKK, ji van her du sekn û xeta milliyetgir qut bû û weke xetekê hebû. Rêbertî ji ber xwe ve ku tevî bi yên din re bi heman awayî difikirî berê xwe neda kom an jî rêxistineke cuda. Ji ber fikrên cuda hebûn bû rêxistineke cuda. Tevî vê dîsa jî tifaq çêkir, xwest bi çepgiriya Tirkiyeyê jî bi rêxistinên Kurd re jî di nav eniya hevpar de pêkve**

**bixebitin. Lê belê ew hêz neketin nav vê qebûl nekirin.**

**Di encama wê de ji serê sala 1976'an ve li ser esasê pêşxistina rêxistinbûna xwe pêvajoya daneheva xwe ya koma bîrdozî neqlî Kurdistanê bike pêk hat. Jixwe nîzameke têkilî û xebatê ya diyar hebû. Piştî wê ya hat guhertin ew e, wê navenda xebatê ya esasî ku derê be. Di nav sê salan de bi hewldaneke zêde ne bi plan û rêxistinkirî li Kurdistanê ji bo meşandina xebata şoreşgerî têra xwe hêzeke kadro yan jî endamên kadro derket holê. Bîreweriyek hat derxistin. PKK'ê xwe weke nasname bi nav kir. Hêzên din gotin, "Apocî". PKK'ê îtîrazî vê kir. Îtîraz ji ber Rêbertî deşîfre dikir bû. Ji lewra dikarî êrîşên dijmin zêdetir bike. Yan na îtîrazeke wê ya din nebû. Dema di vê de zehmetî kişand xwe weke "Şoreşgerên Kurdistanê" bi nav kir, terîf kir. Ji ber behsa Artêşa Rizgariya Neteweyî dikir hinekan got, "UKO'cî". Navên curbicur lê kirin. Lê belê "Koma Bîrdozî" bi awayekî fermî xwe weke "Şoreşgerên Kurdistanê" bi**

nav kir. Bi vî awayî jî neqlî Kurdistanê bû. Li ser wê bingehê daxuyanî da, belavok weşandin. Ji rêxistin û komên din weke nasname jî cudatiya xwe li ser esasê binavkirineke wiha nîşan da.

## Pêvajoya Beriya Damezirandina Fermî ya PKK'ê (1976-1978)

Pêvajoya piştî sala 1975'an li Tirkiyeyê bû pêvajoyeke şerê navxweyî. MHP hat bikaranîn. Desthilatdariya Ecevît-Erbakan a di dawiya 1973'yan de bi hilbijartinê hat avakirin, havîna 1974'an belav bû. Şerê Qibrisê dan destpêkirin. Piştî şerê Qibrisê di navbera wan de nakokî pêş ketin. Bi efûya giştî û şerê Qibrisê hinekî bandor çêkiribûn.

Hesabên weke wê encamên wê CHP an jî MSP werbigire, hatin kirin, Ecevît kişand aliyekî, Erbakan kişand aliyekî. Meyleke di nav CHP'ê de wer hesab kir ku encamên şerê li Qibrisê dikare di hilbijartina nêz de ji bo CHP'ê veguherîne dengan û dengên wê zêde bike. Hikûmeta Ecevît dest ji kar berda. Bendewariya hikûmet nikare bê avakirin û wê hilbijartin pêk werin hebû. Lê wisa nebû. Demîrel siyasetmedarekî hoste bû. Dema koalîsyona CHP-MHP'ê dît, wer nirxand ku li derve hatiye hiştin, eger vê rewşê neguhere wê timî li derve bê hiştin, pêkan e ji rêveberiyê bê xistin û berê xwe da polîtîkayeke nerm. Vê carê bi MSP Û MHP'ê re hevdîtin pêk anî û biryara avakirina koalîsyoneke sê partî hat girtin. Di vê mijarê de tawîz dan. Di MHP'ê de tenê parlamenterek hebû, ew jî serokê giştî Alparslan Turkeş bû. Alîkariya Serokwezîriyê danê. Bi vî awayî CHP li derve hat hiştin. Sê partiyên din hikûmet ava kirin. Weke "Hikûmeta Eniya Milliyetgir" jêre (Hikûmeta MC) hat gotin. Turkeş bû alîkarê serokwezîr. Wezîrtî bi dest xist. Karên kadastro û gelek

tiştên din bi wê derê ve girêdan. Bi vî awayî ji MHP'yiyan re derfetên maddî çêbûn. Meaş dan hinekan, bandoreke mezin bi dest xistin. Tevgereke ciwanan a jêre "Ulkucî" dihat gotin hebû. Ji baskê ciwanan ê MHP'ê hinekî cuda bû. Lê meyla wê jî li ser MHP'ê bû. Kontrgerîla di nav de rêxistinkirî bû. Hem hewldana kontrgerîla ya dixwest çepgiriyê asteng bike, hem jî MHP'ê ku di hikûmetê de wezîrtî bi dest xist ji sala 1975'an û şûn ve di bin navê şerê rastgir-çepgir de Tirkiye ber bi şerekî navxweyî ve çû. Di bin navê Ulkuciyan de her roj li her qadê li hemberî rewşenbîr, hunermend, nivîskar û bi taybet hêzên ciwanan ên şoreşger êrîşên her çû zêde bûn hatin pêşxistin. Li hemberî wan jî rêxistin û komên şoreşger xwe rêxistin kirin, plansazî çêkirin û ketin nav berxwedanê. Her yek di astên cuda jî de be ketin nav têkoşînê. Lê hinekan bi berxwedana çekdarî bersiv dan êrîşên çekdarî. DEV-YOL'ê ew berxwedan meşand. "Yekîneyên Berxwedanê yên Antî-Faşîst hebûn. Hinek neketin nav têkoşîneke wiha, lê faşîzmê hemû kirin armanc. Nîvê

**duyemîn ê salên 1970'î li Tirkiyeyê asteke şerê navxweyî yê wiha îfade kir. Girîng bû, pevçûneke dijwar bû. Bîlançoya rojane bi rastî jî zêde bû. Ji ber ti pîvan nebû, çalakî û êrîşên beramberî hev çêdibûn. Hinek tiştan kê dikir jî diyar nedibû.**

**Zemîneke girîng a vê rewşê Kurdistan bû. Vê rewşê bi awayê tifaqa polîs û faşîstan, paşverûtiya xwecihî û avahiya sîxur bandor li Kurdistanê kir. Li Kurdistanê jî van hêzan, polîs, hêzên MHP û paşverûtiya xwecihî, tevna sîxur-ajan bi awayê ku her çû zêde bû ketin nav êrîşan. Van li ser civakê bandorek çêkiribûn. Di xebatên propaganda û rêxistinbûnê yên ji bo mirov gihiştiba beşên dînamîk ên civakê de diviyabû ev beş were bêbandorkirin. Her çû bi van re pevçûn çêbûn. 18'ê Gulana 1977'an li Dîlokê ji aliyê koma sîxur provokator a Stêrka Sor "Pênc Parçeparêz" ve heval Hakî Karer hat qetilkirin.**

**19'ê Gulana 1978'an li Hîlwanê bi tifaqa polîs û tevna sîxur-ajanan hevrê Xelîl Çavgun**

hat qetilkirin. Hem ji bo şikandina van êrîşan hem jî ji bo gihiştina civakê û perwerdekirina wê diviyabû mirov vê tevnê belav bike. Ji bo vê li hemberî van beşan her çû di asteke ku zêde bû têkoşîn pêş ket. Pêkanîna şîddeta şoreşgerî ya PKK'ê li hemberî van çêbû. Bi vî awayî taktîka têkildarî pêvajoya partîbûnê Rêbertî di manîfestoyê de weke, "Li hemberî avahiyên sazî û kesên bûne sîxur li ser esasê şîddeta şoreşgerî taktîka têkoşînê" bi nav kir. Hedef wer dihatin diyarkirin û çalakiyên şoreşgerî yên ferdî weke çalakî pêş ketin.

## -Vegera Koma Bîrdozî ya li Kurdistanê

Ji bo vê pêşî rêxistinî hewce bû. Vegera li welat li ser esasê înîsiyatîf û rêxistiniya komê çêbû. Bi riza dilê xwe esas bû. Rêxistinek li holê nebû, lê komeke li derdora Rêbertî ava bibû û ji lewra jî komeke rêxistinkirî bû. Navê wê nebû, fermiyeta wê nebû, lê di fiîliyatê de

**koma herî bi disîplîn koma Apocî bû. Dema ji derve lê dihat nihêrîn bi awayê rêxistiniyeke bi heybet heye dinirxandin. Di tarzê liv û tevgera wê de ew disîplîn hebû. Rêbertî disîplîneke wiha ava dikir. Ji ber rêxistin ava dikir, her çi qasî dema wê ya amatoriyê jî bûya, tevlîbûna bi awayê bi riza dilê xwe bûya, têgihiştina xeta milliyetgir a reformîst rexne kiribû, ew sist, bêdisîplîn û legal didît. Pêşbînî dikir rêxistineke ji van hemûyan dibihure, xwedî disîplîna ji pola û xwe ji şer re amade dike ava bike. Vegera li welat di nav rêxistiniyeke wiha de çêbû. Kesên xwestin û yên karîbûn ji pergalê qut bibin vegeriyan. Veger bi riza dilê xwe çêbû. Lê belê her xebata li Kurdistanê bi agahiya Rêbertî çêbû. Bi qismî bi plansazî bû, encamên wê timî weke rapor ji Rêbertî re hat ragihandin. Materyalên nivîskî nebûn, ew hemû bi devkî dihatin neqilkirin. Bi devkî weke rapor hat pêşkeşkirin.**

**Di vegera li welêt de PKK'ê bijartineke din a duyemîn jiya. Dema li Enqereyê kesên tevlî Kawaciyan bibûn ya rastî ji komê hatibûn derxistin. Her kesên bi awayên curbicur tevlî komê bibûn venegeriyan. Kesên nikarîn ji**

**pergalê qut bibin, her çû di nav têkiliyên pergalê de man jî çêbûn. Bi vî awayî hinek man. Kesên weke şoreşgerên profesyonel ji pergalê qut bûn, biryara vê dan vegeriyan Kurdistanê. Divê ev jî bê zanîn. Divê mirov wer nefikire ku her kes bi rehetî vegeriyaye û heman helwest nîşan daye.**

**Di vegera li welêt de armanc ciwanên hîndekariya navîn, lê bi esasî ciwanên xwendekarên lîseyê bûn. Bi qismî jî enstîtuyên perwerdeyê bûn. Dîsa hinek fakulteyên girêdayî zanîngehên li Tirkiyeyê li welat dihatin vekirin. Ciwanên lîseyê esas bûn û zêde bûn. Mamoste û memûrên curbicur, civakên hinekî serwext bibûn, bi karên curbicur re mijûl dibûn hebûn. Doktor û parêzer hebûn. Beşeke hinekî serwext û bibû bûrjûvaya biçûk hebû. Girseya dihat armanckirin ev bûn. Qada ev girseya dihat armankirin lê kom bibû bajar bûn. Em bala xwe bidinê ev beşên me destnîşankirin li bajaran bûn. Li bajarokan lîse nebûn. Bajarvaniyeke wiha jî zêdetir li herêma navîn**

**a di navbera Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê de çêbû. Rêbertî niha herêma di navbera Başûrê Kurdistan û Iraqê de weke "Herêma Navîn" terîf dike. Herêma ji Şengalê heta Germiyan e. Li Bakurê wê herêma navîn heye. Qadeke ji Dîlokê heta Semsûr, Meletî, Dêrsim, Serhedê dirêj dibe. Cihên zêdetir bajarvanî lê hebû, beşa rewşenbîr, ciwanên xwendekar lê kom bibûn ev der bûn. Ji lewra ev der bûn qadên xebatê. PKK di vê zemînê de ava bû û derket holê.**

**Ev zemîn zemînên şoreşger bûn. Dîlok bajarekî şoreşger bû yê her roj çalakî dihatin lidarxistin. Derya Reş jî wisa bû. Tişta Derya Reş anî vê rewşê, şerê taybet bû. Em bala xwe bidinê li Kurdistanê jî mînaka wê heye. Dîlok cihê herî şoreşger û qada herî zêde PKK'ê xwe rêxistin dikir bû. Niha cihê hema hema herî zêde lê lawaz e. Wer tê zenkirin ku li wan deveran xebata rêxistinê nikare bê kirin, halbûkî PKK li wan qadan ava bû. Naxwe heke mirov bixebite, israr bike û li gor xisletên qadê nêzîk bibe wê pêşketin çêbibe. Lê eger**

**xebat çênebe wê pêşketin çênebe, yek jî heke şerê taybet bixebite dibe ku ew bi ser bikevin. Çawa li gelek qadên Tirkiyeyê bi ser ketin, deverên li Kurdistanê jî bi ser ketine hene. Ev qasî bi bandor û tevî hebûna PKK'ê çêbû. Ji lewra mirov dikare bi nihêrîna li vê rewşe li Tirkiyeyê derketiye holê baştir fêm bike. Pêwîst e mirov vê qadê jî wiha zanibe.**

**Mirov nikare bêje ku di vegera li welêt de 'ti têkilî nebûn, bi vî awayî veger çêbû.' Ne wisa bû jî. Helbet ciwanên ji Kurdistanê çûbûn zanîngehan hebûn. Her kes di betlaneyên havînê de diçû herêma xwe. Ji lewra derdoreke nas dikirin û têkilî pêş xistibûn hebû. Di nav 3-4 salan de derdoreke wiha çêbibû. Bi taybet tevneke têkiliyan a berfireh a Rêbertî ya ji Dîlok, Riha heta ber bi Semsûr, Amedê dirêj dibû hebû. Nîqaş kiribû, mirovên şoreşger nas kiribû û hinekî dihat naskirin. Ji ber fikrek wî hebû û nîqaş dikir.**

**Li aliyê din kom li Enqereyê ava bû. Enqere jî cihê ku karên dewletê lê tên meşandin e. Pirsgirêkên Kurdan ên bi dewletê**

**re jî pir in. Bi dewletê re meşandina karê xwe çûn û hatina wan a Enqereyê zêde bû. Ji bo çareserkirina karê xwe, weke xwendekar ji bo ezmûnan û karibin bikevin deverên curbicur dihatin. Ji bo Enqereyê timî çûn û hatin hebû. Di xebatên li Enqereyê de bi wan kesên dihatin û diçûn re jî têkilî dihatin çêkirin. Hezîrana 1976'an ezmûna zanîngehê hebû, wê demê têkiliya komê bi sedan ciwanên ji bo ezmûna zanîngehê hatibûn Enqereyê re hebû. Bi wan re têkilî çêkir, rê da ber wan, civîn li dar xist. Kom ji bo xwendekar bikevin ezmûnê bi wan re bû alîkar. Ji bo li Enqereyê bimînin cih ji wan re dît. Nîzameke wer a têkiliyê jî hebû. Têkiliyên li ser vê bingehê çêbûne jî hebûn.**

**Yek jî tarzê xebata komê îlegal bû. Komele, kovar û navê wê nebû. Dixwest bibe gewde, her tişt bi propaganda û nîqaşa devkî dikir. Bi têkilî û xebata veşartî bi rê ve dibir. Lewma diviyabû girîngiyê bide têkiliya bi mirovan re. Têkilî dîtin, avakirina têkiliyan, şopandina wan û nirxandina têkiliyên biçûk girîng bû. Ji**

**bo serketin û pêşketinê şaxê mirov xwe bi wan ve girtiba ev bûn. Ji lewra nêzîkatiyeke wê ya wiha jî hebû. Girîngî dida têkiliyên bi mirovan re. Lêgera têkiliyan bû. Dema têkiliyek biçûk didît tavilê girîngî didayê. Red nedikir û bi awayê 'tiştek nabe' ji ser guhê xwe re nediavêt. Yek jî hestyariyeke wiha hebû. Di atmosfereke ku têkilî û naskirineke kêm hebû, xebatên şoreşger ên profesyonel zêdetir fikrên koma Enqereyê ava kiribû, neqlî ciwanên rewşenbîr ên li Kurdistanê kir, û berê xwe da xebateke bi armanca li wir bibe kom, li Kurdistanê li bajar, navçe û taxên Kurdistanê bibe kom û rêxistin.**

**Tevahiya sala 1976'an li gelek qadan xebatên wiha hatin kirin. Têkiliyeke herî biçûk jî hat nirxandin. Ji her cihî li têkiliyeke wer geriyan, dema têkiliyek dihat bihîstin, dan pey û wer xebitîn. Hevrê Kemal Pîr li dadgehê digot, "Eger hewce kiriba 3 saetan, hewce kiriba 300 saetan em axivîn, lê ji sedî sed ji bo kesekî em nas dikin tevlî rêxistinê bikin em xebitîn." Heval Mazlum jî got ku li Êlihê di**

**nav baxçeyan de radiza, li kolanan dima, bi rojan tî-birçî dima, ji bo atmosfereke jiyanê ava bike xebitî, li ber xwe da têkilî û derfet ava kirin. Tarzê xebatê wiha ye. Berxwedêriyek hewce dikir. Dema mirov dida pey têkiliyekê, ew kiriba sempatîzan bi wê re li wir wê potansiyela ciwanan a heyî dihat naskirin, nîqaş dihatin kirin û bi awayê qezenckirina alîgiran xebatek dihat meşandin.**

**Li Tirkiyeyê jî kom hê nû ava dibûn. Atmosfer bi liv û tevger bû. Bi faşîstan re di pevçûnên bîrdozî, siyasî heta yên leşkerî hebûn. Atmosfereke têkoşînê ya zêde bû. Bi hilbijartina Cotmeha 1973'yan re mirov vegeriyan jiyana sivîl, lê li Tirkiyeyê têkoşîn neqediya. Li ser mîrasa berxwedêriya 1971'ê bi dehan rêxistinên nû, kom derketin holê. Van bi awayekî têkoşîna bîrdozî-pratîk meşandin. Her çû têkoşîna girseyî kûr bû. Têkoşîna karker, xwendekar û memûran dewam kir. Pergalê jî bi guhertinên faşîst ên li ser bingeha darbeya 12'ê Adarê pêk anî, li hember civakê zext û êrîş zêde kir. Vê her çû**

nakokî û pevçûn kûr kirin. Vê jî bandor li ser Kurdistanê kir. Li Kurdistanê jî heman rewş dewam dikir. Liv û tevgereke civakî, hestyariyek hebû. Ciwanan û komên din hewl didan xwe rêxistin bikin. Di ciwanan de lêgerîn û hestyariyek hebû, lê belê di nav atmosfereke wiha de mirov fikra rast biriba û bi dest xistiba girîng bû. Li ser vê bingehê xebatek hat meşandin. Dema çûna li ser vê atmosferê pêk hat, hinekî israr hat kirin, hinek rastî hatin gotin, derfetên dîtina alîgiran, avakirina komê û rêxistinê çêkir. Zêdetir xwe spartin ciwanên xwendekar. Bi rêya malên xwendekaran xebatên rêxistinbûnê hatin domandin. Li Dîlokê di asteke girîng de ciwanên karker ên ji Rihayê û deverên din ên Kurdistanê hatibûn Dîlokê hebûn. Ev kes di kargehên biçûk de dixebitîn. Ew jî potansiyeke girîng bûn. Wê demê Edene navendeke karkeran bû. Li wir pêşxistina têkiliyan pêkan bû. Heval Hakî 1976'an li Edeneyê xebitî. Ji wir derbasî xebatên li Dîlokê bû. Berê çûbû Êlihê. Dema li wir ziman

**bû pirsgirêk, guhertin çêbû. Heval Mazlum çû. Guhertinên bi vî rengî çêdibûn.**

**Hinek agahî, propaganda û hêza îqnayê girîng bû. Zêdetir israr û îddîa girîng bû. Hevgirtîbûn girîng bû. Hevgirtîbûn jî ew e mirov li gor tiştên dibêje dijî û yek jî tiştên dibêje pêk tîne, têkoşer e. Lêgerîna nû ya ciwanan li ser vê bingehê bû. Pêwîstî bi tarzê jiyanê û fikrên nû hebû. Dihat xwestin ku têkoşîn bê meşandin. Kom dînamîk bû, êrîş û zext hebûn. Dixwest li hemberî van êrîş û zextan têkoşîna aktîf pêş bixe. Bi vî awayî xebat bi giranî li herêma navîn heta Amed, Mêrdîn û Serhedê dirêj bû. Di pêvajoya vê xebatê de komê nikarî derbasî Botanê bibe. Mêtinkariyê di ser Mêrdînê re çûna komê bi plansazî asteng kir. Di ser Serhed-Wanê re jî pir bi bandor nebû. Biryareke bi awayê, “Divê PKK, nikarîbe bikeve Botanê, nikaribe ji Mêrdînê bibihure.” Ev biryareke mêtingerî bû, bi awayekî bi bandor û aktîf hewl dan wê biryarê pêk bînin.**

**Têkildarî xebatên vê demê mirov dikare du tiştan diyar bike: Ya yekemîn xebat li ser çi meşiyan? Li ser bîrewerî, îrade, ked û îddîayê meşiyan. Pêwîst e mirov vê diyar bike. Li ser derfetan nemeşiya. Heke bi derfet, kadro, çek, pere, têkiliyan mirov biba rêxistin wê PKK nebûya. Ji ber ev nebûn. Rêbertî got, *"Me ji sifirê dest pê kir, rêxistin û têkoşîn pêş xist."* Musa Anter got, "Piştî ji 30'ê di bin sifirê de me anî sifirê çêbû." Yanî sifir jî nebû. Ketibû jêrtir jî. Pergala mêtinkar-qirker bi rastî jî rewşa li Kurdistanê anîbû nuqteya tinebûnê. Rêbertî got, *"Mirovekî Kurd ê nekirine ku xiyanetê bi rastiya xwe re bike nemaye, rêxistiniya wî hatiye belavkirin, bîreweriya wî hatiye parçekirin, îradeya wî hatiye şikandin, ji nirxên xwe yên bingehîn hatiye qutkirin, ji civakbûnê dûr ketiye, wer lê hatiye ku ji bo mirîşkekê dikare li ciranê xwe bixe, lê ji bo xak, welat, gel, û azadiyê xwe ji cihê xwe nalivîne, wê nabîne."* Rastiyeke jiyanê ya ew qasî ji rê hatiye derxistin heye. Komkujî, êrîşên faşîst-qirker li ser ferd û civakê pir bi bandor bû. Di dubarekirina vê de ti fikare nîne. Pergalê**

**yeqîn kiribû ku bi ser ketiye û ev wisa ne xapandineke pir kêm jî bû. Divê mirov wer nefikire. Tiştên xwe dispartinê hebûn, hîmên wê yên maddî hebûn.**

**Lewma di xebata PKK'ê de derfeta maddî nîne. Her kesî jiyana pergalê bi pişta destê xwe dahf da û li ya nû geriya. Ji vî alî ve ev felsefeyek e, yek jî nêzîkatiya bîrdozî ye. Kadrobûn ne ew e mirov derfetên rêxistinê yên heyî bixe û biqedîne. Berevajî ew e, divê mirov ji rêxistinê re derfetan çêbike. Rêber Apo got, *"Hevrê ew kes e serê hevrêyê xwe digihîne stêrkan, derfetên hevrêyê xwe naqedîne."* Ev rewş bi tenê xweserî wê demê nebû. Piştî wê jî timî wisa bû. Gerîla jî wer hat wezîfedarkirin, mirov bê kurye ketin qadan. Bi pisûlayekê ji seriyekî Kurdistanê ketin hundir ji seriyên derketin. Bêyî xwe bispêrin ti derfet û têkiliyan wan bi xwe ava kirin. Şoreşgerî karê avakirina derfetan bû, ji şoreşê re avakirina hêz-derfetan, karê avakirina şoreşê. Kesê ji şoreşê re derfetan û rêxistinê ava bike, bi rehetî dikare xwe xwedî bike.**

Şoreşgeriya bi pere û derfeta maddî di PKK'ê de nîne. Ev têgihiştina milliyetgiriya pêşî û milliyetgiriya reformîst bû. Di PDK û YNK'ê de wiha bû. Bi meaş bûn. Tu tevlî partiyê dibî, dibî kadro, pêşmerge û meaş digirî. Jixwe gelek ji ber vê tevlî dibûn. Wan jî pere peyde dikirin, meaş didan û mirov li dora xwe kom digirtin. Dema hewce dikir, didan şerkirin jî. Di PKK'ê de wisa nîne, PKK cuda ye û pêwîst e mirov vê rewşa ku cuda ye bibîne, fêm bike. Divê mirov vê qebûl bike. Xeta bi ser ket, ev xet bû. Pêwîst e mirov ji rastiya wê jî yeqîn bike. Ji ber pratîkê ev piştrast kir. Berê delîleke wiha nebû, zehmetî hebû, lê niha piştrast bû.

Hevalan bê çawa dixebitîn di dadgehan de anîn ziman. Hevalê Karasu got, "Em Dîlokê daketin. Em birçî ne, bi pereyê di bêrîka me de tenê ji bo carekê em dikarin xwarinê bixwin. Têkildarî em bixwin an jî birçî bimînin em fikirîn. Me xwarin xwar, piştî wê aîdî me ye. Heke em bixebitin em ê bijîn. Êdî tê xwe çawa bidî jiyîn girêdayî afirînerî û

**hostetiya te ye." Kar û xebat wer meşiya, bi vî awayî wezîfe hat wergirtin. Li ser vê bingehê çûna kar çêbû. Dema wezîfe tê wergirtin rutbe nayê wergirtin, wergirtina wezîfeyê ya rastî wergirtina mafê xebatê ye. Bi awayekî mafê xebatê werdigire. Rêbertî got, *"Di nav PKK'ê de wekhevî heye."* Di PKK'de wer rutbecîtî, rayedarcîtî, hiyerarşî nîne. Ev ji bo civakekê ne xwedî hukm in. Heval Mazlum di kongreya yekemîn de bûyîna Komîteya Navendî û endamtî weke hev girt dest. Rêbertî ew xet esas girt. Ha tu bûyî endam, ha tu bûyî navend. Navendbûn karbeşiyek e, tê maneya te wezîfe hilgirtiye. Karkirin e, tê maneya te wezîfe hilgirtiye. Dibe karbeşiyek. Ji bo kirina hinek karan wergirtina wezîfeyê ye. Yan na wer îmtiyazeke wê nîne. Tu dibî Komîteya Navendî, Komîteya Herêmê, Hucreya Çalakiyê. Ev hemû karbeşî ye. Tê 24 saetan bixebitî. Wê kî çi karî bike îfade dike. Yan na wisa ti ferqa wan ji hev nîne. Divê nebe. Partî ferq û cudatiyeke wiha nahewîne. Ev di PKK'ê de nîne.**

**Di nav partiyê de jî eger em ê ji pirsgirêkên rojane yên em bi wan re rûbirû tên li çareseriyan bigerin, wê demê em ê li dîroka partiyê binihêrin. Em ê di dîrokê de li çareseriyê bigerin û Rêbertî got, "Dîroka fermî ya PKK'ê girîng e, lê dîroka beriya damezirandinê girîngtir e." Naxwe dema koma bîrdozî, xebatên li Enqereyê, vegera li Kurdistanê, dema koma ciwanan a li Kurdistanê, xisletên bingehîn ên pêvajoya partîbûnê girîng e.**

**Yên PKK'ê diyar dikin ya rastî ew in. Naxwe pîvanên wê demê girîng û diyarker in. Xisletên PKK bi wan ava bû, di vê demê derketin holê û bi gewde bûn. Îro jî hukmê van heye û rê nîşan didin. Divê ev rastî bê zanîn. Em ê ji vir ders werbigirin, lê em ê çawa bifesilînin li gor wê nêzîkatiyeke avaker û rast pêwîst e. Pirsgirêkên çareseriyê dixwazin pir in, lê dema mirov dibêje rêbaza çareseriyê çi ye, ev xebat û tarzê jiyanê yê vê demê tê rojevê. Wezîfe çawa hatin hilgirtin, berpirsiyarî çawa hatin wergirtin, vegera li**

**welêt çawa pêk hat? Vegera sala 1976'an çawa bû? Vegera 1982-83'yan çawa bû? Weke gerîla vegera li welat çawa pêk hat? Em ne carekê gelek caran vegeriyan. Mînak, yekîneyên gerîla vegeriyan ku derê, çawa vegeriyan? Bi çi re rûbirû hatin. Kîjan derfet hebûn? Divê em van rast fêm bikin. Ti derfetên wan nebûn. Dema hevrê Şahîn Kilavuz û hevalên pêre şehîd ketin, li pêşiya wan kesekî ku erazî nas kiriba jî nebû. Kuryeyê wan nebû. Di tariya şevê de xwe berdan çemê Hêzil. Kar û xebat wer meşiyan. Kesên bi pisûleyekê ketin seriyekî û ji seriyê din derketin hebûn. Hinek kom li ser esasê biçin Başûr di Rojhilat de derketin.**

**Tarz û pîvanê xebatê yê PKK'ê wiha ava bû. Xebata xwe dispêre derfetan xebata PKK'ê nîne. Rêber Apo got, *"Ji bo min a girîng avakirina derfetan e, êz lêgerê wê me, dema derfet derdikevin holê ez dewrî hinekên din dikim, ji bo min ti qîmetekî wê namîne."* Naxwe Rêbertî bi derfetan naxebite. PKK bi derfetan ava nebû, wisa nemeşiya. Ya rastî**

derfet ji bo PKK'ê barek e û bi tehlûke ye. Maddiyatperestî wer çêdibe. PKK jî civakeke ku bi felsefeya "pariyek xirqeyek" dijî, dixebite û vê bi keda xwe ava dike. Heke tu tiştekî bidî civakê dê ew jî te xwedî bike. Mimkun e tu birçî bimînî, lê bi sedema birçîbûn heye mirov dest ji xebatê bernade, heke wisa bûya PKK'ê rojiya mirinê pêk nedianî. Wê berxwedana zindanê çênebûba. Di zindanê de PKK'yî jî dikarîbûn li ber xwe nedin, heke ferz kiribana dibe ku li derve hinek tiştên din jî pêş ketibana. Dikarîn jiyana xwe bidomînin, lê wer tevnegeriyan. Berpirsiyartî hilgirtin. Negotin, bila hinekên din bikin, em li ser nirxên wan derxistine holê bijîn û bixebitin. Gotin, "Em bikin, pêşengiyê bikin, yên em dikin bila nirxan ava bike û derfetan bide hinekên din." Felsefeya Apocî ev e. Têgihiştina wê ya jiyanê, nêzîkatiya wê ya ji jiyanê re, ji lewra nêzîkatiya wê ya ji xebata şoreşgerî re jî ev bû.

Ev dê çi qasî bê dawerivandin, çi qasî rast bê dîtin? Ev mijarên nîqaşê ne. Ji ber ev tiştên

**nayên zanîn nînin. Tên zanîn lê şaş û paşvemayî tên dîtin. Heta têkoşîna xeta bîrdozî-rêxistinî neyê xurtkirin jî dê ev hebin. Heke wê sererastkirinek bê kirin, divê ev bên dîtin û mirov li ser van raweste. Hewce ye li ser vê bingehê sererastkirinê pêk bîne. Sererastkirin li vir çêdibe, yan na mirov zêdetir ber bi şaşiyê ve biçe sererastkirin nîne. Hinek kes di partiyê de bi gotina, 'sererastkirin'ê zêdetir jirêderketina xetê û dûrketina ji pîvanên partiyê ferz dikin.**

**PKK'ya em dizanin weke hinek dizanin, wer zen dikin û weke dixwazin nîne. Diyardeyeke li derveyî me ye, rêgezên wê hene, pîvanên wê hene û hukmê xwe dimeşîne. Heke em rast tevlî wan bibin em ê rast tevlî bibin. Em ê kar û xebatên PKK'ê bimeşînin, heke ne wisa be em ê nikaribin tevlî PKK'ê bibin, em ê hewl didin PKK'ê tevlî xwe bikin.**

**Dikare wiha bê gotin, 'Baş e ma ev hemû çima tên ferzkirin? Ma em neçar in wisa bin!' Belê xeta serketin bi dest xistiye ev e. Hemû xetên din ên ji derveyî wê xetên rêxistinên din**

**bûn, ti hêza wan nema. Li Kurdistanê sala 1975'an dema kom bi gewde dibûn, rêxistinên din xwedî hêzên mezin bûn. Serhed di destê 'Kotan'an de bû. Sala 1977'an partiya Kemal Burkay li Amedê şaredarî bi dest xist. Mehdî Zana kadroyê wan bû. DDKD'ê hemû ciwan di destê xwe de digirt. Ciwanên Amedê û navçeyên wê DDKD'yî bûn.**

**PKK kî bû? Jêre digotin "koma serberdayî" ya li dora Rêbertî ava bibû. Hinekan jêre digotin, "Çeteya xwedê ji wan stendî." Civakeke ku ti derfetên wê nebûn û tenê xwedî hinek îddîayan bû.**

**Pêwîst e mirov xwe zêde bi hêza maddî ve girê nede. Heke tu baş bisekinî, rast bixebitî dê ew bi te re be û tê karibî bi rê ve bibî. Heke tu wer nebî, mimkun e tu her kêlî biçî û lawazbûn jî rû bide. Hebûna maddî, derfet û hêz tiştên mirov wer pir zêde bi wan ve bê girêdan û wê her tim hebin nînin. Dibe ku carinan hebin, carinan jî tine bibin. Ev karekî têkoşînê ye. Tişta timî heye çi ye? Bîrewerî ye, bîrdozî ye, îrade ye, sekna fedaî ye.**

**Bingeha meseleyê ev e. Heke tê dîrokê lêkolîn bikî, têkildarî rohnîkirina vê rojê hewce ye mirov li wê demê binihêre. Xeta PKK'ê ya hatiye piştrastkirin ev e. Îro jî eger wê PKK hebe divê di wê xetê de be. Nehat guhertin. Rêbertî di parêznameyan de bi awayekî taybet jî destnîşan kir, li hemberî maddiyatperestiyê derket. Got,** ***"Felsefeya pariyekê xirqeyekê."*** **Ji bo kadro got,** ***"Heqîqeta xwe rêxistin kiriye û hatiye çalakkirin"*** **Wer terîfeke mîna 'serok' an jî wekî din nekir. Got,** ***"Ji min re nebêjin serok, her kes dikare bikeve hilbijartinê û bibe serok. Barzanî jî dibe serok, ez cuda me."*** **PKK cuda ye. Partî, karê siyaset û leşkeriyê dike, lê divê mirov bi bi saziyên siyasî û leşkerî yên din ve tevlîhev neke. Karê wan ê siyaset û leşkeriyê cuda ye, yê PKK'ê cuda ye. Yê PKK'ê xwe dispêre pêşengtiya partiyê û pêşengiya bîrdoziya xwe. Ji lewra ya diyarker pêşengtiya partiyê ye. Yên din bi qasî girêdayî pêşengtiya partiyê bin wê serketinê bi dest bixin. Eger pêk neynin wê winda bikin. Dibe ku artêşa te ya bi 10 hezaran jî hebe, lê di carekê de tê têk biçî, wê ti hêza te nemîne.**

Şer wisa ye, leşkerî karekî wiha ye. Ya girîng û mayînde pêşengî ye, xeta pêşeng e, xeta partiyê ye.

Îro jî eger hinek pirsgirêk hebin, heke em ê li çareseriyan bigerin divê em ji vir lê bigerin. Hewce ye em li mînak û pîvanên li vir binihêrin. Hewce te em li nirxên PKK kirine PKK bigerin. Her pirsgirêk li wir çareser bû. Di rewşa herî zehmet û lawaz de wan pîvanan pirsgirêk çareser kir, divê em li wir binihêrin û çareseriyê wer bibînin. Ne bi awayê din e. Aliyek wê ew e, em vê girîng dibînin.

Ya din jî di aliyê çalakiyan de jî, 1976'an di nîvê meha Gulanê de li Pirsûsê mîtîngek çêbû. Fevzî Aslansoy ê li Zanîngeha Hacettepe xwendekar bû ji aliyê faşîstan ve hat qetilkirin. Ji Rizgariya Gel, koma THKO bû. Lê dema Apocî pêş ketin, bi hevalan re nîqaş bi rê ve dibir. Ji Pirsûsê bû. Pirsûsiyan Rêbertî weke Pirsusî dihesibandin. Di wan pêvajoyan de çûn-hatina Rêbertî ya Pirsûsê pir çêdibû û gelek ji wan nas dikir. Hevalên bi Rêbertî re di nav têkiliyan de diyar kiribûn ku

**Fevzî Aslansoy nêzî tevlîbûna nav komê ye. Nêrînên PKK'ê rast didît, koma RizgariyaGel rast nedidît. Dibêje, "Ez pirsgirêkên xwe çareser bikim, ez ê bêm tevlî bibim." Li ser vî esasî ji komê hinek dem xwestibû. Di wan pêvajoyan de hat qetilkirin. Dema wisa bû, Rêbertî got, *"Li Pirsûsê em hene, wekî din kes nîne, ew nikarin lê xwedî derkevin. Yek jî bi awayê tevlî me bûye divê em li heval xwedî derkevin."* Ji lewra yekser lê xwedî derket, cenazeyê wî wergirt, amade kir û bir Pirsûsê.**

**Gelek kom çûn. Li ser navê *"Şoreşgerên Kurdistanê"* belavok hatin amadekirin. Hevalê Xeyrî hinek ji wan bir merasîma cenaze, hinek di rê de hatin girtin. Ew bi xwe jî hat girtin. Zêdetirî 10 hezar kes tevlî merasîma cenaze bibûn. Dirûşmên destpêkê yên PKK'ê di wê merasimê de hatin gotin. Dirûşma bingehîn a PKK'ê *"Bimire Mêtingerî, Bijî Serxwebûn"* bû. Dirûşmên xeta wê ya bîrdozî-siyasî îfade dikir ev bûn. PKK, xeta serxwebûn û azadiyê ya Kurdistanê bû. Bi esasî xeta wê ya serxwebûnê ye. Navê kovarê "Serxwebûn" e. Hê jî ew nav**

**tê parastin. Hinekan hewl dan biguherin, me asteng kir. Formata wê guhertin, piştî demekê careke din vegeriya formata xwe ya berê, lê me dikarî navê wê biparêzin. Yek jî ya neguheriye ala HPG'ê ye, ala ERNK'ê ye û yek jî navê Serxwebûn e.**

**Dirûşmên di wê mîtîngê de hatin gotin û tevlîbûna girseyê pir girîng bû. Jendermeyan êrîş kir, pevçûn çêbûn. Ev rewşeke girîng bû. Li dû wê heval Xeyrî û Kemal Pîr hatin girtin. Ew kirin girtîgeha Amedê. Di çalakiyeke wiha de hatibûn girtin, girtîgeh veguherîbû ziyaretgehekê. Navê Apociyan hat bihîstin û li her cihî belav bû. Kovar û Komeleyên her kesî hebûn, mîrasa xwe dispartinê hebû û digotin ku pişta xwe didin hinek rêxistinan. Lê Apociyan ne komele, ne kovar ne jî mîrasa wan hebû. Tenê civateke ciwanan bû ya hinek rastî dianîn ziman. Ji lewra hêza bandorkirina wê, bihîstina nasnameya wê lawaz bû. Mîtînga Pirsûsê kom da naskirin, li her cihî belav bû. Bi vî awayî bandor çêbû: "Apociyan li Pirsûsê mîtîng li dar xistine, ev dirûşm gotine, bi vî**

**awayî pevçûn çêbûye, hatine girtin, ew qas mirov tevlî bûne." Çalakiya li hember Bucak di îlana partiyê de çi be, mîtînga Pirsûsê jî ya rastî di îlana komê, ketina komê ya Kurdistanê, naskirina wê ya li Kurdistanê de di wê astê de rol lîst û bandor kir. Xebatên propaganda û rêxistinbûnê hêsan kir. Ciwanan bi giştî gel ev hemû tiştên rû dan bihîst. Da zanîn bê kî ye û dixwaze çi bike. Di vê çarçoveyê de girîng bû.**

**Di heman demê de ev dibe serhildana pêşî jî. Yekemîn mîtînga PKK'ê li Kurdistanê li dar xistiye. PKK li Enqereyê tevlî çalakiyên ciwanan dibû, lê li Kurdistanê mîtînga pêşî ya wê bi xwe pêk anî ev merasîma cenaze bû. Naxwe merasîmên cenazeyan girîng in. Di salên 90'î de jî serhildan li Nisêbînê bi merasîma cenazeyan dest pê kir. Domdarî û bibîrxistineke wiha jî heye. Paşê rewşa girtîmayînê ya li Amedê jî bandorek kir. Ziyaret çêbûn. Girtîgeh wê demê vekirîbûn, zêde ne girtî bûn. Li ser Amedê, rewşenbîrên derdorê bandor çêkir. Têkildarî pêşxistina**

**xebatên propaganda û rêxistinbûnê de bandor kir.**

**Encama xebatên sala 1976'an dawiya 76'an û serê sala 1977'an dawiya Kanûnê û serê Çileyê li Enqereyê li mala Pîlot bi civînekê tê nirxandin. Kesên li Enqereyê diman û yên li Kurdistanê dixebitîn tevlî bibûn. Civîneke nirxandinê ye. Rêbertî di analîzan de ji ber liv û tevgera Pîlot pir cih dide vê civînê. Di civînê de beşeke zêde têkildarî vegera li welêt û nirxandina xebatên sala 1976'an e. Ji pratîka 1976'an jixwe encameke girîng derdikeve holê. Ji vî alî ve civînê bi awayekî girîng dinirxîne. Hema hema li hemû qadên herêma navîn kêm an jî zêde komên ciwanan ava bûne. Komên perwerdeyê, komên propagandayê hene. Bi vî awayî perwerde û propagandayê di zikhev de dimeşînin. Hê pir zêde çalakî nînin. Çalakî bi awayê propagandayê tên meşandin. Nîqaş tên kirin û komên van dikin ava bûne. Asta di salekê de gihiştinê dibe encameke girîng. Nîşan dide û piştrast dike ku ev kar dikare li Kurdistanê bê**

**meşandin. Hêvî û hêz dide. Encam tên nirxandin. Bi vî awayî digihêjin encama ku xebat li ser vê bingehê zêdetir werin kûrkirin û berfirehkirin.**

**Hinek encamên din ên di civînê de derketin holê wiha ne: Ji bo sala 1977'an plansaziyeke nû çêkiriye. Weke alîkarê Rêbertî du heval tên wezîfedarkirin. Heval Hakî û kesekî ji TÎKKO'yê veqetiyabû. Ev kes dema Îbrahîm Kaypakkaya hat girtin nobedar bû. Piştî navbera wî û TÎKKO'ciyan xera bû xwest tevlî me bibe. Hevalan jî weke rêzgirtina ji şoreşgeran re qebûl kirin. Jixwe zêde di nav PKK'ê de xebat nekiribû. Lê di çarçoveya qîmetdayîna şoreşgeriya berê wezîfedarkirineke wiha dikin. Rêbertî bi awayê, "Heval di hilgirtina berpirsiyartiyê de xwe paşde didin" rexne kir. Hinek hevalên din jî bi îhtîmaleke mezin hatiye nîqaşkirin, lê dema meyla wan a xwe paşdekişandinê çêdibe wergirtina wezîfeyê jêre dimîne. Bi vî awayî zêde guhertinek çênabe, lê herî kêm di çarçoveya gavavêtina ji bo Rêbertî**

**wezîfedarkirina alîkaran û ji bo bûyîna rêxistinê avakirina rêveberiya navendî de pêşketinekê jî îfade dike.**

**Li dû civînê piştî demekê têkildarî xisûsa ku Pîlot sîxur e guman zêde dibin. Li ser gumanan rêxistin tedbîran digire. Di nav rêxistinê de belav bû û bi awayê bila her kes baldar be hinek tedbîr hatin girtin. Demeke dirêj 7-8 mehên din jî ma û xebitî. Piştî wê Rêbertî têkiliyên xwe pêre qut kir.**

**Pîlot, ji Agirî bû. Kesekî bi navê Abdurrahman hebû, li Enqereyê xwendekar bû. Wî ew anîbû û tevlî kiribû. Digot ku di Saziya Hewayî ya Tirk 'Turk Kuşu' de pîlot e. Li derve ketibû ezmûnên zanîngehê, di heman demê de zanîngeh jî dixwend. Hinek derfetên wî yên maddî hebûn û ev derfet têkildarî bandora xwe de dinirxand. Zêdetir weke kesekî pereyên wî hene û pereyan dibîne dihat naskirin. Mala wî hebû, di mala wî de civîn hatibûn lidarxistin. Bi îhtîmaleke mezin mimkun e mal jî bi sedema bila civînên wiha li wir bên lidarxistin û bi vî awayî kontrol bê**

**kirin girtibû. Pêkan e ji bo wê jî li Enqereyê kiribûn xwendekar. Mimkun e her tişt bi plan bû jî. Em vê pir bi hûrgilî nizanin.**

**- Civînên Kurdistanê yên Rêbertî “Sefera Kurdistanê”**

**Piştî civînê bûyera girîng a sala 1977’an civînên Rêbertî yên li Kurdistanê bûn. Ev weke “Sefera Kurdistanê” bi nav kir. Li Kurdistanê pêşketinên di nav tevgera ciwanan de derketin holê, piştî serê salê hatin nirxandin, di çarçoveya kom bi awayekî bê kontrolkirin, Rêbertî ji 12’ê Adarê dest pê kir heta hefteya yekemîn a Gulanê li Kurdistanê rêzecivînên du mehan li dar xist. Pêşî li Enqereyê li Odeya Mîmar Muhendisan dest pê kir. Rêveberiya wir di destê “Kurtuluş Sosyalîst Dergî” de bû. Ew jî tevlî civînê dibûn, konferansên bi awayî pêk dianîn. Paşê li Elezîz, Dêrsim, Serhed, Çewlik, Amed û civîna dawî li Dîlokê çêbû. Heke civîna li Enqereyê jî bê hesibandin, 6-7 civîn hatin lidarxistin. Nûnerên komên sempatîzan ên li derdorê ava bibûn jî tevlî civînan dibûn. Ji her**

cihî hinek nûner dihatin. Hemû nikarîbûn di carekê de tevlî bibin, beşeke girîng tevlî civînan dibû. Civîn ji 30-40-50 namzetên kadroyan pêk dihatin. Mirov dikare weke konferansekê jî binirxîne. Civîna herî mezin li Dîlokê pêk hatibû. Li dû wê careke din vedigere Enqereyê. Nêzî 80 kes tevlî civîna li Dîlokê bibûn.

Civîn weke konferansên Rêbertî bûn. Nas dikir, dihat naskirin, kontrol dikir û yek jî asta teorîk-bîrdozî ya gihiştinê bi awayekî sîstematîk radigihand. Konferans dida. Nêrînên rêxistinê neqil dikir. Ji ber heta wê demê ti belgeyeke nivîskî ya hatibû weşandin nebû. Bername, manîfesto û kovara wê jî nebû. Her tişt weke nêrîna devkî hebû. Têkoşîneke bîrdozî ya zêde rû dida. Propaganda dihat kirin. Ji bo xurtkirina vê diviyabû hêza teorîk a rêxistinê timî hatiba zêdekirin. Yek jî çi qasî pêkan be avakirina yekîtiya nêrînê dihat armanckirin. Rêbertî asta gihiştibûyê ji kadroyên perwerde û propaganda dikirin re radigihand. Hem ji bo

**avakirina kûrbûna nêrînê hem jî yekîtiya nêrînê ev dikir. Ev têra xwe jî bi feyde bû. Yek jî cara pêşî di vê astê de civîn çêdibûn. Mirov dikare weke civînên herêmê bihesibîne. Jixwe kesên tevlî civînan dibûn, nû û namzetên kadro bûn. Kar û xebat dikirin. Naskirina rêxistinê û Rêbertî têkildarî xurtbûna xebatên wan jî girîng bû.**

**Bi esasî civînên yek roj bûn, ji ber ji derdorê dihatin. Em tevlî civîna li Amedê bûn, li Amedê wisa bû. Kesên ji Êlihê, Hîlwanê hatin û tevlî bûn hebûn. Ji Mêrdînê tevlîbûn çênebû. Di ketina Rezanê de mala Dêrikiyan hebû, me civîn li wir li dar xist. Nêzî 40-50 kes tevlî bûn. Bi şev her kes kom bû, hatibûn cihê xwe. Beriya wê bi du rojan ji bo amadekariyan hevalê Kemal Pîr hatibû. Rêbertî ew şandibû. Rêbertî serê sibehê hat. Nêzîkî 7-8 saetan axivî. Jixwe zêde derfeta derketina derve nebû, kêm navber dida. Êvarî jî dema civîn bi encam bû, belav bûn. Axaftinên Rêbertî di teybê de dihatin qeydkirin. Bi rêkûpêk diaxivî. Rewşa cîhanê,**

bi awayekî dîrokî rewşa Rojhilata Navîn, rewşa li Tirkiyeyê, xisletên Kurdistanê, xisletên mêtingeriya li ser Kurdistanê vedigot. Asta teorîk a Rêbertî gihiştibûyê bi rengekî sîstematîk dida. Xwedî neqilkirineke fikra sîstematîk a wiha bû. Me diyar kiribû ku hê di 1974'an de jî li Girtîgeha Mamakê axaftinên hemû çepgiran guhdar kiribûn dikir. Di aliyê tarzê xebatê de jî ew aliyê wî pêş ketibû. Aliyê wî yê fikrên xwe bi awayekî konferans weke nêrîn ragihîne pêş ketibû.

Di dawiyê de rewşa li Kurdistanê, xisletên mêtingeriyê, qirkirina tê pêkanîn, xisletên civaka Kurd nirxand. Ji bo tehlîla van hemûyan jî got, "Divê mirov Şerê Rizgariya Neteweyî ya Demdirêj bide, wekî din çareserî nabe" û teyb girt. Encamên girîng ên van civînan çêbû. Di kadroyan de yekîtiya nêrînê û kûrbûn çêkir. Kontrola rêxistinê çêbû, rêxistinê his kir ku tê kontrolkirin. Tevkariyeke ciddî çêkir.

Bersiva ji pirsa, wê encama civînê çawa bandorê li pratîkê bike? bû komkujiya li

**Dîlokê. Piştî civîna ku Rêbertî li Dîlokê kir bi deh rojan 18'ê Gulana 1977'an li Duztepe ya Dîlokê di kemîneke bi plansazî ya ji aliyê koma bi navê Stêrka Sor hevrê Hakî Karer hat qetilkirin. Rêbertî ev weke bersiva ji xebat û rêxistinbûna li Kurdistanê û her wiha civînên ku herî dawî hatin lidarxistin nirxand. Tehdît aşkera bû, dixwestin bêjin eger hûn dewam bikin wê dawiya we wisa be û li ser her kesî ferz dikirin ku dest ji vî karî berdin. PKK'ê wê demê hê propaganda dikir. Propagandaya mijarên weke Kurdistan û gelê Kurd mêtingeh e, divê ji mêtingehiyê rizgar bibe, ji bo vê jî şerê rizgariya neteweyî pêwîst e. Hinek agahî û nirxandinên bi awayekî dîrokî, civakî fêr bibû û derxistibû holê ji ciwanên rewşenbîr re radigihand, dixwest tevlî vê fikrê bibin. Ti rêxistin û çalakiyeke wî ya fermî nebû. Dijmin-dewletê komkujî li ser propagandayê ferz kir. Ya rastî Rêbertî nirxand ku êrîş tenê êrîşeke li hember heval Hakî nîne, êrîşeke bi plan e ya armanc dike kadroyên pêşeng ên rêxistinê bêbandor bike. Heta bi îhtîmala hewldana darbeyekê ve jî**

**girê da. Fermandarê Hêzên Bejahî Namik Kemal Ersun alîgirê MHP'ê bû. Rêbertî bi vî awayî nirxand: Wê darbeya MHP'ê di artêşê de çêbibe û ev darbe wê bi awayekî bi bandor şerê li Kurdistanê Kurdan nîşan bide, wê li hemberî PKK'ê şer bide destpêkirin û darbeya xwe pêk bîne.**

**Li Enqereyê heval hatin girtin. Li hemberî Rêbertî komployeke bi plan bi heman rengî li wir jî hebû. Xwe amade dikin li malekê civînê li dar bixin, di malê de çekên di bûyerên curbicur de hatine bikaranîn hene. Diyar kir ku li wir planeke girtinê heye. Rêbertî sibehê beriya biçe weke tedbîr pêşî hevalekî dişîne wir û jêre dibêje, "Biçe binihêre bê li malê rewş çi ye." Dema heval diçe wir dibîne ku li dora malê gelek polîs hene. Dema agahiyê didinê, Rêbertî naçe wê civînê. Bi vî awayî amadekariya dijmin pûç dibe. Heke hatiba girtin, dibe ku herî kêm 30 sal ceza dabanê. Di serê sala 1977'an de eger Rêbertî ceza xwariba û ketiba girtîgehê bêguman dê geşedan û pêşketin ne wisa bûna. Dibe ku pêşketin û**

**derketina holê ya PKK'ê ne wisa bûya. Wê pêşketineke cihê çêbûba, ev cuda, lê belê tiştên rû dan wê pêk nehatibana. Êrîşên bi vî awayî weke hewldana êrîş û darbeyeke bi plan nirxand. Weke parçeyekî amadekariya darbeyê nirxand. Li hemberî heval Hakî yê ketibû nav pratîkê bibû plana komkujiyê.**

**Dibe êrîşeke bi plan. Paşê derket holê ku komkujî plana MÎT'ê ye. Stêrka Sor rêxistineke sîxur a MÎT'ê ye. Bû bûyereke ku MÎT'ê bi kesên kiribûn nav me re bi taybet plana wê kiribû. Ev zelal bû. Ji ber piştî wê bi salekê bi avabûneke bi navê "Têkoşîn" li Dîlokê parçekirina rêxistinê pêş xistin. Weke bûyera pratîk, di nav van hemûyan de ji bo rêxistinê tehdîteke aşkera bû. Di rêxistinê de zelalbûneke duyemîn li wir çêbû. Ji bo her kesî tehdîtek bû, dixwestin bêjin dawiya kesên di vê rêyê de bimeşin ev e.**

**Dewamkirinê jinûve biryardayîn bi xwe re anî. Her kesî encam da ber çavan û biryara dewamkirinê wiha da, dewamkirin wer çêbû. Têkildarî qetilkirina hevrê Hakî Karer**

**Rêbertî got, "Em ketin halekî ku mîna aveke kelandî bi ser me de dakin." Li ser vê bûyerê Rêbertî gihişt du biryarên bingehîn. Ya yekemîn biryara partîbûnê ye. Ji deverên din tê ev qas têkoşîn dike û jiyana xwe ji dest dide. Ji bo jiyandina wê û weke şertê xwedî derketina li bîranîna wê biryara partîbûnê dide. Pêvajoya partîbûnê li ser esasê vê biryarê dest pê dike.**

**Paşê dawiya meha Tebaxê li Dîlokê 'Pêşnûmeya Bernameya Partiyê' amade kir. Mijdara 1978'an pêvajoya ber bi damezirandina partiyê ve diçû bi vî awayî dest pê kiribû. Encameke girîng a bûyerê ev bû. Ya duyemîn berxwedana çekdarî bû. Bi awayê, 'Mêtingerî li hember propagandayê çekan bi kar tîne, wê demê ewlehiya kadroyan nîne, weke xebata bi ewle divê parastina xwe bikin" biryar hat girtin. Heval Mazlum ev biryar weke, "Di destekî de pirtûk, di destekî de çek" terîf kir. Bi vî awayî pêvajoya berxwedana çekdarî ya PKK'ê dest pê kir.**

**Berxwedana çekdarî bi awayê xwedîderketina li bîranîna heval Hakî û li ser vê bingehê bi avakirina parastina rewa dikare bê destpêkirin. PKK piştî vê bûyerê bi awayekî fermî bû xwedî çek, çek hilgirt û bi kar anî. Beriya wê jî çek bi awayekî ferdî hebûn, ên bi giştî dihatin bikaranîn hebûn, lê ne zêde, hejmareke kêm hebûn. Rewşeke fiîlî bû, hinek heval zêdetir bi demençeyê di nav liv û tevgerê de bûn. Di pevçûnên ciwanan, di hinek bûyeran de bi awayekî bê plan û bê armanc dihat bikaranîn. Sîstemeke wê nebû. PKK bi esasî weke komeke propagandayê tevdigeriya. Komeke çalakiyê nebû.**

**Rêbertî di parêznameyê de got, "Vê komkujiyê pêvajoya pêşketina paşê ya PKK'ê diyar kir. Eger wisa nebûya, wê PKK'ê rêveçûna pêşketineke çawa şopandiba ne diyar bû." Zelalî nebû, vê komkujiyê zelalbûn çêkir. Ev jî dihat maneya xebata li ser bingeha parastineke cewherî û kadro xwe bixin ewlehiyê. Ev bi awayê ku di liv û tevgera xwe de baldar be, eger pêkan be bi çek be pêk hat.**

**Ji ber her kêlî dibe ku bi êrîşeke bi heman rengî re rûbirû hatiba. Lê ya girîngtir dibe wezîfeyeke tolhildana şoreşgerî. Rêxistinê biryar da ku ji kesên heval Hakî qetil kirine tol bê girtin. Li ser vê bingehê wezîfedarkirin çêbûn. Tevahiya 6 mehan şopandin, lêkolîn kirin û herî dawî derket holê ku MÎT wan li Skenderûnê vedişêre. Hatin dîtin û cezakirin. Weke cezakirineke rêxistinî ya PKK'ê mirov dikare bêje çalakiya çekdarî ya pêşî ev e. Bi awayê, weke wezîfeya tolhildana şoreşgerî hatiye pêkanîn û xwe dispêre asta biryareke diyar dikare bê nirxandin.**

**Ji aliyê kesekî bi navê Alaattîn Kapan ve dihat rêxistinkirin. 1'ê Gulana 1977'an li Taksîmê komkujî çêbibû. Weke pevçûneke di hundir de ku dabûn nîşandan ji derve de êrîşî pîrozbahiyên 1'ê Gulanê kiribûn. 34 kesan jiyana xwe ji dest dan. Têkildarî ku ji derve de bi çekan êrîş çêbûye, agahî hebûn. Hinek kesên wekî Ugur Mumcu ev bûyer lêkolîn dikirin. Di nirxandinên Ugur Mumcu de dihat nivîsandin ku kesekî bi navê Alaattîn ê çekdar**

û dirêj bi Reno’yeke spî reviyaye. Ew tespît kiribû. Pirs dikir û digot, “Ev Alaattîn kî ye?” Ev dibe ku rast be. Pêkan e di nav vê provokasyona li wir pêk hatiye de cih girtibû. Li dû wê 18’ê Gulanê komkujiya li Dîlokê pêk anî. Komeke wer a sîxur-provokator bû û MÎT’ê rê dida ber. PKK’ê li hemberî komeke wiha weke têkoşîneke tolhildanê çek bi kar anî. Li ser esasê “li hemberî avahî, sazî û kesên bûne sîxur şîddeta şoreşgerî” taktîka xwe diyar kiribû. Rêbertî paşê di manîfestoyê de nivîsand. Ev aliyekî girîng bû. Em ketin sala 41. a pêvajoya vê berxwedanê. Rastiyeke berxwedana çekdarî ya 40 salî heye, esasê meseleyê ev e. Mirov dikare ji wir dest pê bike. Rêbertî ew di parêznameyê de jî îfade kir.

Heval Hakî di civîna serê sala 1977’an de weke alîkarê fermî yê Rêbertî jî hatibû wezîfedarkirin. Rêbertî Mijdara 1972’yan dema ji girtîgehê derketibû çûbû mala wan û hevdu nas kiribûn. Piştî wê timî bi Rêbertî re ma. Ji navçeya Ulubey a Ordu ye. Li wir gund

pir belawela ne. Ne kombûyî ne. Mala wan li cihekî nêzî Ulubey bû. Dema li lîseyê bû fikrên şoreşgerî nas kiribû, pêvajoyeke berxwedanê ya ber bi 71'ê ve diçû. Paşê di sala hîndekariyê ya 1971-72'yan de qeyda xwe li beşa matematîk a Fakulteya Fen a Zanîngeha Enqereyê çêkiribû. Bi komek ciwanên Derya Reş re di navbera Bahçeli û Emek de malek girtibûn, pêkve diman. Yek ji wan jî hevalê Kemal Pîr bû. Kengî û çawa heval Kemal Pîr nas kiriye em nizanin. Dibe ku li lîseyê bi hev re xwendibin. Mimkun e hinekan ew bi hevdu dabin naskirin. Ji ber heval Kemal ji Gumuşhaneyê ye. Bajarê wan hinekî dûrî hev in. Li heman herêmê ne, lê belê wer pir nêzîk û di zikhev de nîne. Ne ji heman bajarî ne. Heke li lîseyê xwendekar bin jî ji ber fikrên şoreşgerî bûne heval, pêkve xanî girtine yan jî li ser esasê têkiliyên şoreşgerî hevdu nas kirine bi hevdu re xanî girtine. Sekn û pozîsyoneke wan a wiha hebû. Rêbertî ew li mala ku pêkve girtibûn nas kir.

**Di nav xebatên li Enqereyê de rêxistinkerê komê bû. Rêbertî çawa hêza fikir pêş dixist, dixwend-lêkolîn dikir û rê dida ber komê, karên rêxistinî yên komê jî heval Hakî dikir. Rêkûpêkkirina malan û komên perwerdeyê, belavkirin û pirtûk dana xwendin, verastkirina jiyana malan, xebata rêxistinî sazûmaniya jiyanê derdixist holê. Bi vî awayî têkiliyên wî yên bi Rêbertî re têkiliyên ku pîvan û rêgezên xebata rêxistinê diyar dikirin. Di wê astê de têkiliyek pêş xistibûn. Bibûn kesên hêza fikir û dehaya Rêbertî dîtibûn û nas kiribûn. Jixwe Rêbertî wiha terîf kir. "Me bi hevalan re nîqaş nedikir. Dema em li çavên hev dinihêrîn tişta me yê gotiba me ji hev du re vedigot." Bi rastî jî wisa bû. Rewşeke mirov bi Rêbertî re demdirêj nîqaş kiriba û civîn li dar xistiba nebû. Bi îfadeyên kurt kar û xebat dihat kirin. Weke berpirsiyarekî rêxistinê xebat bi awayekî fiîlî bi rêkûpêk dikir û bi rê ve dibir. Ti kêmasiyek çênedibû. Rêbertî kar û xebata heval Hakî tevlî dibû nedişopand, bi awayê, çawa be heval Hakî çi hewce bike dê pêk bîne, ew qasî jê yeqîn dikir. Asta hevdu**

**naskirinê gihiştibû wê nuqteyê. Bi vî awayî nêzî kar û xebatê dibû, ciddî bû. Bi taybet piştî 1972'yan bi xwendin û nîqaşan re daneheva xwe jî zêde kiribû. Rêbertî jî baş nas kiribû. Di nav derdora çepgiriyê de jî di asteke girîng de dihat naskirin. Ji bo rêveberiya ADYOD'ê hat hilbijartin, di wê astê de ji aliyê derdorên din ve dihat naskirin.**

**Xwedî kesayeteke wiha bû ku wextê xwe baş dinirxand. Xwend, nîqaş dikir. Kesekî wer nebû ku wextê xwe vala derbas bike, bi awayekî nepêwîst li derdorê bigere û sohbetên nehewce bike. Disîplîn-rêxistinbûneke wî ya jiyan û xebatê ya girîng hebû. Bi hevalan re nîqaş dimeşand, dema sohbet dikir, pirsgirêk û mijarên curbicur dikir rojev û nîqaş dikir. Têkiliyên wî yên bi mirovan re pir balkêş û bi bandor bûn. Xisleta wî ya hem weke hêza fikir pêkanîn û dawerivandina fikrên Rêbertî hem jî di xistina nav jiyanê de li pêş bû. Her kesî hurmet û bawerî didayê. Tiştên heval Hakî digotin, weke talîmat û ferman dihat fêmkirin û dihatin cih. Tiştekî wisa nebû lê dema ji**

**kesekî re dihat gotin, "Wê wiha bike" nîqaş nebû. Weke talîmatekê dihat fêmkirin û pêkanîn. Di wê astê de bandora wî li ser kadroyan û komê hebû. Baldar û bi pîvan bû. Xisletên herêmî winda nekiribû. Zêde nediaxivî, lê hêza wî ya fikir pêş ketibû. Tecrûbeya wî hebû, îfadekirin zehmet jî bûya dikarî fikrên rast bîne ziman. Ya girîngtir jî di têkiliyên bi mirovan re baldar bû. Xizmet dikir. Rêbertî got, "Xwarin nexwar da mirovan, kinc li xwe nekir, li mirovan kir." Rast e, wisa bû. Bi rastî jî mala ku 2 salan li Enqereyê girtibû, bibû buroya navendî ya rêxistinê. Carinan bi sedan mirov dihatin. Sala 1976'an di pêvajoya ezmûnên zanîngehê de ji bo taştê me 5 torbe nan biribû. Di maleke biçûk a du ode de em ew qas mirov dikarîbûn bimînin. Nîzameke rêxistinî, nîzameke xebat û jiyanê ya wiha rûniştibû. Ev tişt kirin, da kirin. Bi xwe dikir. Hinek kesên din dikir pêşeng. Ji ber wî di pratîkê de dikir, perwerdekar bû, pîvan dida qezenckirin. Dikarîbû şekil û pîvana jiyanê bide mirovan. Bi sekna xwe ya pratîk a xwezayî û pêşengiya**

**xwe dikarîbû vê bike. Heval Mazlum got, "Heval Hakî 4 saetan rûnişt, nêrînên rêxistinê ji min re vegotin, qedand. Min got, ez tevlî hemûyan dibim û bûm Apocî." Di vê astê de xwedî hêza daneheveke wiha bû ku dikarî fikrên Rêbertî ragihîne, îfade bike, kesê li pêşberî xwe bandor û îqna bike.**

**Di ser Dîlokê re rê dida ber pratîka giştî. Ji payîza 1976'an ve Dîlok weke navendekê bû. Çalakî pêş ketin, di aliyê rêxistinî de ji wir dihat birêvebirin. Belavok li wir dihatin amadekirin û belavkirin. Herî dawî di Newrozê de belavkirineke wiha ya belavokan pêk hatibû. Me jî li Amedê amade kirin, lê paşê dema me dît ji Dîlokê belavok hatin, me ew esas girtin û hatin belavkirin. Bi vî awayî xwedî wê astê bû ku hem xeta taktîk pêş dixist hem jî bi awayekî rê dida ber têkiliyên rêxistinî yên li Kurdistanê. Wê demê rêveberî li ser esasê înîsiyatîfê bû. Di PKK'ê de rêveberiyeke wiha nebû. Mehê carekê dema neqilkirina agahiyan hewce dikir, pergaleke weke rapor-talîmat nebû, her tişt bi devkî**

**çêdibû. Dema carinan hevdîtin çêdibû, li ser vî esasî bû. Ev jî girîng bûn. Ji ber mirovan ji ber înîsiyatîf bi kar dianîn zêde pêwîstî bi têkiliyan nedîtin. Çi hewce ye bi xwe dinirxandin, biryar digirtin û pêk dianîn. Eger şaşî hebûya sererast dikirin. Weke di roja me de pergala navendî nîne. Helbet hêza fikir hebû, nêrîna hevpar hebû, bi disîplîn û rêxistinî dixebitîn, bi fermanan nedibû. Lê niha mîna em gihiştine rêxistineke ku bi fermanan dimeşe. Hinek di nav me de hene, eger ferman neyê ti tiştekî nakin. Rewşeke mîna bûne memûr û burokrat mewzûbehs e. Ev sekneke mîlîtanên şoreşger nîne. Sekna mîlîtan sekna ku fermanê ji xetê digire û şertên fermana xetê tîne cih. Wê demê jî wiha dihat kirin.**

**Di vê çarçoveyê de di nav rêxistinê de heval Hakî yê herî zêde dihat naskirin bû. Di pêvajoya heta Komploya Navneteweyî derba herî giran a PKK'ê weke kom û rêxistin xwar komkujiya Dîlokê bû. Qetilkirina heval Hakî bû. Bûyera herî zêde zerar da rêxistinê bûyera**

**Dîlokê ye. Komplo ji vê bihurî. Mirov dikare wiha formule bike. Heke wer bê formulekirin wê baştir bê fêmkirin. Piştî komkujiyê ji aliyê rêxistinê ve mijara xwe ji nû ve nirxandin çêbû. Rêbertî nirxand, kadroyan nirxand. Rewş pir ciddîtir bibû, bar girantir bibû.**

**Weke belgeya nivîskî ya pêşî dawiya meha Tebaxê û serê meha Îlonê "Pêşnûmeya Bernameyê" hat amadekirin. Rêbertî 11 rûpelên bi daktîloyê hatibûn nivîsandin amade kiribû. Hemû nêrînên weke nêrînên teorîk ên rêxistinê diparast bi awayekî pir sîstematîk hatibûn xulasekirin. Li ser vê bingehê armanc hatibûn diyarkirin. Belgeyeke pir bi bandor bû. Beriya wê sala 1976'an heval Xeyrî û Rêbertî têkildarî "Mêtingeriyê" belgeya nivîskî amade kiribûn. Lê belê ew weke pêşnûme mabû. Zêde nehatibû belavkirin û xwendin. Kesî nizanî. Heta wê demê her tişt bi propagandaya devkî dihat kirin. "Pêşnûmeya Bernameyê" bû belgeya nivîskî ya pêşî. Bi rêya daktîloyê hat zêdekirin, ji bo kadro bixwînin bi destan li herêman hat belavkirin.**

Belgeyeke pir bi bandor bû, têra xwe sîstematîk bû û dihat fêmkirin. Gelekî moral da. Bi taybet piştî komkujiya Dîlokê hêza moral a pêwîstiya kadroyan pê hebû derxistibû holê. Dema hesabpirsîna ji qatilan jî bi ser ve zêde bû, kadroyan ji rêxistinê yeqîn kirin, pêşeroja xwe dîtin. Dîtin ku rêxistin li wan xwedî derdikeve. Vê jî xebateke aktîftir û zêdetir pêş xist.

Li ser "Pêşnûmeya Bernameyê" Mijdara 1977'an li Amedê civîneke nîqaşê hat lidarxistin. Li wir mijara em xwe çawa rêxistin bikin hat nîqaşkirin. Payîza 1977'an "Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Kurdistanê" bi awayekî veşartî hatibû avakirin. Hemû kadro negirtiba nav xwe jî gaveke modela rêxistinî ya wiha dihat avêtin. Divê wiha be, yan jî rêxistinbûna partiyê wê çawa be? Li ser bingeha têkildarî bernameyê nîqaşek hat kirin. Rêbertî girîngî dida 'partîbûnê'. Heval Mazlum û hevalên din piştgirî dan vê nêrînê. Ji ber civîneke nîqaşê bû ti biryarek nehat girtin. Biryara dewamkirina civînên wiha

derket. Paşê Nîsana 1978’an li Elezîzê civînek hat lidarxistin. Ew jî weke civîna pêşî civîneke nîqaşê bû. Di encama wê de weke du rêveberiyan karbeşiyek derket holê. Yek, rêveberiya pratîk a qada rêxistinbûn-çalakiyan û xebatên pratîk bi rê ve dibe, yek jî têkildarî Komîteya Weşana Navendî plansazî hat çêkirin. Biryar hatibû girtin ku kovarek bê derxistin. Komîteyeke Weşana Navendî ya dê vê bike hatibû wezîfedarkirin, ew jî dibû rêveberiyeke ku ji rêvebirina xebatên teorîk berpirsiyar. Civîna Nîsana 1978’an a li Elezîzê karbeşiyeke wiha pêş xist.

Ev di heman demê de dibû pêşketina pêvajoya partîbûnê. Çûna ber bi partîbûnê bi lez dikir. Di encama wê de Rêbertî Tîrmeha 1978’an li Amedê manîfestoya bi sernava “Rêya Şoreşa Kurdistanê” nivîsand. Dibû îzaha berfirehtir a bernameyê. Gelek mijarên din berfirehtir digirt dest û zêdetir dihat fêmkirin. Manîfesto weke hejmara yekemîn a Serxwebûnê hat amadekirin. Li Amedê çapxaneyek hat avakirin. Li wir çapa Îlon-

**Cotmeha 1978'an hat kirin. Li Çewlikê hat temamkirin. Qapax li Amedê hatibû çapkirin. Nivîsa "Bi Derketinê re" Rêbertî amade kiribû. Ew jî nivîseke girîng bû. Digot, "Hesta fedîkariyê ya ji ber rewşa Kurdistan xistine nav em his dikin, di serxistina wezîfeyan de wê bibe çavkaniya me ya hêzê ya rastî. Ev hesta fedîkariyê wê bihêle em her tiştî bi ser bixin, wê bibe hêza me enerjiyê." Bi vî awayî serxwebûn jî îlegal hat derxistin. Cotmeha 1978'an xebatên çapemeniyê dest pê kir.**

**Ji bo kadro civînan li dar bixin, nîqaş bikin, nêrîn û pêşniyarên xwe pêşkeş bikin, "Pêşnûmeya Bernameyê" hat belavkirin. Vê jî pêvajoya amadekariya kongreyê îfade dikir. Li aliyê din jî piştî qetilkirina heval Hakî, têkildarî nasandina heval Hakî zêde tiştek nehatibû kirin, bi tehlûke hatibû dîtin. Paşê çalakiya leşkerî ya qatil hatin cezakirin hat lidarxistin. Lê diviyabû heval Hakî bê nasandin. Guncaw hat dîtin ku di yekemîn salvegera şehadeta wî de xebateke propagandayê ya wer berfireh bê kirin û**

plana wê hat çêkirin. Tevahiya hefteyekê bi awayekî beriya 18’ê Gulanê û rojên piştî wê digire nav xwe li her qadê xebata propagandayê hat kirin. Ji bo vê belavok, afîş û pûl hatin amadekirin, li her cihî hatin belavkirin. Tevahiya hefteyekê ji Serhedê heta Stenbolê xebateke propagandayî ya zêde çêbû. Belavok û afîşên têkildarî heval Hakî li her cihî hatin belavkirin û daliqandin. Pankart-poster hatin daliqandin.

Rêbertî ji bo bîranîna heval Hakî hest û fikrên xwe nivîsandin. Ev nivîsa yekemîn a pirtûka “Li Kurdistanê Qehremantiya Gel e”. Di salvegera şehadeta wî de ew jî hatin belavkirin. Kadroyan xwend, nîqaş kirin. Bû propagandayeke bi bandor. Ji ber dema em gihiştin bihara 1978’an hêzeke rêxistinê ya xurt derketibû holê. Ji lewra gihişt asta li tevahiya Kurdistanê bê naskirin. Di nav xebatên propagandayê de 19’ê Gulanê polîsan û hinek kesên ji qebîleya Silêmaniyan -ew qebîle di bin bandora MHP’yiyan de bû- êvarî li hember koma afîş dadiliqand êrîşa çekdarî

**pêk anîn. Heval Xelîl Çavgun di wê êrîşê de şehîd ket. Hevkariya MHP, dewlet û paşverûtiya xwecihî hebû. Li Tirkiyeyê pevçûna navxweyî pir zêde bû. Polîs jî bibûn du beş. Du komele ava kiribûn. POL komeleyek bû, POLDER komelek bû. Çepgir di komeleyekê de bûn, faşîst di komeleyekê de bûn. Polîsên faşîst êrîşî şoreşgeran dikirin, polîsên çepgir êrîşî faşîstan dikirin. Yekîtiya emniyeta dewletê nemabû.**

**Li aliyê din 1977'an careke din hilbijartin çêbûn. Tevî CHP bû partiya yekemîn jî partiyên din careke din koalîsyonek çêkirin. Di salên 1970'î de sê caran hikûmeta eniya milliyetgir hat avakirin. Di pêşengiya Demîrel de koalîsyonên MHP û MSP di nav de pêk hatin. MHP di hikûmetê de bû. Midûriyeta Tapû Kadastro bi wezareta Alparslan Turkeş ve girêdayî bû. Riha weke herêma pîlot diyar kirin. Hemû ulkucî, karkerên MHP'ê têde bi cih kiribûn. Ti kes ji wan nedixebitî, lê meaşên xwe digirtin. Bi vî awayî hewl didan Rihayê bi dest bixin. Li her cihî êrîşî ciwanên çepgir-**

**şoreşger dikirin, dixwestin Rihayê bixin bin kontrola xwe. Serokê MHP'ê yê Rihayê ji qebîleya Silêmaniyên Rihayî bû. Wan jî di wê astê de bi MHP'ê re têkilî çêkiribûn. Armanc dikirin di MHP'ya Riha bi dest xistibû de bi bandor bin. Bi vî awayî hevkariya polîs, MHP û paşverûtiya xwecihî derket holê.**

**Berxwedana Hîlwanê li hemberî vê pêş ket. Rêbertî bi awayê ev jî mîna komkujiya Dîlokê ya 18'ê Gulanê êrîşeke bi plan a nû ye nirxand. Tê xwestin ku rêxistinbûna me ya li xwecihî û bûyîna me ya hêza xwecihî asteng bikin, naxwe weke xwedîderketina li bîranîna heval Hakî, divê ji sedî sed têkoşîneke xwedî li bîranîna heval Xelîl Çavgun derdikeve bê meşandin û pêşketin girêdayî vê ye. Rêbertî ku ev jî wer nirxand, li ser vî esasî wezîfedarkirin çêbûn. Rêbertî bi xwe jî demekê çû Hîlwanê. Heval Kemal û hevalên pêre çûn berpirsiyartî hilgirtin. Li Hîlwanê ketin nav hewldana rêxistinbûna têkoşîneke hesab ji qatilan bipirse. Pêşî pir teng nêzîk bûn, tenê bi awayê em li sûcdaran bidin di nav**

**Hîlwanê de man. Ew hê rêxistinkirî bûn, derfetên wan zêdetir bûn, çekên giran bi kar dianîn. Bi me re demençe hebûn. Bi tehlûke bû. Paşê hevalê Kemal Pîr hat girtin. Hevalê Mehmet Karasungur berpirsiyartî hilgirt. Lê belê piştî demekê dema tengasî hat dîtin, plan hinekî hatin guhertin. Tenê ne di çarçoveya Hîlwanê de ji Amedê heta Dîlokî û tevahiya Rihayê ku digire nav xwe li herêmeke berfireh pêşbîniya têkoşîneke bi plan hat kirin. Ji ber wan ew qad bi kar dianîn.**

**Ya duyemîn, ne bi awayê xwe dispêre çend şoreşgeran, bi perwerdekirin û rêxistinkirina civaka Hîlwanê re avakirina berxwedaneke civakî rasttir hat dîtin. Li ser vê bingehê koordîneya derve hat rêxistinkirin. Di hundir de gelê Hîlwanê hat rêxistinkirin, ji derveyî qebîleyê civaka Hîlwanê bi ciwan, ixtiyar, zarok, jin-mêr her kesî xwe rêxistin kir. Karbeşî çêbû. Her kesek bû xwedî wezîfe. Rêxistinbûna civakî jî bû wesîle. Xebateke baş çêbû. Vê rewşê li hundir û derve em xurt kirin, ew tengav kirin. Pêşî em teng diman, ew**

**pêş ketin û em di têkoşînê de bi bandor nebibûn. Dema rêxistinî pêş ket, ketin rewşeke ku nikarîbûn gav biavêjin Hîlwanê. Têkildarî cihê lê ne tavilê agahî dihat girtin. Zarok jî dixebitîn. Tiştek ji ber çavên wan xelas nedibû. Demldest agahî dianîn û li ser van agahiyan jî çalakî dihatin lidarxistin. Di nav tengasiyeke mezin de man. Li qadên derve jî çûn ku derê hatin şopandin. Birîndarên wan çêbûn, birin girtîgeha Dîlokê. Hevalan di girtîgehê de li wan dan. Dema ew dîtin nema karîbûn gav biavêjin.**

**Weke hesab dikirin nebû, li pêşberî wan bi rastî jî hêzek rêxistinkirî heye, rewşeke wer hêsan nîne û ne mimkun e karîbin pê. Li ser vê yekê dawiya meha Mijdarê teslîm bûn. Lihevkirinek çêbû. Di wê çarçoveyê de teslîm bûn. Dema teslîm bûn û hatin bêbandorkirin, hemû rêveberiya Hîlwanê ket destê rêxistinbûna PKK'ê ava kiribû. Komîteya Hîlwanê hat avakirin. Hemû saziyên dewletê, memûr bi komîteya Hîlwanê ve hatin girêdan. Li dawiyê tenê komeke jendermeyan ma. Ew**

**jî li ser asfalta Amed-Rihayê di qulûbeyan de diman. Nikarîbûn bikevin bajêr. Hemû rêveberiya bajêr ket destê PKK'ê. Îradeya dijber a aîdî dewletê nema. Rewşeke nû derket holê.**

**Weke di bûyera Dîlokê de tenê ne cezakirina sûcdaran, di heman demê de rewşeke ku navçeyek hat rêxistinkirin û rêveberiya wê ji nû ve hat avakirin derket holê. Hemû beşên civakê tevlî têkoşînê bûn. Heta wê demê bi ciwanan ve sînordar bû. Hemû gel jin-mêr di berxwedana Hîlwanê de cih girtin û piştî berxwedanê jî ketin nav jiyaneke rêxistinkirî. Vê rewşeke nû derxist holê. Li gelek qadan ji deverên din ên Rihayê heta Dêrsim û Serhedê bi faşîstan re, polîs û avahiya ajan-sîxur re pevçûn hebûn. Ya rastî berxwedana çekdarî li her cihî belav bibû. Di aliyê berxwedana ferdî, propagandaya çekdarî de belav bibû. Ev bi bandor jî dibû, çi qasî derb li avahiya sîxur dihat xistin, di civakê de bawerî çêdibû, piştgirî didan partiyê. Pêşiya wan vedibû, ji ber ew avahiya sîxur pir xerab**

**bû. Dest û çavên dewletê bû. Hêzeke civak diqutifand, dipelçiqand. Dema rêxistinê ew bi çekan tirsand, tehdît kir an jî li wan da û ew bêbandor kir, civak vebû û hestên wan ên welatparêziyê derketin holê. Baweriya wan bi xwe û rêxistinê zêde bû. Tevlî partiyê û têkoşînê bûn, piştgirî danê. Tevger civakî bû, bû tevgera gel. Li hemberî sazî û kesên sîxur li ser esasê şîddeta şoreşgerî têkoşîn pêş ket. Bi vî awayî çûn kongreyê. Di pêvajoya 1977-78'an de hem di qada teorîk hem jî di qada pratîk-leşkerî de têkoşîneke wiha çêbû. Di encam de li her qadê komên kadro, komên sempatîzan, têkiliyên gel ava bûn. Bû rêxistineke ku ji derveyî Botanê li her devera Kurdistanê çalakiyên aktîf pêk tîne, di asta yekemîn de xwedî hêz e.**

**Bi kurtasî me bal kişand ser hinek bûyerên bingehîn ên pêvajoya ber bi damezirandina partiyê ve diçûn kir, lê belê mirov karibe zêdetir dersan jê werbigire girîng e. Hinekî bi rewşa siyasî ve jî girêdayî ye. Ya rastî di wê demê de bi tenê bi Kurdistanê ve jî sînordar**

**nebû. Ew avantajek bû. Piştî darbeyê heman rewşê dewam nekir. Tecrûbeya Hîlwanê tecrûbeyeke girîng bû. Rewşeke wer berê hatibû pêşbînîkirin, plankirin nebû. Lê dema em xwedî li hinek nirxên bingehîn derketin û ketin nav têkoşînê, bû mînakeke berbiçav a nîşanî me da bê pêşketinên bi çi awayî dikarin çêbibin. Mînakeke girîng bû. Rewşen wiha ne bi heman awayî jî bin li bajar û navçeyên din ên Kurdistanê jî hinekî pêş ketin. Di asta girseyî de pêk hatin. Dawiya 1979'an li Serêkaniyê û Êlihê partiyê şaredarî jî bi dest xistin. Ew qasî girseyî bibû.**

**Li Tirkiyeyê jî li Derya Reş, Fatsa hebû. Pratîkeke bi heman rengî, aktîvîteyeke girîng DEV-YOL'ciyan derxistibûn holê. Şaredarî bi dest xistibûn, ev dibû pergaleke ku dewlet sînordar dikir, civak rêxistin dikir û rêveberiya xwecihî pêş dixist. Hîlwan biçûktir bû, hinek saziyên din ên dewletê jî nebûn. Memûrtiyên wan ên biçûk hebûn, jixwe ew wekî heyî bi komîteyê ve hatin girêdan. Hêza polîs nebû, ji derveyî hêza jenderme hinekî**

**din xweser bû, di xwecihiyê de bidestxistina rêveberiyê, avakirina rêveberiya civaka demokratîk mînakeke girîng bû. Ji vê dikare dersên girîng bê derxistin. Divê pratîka Hîlwanê bê lêkolînkirin. Di aliyê bi civakê re şer çawa tê meşandin jî mînakeke girîng e.**

**Ezmûna Hîlwanê hê wê demê ji bo têkoşîna PKK'ê girîng bû. Di aliyê taktîk-tarz û têkoşîn bibe têkoşîna gel de girîng bû. Bi zelalî derket holê ku zehmet be jî wê civak wezîfeyên têkoşînê hilgire. Heval Xelîl di nav ciwanên Hîlwanê de lîse xwendibû. Hîlwan cihekî biçûk e. Yek jî civakeke xizan, civakeke karker bû. Ax û erd ên axayan bûn. Ti axên civakê nebûn. Ji karker û kedkarên li wan deveran dixebitîn pêk dihat. Weke gundekî mezin bû. Ji lewra ji ciwanên Hîlwanê beşekê kedkarî beşekê jî karkerî dikir. Her wiha mîna ciwanên gundekî yên têra xwe welatparêz û hevdu nas dikirin bûn. Dîsa weke ciwanên taxekê yên hevdu nas dikirin di nav rêxistinbûneke xwezayî de bûn. Piştî 12'ê Adarê koma Dogu Perînçek broşureke bi**

**sernavê "Meseleya Millî ya Kurd" weşandibû û belav kiribû. Li gelek deveran bandor çêkiribû. Li Hîlwanê jî dema ciwanan ev broşur dîtibûn û xwendibûn tevlî wê komê bibûn. Ev tenê bi sedema li ser Meseleya Millî sekinîbû rû dabû. Paşê Rêbertî çûbû Hîlwanê nîqaş kiribû û li ser vê ciwan ji koma Dogu Perînçek qut bûn û tevlî koma Apocî bûn. Bi komî veqetiyabûn. Têkildarî xisûsa ku wer bi komî tevgeriyan û tevlî bûn bandoreke diyarker a hevalê Xelîl Çavgun hebû. Weke rêveberekî rêberê xwezayî yê civakeke ciwanên gund ên xwecihî bû. Kamil û gihiştî, aram û ciddî bû. Kesayeteke pir dilnizm, jidil difikirî biryar dida û derdorê timî rêz û hurmetê didayê. Lîse xwendibû, xwedî daneheveke girîng bû. Ji bo tevgera giştî, pozîsyona heval Hakî çi be, li Hîlwanê jî pozîsyona heval Xelîl wisa bû. Rêber û rêveberekî xwezayî yê di wê astê de bû. Şehadeta wî li ser her kesî pir bandor kir. Hemû Hîlwanê ew ji nêz ve nas dikir. Ji lewra her kes tevlî têkoşîna ji bo bîranîna wî hat lidarxistin bû. Di têkoşîna mewzûbehs de bû**

**avakerê pêşketineke dîrokî ya girîng û Rêbertî dema biryara partîbûnê da, weke sedemeke bingehîn geşedanên li Hîlwanê nirxand. Diyar kir ku tevger bûye tevgera gel, bûye tevgereke berxwedanê ya çekdarî û gihiştiye asta civakê bi rê ve bibe û Hîlwan weke mînak nîşan da. Got, "Tevgereke wiha kesek an jî komek nikare bi rê ve bibe, tenê pêşengiyeke partiyê dikare bi rê ve bibe." Bi awayê ji bo wê divê em bibin partî, partiyê ava bikin sedem diyarkirin. Di bûyîna partiyê, avakirina partiyê de bandoreke wiha ya rewşa li Hîlwanê heye.**

## - Kongreya Damezirandina Fermî ya PKK'ê 26-27'ê Mijdara 1978

**Kongre li gundê Fîsê yê Licê bi civîneke du rojan pêk hat. Rêbertî got,** ***"Me berê jî civînên bi heman rengî pêk dianîn."*** **Civînên salane û yên kadro dihatin lidarxistin. Timî di nav nîzama civînê de dixebitî. Tevgereke wer a bê civîn, timî hêzek organîze dike û bi rê ve dibe nêbû. Lê belê civîna 26-27'ê Mijdarê civîneke hê fermî, hê bi rêkûpêk hatibû lidarxistin.**

**Tevahiya sala 1978'an ji du aliyan ve amadekarî çêbibûn. Di pêvajoya partiyê ya bi komkujiya Dîlokê re em ketibûn nav gihiştibû nuqteyeke girîng. Têkildarî xebatên di aliyê teorîk de bername-manîfesto û amadekariyên rêziknameyê hatibûn kirin. Di aliyê pratîk de li derdora Hîlwanê, li tevahiya Bakurê Kurdistanê bi "li hemberî sazî û kesên bûne ajan-sîxur li ser esasê şîddeta şoreşgerî têkoşîn" re tevger li derveyî Botanê hema li hemû qadên Bakurê Kurdistanê bi awayekî xwe rêxistin kiribû, rojane têkoşîn dimeşand û aktîvîte li dar dixist. Kongre li ser van pêşketinan civiya. Wer bê amadekarî, bê rêxistin, bê bingeh nebû. Lidarxistina civînek û jinûve avabûneke ku rêxistin ji asta gihiştiyê karibe wêdetir biçe îfade dikir. Ji nîzama xebata heta wê demê hatibû kirin cuda bû.**

**Têkildarî kongreyê mijara ewlekariyê girîng bû. Ji ber PKK êdî tevgereke şer bi rê ve dibir. Dewletê û gelek derdoran ev dizanîbûn û dişopandin jî. Ji lewra lidarxistina civîneke bi ewle pir girîng bû.**

**Lewma cih girîng û guncaw bû. Bi plansaziyeke bi disîplîn û guncaw jî çêbû. Destpêkê ji bo bên Amedê bang li delegeyên wê tevlî bibin hat kirin. Ji Amedê bi mînîbuseke taybet ji bo qada kongreyê hatin veguhastin. Haya kesî xerîb jê çênebû, eger şopandinek çêbûba jî diçûn Amedê. Nedihat zanîn wê biçin gundê Fîsê. Li aliyê din dawiya meha Mijdarê pir bi mij û baran bû, tevgereke zêde çênedibû. Mal guncaw bû. Wesayeteke taybet bû, me bi xwe bi kar dianî. Agahiya kesî jê çênebû. Tevahiya şevê kom hatin veguhastin. Zêde haya kesî jê çênebû û kesî nedît.**

**Mala hevalê Seyfettîn Zogurlu bû. Mal nû çêdikirin. Du ode û salonek hatibû çêkirin, beşek jî dihat çêkirin. Weke malbat welatparêz bûn. Di berxwedana Şêx Seîd de şehîd dabûn. Hevalê Seyfettîn dema li Dêrsimê li dibistana mamosteyan dixwend tevger nas kiribû û tevlî bibû. Birayê wî yê mezin hevalê Alaaddîn ji leşkeriyê reviyabû, qaçax bû. Hê tevlî nebibû, di asta sempatîzanan de bû.**

**Dayik û bavê wan welatparêz bûn. Zarokên wan hebûn. Malbatê berpirsiyartî hilgirt.**

**Mal li cihekî asfalt bû. Beriya mirov bigihîje terqarêya Licê li ser rêya Amed-Çewlikê bû. Beşek ji wê rêyê asfalt, beşek ne asfalt bû. Beriya mirov bigihîje terqarêya du navçeyan xwaringeh û çayxaneyeke li ber qeraxa asfaltê bû. Malbata hevalê Seyfettîn xwaringeh û çayxane dixebitandin. Cihekî ku wesayîtan mola dida û av lê pir bû. Qehwexane hebû. Wesayît piranî li wir disekinînin. Mal jî li cem wê çêdikirin. Li wir wekî din kes nebû. Gund hinekî diket pişt wê. Ji wir malên gund xuya nedikirin. Ji lewra gundiyan zêde nedidîtin. Bi vî awayî ku li ber asfaltê bû û eger mirov bala xwe bidiyê cihê wer heke mirov bi dizî tevbigere avantajek e. Wesayîta bi şev diçû tavilê li texma malê disekinî, bêyî faran vemirîne kesên têde dadiketin û wesayîtê dewam dikir. Kesekî ji dûr ve lê binihêriya zêde ferq nedikir ku disekine jî. Di nav saniyeyan de diketin hundirê malê. Bi vî awayî tevahiya şevê kom**

**bûn. Zêde kesî nedît, sibehê zû Rêbertî, heval Cuma, heval Sara û Fatma hatin. Ew jî bi lez ketin malê.**

**Bi roj kes derneket derve. Bavê hevalê Seyfettîn tevahiya du rojan li ber çayxaneyê rûnişt, destûr neda kesek were. Kesên dixwestin bên paşve zivirand. Malbatê karên malê dikir. Hevalê Alaaddîn li cihekî li ber asfaltê çavdêrî dikir. Kesek bi roj ji hundir derneket. Bi roj xebat dihat kirin, şevekê li wir man. Roja dîtir êvara 27'ê Mijdarê bi heman awayî bi wesayîtê heval neqlî Amedê hatin kirin. Civîneke wer veşartî û bi disîplîn bû. Di aliyê ewlekariyê de pirsgirêk çênebû. Cihekî ku bi vî awayî hatibû rêxistinkirin. Rêbertî û heval Mazlum biryar dabûn. Ji me jî pirsîbûn, me gotibû dibe ku guncaw be. Eger mirov baldar bûya cih zêde bal nedikişand. Lê heke mirov xwe daba xuyakirin cihekî bi tehlûke bû. Bi xisletên wê yên hatin diyarkirin dema mirov baldar bûya zêde bal nedikişand.**

**Civîneke du rojan bi vî awayî hatibû plankirin. Ji berê de amadekarî hebûn. Wext guncaw hatibû dîtin. Li herêman rêxistineke fermî nebû, lê herêmên diyar ên Kurdistanê, navendên bajaran hebûn. Ji 1976'an ve bi qasî xebat hatin meşandin, hinek herêm bûn navend, herêmên xwezayî çêbûn. Berpirsiyarên li wan herêman xebitîn çêbûn. Yên herî aktîf xebitîn û bi ser ketin bûn berpirsiyarên herêman. Serhed, Çewlik, Dêrsim, Amed, Dîlok, Hîlwan û Êlih bû. Herêmên wiha bûn. Rêbertî ji bo tenê ew hevalên li wan herêman berpirsiyartiyê dikin werin agahî şandibû. Yek jî têkildarî wê çend kesan bînin kota hatibû diyarkirin. Berpirsiyaran di çarçoveya kotayên ji wan re hatibûn diyarkirin mirov bi xwe re anîn. Zanîbûn ji bo civînekê hatine, lê kongre çi qasî dihat zanîn ne diyar bû. Tenê bername û manîfesto hatibû belavkirin. Wê hatibana xwendin, nêrînên hemû herêman hatibana wergirtin û bi vî awayî wê delege hatibana, jixwe wisa jî kirin.**

**Di vê çarçoveyê de wê 25 kes bûna. Ji ber 3 kes ji Hîlwanê nehatin bi 22 kesan civîn çêbû. Ji hemû qadan weke me diyar kir ji herêmên mewzûbehs nûner hatin. Dudo dudo, sisê sisê, çar çar bûn. Weke koordîneya giştî hinek heval hatin. Beşek ji terkîbê dihat zanîn. Beşek jê şehîd ket. Hinekan xiyanet kir. Beşek di nav têkoşînê de ye. Di nav terkîba ji 22 kesan du jin hebûn. Hevala Sara û Fatma bû. Fatma di dema koma bîrdozî de ji Enqereyê tevlî bibû. Li dibistana çapemenî-ragihandinê xwendekar bû. Li cem Fakulteya Zanistên Siyasî bû. Weke delegeya çapemenî-ragihandinê tevlî damezirandina ADYOD'ê bibû. Yek ji kesên bi awayekî aktîf tevlî têkoşîna ADYOD'ê bibû. Ji Depê bû, lê bi eslê xwe ji Muxîndîlî-Mazgêrd bû. Wê demê têkiliya wê bi DEV-YOL'ê re hebû. DEV-YOL di nav koma ciwanan de koma herî mezin bû.**

**Hevala Sara ji Kurdistanê tevlî bû. Dema sala 1976'an li Kurdistanê ket nav hewldana xebatan yek ji kesên pêşî yên ji qada Dêrsimê tevlî bibû. Beriya wê bi koma Halkin**

Kurtuluşu/Rizgariya Gel re têkiliyek wê çêbibû. Paşê dema tevger nas kir û nîqaş kir, ji wan qut bû tevlî rêxistinê bû. Hinekên din jî ji Dêrsimê tevlî bibûn. Hey cihê wê hatiye em dikarin diyar bikin bê hêza jin çawa tevlî bû. Tê gotin ku kêm tevlî bûye. Wisa nîne. Kêm tevlî bûye, lê çima wisa ye? DDKO, rêxistina ciwanên çîna serwer a Kurd bû. Ji ber wê demê tenê zarokên axa-began dikarîbûn biçin zanîngehê. Zarokên gel nikarîbûn di wê astê de bixwînin. Nifşa paşê, ji ber mêtingeriyê-qirkirinê ji zarokên gel re jî hat vekirin, THKP-C, THKO û paşê jî PKK bû rêxistina ciwanên jîr ên zanîngehê yên gelê xizan. Piraniya wan jî mêr bûn. Keç bi qasî nebûn kêm bûn. Hinekî ji xeta Dêrsim, Sêwasê, hinekî jî ji xeta Mereş, Semsûr, Meletî hejmareke bi sînor jin hebûn. Ji ber di wan pêvajoyan de ne zanîngeh, nikarîbûn biçin dibistanên din jî. Li cihên lê nikarîbûn biçin dibistanên navîn û lîseyê jî. Li Enqereyê wer civakeke xwendekarên keç ên Kurd, zanîngeh nebûn. Yên heyî kêm bûn. Di nav wan de Fatma û keseke ji Elbîstanê hebûn. Komeke

**wer biçûk a PKK'ê hebû. Di çarçoveya têkiliyan de gelek kes hebûn. Di pêvajoya ku têkoşîn neqlî Kurdistanê bû hinek jî qut bûn.**

**Di pêvajoya hatina Kurdistanê de ciwanên ku lîse xwendibûn hebûn. Dîsa ji heman herêman tevlîbûn çêbûn. PKK bi ti tiştekî xwe nikarî bikeve Botanê. Li Mêrdînê hinek komên ciwanan hebûn, demeke dirêj di navberê de man, nikarîn biryar bidin. Bi giştî PKK li herêma navîn pêş ket. Di nav wan de keçên lîse xwendibûn zêdetir di nav civaka Elewiyan de bûn. Civaka Elewî wer bi awayekî vekirî bû. Lewma timî weke civakeke pêşverû dihat hesibandin. Ya rastî çi qasî wiha ye rewşeke nîqaşê ye. Lewma ji Dêrsimê tevlîbûn çêbûn. Girêdayî Dêrsimê di nav civaka Elewiyan de ji Elezîzê tevlîbûn çêbûn. Ji xeta Mereş-Semsûrê tevlîbûn çêbûn. Paşê ber bi xeta Amed, Riha, Mêrdînê û Kurdistana Navîn ve çû. Li wir tevlîbûna kadroyan dereng çêbû. Pêşî welatparêz tevlî bûn, welatparêziya jinan deriyê xwe ji têkoşîna azadiyê re vekir. Lê belê di xeta**

**welatparêziyê, xeta kadro ya profesyonel de hê zêde di pêvajoyên ku têkoşîn pêş diket tevlî bûn.**

**Hevala Sara bi awayê aktîf beşdar bibû û li qadên cuda xebitîbû, tevlî bibû. Hevalên din jî hebûn. Di wê pêvajoyê de tenê kadroyên PKK'ê nebûn, divê mirov wer zen neke. Hevala Sara ji koma Dêrsim-Elezîzê hatibû. Ji deverên din tevlîbûn çênebû, hevalên di asta tevlîbûnê de hebûn. Temsîliyet di wê astê de çêbû. Li gor rêxistinbûnên din dîsa jî tevlîbûna jinan a zêde di nav PKK'ê de bû. Mirov vê jî bêje wê bi feyde be. Rêxistinên din ên mewzûbehs weke PKK'ê jî nebûn. Kêmtir bûn an jî di nav hinekan de bi qasî nebûn kêm bûn.**

**Tevlîbûnên din ji nûnerên ku ji herêman hatibûn pêk dihatin. Hevalên şehîd ketin heval Mazlum û heval Xeyrî bû. Hevalê Kemal Pîr ji ber di girtîgehê de bû tevlî nebû. Paşê hinekan xiyanet kir. Abdullah Kumral ê ji Cîbînê, li Lubnanê şehîd ket. Hevalê Seyfettîn tevlî bibû,**

**ew jî şehîd ket. Yên ji Serhedê tevlî bibûn hebûn. Heval Cuma û Fuat tevlî bibûn.**

**Di civînê de heval Xeyrî bibû dîwan. Rêbertî got, "Ji ber ez ê tevlî nîqaşan bibim, hevalek bi rê ve bibe baştir e. Hem axaftin hem jî rêvebirina dîwanê dibe ku zehmet be." Hevalan hevalê Xeyrî guncaw dîtin. Hevalê Xeyrî bû dîwan, lê jixwe bi awayekî aktîf Rêbertî bi axaftinê kongre bi rê ve bir.**

**Rojeva civînê mîna rojevên me yên niha bû. Lê belê nirxandina rewşa siyasî hebû. Mijarên nirxandina xebatan, xebatên pratîk, rêxistinbûn û partîbûnê hebûn. Divê em xwe çawa rêxistin bikin? Têkildarî van rojevan Rêbertî axivî. Ew axaftin weke "axaftinên destpêkê" bû pirtûk. Axaftinên Rêbertî ne.**

**Bûyîna partî, nîşan dida ku weke sedema rêxistinbûnê tevger, bibe tevgereke gel û tevgereke berxwedana çekdarî. Rêbertî digot, "Tenê partî dikare tevgereke wiha bi rê ve bibe. Rêxistineke din nikare bi rê ve bibe. Heta niha weke kesê bi rê ve bir, bi tena xwe**

**min anî heya vir. Heta niha komek bû, lê niha tevgereke gel a çekdarî heye, tenê kesek nikare wê bi rê ve bibe. Tenê partî dikare bi rê ve bibe, ji lewra divê mirov bibe partî.” Sedema wî ya bingehîn ew bû. Di vê de jî mînaka herî berbiçav, tevî mînakên li Kurdistanê yên giştî Hîlwan mînakeke berbiçavtir bû.**

**Ji derveyî wê herêman nîqaş kiribû, têkildarî bername-manîfestoyê nêrînên xwe anîbûn ziman. Her kesî nêrîn û pêşniyarên xwe gotin. Wê guhertinên çawa çêbibin? Pêşniyarên guhertinan hatin nîqaşkirin. Di dawiyê de “Pêşnûmeya Bernameyê”, “Rêya Şoreşa Kurdistan” hat qebûlkirin, bû manîfesto. Rêbertî bi destxeta xwe “Pêşnûmeya Rêziknameyê” ya 9 xal amade kiribû. Çarçoveya rêziknameya partiyên komunîst ên sosyalîzma pêkhatî bûn, ew hat qebûlkirin. Bi vî awayî bername, manîfesto û rêzikname fermî kir û kir rêxistinek.**

**Têkildarî xebatên bên kirin nîqaş çêbûn. Divê xeteke çawa bê şopandin? Herî dawî**

**xisûseke girîng jî hilbijartina rêveberiyê bû. Rêbertî girîngî dida bûyîna partiyê. Sekna kadro ya heyî pir têr nedidît. Digot ku partî nebe nabe. Lê di mijara, ev kadro çi qasî dikare bibe partî, em ê weke 'partî' nav lê bikin, lê belê di fiîliyatê de eger em şertên partiyê neyînin cih wê rewşa me çawa be, bi fikar bû. Nuqteya bi esasî têde bi fikar bû ev bû.**

**Dema ji bo rêveberiyê gelek heval hatin pêşniyarkirin, yek bi yek bi hemûyan re hat nîqaşkirin. Bi awayê "Tu çi qasî amade yî? Tu dikarî bikî? Tu xwe çawa dibînî?" Ji bo fêm bike bê çi qasî amade ne, diyalog pêk anî. Di encam de biryar hatibû girtin ku Komîteya Navendî ya ji 7 kesan bê hilbijartin. Di encama van nîqaşan de dema pir dirêj bû, negihiştin encamê. Raye dan Rêbertî. Weke alîkarên Rêbertî du kes hatin hilbijartin. Jêre komîteya rêveber a ji 3 kesan hat gotin. Rêbertî dibû sekreterê giştî û du alîkarên wî çêdibûn. Dibûn rêveber. Di civînê de zelalkirina 4 kesên din jî ji Rêbertî re hat**

**hiştin. Hat gotin ku bixwaze bi kê re bixebite, bila Rêbertî diyar bike û bixebite. Rêveberî wer hat hilbijartin.**

**Biryar hatin girtin, bernameya partiyê û rêzikname zelal bû, lê navê partiyê nehat diyarkirin. Kongreyê biryara wan da û belav bû. Paşê Rêbertî zivistana 1978-79'an li Amedê "Danezana Rizgariyê" nivîsand. Bername, manîfesto û yek jî danezana îlana damezirandinê jî bi 25-30 rûpelên pirtûkê dibû broşurek. Tevahiya zivistanekê wer xebitî. Danezana damezirandinê amade kir. Komekê ev danezan redakte kir. Ji bo bê çapkirin derbasî ser kaxeza mûmkirî hat kirin. Em bi karê çapkirinê re mijûl dibûn. Navê ku Rêbertî nivîsandibû cuda bû. Navê "Yekîtiya Têkoşînê" lê kiribû, lê bi nîqaş bû. Dema me yê şandiba çapê agahiyeke bi awayê 'bila ecele neyê kirin' hatibû şandin. Wê demê Komîteya Navendî Nîsana 1979'an civîna xwe ya yekemîn li dar xist. Rêbertî tevahiya zivistana 1978-79'an li Amedê xebitî. Danezana damezirandinê amade kir. Ji ber**

**rêveberî di civînê de bû, me her tişta amade şand çapkirinê. Agahiyeke bi awayê wê weke PKK (Partiya Karkerên Kurdistan) bê nivîsandin hat. Me navê ku berê hatibû nivîsandin rakir û li şûna wê (Partiya Karkerên Kurdistan) PKK nivîsand. Nav bi vî awayî hat danîn. Civîna Komîteya Navendî diyar kir. Ji ber me wer guhert baş tê bîra min.**

**Piştî kongreyê Rêbertî zivistana 1978-79'an li Amedê xebitî. Her kes belav bû, wê partî jinûve hatiba rêxistinkirin, lê belê pêşbînî hat kirin ku pêşî "Danezana Damezirandinê" bê amadekirin. Bi îhtîmaleke mezin hinekî jî xwest bifikire û xwe amade bike. Di jinûve rêxistinkirina partiyê de ecele nekir. Li Amedê hinek civînên kadroyan li dar xist. Têkildarî girîngiya bîrdozî û polîtîkayê konferansek da. Axaftinên wê konferansê bûn broşur û di Serxwebûnê de hat çapkirin. Têkildarî Komkujiya Mereşê konferansek hat lidarxistin, ew jî bû broşur û di Serxwebûnê de hat çapkirin.**

**Di dawiyê de Nîsana 1979'an civîna Komîteya Navendî çêbû, wê civînê navê partiyê diyar kir, plansaziya Komîteya Navendî çêkir, erkdarkirina wê pêk anî û biryara pêkanîna taktîkê da. "Berxwedana Siwêreg" a weke pêkanîna taktîk hatibû diyarkirin çêbû. Bi awayê li hemberî Mehmet Celal Bucak pêşxistina berxwedana Siwêregê bû. Belê Bucak êrîşî me nekiribû, lê êrîşî gel dikir. Hîlwan li pişt bû, bi pêşketinên li Hîlwanê re hatibû pêşbînîkirin ku li Siwêregê li hemberî Bucak têkoşîn dikare bê kirin. Me nikarî ciwanên Siwêregê yên di bin kontrola Bucak de tevlî PKK'ê bikin. Ev meylên milliyetgir reformîst hê zêdetir bi bandor dibûn. Potansiyeleke ciwanan a berfireh hebû. Diviyabû mirov wê potansiyelê tevlî berxwedanê bike. Siwêreg hinekî wer hat diyarkirin.**

**Navê partiyê weke min diyar kiriye. Civînê biryara jinûve rêxistinkirina partiyê da. Plansaziya Komîteya Navendî çêkir, ji bo komîteyên navendan li qadan jinûve bê**

rêxistinkirin weke sê eyaletan dabeş kir. Bakurê Kurdistan, qada ji Elezîzê heta Serhedê ye. Bakurê Firatê xeta Riha, Dîlok, Mereş Rojavayê Kurdistan e. Xeta Amed, Êlih, Mêrdîn, Botan weke Kurdistana Navîn dihat binavkirin. Başûrê Kurdistan û Rojhilatê Kurdistan dima. Pênaseya Kurdistanê ya PKK'ê wiha bû. Ji lewra Kurdistana di nav sînorên TC de ji sê parçeyan pêk dihat. Li gor sê parçeyan sê eyalet hatin ava kir. Li ser esasê eyaletan xebatên rêxistinkirina herêman pêşbînî kir.

Vesazkirina Komîteya Navendî çêbibû. Sekreteriya Giştî, rêveberî û Komîteya Navendî bûn. Di karbeşiya wê de beşek Komîteya Weşana Navendî bû. Komîteya Weşana Navendî ya ji sê kesan ku di asta navenda bîrdozî ya niha de bû hat avakirin. Heval Mazlum bi rê ve dibir. Ya duyemîn Komîteya Leşkerî ya Navendî ya ji sê kesan hat avakirin. Ji ber qada leşkerî hinekî xweser bû, hevalê Karasungur di Komîteya Navendî de ma, lê ji rêveberiyê derket, pêkve

**rêvebirina her duyan dikarîbû zehmet be. Hevalê Karasungur berpirsiyar û fermandarê vê komîteyê bû. Li şûna wê heval Cuma tevlî rêveberiyê bû. Ya sêyemîn jî Komîteya Rêxistinbûnê bû. Vesazkirina Komîteya Navendî ya pêşî bi vî awayî bû.**